Arşîva Bîra Kurdan: Ji Christiane More gotara bi serenavê "Li Tirkiyeyê şideta çekdarî dewam dike" (1990) ▶ R. 12

LE MONDE diplomatique kurdî

Çirîya pêşîn 2011 - Hejmar 23 · www.lemonde-kurdi.com · info@lemonde-kurdi.com · 24 Rûpel

**Jean-Marie Harribey**
Yekîtîya Ewropa ji ber krîza deynan li ber teqînê ye. Amerîka ji bo rêlibergirtina qeyraneke aborî di nava hewldanê de ye… Gelo yek ji sedema herî girîng ya vê krîzê globalbûn e?
▶ R. 10

**Vicken Cheterian**
Şerên Rûsyayê yên bi Çeçenistan û Gurcistanê re derxistin meydanê ku artêşa Rûsyayê nikare çekên nûjen baş bi kar bîne û di warê teçhîzatên leşkerî yên teknolojîk de qels e...
▶ R. 16

**Philippe Baque**
Çandinîya bîyolojîk ku li dijî çandinîya kîmyayî û berhemperest piştî şerê cîhanê yê duyemîn li Ewropayê peyda bû û pêş ket, şûna xwarinên hormonkirî yên bîyo pêşkêş dike?
▶ R. 18

**Jean-Claude Sergeant**
Sêyemîn împaratorîya çapemenîyê ya cîhanî *News Corp*. ku ya Rupert Murdoch e û li çar parzemînan xwedîyê pêncî û sê hezar mûçegir e diheje. Sedemên lerza medyayeke dêw...
▶ R. 20

**Yılmaz Özdil**
Hebûna sînemayeke neteweyî ya kurdî, girêdayî hebûna dewlet û nasnameyeke neteweyî ye. Li gor vê formulasyonê, sedemên pirsgirêka kurdî û yên bênavbûna sînemayeke kurdî yek in...
▶ R. 23

# Li Kurdistanê rêya sêyem

PROF. DR. ILHAN KIZILHAN

Gengeşîya li ser rêya sêyem cara pêşî di roja me de nayê kirin. Ji alîyê dîrokî ve rêya sêyem bi destpêkirina dualîzmê, ji serdema Manîçêr (216 piştî zayînê) ve bû xwedîya girîngîyeke taybet, ji ber ku dualîzm rêyeke sêyem nabîne. Dabeşî di navbera baş û xirab, reş û spî, jêr û jor, çep û rast de tê kirin. Beşên din yên navber û derdorê nayên dîtin. Dîyanetên cîhanê yên mezin û îdeolojîyên siyasî yên piştî wê demê hewlê didin ku di bin vê nêrînê de pirsgirêkên civakî fêhm bikin û li gor wê jî, awayên jîyanê pêk bînin.

Rêya sêyem dikare bi gelemperî wek rêyeke lihevanînê ya ku dijberîyan digihîne hev, bê fêhm kirin. Pirs ew e ku azadîya kesan çawa dikare li hember zordarîya civakê bê parastin. Herwiha li beramber aborîyeke ku dixwaze herdem qezenc bike, sermaye zêde bibe, em çawa dikarin dîsa jî edaleteke sosyal, nirxên mirovahî û nasnameya kesayetîyê biparêzin. Di dema şerê sar de **Ota Sik** li jîyaneke hevbeş a kapîtalîzm û komunîzmê digeriya (Sik, 1979). Bazara aborîya azad û aborîya bi plan a navendî tê bi rê ve birin, diviyabû hevaheng bûna. Îro kesên din alternatîveke bi edalet daxwaz dikin ku sîmayeke mirovane bidin globalîzma sar. **Anthony Giddens** (2001a) li vê yekê *"Rêya sêyem wek nûvejîna demokrasîya civakî"* bi nav dike (Giddens, 2001b). Li ba **Joseph Stiglitz** wiha ye: "Making Globalization Work" (Telo, 1998). Mirov dikare vê yekê, ango rêya sêyem li Rojhilatê Navîn mîna "wekhevî, demokrasî û mafê mirovan" bi nav bike.

Eger em rewşa kurdan a li Tirkiyeyê bigirin ber çavan û li "Rêya Sêyem" bigerin, wê demê em li Tirkîyeyeke polarîze ya gengeşî û ramanan, dikevin pey lêgerîna alternatîveke siyasî û civakî. Pêşniyaz û pêşniyazên hember ji bo çareserîyeke pirsa kurd hatine dayîn û her duyan jî qebûl nedîtine. Herdu alî, yanî dualî cih di cepha xwe de girtine û gavekê jî nêzîkî hev nabin. Di tevgera kurd û îdeolojîkkirina wê de jî guhertin tunene, yanî îdeolojîyeke bê îdeolojî ye.

Ew ji bo azadîya Kurdistanê têdikoşe bêyî azadîya kurdan. Heman demê, di maneya dualîzmê de şemayên dost-dijmin pêk tîne. Mirov yan dijmin e, yan dost, welatparêz yan xayîn, sempatîzan yan dijber e. Avayîyên patrîarkal û dînî ku bi teorîyên şoreş û civakî yên rojava tevlîhev bûne; tevgera kurd heta vêga dûredirêj neketîye pey îdeolojîyeke rasteqîn ku ew ji gelê kurd re azadîyê bîne. Hertim ji nû ve teorî û planên li ser azadî û serfirazîya civakî yên ji alîyê zanistê ne piştrast in tên gengeşî kirin, lê dema ew têkûz naxuyên, tên avêtin û dîsa li yên nû tên gerîn. Ev yek ji bo ku di paşerojê de kurd çawa û bi kîjan modelê dikarin bijîn, derbas dibe: Hewldanên otonomîyê, demokratîzma herêmî, federalîzma di nav sînorên dewleta heyî de, heta serxwebûnê hemî tên tevlihev kirin û hemwelatîyên kurd derbarê armancên partîyên kurd ên siyasî ên li Tirkîyeyê di nezelalîyekê de dimînin. Serdestîya PKKê ya li ser aktorên siyasî bi vîzyona çareserîya wan a pirsa kurd û ya dewleta tirk ji cudahîyê zêdetir, çareserîyekê jî bê îmkan dike. Sosyalîzasyona aktorên siyasî yên kurd û herwiha yên piranîya endamên PKKê û siyasetmedarên AKPyê, herçend bi dîtinên siyasî ji hev cuda bin, li ser pirsa kurd dişibin hev. Hemû li Tirkîyeyê sosyalîze bûne û taybetmendîya îdeolojîya netewperest a kemalîst a bi paşbingehekî kevneşopîya dînî li ser wan çêbûye. Rêşopên hewldana bicîanîna mafên siyasî, li ba AKPyê ya tirk û BDP/PKKê ya kurd dişibin hev: Tabûkirin, şopandina radîkal a îdeolojîyeke bê naverok, ji bingeha xwe kevneperest, otorîter û li pey serokatîyekê bûn, şemaya dost-dijmin, redkirina ramanên kesên din, hema bibêje mîna terîqatê û li hember derva lîberal û fêhmdar. Hem AKP hem jî PKK dibêjin ku siyaseta tirk derbarê pirsa kurd ya heta niha divê bê guhertin. Ev tê wê maneyê ku divê zora kemalîzmê jî bê birin. Hem AKP û hem jî PKK sedema biserneketina rejîma tirk bi îdeolojîya wê ya neteweperest a kemalîst ve girê didin, lê li alîyê din her du grûp jî, ji bo çareserîya pirsa

▶ R. 3

Almanya: 4,50 €
**Awûstûrya, Belçîka, Fransa, Holanda:** 5,00 €
**Brîtanya:** 4 £, **Danîmarka:** 40 DKK, **Norweç:** 40 NOK,
**Swêd:** 50 SEK, **Swîsre:** 6,50 CHF, **Tirkiye:** 7 TL

4 191764 204509 23

PIŞTÎ DESTPÊKIRINA SERHILDANA EREBÎ

# Siyaseta Tirkîyeyê ya Rojhilatê Navîn û faktora kurd

PROF. DR. FERHAD IBRAHIM

Bihara erebî, siyaseta tirk a Rojhilatê Navîn xiste ber ceribandineke dijwar. Mînîmalîzekirina dijberîyên di stratejîya siyaseta derva ya wezîrê derva **Davutoglu** "siyaseta-sifir-pirsgirêk" a nakokîyê ya bi aktorên herêmî re bi nav dike, wiha dixuye ku wek destpêk bi temamî serkevtî nîne. Ev yek, ji ber ku **Davutoglu** awayekî siyaseteke derva ya hevkarîya bendeyî [Interdependence] rojane bi kar tîne, yanî ji xwezaya teorîyê bi xwe ye. Teorîya siyasetê ji mêj ve ye bala xwe dide ser girêdana hevkarîyê ku wek konsepta siyaseta derva bi helwêsta aktorên beşdar ve girêdayî ye. (1) Helbet herçiqas stratejîya hevkarîya bendeyî ya *win-win* (qezenc) ji alîyê **Davutoglu** hatibe plan û propaganda kirin jî, cewherên di têkilîyên navneteweyî de nikarin bên veşartin. Helbet hevkarîya bendeyî di civakeke dewletî de bi eynî avahî û berjewendîyên siyasî dikare bibe bingeheke siyaseta hevbeş. Stratejîya Davutoglu di serî de tam jî di vê noqteyê de têk çû. Dewletên-MENA (Middle Est and North Afrika/Rojhilatê Navîn

▶ R. 4



DARA ARAM: **Qadên xeyalan**, boyaxa akrîl li ser tûwalê, 36 x 36 cm

*EDITO* "HEGER LI VIR PÊK NEYÊ, LI TU DEVERAN PÊK NAYÊ"

# Tûnis, serxweşîya gengazan

SERGE HALIMI

Nêzî salek piştî xwekuştina Sîdî Bouzîyê ku çirûska serhildanên erebî vêxist, Tûnis hilbijartinan li dar dixe. Kampanyaya hilbijartinê ya bêserûber, li ser bingeha pêwistiyeke lezgîn a civakî tê meşandin.

Bi daxistina ji text a zordar, gelo şoreş jî bi dawî hat? Li Tûnisê, li vê dema ku zêdetirî sed partî, ku piranîya wan nayên nas kirin, ketine nav hewldana dagirtina cihekî li Meclîsa Avakar a ku di encama hilbijartinên 23yê cotmehê de wê bi gewde bibe, hertişt mimkun xuya dike, hertişt vekirî xuya dike. Meclîsa hilbijartî wê karibe bibe xwedî nirx û rewatîyeke bêkêmasî ya demokratîk: Temsîla nisbî û wekhev (herçendî % 95ê serên di lîsteyê de mêr bin jî); rêziknameya dijwar a lêçûnên kampanyayê, sondaj, propagandaya siyasî; nenasîna tu îmtîyazekê ji partîyên mezin re. Weke nûner, Meclîsa Avakar wê dîsa bibe serwer. Ew ê di heman demê de dengeya hêzan, şeklûşemala rejîmê (serokatî an jî parlementerî), cihê olê di nav sazîyên welêt de û wekî din, eger bixwaze, ew ê rola dewletê ya di aborîyê de jî dîyar bike. Coş û xiroşa rûpela sipî; Hêvîya ji bo demokrasîyeke ereb û misilman. Milîtaneke çepgir ê bi welatê xwe pir bawer, bi van gotinan û bi awayê herî kurt tîne ziman ku Tûnis bi qabiliyet û derfetên xwe wê bikaribe rola xwe ya ronîkirina herêmê bidomîne: *"Eger ev yek li vir pêk neyê, wê li tu devereke din pêk neyê"*.

23yê cotmehê, maseyên ofîsên dengdanê yên ***Sfak*** wê têra xwe zehf an jî mezin bin. Dengdar wê bên vexwendin ji bona ku ji nav sî lîsteyan ku nîvê wan jî xwe weke "serbixwe" îlan dikin, tercihekê bikin. Baş e li demeke ku vegotinên piranîya partîyên siyasî bi awayekî bêdawî li derdora heman têgehan diçin û tên, wê çawa tercîhek were kirin: *"Nasnameya ereb-misilman"*, *"aborîya civakî ya bazarê"*, *"geşedana herêmî"*, *"dewletastratejîst"*?

Li gor **Nicolas Dot-Pouillard** lêkolînerê *Koma Krîzê ya Navneteweyî* ya ku li ser Tûnisê heta niha gelek rapor

▶ R. 5

www.arsivakurdi.org

JEOPOLÎTÎK

# Dîplomasîya lihevkirinê û sazûmana navneteweyî

ALAIN GRESH

Ji hilweşîna "kampa sosyalîst" û bidawîhatina şerê sar bi vir de, her çend ku "birêveberîya dinyayê" ya ji alîyê G8ê ve tê kirin, xwe li ser mirov ferz bike jî, deşîfrekirina sazûmana navneteweyî ya ku dikeve şûna wê, ne hêsan e. Tevî vê jî, weke mamoste û lêkolînerê li *Navenda Lêkolîn û Lêgerînên Navneteweyî* (CERI) zanyarê siyasetê **Bertrand Badie** di berhema xwe ya dawîyê de (1) jî balê dikşîne ser, mirov dizane ku neheqîyeke mezin dibe: *"Cudayîyeke pir mezin me ji dema welweleya ewropîyên avaker de ji hev cihê dike: Di sedsala XIXyê de, pênc dewletên sereke dehên din ji xwe dûr kirin; îro jî, 8ên mezin 184 [tevlî Sûdana Başûr 185]ên din diqewirînin, tew G20 giregir 173yên wan li derve dihêle!"* Û ev lidervehiştin, li gor wî, *"dubarekirina şaşîyê ye, ji ber ku, bi awayekî objektîf, ew şansê sazkirinê kêm dike, bi awayekî subjektîf jî, tovê mehrûmiyetê, heqîrkirinê, minetê û her wiha jî şidetê diçîne"*.

"Esîlzadeyê rojavayî" dev ji îmtiyazên xwe bernade. Êdî ew, nema li ser navê têkoşîna li dijî komunizmê vê yekê rewa dike, belê bi sentezeke referansên xiristîyanîyê, bavîtî û mesîhîtîyê, bi wateya gerdûnîbûn û vejîna fikrên azadîyê, demokrasî û dewleta hiqûqê, wê rewa dike. Di bin vê ebaya "çandî" ya *"bi tevayî xeyalî de, Rojava cîhaneke wiha dest nîşan dike, ku tu dîyardeyên wê yên objektîf ên erdnîgarî, dîrokî yan jî civatî tunene"*. Û ew dîsa di pakteke leşkerî de, di himbêza Rêxistina Peymana Atlantîkê ya Bakur (Nato) de, ku *"bûye navgîneke veguhartina fikra 'Bakur' bi ya 'Rojava' re"*, ji nû ve derdikeve holê.

Ew nîzama ku, di serî de ji ber *"kêmbûna dewlemendîyê"* derbekê li olîgarşîya avaker dide, heta îro gelek hatiye minaqeşe kirin. Hêzên aborî yên nû derdikevin holê, ji Çînê bigre heta bi Brezîlyayê, li gor nivîskarî, *"ne tenê bi forma xwe, her wiha bi naveroka xwe jî alternatîfeke nû ya birêveberîya kevin xuya dibe. Bi jêderên xwe yên taybetî, bi nirxên xwe yên nû, bi helwêstên xwe yên nûjen li ber pêgeha navneteweyî, ev alternatîf dikare ji guherankarîyeke besît wêdetir biçe û weke şansekî din ê globalbûnê tiştekî cihê pêşnîyaz bike"*. Bêdengkirina ***G8***ê bi riya entegrekirina wê ya di nav ***G20***ê de jî yek ji van alternatîfan e.

Bi awayekî paradoksî, yek ji encamên avakirina G8ê û birêveberîyeke dinyayê, weke ku **Badie** jî dest nîşan dike, weke dengekî serbixwe avakirina "civateke sîvîl" a navneteweyî, li ser sehneya cîhanî bû faktoreke çalak. Ev aktora nû ye, ku **Gustave Massiah**, di pirtûka xwe ya bi navê *Stratejîyeke alternatîf a globalizmê* (2) de bahsa wê dike. Nivîskarê endamê avaker ê vê tevgera bi navê globalîzma alternatîf, bi serketinên xwe yên zû û herwiha bi şkestinên xwe ve jî, şopa dîrokê digerîne. Ew herwiha minaqeşeyên ku ew bixwe beşdar bûye jî –li ser şidetê, li ser desthilatê, li ser cihê dewletê- rave dike, minaqeşeyên ewinde tevlîhev ku beşdarên wan pir in û berevajî yên kluba olîgarşîk, tevger naxwaze kesî li derveyî wê bihêle. Ew hez dike çareseriyeke veguherîna ber bi neolîberalîzmê û jê wêdetir ber bi kapîtalîzmê peyda bike, ji ber ku *"ew li dijî mentiqê serdest pêşnîyara birêxistinkirina civatan û dinyayê derdixwe pêş, ku bi vî awayî mafê her kesî yê xwegihandina mafên bingehîn hebe"*.

Ji bo Massiah, sê rêyên ji krîza di rojevê de derketinê hene: Rêyek neo-konservatîv e, rêya şer e; rêya din ji nû ve avakirineke kapîtalîzmê ye, ev rêya ***Green New Deal*** e, ku neolîberalîzmê tawanbar dike; riya sêyemîn a devjêberdana kapîtalîzmê ye. Li dûv hev rêzkirina peymanên di navbera hêzên ku piştgirîya riya duyê û yên ku piştgirîya riya siyê dikin û ***Massiah*** jî xwe tê de dibîne, bi qasî serê derzîyê jî ne zor e.

Her çend derfeta avakirina sazûmaneke navneteweyî, li gor **Badie**yî, pêrgî gelek astengan tê jî, Massiah li rêya ravekirina asoyeke him utopîk û him jî konkret digere ku destûrê bide *"civateke sîvîl"* a navneteweyî û ew jî *"mîzanîya danûstendinên globalbûyî û kadroyên navdewletî"* pêk bîne.

1 La Découverte, Parîs, 2011, 273 r.

2 La Découverte, Parîs, 2011, 323 r.

Wergera ji fransî: Yaqûb Karademîr

# JI ÇAPEMENÎYÊ

## Muşterekên Îsraîl û Tirkîyeyê

Rojnameya amerîkî ***New York Times*** di 17ê îlonê de sebaret bi rûdanên dawî yên navbera Îsraîl û Tirkîyeyê gotarek weşand. Di gotarê de, ku ji alîyê **Ethan Bronner** ve hatiye nivîsandin, piştperdeya tengezarîya di navbera herdu welatan de tê nirxandin û tê gotin ku her du hevalbendên Amerîkayê li ser çavkanîya pevçûnê de, ne hevbîr in. Dema ku Tirkîye meseleya Filistînê wekî sedem nîşan dide, Îsraîl jî dibêje ji ber mebesta xwe ya serokatîya herêmî Tirkîyeyê dev ji Îsraîlê berdaye.

Nivîsa NY Timesê sedemeke sêyem pêşnîyar dike û dibêje: *"Herdu welatên di dehan salên çûyî de di serdemeke siyasî ya weha re derbaz bûn ku gelek dişibin hev. Anku Tirkîye û Îsraîl ku herdu jî ji alîyê elîtên rojavaparêzên sekuler ve dihatin bi rê ve birin, lê belê rewş ber bi dewletên etno-olî yên populîst ve diçin, ku lidijderketina welatên derve di warê siyasî de bi kêrî siyasetmedarên nav welêt tên."*

Gotarnivîs dibêje damezirînêrê Tirkîyeyê **Mustafa Kemal** û serokwezîrê damezirînêrê îsraîlî **David Ben-Gurion** ji gelek hêlan ve wekî hev bûne û ev yek ne tesaduf bûye ji ber ku Ben-Gurion li Stenbolê huqûq xwendîyê û **Atatürk** ji xwe re mînak girtîye. Gotar weha berdewam dike: *"Ben-Gurion jî dixwest hema civakeke nûjen ava bike ku ji hevwelatîyên 'îdeal' pêk were û tê de cudahîyên gelek hindik ên zimanî û çandî hebin. Her du serokan jî ol wekî cudabûn û etnîsîte jî wekî pirsgirêk didîtin. Wekî kurdên li başûrê rojhilat, cihûyên fasî û yemenî jî tûşî tadeyeke fermî bûn. "*

Nivîskar wekî nîqaş dike ku li derve hiştina ol û reftara xerab a li hember hindikahîyan û demokrasî bi hev nakin û fikra damezirinêrên her du welatan bi rêya şoreşên hilbijartinan hatine weşandin. Di 1977ê de li Îsraîlê û di 2002ê de li Tirkîyeyê. Rojnameger **Bronner** weha dirêjahî pê dide: *"Niha neteweperestîya olî, ku her diçe mezintir dibe, di siyaseta herdu welatan de xwedî roleke navendî ye. Elîtên sekuler, ku bi salan rojeveke çandî û siyasî ava kiribû, hemû bandora xwe ji dest dane."*

Gotar herweha cih dide tesbîtên sefîrê berê yê Îsraîlê li Tirkîyeyê **Alon Liel**, ku dibêje: *"Li Tirkîyeyê elîtên kemalîst, serokên olî û kurd paşguh kirin û xelkekî xemgîn saz kir. Heman tişt li Îsraîlê jî pêk hat. Lê îro **Erdoğan** û **Netanyahu** hêza xwe ji xelkê oldar, gundî û nexwenda distînin, ku ji bo wan şeref û neteweperestî pir girîng in."*

Nîvîskarê gotarê wekî din dibêje ji ber ku tirk û îsraîlî ne ereb in, wan di navbera xwe de yekîtîyek ava kiribû, lê belê îro, dema ku Tirkîyeyê berê xwe daye rojhilatê, Îsraîlê jî daye rojavayê. Lê bi bîr dixe ku ji ber hin berjewendîyên hevbeş, her du welat dikarin yekîtîya xwe dubare saz bikin. An ku Îsraîl li dij Hamas û komên din ên filistînî şer dike, Tirkîye jî li dij kurdên cudaxwaz. Di eynî demê de, digel nerazîbûnên navneteweyî Îsraîlê ***Şerîaya Rojava*** û ***Rojhilata Qudsê*** dagîr kiriye û Tirkîyeyê jî ***Bakurê Qibrisê.***

## Nefta başûrê Kurdistanê

Kovara aborîyê *Financial Times* di 20ê îlonê sebaret bi nefta Başûrê Kurdistanê gotarek weşand. Di gotarê de, ku serenavê wê ***'Teşqela li ser nefta Kurdistanê ji herkesî re rîzîko ye',*** Herêma Kurdistanê li Îraqê wekî welatekî îmkanan tê bi nav kirin. Gotarnivîs **Jonathan Guthrie** bi bîr dixe ku şirketa lêgerîna petrolê *Gulf Keystone Petroleum* (GKP) 200 mîlyar dolar pere xistiye herêma Kurdistanê û şirketa *Vallares* jî daye xuya kirin ku wê dê digel şirketa petrolê ya Tirk a bi navê *Genel* peyman girêdaye û dê bi hev re bixebitin.

Gotar wekî din dîyar dike ku nefta Kurdistanê hêsan e ku were derxistin, lê belê di dema deshilatdarîya **Seddam** de ev rezerv li derveyî sînorên siyasî mane. Lê belê piştî hilweşîna rejîma Seddam jî îcar sîyasetmedarên Bexdayê gef li wan şirketan dixwin, ku digel Hikûmeta Herêmî ya Kurdistanê peymanên neftê girêdidin. Bexda dibêje ew dê van şirketan bixe nav lîsteyeke reş. Ji alîyê din de jî gotar mînaka GKP dide û dibêje: *"Vê yekê ji bo wan şirketên serbixwe fersendek afirand, ku bala xwe nadin ser nefta Başûrê Îraqê. Wekî mînak GKP, niha xwe digihîne rezervên Kurdistanê, ku tê guman kirin ku di navbera 4.8 - 10.1 mîlyar varîl in. Şirket ji bo lêgerîn û derxistinê pere kom dike."*

Gotar her weha rîskên sebaret bi nefta Kurdistanê jî bi bîr tîne û weha dinivîsîne: *"Lê belê heger dixwazî kosteka saeta xwe bixî bin rîskê û nefta Kurdistanê bikirî, divê tu hişk li ser pîyên xwe rawestî. Bexda û Hikûmeta Herêmî ya Kurdistanê di warê parvekirina derameda neftê de muzakere dikin, lê belê ew hîna negihîştine encamekê. Heta niha gelek hindik neft hatiye derxistin. Rîska li ser wan şirketan ku dixwazin pere bixin vî karî hîna jî gelek bilind e. Her weha, kurdên ku heta niha pir kişandine, guh nadin encamên 'laneta çavkanîyê'/paradoksa bereketê. Li dij mantiqê, dewlemendên enerjîyê di şûna pêşvebirînê de dikarin li pêşîya demokrasî û pêşketina wê derê bibin asteng."*

## Tirkîye û welatên ereb

Rojnameya brîtanî ***The Guardian*** di 13ê îlonê de sebaret bi seredanên serokwezîrê tirk **Erdoğan** bo welatên ereban nivîseke nirxandinê weşand. Serenavê gotarê ku ji alîyê **Brian Whitaker** ve hatiye nivîsandin, weha ye: ***"Tirkîye kuçeyên ereban dipîve***" Gotar herweha bi vê hişyarîyê dest pê dike: *"Bextê Tirkîyeyê li herêmê vekirî ye ji ber xelk bi siyaseta wê kêfxweş e. Lê belê divê Tirkîye alîyê ku lê disekine aşkere bike."*

Gotarnivîs wekî din bi bîr dixe ku welatên ereban hemû li jêr desthilatdarîya ***Osmanî*** de bûn û hatina Tirkîyeyê bi cara duyem ji alîyê gelekan ve di şûna tirsê de wekî hêvîyekê tê dîtin. Her ji ber vê yekê seredana **Erdoğan** a bo ***Qahîre***yê ne wekî fetihkirina duyemîn, lê belê wekî seredana dostekî qedîm hat dîtin. Helwêsta qewî ya Tirkîyeyê ya li hember Îsraîlê di çavê ereban de ew kir hêjayî pesindanê.

Nivîskar herweha radigihîne ku piştî ku Amerîkayê nikaribû Îraq bikira modelek ji bo demokrasîyên Rojhilata Navîn, Tirkîye wekî tenha mînak maye. Ji ber ku, herçend gelek tirk digel vê yekê hevbîr nebin jî, Tirkîye ji derve de weha xuya dike ku wê digel pêşveçûna xwe ya di warê aborîyê de, karî Îslam û demokrasî, kelepûr û nûjenî tevî hev bike. Gotar pêşnîyar dike ku siyaseta Erdoğan a *'ji cîranê xwe hez bike'* an ku bi cîranên xwe re pevneçe di vê rewşa îro de bandorker e.

Gotar weha dirêjahî pê dide: *"Lê belê Tirkîye êdî nikare weha berdewam bike ku herkes jê razî be û divê alîyê ew lê disekine dîyar bike. Wekî mînak li Sûrîyeyê, Tirkîyeyê piştgirî da muxalefetê û bi awayekî nazik rexne li rejîma Esed girt."*

Derbarê pêşêngîya welatên ereban de rojname vê tesbîtê dike: *"Ji berê de li herêma ereban du welat an ku Misir û Erebistana Suûdîyê xwedî bandor in, lê belê di salên dawî yên rejîma Mubarek de Misirê vê bandora xwe ji dest da. Têkilîyên nêzîk ên navbera Misir û Tirkîyeyê dikare pozîsyona Misirê hêzdartir bike û ekseneke hêzdar ava bike, ku li hember monarşî û muhafezekarîya olî ya Erebistana Suûdîyê, her du welat jî komarparêz in û bi nisbî sekuler in. Lê belê ev yek nikare temen dirêj be, ji ber ku piştî teşqeleya şoreşê bi dawî bibe, Misir dê hewlê bide ku berjewendîyên xwe yên li herêmê biparêze."*

*"Tirkîye jî herçend xwedî siyaseta cîrantîya baş e jî xwedî pirgirêkên din e. Wekî Sûrîye, Iraq û Îranê ew xwedî pirsgirêka kurdî ye. Herweha Tirkîye li alîyê koma sunnî ye. Ev yek dikare dîyar bike ka Tirkîyeyê çima bi baldarî piştgirî da rejîma zordest (lê belê sunnî) ya Bahreynê, dema ku wê piştgirîya serhildanên din kir. "*

Gotar weha digihîje encamê: *"Herweha faktora Ewropayê jî heye. Di dema dirêj de, Tirkîye hîna jî dixwaze bibe endama Yekîtîya Ewropayê û di merheleyekê de naçar bimîne ku biryarê bide ka ew dê berê xwe bide Rojhilatê yan Rojavayê. Tirkîye çiqas nêzî welatên ereban bibe jî ew dê her tim bîyanî bimîne, ji ber ku tirk ne ereb in. "*

**Le Monde diplomatique kurdî**
Ji aliyê Independent Kurdish Media Group GmbH ve tê weşandin

**INDEPENDENT KURDISH MEDIA GROUP GMBH**
Carnotstr. 4
10587 Berlin / Almanya

**Lijneya Weşanê**
Murad Satik
Riza Dînç

**Le Monde diplomatique kurdî**

**Redaksiyona Zimanî**
Mahmûd Lewendî
Remzî Kerîm

**Alîkarên vê hejmarê**
Yado Ciwan
Semra Polat
Ergün Yetkiner
Celîl Kaya
Nedîm Baran

**Revîzyona Wergeran**
Feryal Guladawîya
Luqman Guldivê

**Berpirsê Hunerî**
Hasan Huseyîn Deveci

**Designer**
Fabio Biasio

**Web Developer**
Erhan Yekta

Tel: 00 49 (0)30 330 990 420
Fax: 00 49 (0)30 330 990 429
info@lemonde-kurdi.com
www.lemonde-kurdi.com

**ABONETÎ**
Independent Kurdish Media Group GmbH

Berliner Volksbank
Konto: 2284 123 010
BLZ: 100 900 10
IBAN: DE78 1009 0000 2284 1230 00
BIC/SWIFT: BEVODEBB

**Abonetiya Salane:**
Almanya: 50 €
Derveyî Almanyayê: 60 €
Abonetiya dîjîtal: 20 €

**Le Monde diplomatique**

**Damezrîner**
Hubert Beuve-Méry

**Birêveberê giştî**
Serge Halimi

**Serniviskar**
Maurice Lemoine

**Cîgirên Serniviskarî**
Martine Bulardi
Philippe Rivière
Anne-Cécile Robert

**Redaksiyon**
Alain Gresh
Mona Chollet
Pierre Rimbert
Dominique Vidal

**Birêveberê hunerî**
Alice Barzilay

**Dokumantasyon**
Olivier Pironet

**Sekreter**
Sophie Durand
Monique Salomé

Tel: 00 33 (0) 153 94 96 01
Fax: 00 33 (0) 153 94 96 26

1-3, rue Stephen-Pichon,
F-75013, Paris, France

www.arsivakurdi.org

# Li Kurdistanê rêya sêyem (Dewama rûpela 1)



DARA ARAM: **Naram-Sin**, boyaxa akrîl li ser tûwalê, 44 x 44 cm

kurd û demokratîzebûna welat metoda kemalîzmê bi kar tînin. Goya sosyal demokratên tirk, neteweperestên rastgir û leşkerîya tirk hertim parastvanên vê rêya kemalîzmê bûn û heta roja me jî wisa ne. Bernameya wan a siyasî wek îdeolojîyeke kolektîv û egoîst li pêş çareserkirina pirsa kurd astengek e.

Mirov dikare vê yekê bîne zimên ku siyaseta tirk ji ber sedemên îdeolojîk û girêdana mixriktijî ya bi dîn, kevneşopîya hevjîyana civakê ji hemû alîyên xwe yên siyasî ve dixe xeterê. Siyaseta parçekirin û birêvebirinê, rêya Împaratorîya Osmanî ye ku heta îro tesîrê li Tirkiyeyê dike. Rêyeke sêyem jî, ji partîyên tirk re pêwîst e ku civaka tirk û kurd ji îslamîzma nû û kevneperestîya neteweperestîyê biparêze. Ev mijar divê û pêwîst bû berîya her kesî ji alîyê aktorên tirk ve bihata munaqeşe kirin.

Lê ez li jêrê dixwazim bi kurdan û siyaseta wan a bi pirsa kurdan ve girêdayî, li ser rêya sêyem yan "rêyên sêyem" gengeşîyê bikim. Ji bo ku mirov ji vê girtîgeha dualîzmê rizgar bibe, divê mirov li alternatîvan binêre. Divê li gor teorîya rêya sêyem texmînî rêyên sêyem hebin. Bi vê yekê mebest piranî "versîyoneke hişmend" an jî "versîyoneke nerm" alternatîveke ne îdeolojîk tê fikirandin. Lê ev nayê vê wateyê ku mirov dest ji siyaset û erka têkoşîna ji bo edalet û azadîyê berdide. Na, ev rêya sêyem derfetê dide ku mirov karibe li ser çareserîyên dinê bifikire.

## Rêya sêyem li Kurdistanê: Siyaseta întegral

Tevgera kurd ji 60 salan vir ve gelek qonaxên pêşketina civakî û siyasî, lê herwiha demeke şerên leşkerî jî, jîyaye. Di serdema globalîzmê û veguherîna mafên civakî û kesane de, pêwîstîya wê bêhtir bi siyaseteke ku hîtabê giş kurdan dike, heye. Ez dixwazim wê li vê derê wek *siyaseta întegral* bi nav bikim.

Siyaseta întegral tê maneya ku gava hûrlêkolînên siyasî tên pêk anîn û siyaset tê amade kirin, divê hemû dîmenên civakî li ber çavan bên girtin. Siyaseta întegral bi vê maneyê "rêyeke sêyem" derdixîne der ku cudahîyên civaka kurd yên heyî bi hemû dîmenan re întegre bike. Hemû cudahîyên civakî ango yên çandî, olî, herêmî, aborî, eşîrtî û hwd. parçeyekî civaka Kurdistanê ne û divê bê sînor werin rêz- û qebul kirin û roleke mezin di nav siyaset û çanda kurdan de bileyizin.

## Wekhevîyên çand û bîreweriyê

Pêwîstiya pratîka siyaseteke întegral bi rêpêşandaneke çandî û bîrewerîyê heye, ji ber ew vîzyonek e ku li derveyî mentiqa rojane ye. Rêpêşandan û hevgirtineke hevbeş dikare qezencên destkevtî, trajedî û derbên jîyanê be. Mînak; destana kurdî ya **Ehmedê Xanî** *Mem û Zîn* dikare wek bîrewerîyeke hevbeş, ruhekî hevbeş ku hemû kurdan li hev kom dike, bê dîtin. Hêmanên dînî jî dikarin bi heman awayî roleke girîng bilîzin, lê divê ev di maneya polîtîzekirina dînî de neyê fêhm kirin. Bîrewerîyên hevbeş bi giştî vekirîbûnek e li hember tiştên ne-rojane, li hember tiştên hestyar û subjektîv yên ku civakê bi hev re girê dide û xurt dike. Bi nêrîna dîrokî dînên rojava yên yekxudayî (monotheist) mîna xiristîyanî, îslam û cihûtîyê li pey lêgerîna hevbeşîyan, manedarî û rêpêşandana mirovan ceribandinek bûn. Divê siyaseta întegral a kurd nirxê hemû pircûreya çandî, civakî, dînî û hebûna bîrewerî li herêmên Kurdistanê (êzdî, sunî, şîî, elewî, kakeyî, ateîst ûwd.; ermenî, tirk, asûrî, ereb ûwd.; jin, mêr, zarok, heteroseksuel, bîseksuel, homoseksuel ûwd.; seqet, tendurist, nexweş ûwd.) bipejirîne, rêz bigre û wan bîne nêzîkê hev. Ev tê wê maneyê ku divê ji bo pratîka siyasî, şêweyên nû yên sazûmanîya civakî bên dîtin ku tê de kesayet û civaka kurd bên bi cî kirin.

Rêxistin, komele, kongre ûwd. ên ku heta niha ji alîyê tevgera kurd hatine damezrandin îdeolojîk in, ji jor daxistî ne û bi hin beşên xwe cudahîyên erênî yên nirx û normên van civakên li Kurdistanê dişêlînin. Kurd bi wan rêxistinên xwe yên îdeolojîk bixwe zerareke mezin didin çand û hebûna kurdan, ji ber ku ew bixwe bê mantiq, pir tiştên rêzdar û kevin yên komên kurdan tune dikin.

## Prensîpên bingehîn ên siyaseta întegral a kurd

Ramanên ji alîyê min tên rêz kirin divê mîna qaîdeyên qerimî neyên fêhm kirin, bêhtir mîna pîvanên ji alîyê civakê qebûl dîtine ku siyaseteke întegral a kurd a nû dikare di nav xwe de bihewîne.

### Yek vîzyon:

Siyaseta întegral a kurd divê xwe bide ser vîzyonekê ku karibe dijberîyan, nakokîyan, alozîyan û pirsgirêkan întegre bike. Siyasete întegral dive karibe tehamula hebûna nakokîyan di nav kom û civaka kurd de bike. Di pratîkê de ev tê wê maneyê ku divê realîteya siyasî ya yekî/ê, ne a kesekî/ê din be û dîsa jî ev întegratîv be, mînak: di maneya azadî û demokrasî ji bo gelê kurd, mirov bi tolerans be û wekhevîyan peyda bike ku bi hev re li ser bixebitin. Dîtîn û ramanên her mirovî ne wekhev in, lê dîsa jî divê rêzdîtin bi hev re li ser bingehên azadîyê û demokrasîya kurdan gengaz be. Her hewldana ji bo yekîtîyekê, li ser bingeha siyaseta civakî, ya globalîzmê yan jî, ji sinorên ku kurd niha tê de dijîn wêdetir divê di heman demê de întegrasyona tiştên berê hebûn jî yanî netewî, herêmî, kesayetî, dînî çandî, etnîkî ûwd. tê de cî bigrin. Çawa mafê gelê kurd ji bo azadîyê heye, herwiha divê mafê yek mirovekî bi xwe jî ji bo azadîyê hebe. Ango mafê yek mirovî divê ji bo "azadîya" komekê neyê qurban kirin. Êdî ev ne azadî ye.

Divê tevgera kurd di wê rewşê de be ku şêweyên nû yên rêxistina civakî bibîne û di heman demê de mafên kesane û mal û milkên kolektîv biparêze û teşwîk bike. Pêdivîya tevgera kurd bi civakekê heye ku tê de her mirov xwedîyê derfeta avakirina azadî û jîyana xwe be ku ev di heman demê de rê li ber azadîya hemû civakê vebike.

### Prensîpên rewiştî:

Prensîbên rewiştî tê maneya hewldana pêşketina herî mezin a hemû civaka kurd ku mafê her mirovekî li ser jîyan, azadî û edaleta civakî heye û piştgirîya wî/ê bê kirin. Ev tê maneya pêşketina ramana edaletê, xemxurî û dilovanî ji bo her kesayetek di giş civakê de (Edelstein, 2001).

### Veguherîn (transformasyon):

Tevgera kurd ku hîn jî, ji alîyê îdeolojîk ve, yekalî ji tevlihevîya komunîzm, îslam û patrîarkalîzmê gihîştiye asteke siyasî û civakî ku divê bê guhertin. Veguherîn (transformasyon) an jî şoreş gavên muhtemel in ku dikarin derbas bibin. Ev jî girêdayî derfetên ku di deste kurdan de heyî û xwestina gel bi gelemperî ye. Ji sedema parçebûna Kurdistanê, li gor dewletên tê de dijîn, dikarin perspektîv û stratejîyên siyasî yên kurdan cuda bin, lê divê ev nebe sedema neheqîyê li dijî hev. Eger şertên veguherînê tunebin, wê demê divê reform wek tercîheke gengaz bên dîtin. Siyaseteke întegral a kurd pîvana hem reformê hem jî şoreşê nas bike ku girêdayî bi rewş û qonaxa pêşketina civakî û siyasî cîyê her yek ji wan tê de cuda ye. Tevgera kurd divê di wê xemxurîyê de be ku asta civakê, ger civak ji bo vê yekê amade be, bilind bike.

## Globalîzm û tevgera kurd

Globalîzm heman dem mijareke herî aloz û herî girîng a dema me ye. Divê tevgera kurd bala xwe bi çalakî bide vê mijarê û bi xwe jî li ser vê yekê ramanên xwe yên siyasî bi pêş ve bixîne. Ev tê wê maneyê ku emê di cîhana ragihandinê ya nû de bi gelek agahdarî û guhertinan bên hember hev. Eger em bersivê nedin jî, dîsa ev livbazîyek e, lê li derveyî kontrola me ye.

Komên pêşketina civakî ji qebîleyan ber bi eşîran, neteweyan, herêman û di dawîyê de ber bi globalîzmê li Kurdistanê jî, berfireh dibin. Maneya vê yekê jî ew e ku dînamîka zêdebar a wergirtina nav xwe ne tenê ji bo civaka kurd derbas dibe, herwiha ji bo hemû xetên pêşketina civakî, aborî, hiqûqî, rewiştî yan siyasî jî derbas dibe. Pirsa derdikeve holê ew e ku her yek ji wan xetan bi çi lezûbezê ber bi girêdaneke globalîzmê ve dilive û gelo pê re pêşketinên nerênî derdikevin ku zerarê bidin komekê yan jî civakê bi giştî. Em îro li Tirkîyeyê dibînin ku ne hemû alîyên pêşketina mirovahîyê globalîze dibin û xwe diguherin.

Wek mînak em tenê tundrewîya dînî, kevneperestî û mîlîtarîzmê bi nav bikin. Aborî û hin hêmanên çandî li Tirkîyeyê dînamîkên xwe yên global bixwe bi pêş ve birin, lê rewişt[karakter] û siyaset bi gelemperî li cîyê xwe asê bûn yan jî, di îdeolojîya kemalîst û AKPê ya îslamî de girtî man.

Ev dikare bi temamî wek patolojî, nexweşîyek bê sinifandin ku mixabin tevgera kurd jî xwe spartiye vê dînamîkê. Ev tê wê maneyê ku divê tevgera kurd rêyên nû peyda bike da ku pêşketina civakî, çandî û aborî bi nîzama siyasî ya globalîzebûyî bixe nav analîzên nû û hemû grupên kurd wek hevgir ji nû ve tê de karibin xwe bibînin.

## Mantiqekî çandî yê nû

Hêmaneke sereke ya siyaseta întegral a kurd pêwîst e balkêşîya xwe bide alîyê navxweyî, subjektîvî, çandî ya civaka kurd. Eger tevgera kurd nakokîyên xwe bi tenê li ser hêzên derva (mînak: artêşa tirk û hikumeta tirk) hûrbînî bike û mînak çareserîya pirsa kurd bi hikumeta tirk ve girê bide, wê demê dê kêm bimîne, ji ber ku ew dînamîka civaka kurd a hundurîn nagire ber çavan. Siyaseta întegeral a kurd divê berîya hertiştî guh bide hemû kesan û grûpên kurd. Siyaseteke bê hemû xwestinên gelê kurd ne siyasetek e ji bo azadîya kurdan. Bi peyvên din, li kêleka pevçûna bi hikumetên Tirkîye, Îraq, Surîye û Îranê re, pêwîstîya tevgera kurd bi siyaset û çandeke întegral heye. Ev tê vê maneyê ku civaka kurd divê bi çalakî bixwe bandorê li ser veguherîna xwe bike. Ku hêzên derva civaka kurd biguherînin, bê guman ev li gor xwe û ne li gor xwestinên kurdan wê civakê biguherînin. Eger komelgehên kurd ên cuda û şexis hesteke qebulkirin û piştgirtîyê nebînin, ew vê siyaseta întegral napejirînin. Divê partîyên kurd amade bin ku mirovên kurd wek kesên azad û rizgar ên bi raman û nirxên cuda bipejirînin û wisa hemêz bikin. Wê demê damezirandina kongreyeke neteweyî ya ku li ser gelek tê gengeşî kirin jî, êdî nabe pirsgirêkeke mezin.

Li hember siyaseta real li Kurdistanê û têkoşîna berxwedana dûredirêj a kurdan sempatîya mirovan ji hev re hîn jî zêde beşekî girîng ê çanda întegral e. Beşê din jî întegrekirina zîrekî û daxwazî, şexsî û hevbeşî, objektîvî û subjektîvî, ketin û rabûn e. Întegrasyona şexs û hevbeşî ya bendbestîya globalîzmê tê maneya ku gelek mafên bi rêya danûstandin, çand û bandora global tên bi dest xistin, zerarê nedin întegrebûna yek bi yek kesan. Mînak; ev tê wê maneyê ku mafên hindikahîyan li Kurdistanê bi taybetî jî, ji alîyê tevgera kurd ve divê bên parastin. Di heman demê de mafê şexsan nikarin ji berpirsîyarîya wan a civak û xwezayî bên veqetandin.

Întegrasyona objektîv û subjektîv tê wê maneyê ku ji bendbestîya global ev yek bê fêhm kirin; gavavêtina ber bi mantiqekî nû yê sîstema global divê ji alîyê mantiqekî çandî yê nû ve bê bi rê ve birin. Guhertina kes û civakê nayê maneya înkarkirina nirxên kevin yên mîna kevneşopî û çandê. Tiştên herêmî jî wek ên kosmopolîtîk girîng in. Eşîr jî wek yek bi yek kesan girîng e û civaka kurd bi giştî girîng e. Di serdema globalîzmê de tiştên herêmî ne tenê ji ber pîvana mirovperwerîyê, herwiha ji ber sedemên demokrasî û mafdarîya civakê jî, girîng in. Eger desthilatî cîwarê neteweyî biterikîne û bibe global, ji tecrubeyên jîyana rojane û daxwazên rojane û ji realîteyê dûr dimîne. Îmkanek e ku mirov desthilatî û berpirsîyarîyê li şexsan û ber bi civaka herêmî ve vegerîne. Li vê derê hîn modelên kurd ên nekemilî dikevin dewrê: demokrasîya herêmî, federalîzm ûwd. Lê pirs, pêşvexistina pêvajoyekê ye ku divê têrahîya wê bixwe ji bo serzemîna şexsî û civakî mezin be. Geşepêdan û hêzdana demokrasîyê ya asta herêmî pêwîst e, bi demokratîzekirina desthilatê, ji herêmî heta global, di hemû astan de bi hev re bimeşe.

Konsepta-rêya-sêyem bi veguhastina ser rewşa Kurdistanê re, vê rastîyê jî tîne ber çavan ku divê eşkalên siyasî wek perspektîveke dûredirêj xwedîyên konsepta siyasî û bernameyê bin ku jê re bingeheke zexim gerek e daku erkên siyasî yên misoger bîne cî: erk, îkna kirin, seferberbûn, nasname û hevgirî ji hundir ve avakirin, lê bê înkarkirin û veşartina dijberî û fikirên cuda di nav kurdan de. Çiqas kurd ji cidayîyên hev agahdar bin û li ser wan gengêşî bikin, ewqas çêtir bawerî û nêzîkbûn di nav civaka kurd de pêk tê. Tevgera kurd divê xwe ji bo wan veguhestinbînîyên dijwar amade bike.

Rêya sêyem ji bo rejîma tirk, eger bixwaze, dikare wek ceribandineke ji nû ve rêkûpêkîya bernameyê bê fêhm kirin ku tê de siyaseta xwe ya çewt li dijî kurdan ji bingehîn demokratîk û mirovhez biguhere.

Rêya sêyem ji bo tevgera kurd dikare wek ceribandineke bernamekirina nû bê fêhm kirin ku tê de berê xwe bi giranî bide gelê kurd û berjewendîyên wî û ji wê rewşê rêyeke nû peyda bike.

### Çavkanî:


**Edelstein, W.**: Gesellschaftliche Anomie und moralpädagogische Intervention. Moral im Zeitalter individueller Wirksamkeitserwartungen. (Bêhêvîtîya civakî û mudahaleyên perwerdeya rêwişt[Moral]. Rêwişt di serdema bandorkirina hêvîyên kesane de.) In: Edelstein, W./ Oser, F./ Schuster, P. (Hrsg): Moralische Erziehung in der Schule. Entwicklungspsychologie und pädagogische Praxis. (Perwerdeya rêwiştane di dibistanê de. Psîkolojîya pêşketinê û pratîka perwerdeyîyê). Weinheim und Basel 2001. S. 26.

**Betz, Hans-Georg** (Hg). (1998): The New Politics of the Right. Neo-Populist Parties and Movements in established Democracies (Siyaseta nû ya rastan û tevgerên populist ên neo-polîtîk di demokrasîyên bingehgirtî de). New York.

**Giddens, A.**: Der dritte Weg. Die Erneuerung der sozialen Demokratie, Suhrkamp, (Rêya siyem. Nûkirina demokrasîya civakî) Frankfurt/Main 1999

**Giddens, A.**: Introduction in: Giddens, Anthony (ed). The Global Third Way Debate (Gengêşîyên global li ser rêya sêyem). Cambridge, Oxford, Malden, 1-21, 2001a.

**Giddens, A.**: Die Frage der sozialen Ungleichheit. (Pirsa newekhevîya civakî). Frankfurt/Main 2001b.

**Sik, Ota.**: Humane Wirtschafts-demokratie. Ein dritter Weg (Demokrasîya aborî ya human. Rêyeke siyem), Hoffmann und Campe, Hamburg 1979

**Teló, M.**: Transformation of programmatic profiles, (Veguherîna profîlên bernameyî): Cuperus, René/Johannes Kandel (Hg.): European Social Democracy: Transformation in Progress. (Sosyal Demokrasîya Ewropayê: Veguherîn û pêşketin). Wiardi Beckman Stichting/ Friedrich Ebert Stiftung, Amsterdam, 41-48, 1998.


Wergera ji almanî: Hüseyin Kartal

www.arsivakurdi.org

# Siyaseta Tirkîyeyê ya Rojhilatê Navîn û faktora kurd (Dewama rûpela 1)

û Afrikaya Bakûr) xwedîyên sîstemên siyasî yên cûrbicûr in û li gor vê yekê xwedîyên berjewendîyên cûrbicûr in (bi hin beşan dijberên dijwar). Tirkîye jî ji ber sedemên siyaseta hundir û derva bi hin hesaban, xwe ji nearamî û dijberîyan paş ve neda û ev yek kir beşekî stratejîya xwe ya herêma-MENA. Nearamîyên bi Îsraîlê re beşekî vê stratejîyê ye ku li ser baş hatîye hizir kirin.

Di vê gotara xwe de ez hewl didim ku helwêsta Tirkîyeyê ya piştî derketina goya bihara ereb li ser sê pirsan analîz bikim: Helwêsta derbarê serhildana ereban, derawayê tirk li ser "hevalbenda stratejîk" Sûrîyeyê û girîngîya pirsa kurdî ji dema destpêkirina serhildanê ya li dewletên ereb ên Rojhilatê Navîn.

## I. Helwesta Tirkîyeyê derbarê serhildana ereban

Ji bo hikûmeta AKPê ramana bi dewletên cînar re siyaseta-sifir-pirsgirêka nakokîyan, ji motîvên binekûr derketîye ku wezîrê derva yê tirk **Ahmet Davutoglu** di lêgerîna xwe ya berfireh de "kûrahîya stratejîyê" nivîsîye. Li gor vê yekê divê Tirkîye vegere herêma xwe ya deverê bê ku girêdanên xwe yên rojavayî biterikîne.

Di pênc salên dawîyê de Tirkîye bi rastî jî di têkilîyên xwe yên du-alî de bi dewletên-MENA re faktoreke girîng e. Aktorên ereb di Tirkîyê de hevkêşeyekê li dijî giranîya Îranê ku her diçe tesîra wê li herêmê zêde dibe, didîtin. Lê dengên şikbar ên ereb jî kêm nebûn ku bi çavine gumanê li rola aktorên ne ereb ên herêmê dinêrîn. (2) Dewletên ereb, bi giştî jî dewletên Kendavê siyaseta aktîv a Tirkîyeyê wek hevkêşeya dijber a siyaseta firewan a Îranê pêşwazî kirin.

Tiştê li ber çav ew e ku helwêsta Tirkîyeyê li ser serhildanên ereb heta dereceyeke bilind nezelalî şanî dida. Ji alîyekî hikûmeta-AKPê destek dida serhildanên li Tûnis û Misirê, ji alîyê din serokwezîrê tirk **Erdogan** xwe ji alîkarîya serhildana Lîbyayê bi paş ve digirt. Wek sedema vê bêqerarîyê zêdebûna têkilîyên aborî yên Tirkîyeyê li Lîbyayê tê dîtin. Erdogan piştre bingeha aborî ya siyaseta xwe ya Lîbyayê îzafe dike û balê dikşîne ser berdewamîya hebûna têkilîyên aborî. Ne dûrî aqilan e ku Erdogan li gor mînaka xwe ya siyaseta-Îraqê ya 2003yê mudahaleya Rojavayê ya nav karê dewleteke îslamî red bike. Balkêşîya ecêb jî, piştî ku zelal bû dahatûya rejîma **Muamer Qedafî** tuneye, mudahaleya NATOyê pejirand. Erdogan bi mehan bi her du alîyan re di têkilîyê de ma.

Helwêsta Tirkîyeyê di bûyera Behreynê de ne zelal e. Di vê bûyerê de Tirkîye helwêsta dewletên-GCC(Meclîsa Dewletên Hevkar ên Kendavê) hildigire berçav ku ew alîkarîya serhildana piranîya şiî ya li dijî rejîma hindikahî ya sunî dikin. Şandina yekîneyên leşkerî yên siûdî bûyera li Behreynê bêtir dramatîze kir. Tirkîye di vê dubendîyê de navbeynkarî dike ku dijberîya di navbera Îran û Erebistana Siûdîyê de ji holê rabe. (3)

1. Tirkîye helwesteke biryardar nîşan nade û ji dêvla wê yekê stratejîyeke bendeman û carna dualî dimeşîne ku ji alîyekî bi serhildêran re, ji alîyê din jî, bi desthilatdarên serhikum ên mîna **Qedafî** û **Esad** re di pêwendîyê de dimîne, dibe ku xwedîyê bingeheke pragmatîk be: Wisa dixuyê ku bawerîya AKPê bi guherîneke demokratîk a bikêrhatî ya li cîhana ereb tuneye. Lê **Kemal Kirişçi** (4) bi alîkarîya teorîya "tesîra demonstratîv" ya **Samuel Huntington** bawer dike ku ew di lêkolîna xwe de ya bi navê "*The Third Wave: Democratizaton in the Late Twentieth Century (Pêla sêyem: Demokratîzebûn di derengîya sedsala bîstan de)*" (5) tîne ziman û bawer dike ku pêvejoya demokratîzebûnê dê ji modeleke real îlham bigire. Bi rastî jî, di dîroka herî nû ya demokratîzebûnê de model hene ku bûne îlhama zincîreke pêvajoyên guherîna rejîman. Guherîna Polonyayê di dawîya salên heştê de û piştî demokratîzebûna Koreya Başûr, guherîna demokratîk li Asyayê mînakên wiha ne.



DARA ARAM: **Dinya û masî 07**, boyaxa akrîl li ser tûwalê 48 x 48 cm

Lê gelo Tirkîye modelek e ji bo dewletên ereb? **Kemal Kirişçi** bersiveke bi dîqet dide vê pirsê û balê dikşîne ser pêşveçûna serkevtî ya aborîya Tirkîyeyê. Armanca wî şanîdana sedemîyeta di navbera merhaleyên siyaset û aborîyê de ye. Berîya zêdeyî pênc dehsalan zanayê aborî yê amerîkî yê bi binyadê xwe ereb **Charles Issawi** dîtibû ku cîhana ereb tenê bi nûjenkirineke berfireh dikare bê demokratîze kirin. Lê rapora dawî ya UNDP- *United Nations Development Programe in the Arab Countries* (Bernameya Pêşketinê ya Neteweyên Yekgirtî li Welatên Ereban) *"Arab Human Development Programme 2009* (Pêşketina Bernameya Mirovahî ya Ereb 2009)" şanî dide ku cîhana ereb nekarîye serzemîna aborîya civakî pêşketinên mezin bi dest bixe.

Tirkîye wek model hikûmeta-AKPê dipixpixîne, lê pêşketinên wek vê yekê li dewletên ereban weha dike ku mirov bendewar bimîne.

## II. Sûrîye: Guherîna hevalbenda stratejîk ber bi rewşa pirsgirêkbûnê ve

Siyaseta Tirkîyeyê li hember Sûrîyeyê xwe ji aktoren din gelek cuda dike. Di pênc salên dawîyê de peywendî gelek zêde bûbûn. Sûrîye, ji bo pratika siyaseta-sifir-pirsgirêk, mînaka şanîdar bû. Hevxebata di warê sermaye birin, mal û trafîka kesane de berîya serhildana gelheya Sûrîyeyê gihîşt asta bilind.

### Ticareta Sûrîyeyê bi Tirkîyeyê re (Dolarên DYA û %)

| | 2006 | 2007 | 2008 | 2009 | 2010 | 2009/10 (%) |
|---|---|---|---|---|---|---|
| Eksport | 187 | 376 | 639 | 327 | 662 | 102 |
| Împort | 609 | 797 | 1,115 | 1,424 | 1,849 | 30 |
| Gişt | 796 | 1,173 | 1,754 | 1,751 | 2,511 | 43 |
| Balans | -422 | -421 | -476 | -1,097 | -1,187 | 8 |

*Çavkanî: Turkstat, The Syria Report (Rapora Surîyeyê)*

Wek ji tabelayê jî dîyar dibe, encama ticaretê alîkarîya Tirkîyeyê bû. Tirkîye xwe ber bi eksportora girîng a dewletên Rojhilatê Navîn ve bi pêş ve bir. Herçiqas Sûrîye peywendîyên xwe yên teng bi Îranê re berdewam jî dikir, ji alîyê siyasî ve têkilî zêdetir dibûn.

Hewldanên navbeynkarîyê yên Tirkîyeyê di pirsgirêka Sûrîye-Îsraîlê de heta guherîna siyaseta Îsraîlê derbarê Tirkîyeyê ya sala 2009ê de, hikûmeta-AKPê atmosfereke aştîvane ya herêmê dida pêş. Lê ji hemû aktoran re jî zelal bû ku Sûrîye ne li pey aştîyeke temamî ye û Îsraîl bendewara Sûrîyeyê ye ku di pirsa erdê de tawîzan bide. Ev nêrîn bûn sedem ku hewldanên navbeynkarîya Clinton a sala 2000ê têk biçin. Di rastîyê de rêberên hikûmeta-AKPê û hikumdarên elewî li Sûrîyeyê şirîkên gelek ji hev dûr bûn: AKP wek Îslama nerm tê hesibandin û hikûmeta desthilatdar a *Partîya Baas* ji alîyê elewîyan tê bi rê ve birin.

Hikûmeta-AKPê destpêka serhildana li Surîyê, di wê nêrînê de bû ku rejîma li Şamê divê reforman pêk bîne. Divê rejîma **Beşar el-Esad** bi xwepêşandêran re rêya dîyalogê bide ber xwe.. Di heman demê de **Erdogan** destûr dida û belkî alîkarîya muxalifên Sûrîyeyê jî dikir ku wan ji gulana 2011ê ve gelek konferansan li Tirkîyeyê li dar dixist. Wergirtina penaberên ji Sûrîyeyê jî gavekî din bû ku bi siyaseta **Beşar el-Esad** re di nav nakokîyê de bû. Piştî peywendîyên sift û pirbare bi **Beşar el-Esad** re **Erdogan** bawer kiribû ku Sûrîye biryara xwe ji bo stratejîyeke şidetê daye. (6) Erdogan dibêje ku ji meha tebaxê şûn ve peywendîyên rasterast qut bûne. Erdogan zelal dike ku dijberîyên li Sûrîyeyê dikarin di navbera piranîya sunî û elewîyên desthilatdar de veguherin ser şerekî mezhebî. (7) Tekrarkirina daxuyanîyên hikûmeta-AKPyê mudaxaleyeke ji derva ye li Sûrîyeyê, eger bûyer xwe neguherînin û eger hikûmeta Sûrîyeyê li ser muxalifên aştîxwaz şidetê berdewam bike, bilêvkirina erênî mudaxale dikare li gor modela Lîbyayê bê kirin. Li gor hikûmeta-AKPê zelal e ku Îran, hevkara nêzîk a Sûrîyeyê, ji ber sedemên hikumdarîyê û tesîra xwe ya li Lubnanê dê hertiştî bike daku hikumdarîya **Beşar el-Esad** berdewam bike. Ji ber vê sedemê wiha dixuyê ku Tirkîye hertiştî dike daku Îran angajmana xwe ya li Sûrîyeyê girantir neke. Mîna nivîserê quncik ê rojnameya *el-Heyat* **Durgham** jî texmîn dike, Îran hertim dikare bi hêrişeke *Hîzbulahê* ya li dijî Îsraîlê hemû rewşa Rojhilatê Navîn biguherîne. (8) Ji kevnewezîrê derva yê Amerîkayê **Henry Kissinger** peyva ku bê Sûrîyeyê di Rojhilatê Navîn de aştî ne mimkun e, derketibû. Îro divê bê gotin heta ku rejîma Sûrîyeyê dewam bike, aştî çênabe. Ne bi tenê bi nêrîna ser pirsgirêka Rojhilatê Navîn, lê bi nêrîna hemû herêma di navbera Îraq û Derya Spî de

## III. Hikûmeta-AKPê ya tirk, kurd û bihara erebî

Helwesta Tirkîyeyê beramber hêmana kurd yan tesîra di bihara ereb de, yanî rola kurdan di vê pêvajoya siyaseta civakî de bi siyasetên Tirkîyeyê yên beramber pirsa kurd li Tirkîyeyê bi xwe û beramber pirsa kurd li Îraq û Sûrîyeyê ve girêdayî ye. Ji bo AKPê ya îslama-nerm jî asimilasyona kurdan di çarçoveya piranîya etnîk de li wan welatên ku bijartî bûne, dibe rewşeke îdeal. Lê ne wek CHPê, AKPê bi pirsa kurd pragmatîk tevdigere.

Bihara ereb rewşa kurdan û siyaseta kurd ya Tirkîyeyê jî gelek elaqeder dike. Ji alîyekî wiha dixuyê ku Erdogan ne bi daxwaz e ku ji siyaseta gavên gelek piçûk xwe bi paş ve bigire. Projeya ku di meha tebaxê de bi navê: "*Solution on the Kurdish Problem: Towards a Model for Turkey(Çareserîya pirsa kurd: Ber bi modelekê ji bo Tirkîyeyê re)*" (9) di nav AKPê de gengêşî li ser hat kirin, wisa dixuyê ku ji rojevê ketîye. Li ser pirsa kurd mirov dikare bibêje ku li Tirkîyeyê hîç tiştekî nû tuneye. Serkevtina *Partîya Aştî û Demokrasîyê* yên hilbijartina hezîran 2011ê ku 36 kursî li parlamenê qezenc kiribûn, paşveçûneke popularîteya AKPê li bajarên kurdan, li Tirkîyeyê şanî dabû. Beramber gengêşîyên derbarê çareserîya sîvîl a pirsa kurd li Tirkîyeyê, wesayet û taktîkên hikûmeta tirk, bêdilîya Erdogan ku gavên berbiçav ji bo nîzama aştîyane navêje, nabe.

Helwesta beramber Herêma Federal a Kurd bêhtir rast bûye. Ji ber sedemên aborî û sedemên siyasî jî, Tirkîye mecbûr ma ku bi Hikûmeta Kurd ya Herêmî realîst tevbigere. Wiha dixuyê ku Tirkîyeyê ev yek jî pejirandîye ku statuya gerîlayên-PKKê li ser erdê Hikûmeta Kurd ya Herêmî encama pêşveçûneke têkilîyên nav Tirkîye û herêmê ye. Ev pêwîst dibîne ku hewldanên girîng ên Tirkîyeyê jî, ew be ku ji alîyê hiqûqî û siyasî sedemên bingehîn yên pirsgirêkê derxe holê. Ji alîyê siyasî gelek sivik dibe, mîna siyasetmedarekî pêşeng ê kurdên Îraqê dibêje, eger mirov bi wê yekê bawer bike ku kurdên Îraqê PKKê vexwandine Kurdistana Îraqê. (10) Di rastîyê de hikûmeta tirk ku ji ber peymanên ewlekarîyê yên dualî bi hikûmeta **Sedam Huseyn** re li Kurdistana Îraqê operasyon dikirin, sedemên rewşa îro jî destê yekem nas dike.

Kurdên li Sûrîyeyê ku ji sedî 10 ji 23 mîlyon nîştecîyên welat in, wisa dixuyê ku di muhalefeta Sûrîyeyê de bûne faktoreke girîng. Herçiqas **Beşar el-Esad** hewl da ku bi paşvevegerandina mafê hemwelatîyê ji bo kurdên ku bi qanûnekê hemwelatîyên xwe winda kiribûn, bê alî bihêle jî, ev hewldan heta niha serkeftî nebûne. Televîzyonên ereb ***el-Cezîre*** û el Erebîye her hefte pey hev wêneyên xwepêşandêrên kurd nîşan didin. Lê protestoyên li bajarên ku kurd tê de nîştecî ne bi jimar in û radeya wan hîn negihîştîye asta tevgera protestoya bajarên ereb li Sûrîyeyê. Mirov dikare sê faktoran wek sedem destnîşan bike:

- Bi demê re nêzîkî 12 komikên kurd çêbûn. Lihevhatinek zehmet dixuyê.

- Hikûmet hewl dide ku bi stratejîyeke aqilane ya bê şidetîyê kurdan bê alî bike. Bi vî awayî hêzên wê vala diminîn ku li dijî tevgera protestoyê ya li bajarên ereb şideteke tund bi kar bînin.

- Hin tevgerên kurd ên Sûrîyeyê bi partîyên kurd ên Tirkîyeyê û Îraqê ve girêdayî ne. Siyaseta van komikan ji alîyê partîyên eslî ve tên bi rê ve birin.

Ya rastî daxwazên kurdên Sûrîyeyê di hundirê welat de careke din bidestxistina mafên ku ji alîyê siyaseta zordar û şovenîst a 50 sal in ji wan hatîye girtin, derbas nabin. Pirs naskirina mafên çandî û siyasî ne ku bi qanûnên awarte û metodên dervayê hiqûqê ji wan hatine wergirtin. Îhmalkirina ji alîyê aborî û şertên kolonyalîzma hundirîn(11) bûn sedema têkçûna ekonomîya cîyên kurd tê de dijîn. Encam koçberîya hundirîn, bi sedhezaran kurd ji hejarîya tund, ber bi bajarên mezin û Ewropaya Rojavayê ve revîyan.(12)

Wek li ba muxalefeta ereb jî dîyar dibe, mirov li ba kurdên Sûrîyeyê jî xeteke rast ya muxalefetê nabîne. Daxwazên muxalefeta kurdên-sûrîyeyî yên derva ji mafên çandî yên basît û naskirina xweserîya etnîkî heta çareserîya federal berfireh in. Dîyardeyeke balkêş e ku heta niha hikûmeta tirk tevlîbûna nûnerên kurd ên konferansên muxalefeta Sûrîyeyê ku li Tirkîyeyê dicivin, veto nekirîye.

Ji hikûmeta-AKPê re zelal dixuyê ku kurd nikarin dervayê pirsê bên hîştin, ji ber ku ew asteke bilind a rêxistinbûna siyasî nîşan didin.

Wekî din derxistina kurdan dê pozîsyona sunîyên ereb, muxalefeta li dijî rejîmê ku ji alîyê sê mezhebên hindikahî ve yanî elewî, xiristîyan û druzîyan piştgirîya wê tê kirin, qels bike.

1 Binêre J.S. Nye: Power and Interdependence. Boston 1977

2 Binêre Khair al-Din Hasib: al-arabi al-Taaun al-turki ila ayn? (Hevkarîya tirk û ereb ber bi kuderê ve? Di nav al-Mustaqbal al-Arabi, hejmar 1, 2010, r. 7-10, û Mustafa al-Labad: hal asbahat al-adwar a-iqlimîya bi al-mantiqa hakran ala qwa ghaîyr arabîya? (Rolên herêmî bûne monopola hêzên ne ereb?). Di nav: Shuun Arabîya, 135, 2008, r. 31-39

3 Ji ber vê sedemê wezîrê derva yê tirk di navbera GCC, Îran û hikûmeta Behreynê de navbeynkarî dike, binêre Zaman Sundays, 25.09.2011

4 Kemal Kirişçi: Turkey's "Demonstrative Effect" and the Transformation of the Middle East ("Tesîra Demonstratîv" ya Tirkîyeyê û Veguherîna Rojhilatê Navîn). Di nav: Insight Turkey, Vol. 13, No.2, 2011, r. 35-55

5 Samuel Huntington: The Third Wave: Democratizaton in the Late Twentieth Century (*Pêla sêyem: Demokratîzebûn di derengîya sedsala bîstan de*). London: University of Oklahoma Press 1991

6 Bide berhev: Rojnameya Lubnanî The Daily Star vom 13. Îlon 2011

7 Binêre Raghida Durgham: Khaîyarat al-Qîyada al-surîya amam al-uzla al-dawlîya (Alternatîva rêveberîya Sûrîyeyê beramber mudaxeleya Navnetewî). Di nav: al-Hayat vom 11. Tebax 2011

8 Heman berhem

9 Ruşen Çakir: Kurdish Political Movement and the "Democratic Opening" (Tevgera Kurd a Siyasî û "Vebûna Demokratîk"). Di nav: Insight Turkey, Vol. 12, No. 2, 2010, r. 179-192

10 Axaftina bi kesayetîyekî kurd ê girîng re. Hewlêr, Hezîrana 2011

11 Kolonîya sereke ya kurdan el-Cezîre li bakûrê rojhilatê Sûrîyeyê di dema xwe de depoya genim ya Sûrîyeyê bû. Bîrên petrole yên welat jî li wê derê ne. Bi zanebûn ihmalkirin û ji alîyê rêxistinên ewlekarîyê ve bi zorê standina xercên taybetî, struktura aborî ya herêmê hat xirab kirin

12 Tê texmîn kirin û ji salên 90ê û wê de nêzîkê 100.000 kurd wek penaberên siyasî-aborî hatine Almanyayê

Wergera ji almanî: Hüseyin Kartal

www.arsivakurdi.org

# Tûnis, serxweşîya gengazan (Dewama rûpela 1)

belav kirine (1) *"Tîra şoreşê çepê navendî nîşan dide"*. Şefên têkçûyî yên partîya yekane ya **Zine El-Abidine Ben Ali** (Lihevkombûna Demokratîk ya Welatîyan, RCD), yên weke **Kamel Morjane** di eslê xwe de xwe weke navendparêz dinirxînin, eynî weke raqîbên xwe yên berê yên ji Partîya Demokratîk a Pêşverû yên li dû **Nejîb Chebî** ji nû ve li hev kom bûne. Lê belê, weke ku navendparêz bersivê didin îslamîstên *Ennahda* (Ronesans) eynî mîna du raqîbên wan ên sereke yên laîk, komunîstên berê yên *Ettajdîd* (Venûkirin) û sosyalîstên *Enîya Demokratîk ji bo Kar û Azadîyan* (FDTL) –yên ku xwe li navenda çepê bi cih dikin. Hetta, *Partîya Kar a Tûnisî* (PTT) a ji alîyê rêveberên *Yekîtîya Giştî ya Tûnisî ya Kar* (UGTT) ve hatiye ava kirin, xwe li ser heman mazgalê bi cih dike, tevî ku navenda sendîkayî berî demeke nêz di serhildaneke civakî de roleke sereke lîst. Gelo ev yek rewşê hinek tevlîhev dike? Ya rastî erê. Mîrasa ji *Benalîst* jî xwedî giranîyekê ye: RCD di wextê xwe de ji alîyê aborî ve lîberal (û mafiyayî), siyaseten polîsîye û endama Enternasyonala Sosyalîst bû.

Qet nebe, nasnameya siyasî ya partîyên mezin –an jî kesayetîya rêveberên wan li nav rewşa ku tê de ev nasname dikare guhêrbar xuya bike (2) -kêm zêde tê nasîn. Zehmet e ku heman tişt ji bo *Yekîtîya Welatparêz a Azad a Fantomatique* were gotin. Ev partî di hezîranê de ji alî karsaz **Slim Riahî** yê li Londonê bicihbûyî û li Lîbyayê xwedî serweteke mezin e, hat ava kirin. Dijberî bisînorkirina lêçûnên ji siyasetê, ku bi vî awayî ew herwiha hewl dide rê li derketina holê ya hêzên nû bigire, -ji ber ku hêza wî, wisa xuya dike ku ji tu derfetan ne bêpar e … -, Riahî tercih kir ku rêveberekî ku diploma xwe ji ***Paris 1*** wergirtiye û ew jî serokê koma şirketan e, ji xwe re bike berdevkê partîyê. Vî berdevkî, berî çendekî bernameya partîyê pêşkêş kir: *"modela me ya geşedanê xwe dispêre beşdarîya gel, aborîya bazarê, zêdetir edaleta civakî, rûmet û kar ji bo herkesî, geşedana herêmî"*. UPL wê pir hestîyar be, bêguman, li ser *"parastina nasnameya ereb-misilman a welêt"*, bêyî ku *"girîngîdayîna nirxên gerdûnî jî"* di pişt guhên xwe re bavêje. (3) Tê fikirîn ku piştî haydarbûneke zelal ji taahutên wisa mukemmel, dengdar wê êdî zanibin çi bikin. Eger ne wisa be, hebûna lîstikvanê berê ê futbolê **Chokri El Ouaer** weke serê lîsteya UPLê ji bo herêma Tûnisê wê dengên wan bihelandana.

## Paşgorinîyên li ser "hikûmeteke veşartî"

UPL tenê yek ji gelek serpêhatîyên van partîyan e, ev partîyên ji gelek parçeyan hatine afirandin û hesab dikin ku ew jî destê xwe bavêjin şabelotên li nav pizotên agir ên demokrasîyeke ku bêyî wan bi gewde dibe û ji xwe re jî vê rewşê sûdê wergirin. Kes nikare li derveyî îhtîmalan bibîne ku, di nav meheke de dotira rojê ya hilbijartinan, an jî di nav salekê de muhtemelen li dawîya pêvajoya xebatên meclîsa avakar, derdorên ku di serhildana hilweşandina rejîma **Ben Alî** de pir zêde beşdar nebûn jî, -ji ber ku wan jî ji na'metên wê sûd werdigirtin-, dibe ku ji nişkave derkevin pêş. Bes e ku ew bînin ziman –jixwe ji niha ve jî wisa dikin– ku divê bêserûberî bi dawî bê û karûbar dest pê bike, ku hertişt êdî guherîye û êdî bes e ji ber ku çawa be zordar êdî ji ser kar hatiye xistin. Soreşa fransî ya sibata 1848ê bi navê **Alfonse de Lamartine** re tê bi bîr anîn. Halbû ku, deh meh piştî îlana komarê, nivîskar û wezîrê berê yê karûbarên derve tevlî hilbijartina serokatîyê bû û bi tenê 17 210 deng bi dest xistin. **Louis-Napoléon Bonaparte**, endamê qralgiran û partîya nîzamê, wê bihata ser deshilatê, ji ber ku wî 5 434 226 deng bi dest xistin. **Hamma Hammamî**, rêveberê *Partîya Komunîst û Karker a Tûnisê* (PCOT) restorasyoneke bi heman rengî li derveyî îhtîmalan nabîne. Ji ber vê yekê, dema ku tevnên civakî hin spekulasyonan berbelav dikin li ser fen û lîstikên wisa yên *"hukûmeteke veşartî"* ku hevsarên wê di destê karsazên girêdayî rejîma berê de ye, ew bê navber dubare dike ku *"divê şoreş bidome"*. Di 9ê îlona bihurî de jî li *Lassoyudê*, bajarokê çandinîyê yê li heşt kîlometre dûrî *Sidî Bouzîd*, ku li wê derê di kanûna 2010ê de çirûska pêşî ya şoreşên ereban pêket, wî ev yek wiha îzah dikir: *"Dewlemendên tûnisî ji alîyê dizan ve hatin şêlandin. Ji niha û şûn ve mirov dikare xwe îfade bike, lê belê jîyana rojane neguherî. Divê şoreş ji bo garantîkirina refaha piranîya gel bidome. Hin kes xwedî derfet in ku derkevin gerûgeştên li Amerîkayê, yên din derfeta wan tune ku pereyê aspirînekê peyde bikin. Tenê ji sedî yekê pereyên ku ji alîyê* ***Ben Alî*** *ve hatin dizîn, wê têra çareserkirina pirsgirêka avê bike"*.

Berîya wî, gundîyekî ev "pirsgirêka avê", hinekî din jî, raxistibû ber çavan: *"Ji 1956ê ve* [dîroka serxwebûnê], *me ji hukûmetên ku li pey hev hatin jî tu tişt bi dest nexist –ava vexwarinê, binesazî. Wan rahişt "karûbarên" ku tu têkilîya wan bi razandina sermayê re tunebû. Ew radihêjin projeyên ku tu caran bi dawî nayên"*. Di eslê xwe de, ji bo heft hezar niştecîyên herêma *Sidi Bouzid* tenê lûleyeke avê hebû û ew carna diteqiya, carna jî ava wê diçikîya. Kişandina avê ji bîreke ku hêvî dida, bi carekê hate rawestandin û devê bîrê hate beton kirin, kêlîya ku rayedar têgihîştin ku ew ê neçar bimînin ji bo xwe gihandina kanîyeke berfireh a xwedî aveke boş û şîrîn tehtekê qul bikin.

Coşgermîya hilbijartinê fersendê dide niştecîyan ku daxwaza geşedana aborîyê, lîse, nexweşxanokek û rêyên baştir bikin. Ev herêma ku ji alîyê hilberîna çandinîyê dewlemend (zeytûn, fistiq, behîv), xwedî şênîyên xizan e. Hin gundî hê jî di xanîyên kelpîç ên piçûk û sist de tev li ser dilên hev dijîn, li erdê li ser "doşekên" bi gîya dagirtî yên sê santîmetre stûr, radizên. Xanîyên xweşik ên *Marsa* û qesrên *Kartaj*ê li mesafeyeke pir dûr in. Gelo hilbijartina Meclîsa Avakar wê derfetê bide wan ku berpirsîyarên riziyayî û sextekar ên rejîma berê ceza bikin, dezgeha wê ya têrnexur a polîsan ji hev bixin, birînên herêmî û civakî bikewînin û baş bikin û *"cihêkarîya herêmî ya pozîtîf"* ya ku mîlîtanê mafên mirovan û serokê Kongreya ji bo Komarê (CPR) **Moncef Marzoukî** pêşnîyar dike, bixin pratîkê?

Tevî ku ji alîyê deshilatê ve hat îhmal kirin, **Lassouda** ji 1956ê û vir ve guherî. Li qehwexaneyê tevneke Înternetê a pir bi lez heye; herkes an jî hema hema herkes weke ku xwedî telefoneke desta ye; piranîya ciwanan û carna dêûbavên wan jî ***Facebook***ê bi kar tînin. Gava gundîyekî ser bi kefî pirsgirêkên xwe yên ava vexwarinê ji delegasyoneke PCOTê re tîne ziman, rewş dişibe gravurekî berê, heta wê kêlîya ku telefona wî ya desta Nokia gilîgazincên wî qut dike; di vê navberê de bala cîranê wî, ji ber teksta ku kurê wî yê li Parîsê dijî jê re bi telefonê dişîne, belav dibe. Guherîn di warên din de weke ku hinek kêm zelaltir in. Di dema hevdîtina ku li bin taveke sotîner de pêk tê, temaşevan xwe li bin du holikên sergirtî ji rojê diparêzin: Yek ji wan ji bo zilaman, ya din jî ji bo jin û zarokan e. Piranîya temaşevanan jî zilam in.

Divê **Hammamî** careke din pozîsyona xwe ya beramberî olê dîyar bike. Mîlîtanek bi dengekî nizm dibêje *"Ev pirs kemîn e"*. Bersiv dibe sedemê hinek xirecirê: *–"Tûnisî misilman in. Ev yek ne muşkule ye: Em azadîyên takekesî, bawerî û derbirînê diparêzin"*. Şefê komunîst wiha pê de diçe: *"Partî ne li dijî olê, ne jî li dijî mizgeftan e. Gava* ***Ben Ali*** *çû Mekeyê* [di 2003yê de, ji bo wezîfeya xwe ya hecê bi cih bîne], *çavên wî tije rondik bûn. Û tevî vê yekê jî ew mirovekî diz bû… "* Temaşevan dikenin û ji bo vê bîranîna mexrebî ya bi terza pêkenîna *Tartuffe*, li çepikan dixin. Demeke din şûn de, Hammamî mijarê li ber me wiha bi dawî tîne: *"Zavayê Ben Alî, Sakkhar* ***el Matrî****, zevîyeke mezin kirî û nod û neh navên pêxemberan da ser rêyên di nav milkên wî re derbas dibin. Wî banka îslamî ya Zeitouna ava kir. Û di nav da radyoyeke xwe ya ku tenê bernameyên olî diweşandin. Dema ku* [Şêx Raşîd] *Ghannouşî* [rêveberê Partîya Îslamî] ji ber zextên Ben Alî revîya, gelo wî li ku derê ji xwe re starek peyde kir? Li Qralîyeta-Yekbûyî, welatê laîk. Dema ku Ben Alîyê laîk jî ji şoreşê revîya, gelo îcar wî li ku derê ji xwe re starek peyda kir? Li Erabistana Siûdîyê… Ev bibîrxistin hêjatirî hemû dersên teorîk e". Bi taybetî, kêlîya ku herkes texmîn dike ku îslamîst wê partîya herî girîng a nêzî Meclîsa Avakar ava bikin.

## Analojîya balkêş Atatürk û Bourgîba

Yek ji rêveberên *Ennahda*, **Alî Laarîdh**, dipejirîne ku zexta polîsîye û surgunê bergeha birayên wî yên têkoşînê guherandîye: *"Em bi neheqî û binpêkirinên mafan re rû bi rû man. Em dizanin binpêkirina mafên mirovan tên çi wateyê. Em neçar man li pêncî welatên cuda bijîn. Û em fêr bûn demokrasî çi ye û çi ne, mafên jinan. Divê li gor guzergaha me em bên nirxandin û darizandin. Û wekî din temaşe bikin ka em çawa dijîn, em û malbatên me: Jina min dixebite, keçên min xwendin, yek ji keçên min ne sergirtî ye"*. Gelo ev yek bes e ji bo jiholêrakirina gumanên têkildarî "cot gotara" ku îslamîst pê tên sûcbar kirin? Parêzera dijberên bûne mexdûrên rejîma berê, xatûn **Radhîa Nasraouî** gumanan dike: *"Mîtîngên Ennahda yên ku tê de dîrûşmeyên wiha tên dîtin: 'Tu deng nikare derkeve raserî dengê gelê misilman!'"*. Û ew vê çavdêrîya xwe lê zêde dike: *"Di navbera tiştên ku rêveber vedibêjin û tiştên ku hin endam dikin, ferqeke girîng heye"*. Bersiva **Laarîdh** bawerîyeke tam nede jî, mirovan îqna dike: *"We dê tu garantîyeke pêşîn tunebe ku ti partîyek wê li ser soza xwe bimîne"*…

Ji ber ku hê jî endîşeyên wan hene, ji bo ku nîşan bidin ku ew ji alîyê demokratîk ve guherîne, hin jî rêveberên Ennahdayê weke referans her diçe zêdetir xwe dispêrin "modela tirkan" a **Recep Tayip Erdogan**ê ku berî demeke nêz ji alîyê tûnisîyan ve pir bi germî hat pêşwazî kirin. (4) Ev analojî hem bi cazîbe, hem jî ronîker e. Li her du welatan jî, pêşengekî karîzmatîk (**Mustafa Kemal Atatürk** an jî **Habîb Bourgîba**) zêde girîngî daye –dûre jî ferz kiriye– nûjenîyeke ku warên siyasetê û yên olê ji hev vediqetîne. Vî yê dawîyê, hetta, hin caran bi awayekî vekirî xwe spartiye palpiştên rasyonalîst ên rojavayî. Herçendî îdîa dikin ku ew dixwazin vê "kevanê" bigirin jî, li gor piranîya îslamîstên tûnisî, piçek çawa ku Atatürk Tirkiye "dezorîyantalîze" kiribe, Bourgîba jî Tunis "dezarabîze" kiriye. Bi gotineke din, wî ew nêzî Ewropayê kiriye. Bernameya Ennahda ya ku ne lîberalîzmê, ne jî vebûna bazirganî dike mijara guftûgoyê dixwaze di navber karsazên sermayê radizînin û tûr-operatorên rojavayî û yên *" îslamî"*, yên ji herêmê an jî ji Kendavê tên dengeyeke nû çêke.

Gelo her kesek behsa demokrasîyê dike? **Laarîdh** bi sûdwergirtina ji vê rewşê daxwaz dike Meclîsa Avakar bi *"azadîyên bêsînor"* bê xemilandin, ango ji *"derfeta referansên olî, ereb-misilman"* sûdê werdigire. Bi xemgînî dibêje, *"Bi Bourgîba, dewletê eynî weke sîstemeke sovyetîk, bi darê zorê berê veguherîn ber bi rasyonalîteyê ve bir û ferz kir"*. Ji bo wî qebûlnekirina destkeftîya pêncî û pênc salên dawîyê ne mijara gotinê ye, ew îdîa dike ku divê ev yek *"bi berdêleke erzantir pêk hatiba"*.

Îslamîst zêde berê xwe nadin nav qadên bi rîsk. Piştrastbûyî û razî ji tesîra gotareke têkildarî dersên exlaqî li welatekî ku tê de saman û sermaye ji alîyê eşîra Ben Alî ve hatine talan kirin, Ennahda ji guftûgo yeke ku wê û "éradicateur"ên rojavayikirî yên li taxên dewlemendan dijîn bîne pêşberî hev, zêde natirse. Ji bo van ên dawî bi xwe, xetere mezin e. Mîlîtanê çepgir ê berê û endamê PDPê **Omeyya Seddîk** rewşê bi kurtî wiha tîne ziman: *"Pêvajoya sedsalekê ew bûn bijarteyên çandî yên welêt, lê niha ew ê êdî bibin bermahîyên lihevkomkirî. Di vê rewşê de ew ê bi berdêla jîyana xwe derkevin meydanê"*.

## Hunereke berxwirîyê ya dîyalektîk

Xala yekem a Destûrnameya niha dibe mijara gengeşî û guftûgo yên bêdawî. Ew bi baldarî ji alîyê **Bourgîba** ve hatiye nivîsandin: *"Tûnis dewleteke azad, serbixwe û serwer e: Ola wê îslam, zimanê wê erebî û rejîma wê komar e."*. Bi taybetî bi peyveke duwateyî tê dest nîşan kirin ku Tûnis misilman e. Lê belê ev yek dikaribû herwiha weke ferzkirina rewşekê jî bihata xwendin û Qur'an bibûya çavkanîyeke huqûqa gelemperî. Di vê qonaxê de jiholêrakirina referansa olî dikare îslamîstan aciz bike; destnîşankirina wê jî wê "laîk" bixistana nav endîşeyê. Ya herî rengebira ew e ku teksta heyî were parastin. Li gor **Hammamî** *"guftûgoya li ser xala 1 bi armanca kemîndanîna li pêşîya laîkan ji alîyê îslamîstan ve hat dest pê kirin. Û ew ketine nav kemînê. Hal bû ku bersiva rast wiha bû: Baş e hûn çima dixwazin xwezaya misilman a Tûnisê binxêz bikin? Bi kîjan armancê? Ji bo pêkanîna şerîetê? Ji bo ku wekhevîya jinan bibe mijara guftûgoyan? Her cara ku ev pirs hatin kirin, islamîstan berepaş ve gav avêtin"*.

Sosyalîstên FDTLê jî red dikin li ser qadeke olî dor li xwe bidin girtin. Gava ew ji bo qoda statuya takekesî bergirîyê dikin; ya ku, ji bilî mîrasgirîyê, mafên wekhev ên ji bo zilaman ji jinan re jî nas dike, ew vê yekê weke hêmaneke bingehîn a nasnameya neteweyî pêşkêş dikin, ne weke tiştekî wergirtî ji kevneşopîya rasyonalîst a rojavayî. Bernameya wan pirsgirêkê bi hunereke ku pala xwe dide dîyalektîkê dinirxîne: *"Nasnemeya gelê tûnisî xwe dispêre kokên nirxên xwe yên ereb û misilman û bi şaristanîyên curbecur hatiye dewlemend kirin; ew di bingeha xwe de ji bo çandên cîhanê nûjen û vekirî ye."* 10ê îlona dawî, Ben Jaffar, rêveberê FDTLê mîtîngeke li Sîdî Bou Saîs, taxa dewlemendan a li peravê bi peyvên din ên tije hêvî bi dawî anî: *"Yên ku red dikin ku welat biguhere, tirsûxofê berbelav dikin. Em bi xwe bawer bin. Welatekî weke Tûnisê piçûk ê ku gava şer li ser sînorên wî bi dijwarî rû dida, karî xwe li ser piyan bigire, welatekî xurt e"*.

Welatekî ewçend xurt wê bikaribe bêderengî pirsgirêkên xwe yên ava vexwarinê jî çareser bike.

1 Bi taybetî, "Serhildanên gel ên li Afrîkaya Bakur û yên li Rojhilata Navîn (IV): Rêya Tûnisî", Koma Krîzê ya Navneteweyî, Tûnis / Bruksel, 28 nîsan 2011

2 Raqîbê qedîm ê dîktatorîyê, Chebbi car caran bû kesekî nêz ê Baasa iraqî, marksîst-lenînîst, sosyalîst, berî ku bibe navendparêzekî lîberal û mezdanvanên derdorên karsaz. Têkilîyên wî yên li gel îslamîstan jî guherîn û weke ku di sê mehên dawîyê de xira bûne

3 Hevpeyvîna li gel Mohsen Hassen, Le Quotidien, Tûnis, 11 îlon 2011

4 Li miqabilê vê yekê, Birayên Misilman ên misirî weke ku zêde guh nadin şîretên wî û bi gumana pêkhatina serwerîyeke Tirkîyeyê li Rojhilata Navîn

Wergera ji fransî: Baran Nebar

## Pusûlaya dengan, awayê bikaranînê

Hilbijartina ji bo meclîsa avakar 23yê cotmehê li Tûnisê, bi lîsteya partîyan (rêbaza ya herî xurt dimîne) wê pêk were.

- 7.5 miliyon dengdarên potansîyel (li Tûnis û li derveyî welêt)
- 33 navendên dengdayînê ku 6 ji wan li derveyî welêt in (Marsîlya, Parîs, Îtalya, Almanya, Kanada, Abû Dhabî)
- 1.600 lîsteyên namzedan (di nîvê meha îlonê de), ku 845 ji wan ji alîyê partîyan (52%), 678 ji wan ji alîyê serbixweyan (42%), 77 ji wan jî ji alîyê koalîsyonan ve hatine pêşkêş kirin
- 218 parlementer wê bên hilbijartin



DARA ARAM: **Erdê sor**, boyaxa akrîl li ser tûwalê, 50 x 52 cm

# Armanc û perspektîvên demokrasîya herêmî

GIOVANNI ALLEGRETTI *

Di dehsalekê de, bi hezaran bajarên dinyayê pratîkên xwe yên demokratîk guherandin. Budceya tevlîker, ya ku 1989ê li *Porto Alegreyê* îcad bû, sembola vê tevgerê ye û îroj ji hêla 15300 bajarên li hemû parzemînan ve tê bi kar anîn. Armanca wê bersivdana endîşeyên xelkê, bi taybetî xelkê belengaz e, ku gelek caran li derveyî birêvebirina şaredarîyan tê hiştin. "Pêwîstîya nîqaşê" ya modernîteyê, bi gotinên siyasetnasên fransî **Yves Sintomer** û **Loïc Blondiaux** (1), gav bi gav li ser birêveber û rayedarên cîhanê ferz dibe. Bi awayekî berbiçav, encama wê vekirina cihên desthilatê ji bo dîyaloga siyasî û civakî ye. Zemînên weha tên bi rê xistin -weke zemînên ku *Foruma Aubagneyê* ya 2011ê tevin li wan dide- ku rê didin xurtkirina pevguherandinên navan, li alîyekî komele, welatî, tevger û rêxistinên sendîkayî û li alîyê din, hêzên siyasî û nûnerên sazûmanan. Ev înîsîyatîvên hanê pir caran ji hêla sazîyên nêzîkê gel (şaredarî, taxên şaredarîyan, yekîtîyên navşaredarîyan) ve tên pêş xistin, kêmtir caran jî, li asta jorîn (herêm an eyalet, wek mînak li Malagayê an li herêmên îtalî yên Toscane û Lazîoyê). Ji bo ku vê tevgerê şirove bikin, siyasetnasên brezîlî û portekîzî **Leonardo Avritzer** û **Boaventura de Sousa Santos** xeleka jirêderketî ya ku demokrasîyên hevdem zeft kiriye, analîz kirin: Ihtiyata li hember rabûn û rûniştina sazîyên nûnerî dibe sedema kêmbûna meraqdarîya ji bo tevlîbûna çalak, ku weke tiştekî "bêbandor" û ji hêza guhertina birêvebirina giştî bêpar, tê hesibandin. (2) Helkirina vê "patolojîya" aîdê civakên lîberal tê maneya îcadkirina pratîkên ku rê li ber derketina ji warê axaftinê û tesîrdayîna li biryarên hikûmetî vedikin. Li berevajî daxwazên hin meylên lîberal ên ilhama xwe ji *New Public Management* werdigirin (3), ev pêvajo bi guherandina têkilîyên navbera xizmetdêr û bikarîner/mişterî ne sînorkirî ne. Bi xêra wan, *çanda* siyasî dikare bê guhertin, da ku hemû beşên gel bi rastî tevlî wê bibin. Bi tarîfeke weha, tevlîbûn ne ji minaqeşeyê û ne jî ji pevçûnê ditirse, lewre ku ew nirx dide nihêrînên cuda, yên bi azadî tên îfade kirin. Jixwe, rabûna tansîyonan a ligel vebûna zemînekî dîyalogê ji bo kesên ku dengê wan pir zêde ji hêla piranîya siyasîyên serdest ve hat tepisandin, tiştekî pir asayî ye. Wekî din, ev dijberîyên stewr nînin, lewre ku armanca wan ew e ku berjewendîyên giştî yên civatê derxin holê. "Beşdarîya" xelkê weha li dij tiralîya tişta ku sosyolog **Antonio Tosi** navê "teorîya îdareyî ya pêwîstîyan" lêdike, radiweste. (4) Ew behsa sazûmanan dike ku, pirî caran, xwedîyên îmkana nasîneke kûr a tevahîya erdên xwe û hîskirina pêwîstîyên wan ên îfadenebûyî nînin. Zêdebûna newekhevîyan û xwepêşandana pirşiklî ya xelkê, pirsên nû li ber bajaran datînin û bajar jî bersivên ji berê de hazir didin wan. Ji ber vê yekê, bi taybetî li Amerîkaya Latînî û Afrîqayê *(nivîsara Bachir Kanoute bixwînin)*, birêvebirina şaredarîyan mecbûr ma ku xwe bi temamî biguherîne. Ev ne tenê tevgereke nûmûnîsîpalîst e. (5) Bi rastî jî, divê kokdan û belavbûna nûbûnên li asta bingehîn, di dawîyê de, rê bidin guherandina hemû sewîyeyên hikûmdarîyê.



DARA ARAM: **Kuba 1.04**, boyaxa akrîl li ser tûwalê, 52 x 54 cm

## Armanc, bicihkirina "federalîzmeke piştgir" e ku "xwe dispêre xelkê" ye

Armanc bicihkirina "federalîzmeke piştgir" a "xwe dispêre xelkê" tê, da ku têkilîyên navbera xelkên cihê yên dewletê reforme bibin û pevguherîna çand û welatên cuda xurt bibe. Dinyaya siyasî ya herêmî weha xwe weke xeleka pêşî ya pevgirêdana aktorên "civaka sîvîl" bi sazîyên nûnerî ve pêşkêş dike. Tevgera neteweyî ya ji bo reforma bajarî (Fórum Nacional de Reforma Urbana, FNRU) li Brezîlê ji bo rola hewldanên herêmî di guherandina mayînde ya siyasetên dewletî de yek ji mînakên herî baş e. Di welatekî wisa de ku bajarvanîyeke lezgîn û cihêkarîyeke zemînî û civakî lê heye, FNRU ya 1988ê damezrandî li dij cîhûwarên bêistiqrar û ji bo birêvebirineke şaredarî ya demokratîk têkoşiyaye. Di Meclîsa Damezirîner a 1988ê de, wê nivîsandina prensîpa fonksîyona civakî ya bajêr di zagona bingehîn de bi dest xist, ku herweha tê maneya bicihkirina mekanîzmayên beşdarîya yekser a gel. Ev jî çarçovekirina hiqûqa mulkîyeta ferdî ji bo sedemên berjewendîya giştî dihewîne.

Di vê têkoşînê de, wê piştgirîya ji hezaran bêhtir komele, sendîka û komên pîşeyî wergirt, herweke li asta herêmî bicihanîna pir nûbûnên ku wê pêşnîyar dikirin. Bi xêra vê xebata li ser zemîn a ku şaredarîyên pirhejmar, tevî rîskan jî, bi awayekî serkeftî da meşandin, FNRUyê di 2001ê de qanûna li ser "statûya bajaran" bi parlemana brazîlî da pesind kirin (hem jî bi yekdengî û di bin serokatîya **Fernando Henrique Cardoso** yê piştgirê îdeolojîya lîberal de). Ev çarçoveya hiqûqî ya bajarî, heta niha li cîhanê ya herî wêrek e. Lê belê, tevî pêşketinên xuyanî, belavbûyîna demokrasîya beşdar li hemû parzemînan bi hewldanên bixwevekişandinê re rû bi rû dimîne. Siyasetnasa brezîlî **Evelina Dagnino** weha behsa "nêzîkbûneke fahş" (6) a li nav daxwazên gelan û cureyeke bîrdozîya lîberal dike. Sazîyên navneteweyî yên mezin weha "tevlîbûna" herêmî dikin amûra bêberpirsyarîkirina sazûmanan û kêmkirina rola dewleta civakî. Piştgirîdana hevkarîyên ligel rêxistinên sektora sêyem -komeleyên weqfî û piştgirîyê- weha çarçoveyên dewletî yên piştgirîyê xira dike û mekanîzmayên weqfî an sîgortayên ferdî dixe şûna wan. Di perspektîveke utîlîtarîst de, berê beşdarîya welatîyan xwerû ber bi îfadeya ferdî û zêdebûna mekanîk a bijarteyên wan ên cihê tê dayîn. Mînak dema ku hilbijartî niştecihan vedixwînin da ku planên nûbûna bajarî şirove bikin -di piranîya paytextan de dezgehên agahîyan û pêşangehên xweşik tên bi cih kirin û weha çêdibe-, bêyî ku bibin xwedîparên biryardanê. Herweha, hin aletên elektronîk (weke forumên sohbetê yên malperên Înternetê yên bajaran) xwerû rê li ber "dîyaloga" nav welatî û birêvebiran vedikin û ev birêvebir hê jî dikarin bijarteyên welatîyan li gor xwe fêm bikin. Di dawîyê de, sazî "dabeş dikin da ku bêhtir serdest bibin". Nîqaşa ku serokwezîrê îngilîz **David Cameron** li ser rola "Big Society" (civateke dilxwazan) a di reforma dewleta refahê de da dest pê kirin mînakeke baş e -bi dîtina wî, divê ew mezinîya vê dewletê piçûk bikin û xizmetên wê li derveyî dewletê bên kirin.

## Sazîyên civakî û siyasî êdî rewabûna xwe winda dikin

Bazirganê hindistanî **Narayana Murthy** herweha bi awayekî xedartir perspektîva lîberal anî ser zimên, ligel dirûşmeke ku ew dixwaze wê bi navûdeng bike: *"In God we trust. Everyone else brings data to the table" ("Bawerîya me bi xwedê heye. Kesên din bi tenê agahîyan didin")*. Ev dîtina utîlîtarîst a beşdarîyê, welatîyan weke "agahîdêrên kilît" ji bo stratejîstên ragihandin an reklamê yên birêvebirên dewletî dihesibîne, li şûna ku hevbiryardêrên xwedîyên zanyarîyan bin. Bi rastî jî, krîza siyasî ya civakên hevdem tê re diçin rê dide fêmnekirinê û birêvebirên herêmî, carina, nêzîkatîya pêşverû yan jî nêzîkatîya lîberal bi ser xwe digrin. Jixwe, rewş li ber çavên herkesî eynî ye: 1) sazîyên civakî û siyasî (birêvebirî, partî, sendîka, medya, dêr, rêxistinên ne hikûmî...) rewabûna xwe winda kir; 2) krîza fînansî serkanîyên giştî yên herêmî dixe tengasîyê, di paşxaneke "destekdêrîya asîmetrîk" de ku jinavendîbûna berpirsyarîyên herî "hessas" (civakî, tendurisitî, binesazî) tê de bêpar e û bê îmkanên biryardayînê tên kirin; 3) pêwîstîyên civakî herweke çareyên teknîk ji bo bersivdana wan zêde dibin. Hilbijartina ji wan çareyan weha dibe kiryareke siyasî ya zehmet a ku bandor li mayîndebûna wan dike. Lewre jî, fikira li ser pratîkên heyî û dîyarkirina têgihan pêwîst e, ji ber ku têgihên nezelal dikarin nûkirina rasteqîn ya siyasetan asteng bikin û heta têk jî bibin. Xwendinên dirust ên *"pêwîstîya nîqaşan"* jê fêm dikin ku, di civakeke dabeşkirî û bi meylên ferdperest de, divê dîyaloga civakî ji "bedenên navbêrkar" ên ji xwe rêxistinkirî yên cîhana komelegerî û sendîkayî *bêhtir* bê berfireh kirin. Divê insurên neresmî yên civakê yên "di pêşketinê de" jî bên guhdarî kirin, tevî ku utîlîtarîstên lîberal wan biqest tune dihesibînin. Ev "welatîbûna serîhildêr"

www.arsivakurdi.org

têkildar e ligel tevgerên "raperîner û protestoker" yên ku mirovnas **James Holston** ew analîz kirin (7), herweke rêxistinên "pêşprojeyî û piştgirîyê" yên sosyologa awustralyayî **Leonie Sandercock** salox dan. (8) Ev yeka hanê pir caran bi awayekî empîrîk, bê projeyên ji berê ve sazkirî, li ser erdê dixebitin. Ji bo herdu mînakan, lewre ku ew li ser prensîpa şebekeyan dixebitin, ev aktor bêhtir bi dewamîya heyînîya xwe bi riya "piştgirîya hev û din" mijûl dibin û li ser rola xwe ya muhtemel di guherandina civakê de nafikirin. Lê belê armanca nêzîkatîya beşdar ne qezenceke utîlîtarîst e, lê belê nirxdana her ferdeke ligel daxwazên wê yên taybet, bêyî ku dev ji imkana jinûve parvekirina qadên kolektîf berde. Ji bo ku ji xefkên utîlîtarîzma lîberal bifilitin, divê çend hedefên bi hev ve girêdayî bên danîn. a) Nirxdana alîyê pedagojîk a beşdarîyê ku ji bo yên beşdar dibin, weke aleteke xweguherandinê bi riya guhdarîya hev û din tê hesibandin, da ku ji pevajoyê "cuda", di warê însanetî û zanyarîyan de zengîntir, derkevin.

## Li bajaran dersên xwefêrkirina siyasetên giştî û bi hev re biryar dan

Li ser vê, "dersên xwefêrkirina siyasetên giştî" -ku, li bêhtirî heftê û pênc bajarên Koreya Başûr, herweke bajarên mezin ên brezîlî yên weke Fortaleza û Guarulhosê, berî seansên bîlançoya tevlîker tên- pir tiştan şanî me didin. Van bajarên hanê ji tecrûbeya rêbazên xwefêrkirinê yên pedagog **Paulo Freire** sûd wergirt, da ku welatî weha hîs nekin ku birêveber "mêjîyên wan dişon" berî ku ew beşdarî biryardana bi hev re bibin. b) Bikaranîna beşdarîyê da ku agahîyên ji hêla medyayên serdest ve tune hesibandî werin ragihandin. Ji bo ji van xefkan bifilitin, divê nirx ji şebekeyên alternatîv ên ragihandinê re bê dayîn û, berî hertiştî, îradeya "vekirina qûtîyên reş" ên birêvebirîyên giştî, bi taybetî yên pir "teknîkî", hebe. Lewre ku awayê xebata wan nahêle ku welatîyên kêmtir perwerdebûyî xebata kirî fêm bikin û pêwîstîyên xwe bînin ser zimên. "Dabeşkirina karan" ku weha bi cih dibe, rê li ber parastina îqtîdarê ji bo cîhana siyasetê vedike. Ji ber vê yekê, grûpên "çavdêrên beşdarîyê" yan jî "şopandina sozên hilbijartinan", wek mînak, li Kamerûn an Brezîlê çêdibin. Ev struktur pir caran hevbeş in û ji welatî, tevger, akademîsyen û birêvebiran pêk tên. c) Reformkirina aletên beşdarîyê da ku imkanên bixwevekişandinê kêm bibin. Eger em bi aletên weha bidomin ku nahêlin aktor di ber pêvajoyê re pêş bikevin û di nav xwe de çareyan muzakere bikin, piranîya rayedarên siyasî wê dev ji nihêrinên xwe yên welatîyan weke girseyeke ezperestên bi daxwazên xweperest bernedin; hilbijartî jî wê zemînên nû yên bi hev re biryardanê venekin, tevî ku ew, li alîyekî, piştgirîyê diafirînin û li alîyê din, rê li ber feraseteke çêtir a pêwîstîyên birêvebirina îdareyî ji hêla xelkê ve vedikin. Lewre jî, divê dawî li cudabûna nav "ilmên laîk" (yên gel) û "ilmên bispor" bê anîn. Divê pêvajoya tevlîker bibe şûna "adeleteke kognîtîv" a ku ji zanyarîyên teknîsyenan herweke pratîka niştecihan sûdê werdigre. Wekî din, ew "zanyarîya siyasî" ya welatîyan, bi gotina **Sintomer,** têdixe dewrê, yanî imkana niştecihan a sazkirina stratejîyên ku dikarin ligel stratejîyên cîhana siyasî têkevin dîyalogê. Di heman demê de, divê birêvebirên giştî hevparên van nîqaşan bin, da ku ew ji fersenda gumanbirina ji hin qet'iyetên pîşeyî yên ji fêrên zanîngehî yên nikarin rexne li xwe bigrin hatî, sûdê werbigrin. Bajarê portekîzî Cascais mînakeke ji nû ve berdayîna avaker a çanda teknîkî ya memûran dide. Şaredarê vê şaredarîyê, **Carlos Manuel Lavrador de Jesus Careiras** (PPD/PSD) lîberal e, lê pir bi nûbûnên tevlîker mijûl dibe. Di çarçoveya programa "In Loco" (li ser cih), her sal bi dehan memûr beşdarî fêrekê dibin da ku hem di karîyerên xwe de bi pêş bikevin, hem nirx ji qabiliyetên wan ên hizirîna li ser xwe re bê dayîn û hem jî navberkarîyên civakî yên nû ji bo kokdana jêhatîbûnên wan ên teknîkî çêbibin. Armanc herweha ew e ku bi gotina **de Sousa Santos** cih ji "ekolojîya ilmên cuda" re, were veqetandin, bêyî ku zanyarîyên ji bav û kalan an jî çandên kêmneteweyî yên ji xwe nasnameya erdekî pêk tînin, li derve bên hiştin. d) Ji bo naskirina rola welatîyan (û rêxistinên wan) a weke muxatebên rasteqîn, divê modelên çandî yên projeyên herêmî di xwe de vedihewînin bên nû kirin. Lewre ku adetên îdareyî û pêşfikir hene ku dubare dibin û rêçûyîna ber bi pêşketineke mayînde û xwecihî ya hemû beşên gel di xwe de dihewîne, asteng dikin. Divê ev tişt hemû bên guherandin û ev jî karê herî zehmet ê sazîyan e. Ji bo ku encamên nûker ên bi piştgirîya aktorên civakî bên bi dest xistin, divê tabloyeke dîyar a têkilîya mesref/qezenc a her terciheke (di dema navîn û dirêj de fikirî) bê pêşkêş kirin û senaryoyên cihê bên muqayese kirin. Ev jî alîyê "çandî" ê beşdarîyê ye: Divê hayê civakê ji prensîbên pêwîst ên ji bo "mayîndeyîyeke" rasteqîn çêbibe. Ji bo pêvajoyên restorekirina bajarî ya bîdonvîlan bi taybetî li Başûr, wisa ye.

e) Bi nihêrîneke burokratîk û utîlîtarîst, belavbûna bajaran di demeke kurt de ji ber getobûna *bidonvîlên* ji navendê qewirandî pirsgirêkan najî. Lê belê, fikireke tevlîker nîşan dide ku ev tercih wê di dawîyê de bibe sedema fînansmana giştî ya biha ya binesazîyên li kevîyên bajêr û ji bo yên ku şebekeyên xwe yên pîşeyî û civakî winda kirin, wê veguhere têkoşîneke rojane a li hember mesafe û pirsgirêkên çûnûhatinê... Li hember pirsên bi vî rengî, sazûman nikarin xwe bispêrin çareyên basît, berevajîya wê, divê ew roleke "teşwîqker" bileyizin da ku pratîk nû bibin. Mirovnasê ugandî **Mahmood Mamdani** baş nîşan da ka çawa gelek bajarên afrîqayî, bi riya programên cotyarî, di şerê li dijî kêmbûna nifûsa gundan de bi kêr hatiye. (9) Bi eynî mantiqî, bajarê *Aubagne* ji bo perspektîvên siyasî û çandî yên nû, bi riya toreyên transneteweyî yên bajar û gundan xebitî. Herçi **de Sousa Santos**, wî rola sereke ya pir birêveberîyên herêmî yên ekwadorî û bolîvyayî di dehsala bihurî de binxêz kir, yên ku ligel tevgerên xwecihî hevkarî kir da ku dewletê bi kûrahî reforme bikin. (10) Destûrên bingehîn ên nû nirxên cihê di xwe de hewandin, bi taybetî têgihên kosmogonîk ên kokên wan di çanda gelên andî yên xwecihî de ne, ku xwezayê dikin mijareke hiqûqî û ne bi tenê objeyek. f) Pesendkirina statûyên hiqûqî yên nêzîkatîyên nû dixin çarçoveyekê, ne bi tenê piştgireke "teknîkî" ye; divê ew herweha bibe esasê çanda wan. Jixwe, bêyî xuyakirina zelal a nirxên bingehîn, sazkirina empîrîk a qeydan (ku aniha di pir pêvajoyên tevlîker de, nemaze li Brezîl û Spanyayê, tê dîtin) rîska herifîneke gav bi gav di xwe de vedihewîne. Lewre ku hertişt têkildarîya îradeya aktoran e. Em jî jê haydar in ku hin aktor çêtir dizanin xwe bi rê bixin da ku qeydan bi alîyê xwe ve bikişînin. Li hember vê rîskê, hin bajar (weke Lîsbona û Cascaisê, li Portekîzê) "şertên prensîpan" çêkirin û daîmî rêçên xwe yên beşdarîyê li ber wan dihesibînin. Ev "destûrîbûn" ne tenê misogerîyek e li dij "bêistiqrarîya" wan, ew herweha teşwîqeke başkirina bênavber a kalîteya biryardêr, imkana hewandinê û lihevbûna armancên xuyakirî û aletên ji bo gihîştina wan hatine bi kar anîn.

## Hê jî divê nezelalîyên li jêr bên dîyar kirin:

1 Divê hevtemamkirina aktorên herêmî, giştî û ferdî, îdarî û gelî, bi rastî be. Tevî ku sazîyên herêmî pir caran ji ber vegirtina sewiyeyên jorîn ên desthilatê zehmetîyan dikişînin, ew bixwe di têkilîyên ligel aktorên li ser zemîn de vê nêzîkatîyê dubare dikin. Dema ku ew xizmetên civakî bi komeleyên serkanîyên wan hindik û berpirsyarîyên wan zêde didin çêkirin, wisa dibe. Divê em ji vê xeleka gunehkar derkevin, bi perspektîva sazkirina enîyeke hevpar (civak û sazîyên herêmî) ji bo ku ji dewletê pirtir ji nû ve dabeş kirin bê xwestin.

2 Pirsa kêmbûna serkanîyan nikare heta hetayê ji taloqkirina reformên ku welatî dixwazin re bibe bahane. Serkevtina bi hezaran "diravên herêmî" yên cihanê, weke serkevtina "aborîyên hîbeyê" yên di pir erdên Başûr de bicihbûyî ne, imkana vegerandina sosyal a di aborîyê de îspat dikin (Oikonomiya ya ku Karl Polanyi di salên 1940ê de behsa wê dikir). Hin bajarên weke *Santa Cristina d'Aro* (Catalonya) an *Grottammare* (Îtalya) pêvajoyên tevlîker ên weha bi cih anîn ku ne bi tenê organîzasyoneke nû ya mesrefan nîqaş dikin, lê li dor qezencan minaqeşe dikin, da ku ligel niştecihan serkanîyên nû yên hatinan (diravî û nediravî) bên dîtin. Bêyî înîsîyatîvên bi vî rengî, fikira aborîyê weke dinyayeke hişk û qerisî bi rêgezên nayên guhertin wê bidome. Yanî warek ku tercihên cuda lê nabin.

3 Nelihevîya kirinên herêmî ji bo gelek bajaran pirsgirêkeke giran e. Bajarekî ku piştgirîyê dide navendên danûstandinê, nikare li cem bajarokên piçûk ên di xwezayê de winda û nirx didin dikanên piçûk ên nêzîkbûnê, cihê xwe bigre; eger şaredarîyek dixwaze pêşketineke ufqî saz bike, divê ew geto û qûtbûnên civakî red bike.

4 Pêwîstîya hesabdanê ne xwerû bi insûrê teknîkî ya zelalîyê ve girêdayî ye. Ew, di her qonaxa pêvajoyên hevsazkirinê û bicihanîna tercihan de tê maneya îradeyeke siyasî ya xurt ji bo berpirsiyarîyê.

5 Divê beşdarî ne bi tenê bi nûbûnên teknîkî sînorkirî be; divê ew weke pêvajoyeke kûr a guherandina çandî û siyasî bê hesibandin. Bawerîya ku cîhana siyasî ya ji "nûnertîya" neteweyî derketî, dikare ji pêvajoyeke tevlîker feydayê werbigre, bêyî ku beşek ji iqtîdara xwe berde, tê maneya fêmkirina şaş an jî xeyalan *(nivîsara Ernesto Ganuza bixwînin)*. Bi heman awayî, tevlîbûna "carcaran" girêdanan saz nake; lê belê bikaranîna çemberên dubare pêwîst e ji bo ku kevneşopîyeke nû û bêtir bawerî pê tê, derkeve holê.



DARA ARAM: **Baxçeyên tîrêjên rojê**, boyaxa akrîl li ser tûwalê, 32 x 36 cm

## Birêveber bi zorê cilên kevin ên çanda siyasî ya kevneşopîyê ji xwe dikin

6 Ji bo ku welatî û sazî hev û du bibînin, divê herdu jî gavekê bavêjin. Divê welatî li "başîya giştî" bigerin û di ber berjewendîyên xwe yên taybet re, ku ji hêla bedenên navberkar ên rêxistinkirî tên parastin, derbas bibin. Divê sazî jî gaveke mezintir bavêjin û dev ji biryardana xwerû û li gor guncîna demê berdin. Ya çêtir: Divê ew herweha li dijî dabeşkirina berpirsyarîyan û parçebûna nav sektorên kirinê yên koordînenekirî (taybetmendîya mantiqa burokratîk-teknîkî) têbikoşin.

7 Dawîyê, dîtina vehewandina civakî yan edaleta ji nû ve dabeşkirinê wek encamên bi xwe re anî yên jixweber ên hemû pevajoyên tevlîker xeternak e. Tecrûbeyên latîn-amerîkî û afrîqî şanî me didin ku, bêyî aletên taybet ên ku van armancan dikin kirinên berbiçav, newekhevî dubare dibe. Bi gotineke din, bêyî naskirina eşkere ya newekhevîyên ku civakên me lawaz dikin, û bêyî bicihanîna awayên têkoşîna li dij wan, hemû siyasetên nû rîska dubarekirina rewşa berê digrin. Gelo rêçeke beşdarîyê ya ku mafên nû bi xwe re nayîne (an jî nikare mafên ferdî û kolektîv di bin mafên sîwan ên nû de, weke "mafê bajêr", misoger bike), navê xwe heq dike?

Haya birêveberîyan hindik caran di heman demê de ji van daxwazan hemûyan çêdibe. Ew bi zorê cilên kevin ên çanda siyasî ya kevneşopîyê ji xwe dikin. Lê belê, guherînên xuyanî di hejmareke mezin a şaredarîyan de tên dîtin. **De Sousa Santos** senyaryoyeke weha xeyal dike ku beşeke dewletê jî xwe weke "tevgereke sosyal a bi şiklekî nû" pêşkêş dike û bi insûrên herî dînamîk ên civakê re meyla guherandina siyasî parve dike. (11) Ev guherîn dikare li ser bingeha teşwîqkirina dîyaloga navbera nihêrînên cuda û li ser naskirina "ilmên belav" ên her erdekê çêbibe.

* Lêkolînerê Navenda Lêkolînên Civakî (CES) a Zanîngeha Coimbra (Portekîz).

1 Loic Blondiaux û Yves Sintomer, *L'impératif délibératif [Pêwîstîya nîqaşan]*, Collège international de Philosophie, Parîs, 2010

2 Leonardo Avritzer et Boaventura de Sousa Santos, *Towards widening the democratic canon [Berfirehkirina hiqûqa demokratîk]*, 2003, http://www.ces.uc.pt/bss/documentos/IntroDemoENG.pdf

3 Bixwînin Jérôme Tournadre-Plancq, "La faute aux Britanniques" ["Sûcê Brîtanîyan"], *Le Monde diplomatique*, kanûn 2009

4 Antonio Tosi, "Urban Theory and the Treatment of Differences: Administrative Practices, Social Sciences and the Difficulties of Specifics" ["Teorîya bajarî û nêzîkbûna cudatîyan: Pratîkên îdarî, ilmên civakî û zehmetîyên taybetmendîyan"], International Journal of Urban and Regional Research, Montreal, Volume 15, n° 4, rûpel 594–609, kanûn 1991

5 Munîsîpalîzm doktrîneke weha ye ku desttêwerdana şaredarîyan di aborîyê de diparêze

6 Evelina Dagnino, Brasil. Sociedad Civil, Esfera Publica Y Democratizacion En America Latina *[Brazîl. Civaka sîvîl, qada giştî û demokratîkbûn li Amerîkaya latînî]*, Fondo De Cultura Enconomica, Mexico, 2004

7 James Holston, *Insurgent Citizenship: Disjunctions of Democracy and Modernity in Brazil [Welatîya serîhildêr: Jihevbûyînên demokrasî û modernîteyê li Brezîlê]*, Princeton University Press, Princeton (New Jersey), 2007

8 Leonie Sandercock, *Towards Cosmopolis: planning for multicultural cities [Ber bi Kosmopolîsê ve: plankirina bajarên pirçandî]*, John Wiley, Londra, 1998

9 Mahmood Mamdani, *Citizen and Subject: Contemporary Africa and the Legacy of Late Colonialism [Welatî û bende: Afrîqaya hevdem û mîrasa kolonyalîzma dawîn]*, James Curey, Princeton University Press, 1996

10 Boavantura de Sousa Santos, *Reinventar la Democracia: Reinventar el Estado [Îcada nû ya demokrasîyê, îcada nû ya dewletê],* Clacso, Madrîd, 2005

11 *Berhema navbihurî*

Wergera ji fransî: Simko Destan

Di 1948ê de – tê bîra kê?– Amerîka (DYA) di venasîna Îsraîlê de dudilî mabû. Di 2011ê de Amerîka li Neteweyên Yekbûyî, bêdudilî bend û rizdeyan datîne pêşîya endametîya dewleta filistînî. Ev veto di eslê xwe de ji alîyê Yekîtîya Ewrûpayê ve hatîye teşwîqkirin, armanca wê ew e ku careke din biryar were "bipaşdexistin" û ji nû ve vegerin hevdîtinên dualî – ku tên wateya tekçûnê, ji ber paxavnekirina Îsraîlê bi hiqûqa navneteweyî.

PARADOKSA ZENON

# Dewleta Filistînê dîsa ma bo siberojê

ALAIN GRESH

Ji dema Antîkê û vir ve, paradoksa ji alîyê fîlozofê yewnan **Zénon d'Elée** ve hatiye formule kirin, ji bo zanyarên mentiqê hertim bûye serêşî: Gelo **Achille** yê "bi bayê re dibeziya" wê karibûya bigihîşta pêşbazekî ku sed metre di pêşîya wî de dest bi pêşbazîyê kiriba? **Zenon** bersiva ***na*** dide wê pirsê, ji ber ku, lehengê *Iliada*yê dê tu caran nikaribûya xwe bigihandayê: Ango, wî yê pêşî ferqa navbera xwe û reqîbê xwe daxista nîvî, dûre, nîvê nîvîyê, û bi vî awayî wê hetahetayê bidomiya, bêyî ku tu caran ferqa di navbera herduyan de daketa sifirê. (1)

Ev heman pêşbazîya mezin a bêdawî ye ku *Rêxistina Rizgarîya Filistînê* (RRF) ji bo sazkirina dewletekê ketiye nav. Piştî her qonaxa li pey xwe dihêle, jê re wiha xuya dike ku ew nêzî armancê bûye, lê belê, weke şerta herî dawî ya ji bo pêk bîne û tawîza ku pêwist e bide, mesafeyeke bi qasî nîvê rê hertim derdikeve pêşîya wê. Di sala 1999ê de, RRFê dîyar kir ku hema li jêdera (dawîya) pêvajoya demborî ya "xweserî"ya Şerîa Rojava û Xezzayê, ya ku li hevdîtinên Oslo yên 1993yê li ser hat peyivîn, ew ê jidayîkbûna dewleta Filistînê îlan bike. Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê û Yekîtîya Ewropayê dest bi zextan kirin û di berdêla taloqkirinekê de, Yekîtîya Ewropayê di civîna xwe ya bilind a Berlînê ya di adara 1999ê de "*amadebûna xwe ya ji bo nirxandina venasîna dewleteke filistînî*" piştrast kir.

Di adara 2002yê de Konseya Ewlekarîyê ya Rêxistina Neteweyên Yekbûyî (RNY) ê girêdana xwe ji bo vîzyona herêmeke ku di navê de du dewlet, Îsraîl û Filistîn wê li tenişt hev hebûna, dîyar dikir. Sala li pey hat, çaran, (Dewletên Yekbûyî, Yekîtîya Ewropayê, Rûsya, û RNY)ê "nexşeyeke rê" ya afirandina dewleta filistînî ji bo berîya dawîya sala 2005ê diweşand. Piştî cemidîneke hevdîtinan, mijdara 2007ê li *Annapolîs*ê, li yek ji van civînên wisa medyatîk a li ser "civata navneteweyî" xwedî bandoreke erênî bû û tê de Ewropa, Rûsya, Suriye, Misir, filistînî û îsraîlî li hev kom dibûn, serok **George W. Bush** bangek dikir: Li gor vê bangê di dawîya 2008ê de ew ê nihayet bigihîşta encamê. 23yê îlona 2010ê di gotara xwe ya li pêşberî civata giştî ya RNYê, serok **Barack Obama** jî hêvîya xwe ya ji bo ku bibîne Filistîn di îlona 2011ê de di nav Rêxistina Neteweyên Yekbûyî de cih bigire, dianî ziman. Piştî saleke din, wî bi xwe venasîneke wisa veto kir.

Ev bû çîroka dirêj a sozên bicihnehatî ya ku rêveberîya Filistînê neçar hişt ku rasterast serî li Neteweyên Yekbûyî bide û xwe nede ber hevdîtinên dualî yên "bêyî şertûmercên pêşîn", ango li çarçoveya kontekstekê ku tê de rûvîyê "azad" wê di nav pîna "azad" de li gor kêfa dilê xwe bilîze. Bi vê yekê re jî, rêveberîya Filistînê bi awayekî de fakto têkçûna stratejîya xwe ya berê, vedinasî, û qebûl dikir.

Di 1969ê de, li pey têkçûna ereb a hezîrana 1967ê (2), tevgerên çekdar ên fedaî hefsarê RRFê dixistin destê xwe û xwe ji rêveberîya kevin a ku bi bicihbûna li ser xeta rejîmên ereb bi ser neketibû, rizgar dikirin. Arastebûna nû ya RRFê li ser sê stûnan bû: Têkoşîna çekdarî ku hingê li devera ku weke cîhana-sêyem dihat bi nav kirin, rêbazeke ecibandî bû ku tê de, çawa ku **Che Guevara** digot pêwist bû *"yek, du, sê, zêdetir Vîyetnam bihatana afirandin"*; rizgarîya tevahîya Filistînê (û ji ber vê yekê jî hilweşîna avasazîyên sîyonîst ên Îsraîlê) û sazkirina dewleteke demokratîk a ku tê de misilman, cihû û xiristîyan wê bi hev re li kêleka hev bijîyana; serxwebûna biryara filistînî (bi taybetî jî beramberî rejîmên ereb).

Serkevtina sereke ya RRFê ew bû ku wê karî hemû filistînîyan li jêr ala xwe li hev kom bike –ji mihendizê li *Kuweytê* dixebite bigire heta bigihe gundîyê ji *Hebronê* û penaberê li kampa *Libnanê* ya *Bourc Al Barjneh*–, wê karî hevgirtina neteweyî xurt bike û daxwaza wan a ji bo serxwebûnê bîne ziman. Li hemberî vê yekê, têkçûna şerê çekdarî, ji alîyê girseyeke mezin a îsraîlîyan ve qebûlnekirina fikra utopyaya dewleta demokratîk û ji alîyê hevalbendên RRFê bixwe, bi taybetî jî yên "kampa sosyalîst" ve, qebûlnekirina fikra hilweşandina Îsraîlê, berê wê dide ser lêgerîna rêya ber bi qada dîplomatîk ve.

Rêveberîya filistînî berê jî di vê qadê de gelek serkevtin bi dest xistibûn: Wê ne bi tenê Filistîn li ser nexşeya siyasî bicih kiribû –qedera filistînîyan êdî nedihat daxistin ta radeya pirsgirêkeke besît a "penaberan", ew êdî di çarçoveya tayînkirina qedera gelekî de dihat nirxandin–, wê herwiha xwe "weke yekane nûnera gelê filistînî" bi welatên ereb dabû qebûl kirin û venasîn. Di 1974ê de, **Yasser Arafat** bi hewayekî coş û xuroş ê serkevtinê li New Yorkê di civata giştî ya RNYê de dihat pêşwazî kirin û di encamê de RRF bû endama çavdêr a Neteweyên Yekbûyî.

Lê belê ev pêşketin hertim rastî heman du astengan dihatin: Îsraîl û Dewletên Yekbûyî yên ku xwe nedidan ber guftûgokirina li gel "rêxistineke terorîst". Pêwistî wê hê bi gelek salan, bi çalakîyên bêdawî, û bi taybetî jî bi destpêkirina Întîfadaya keviran a kanûna 1987ê hebûya ji bo ku statu quo ji herkesî re xeter xuya bike û li Îsraîlê bi xwe jî, gelek kes ji bo lihevhatinekê piştgirîya xwe îfade bikin. Di mijdara 1988ê de, Konseya Neteweyî ya filistînî jidayîkbûyîna dewleta filistînî îlan dikir û bi plana parvekirina Filistînê razî dibû ya ku di 29ê mijdara 1947ê de bi dengdayîna ji alîyê Civata Giştî ya Neteweyên Yekbûyî ve hatibû qebûl kirin.

**Yasser Arafat** ev destek û piştgirî li pêşberî Civata Giştî ya Neteweyên Yekbûyî ya li Cenevreyê di 13ê kanûna 1988ê de piştrast dikirin. Lê belê Washington hê jî tatmîn nedibû. Piştî heftîyekê, lîderê filistînî danezanek xwend –danezeneke ku ji alîyê hukûmeta amerîkî ve hatibû amade kirin! (3)– û qebûl kir ku ew dev ji terorîzmê berdide, biryara 242 ya Konseya Ewlekarîyê ya RNYê qebûl dikir û Îsraîl nas dikir. (4) Di 13ê îlona 1993ê de, li eywana Qesra Spî, li bin çavê baldar ê serok **William Clinton**, bi lihevhatinên Osloyê û bi desthevgirtina **Arafat** û **Itzhak Rabin** re weke ku rûpelek dihat girtin û yekî nû vedibû.



DARA ARAM: **Diyarîya xwezayê 07**, boyaxa akrîl li ser tûwalê 48 x 48 cm

### Guherandina stratejîyê

Hijdeh sal bi şûn de derdikeve holê ku rêya ku **Arafat** û hogirên wî pê daketibûn, rêyeke şaş a bêbihurk e. Ti serwerîya filistînî li Şerîaya Rojava û Qudusê û heta li herêma **A** jî pêk nehat (5), êriş û operasyonên îsraîlî zêde dibûn: Kî dibe bila bibe her welatîyê Filistînê dikare li wir were binçav kirin û girtin. Hejmara kolonîyên li Şerîaya Rojava, ku di 1993yê de bi 100 hezaran bûn, îro hindik maye bigihîje 300 hezaran û yên li Qudusê jî ji 150 hezaran hilkişîyan 200 hezaran. Aborî di rewşeke kambax de ye û raporên li ser pêşveçûnê jixwe bi bîr jî naxin ku hilberîna neteweyî ya brut a serê her mirovî niha daketiye bin asta sala 2000ê û bi tenê teweke teng a civakê ji vê rewşê sûdê werdigire. Erê rêveberî li gel dagirkerên îsraîlî ji bo têkoşîna li dijî "terorîzm"ê hevkarîyê dike, lê belê heman rêveberîyê herwiha deshilateke otorîter a dişibe desthilatîya li cem cîranên ereb bicihbûyî ferz kir.

Berîya ku "civata navneteweyî" a piştgirî dida **Mahmoud Abbasê** ku pir bi rêkûpêkî karî hevdîtinan bidomîne, wan ji serkeftinê bêpar bihêle, dengdarên filistînî ji bo cezakirina têkçûna Rêveberîya Filistînê di çileya 2006ê de dengên xwe dan ***Hamas***ê. Lê belê, eynî mîna RRFyê, Hamas jî stratejîyeke bawerîbexş pêşkêşî filistînîyan nake. Ew têkoşîna çekdarî dertîne pêş, lê belê pirêzeya wê ya di vî warî de, dîsa eynî weke ya rêxistinên fedayî yên piştî 1967ê, têra xwe bêber e. Û ji du salan û vir ve, wê agirbesteke bi Îsraîlê re li ser hemû rêxistinên filistînî yên Xezzayê ferz kir. Herçi otorîtarîzm e, ew di wî warî de jî bi ya Abbas re di nav pêşbazîyê de ye.

Ji ber pêşbazîya ji bo bidestxistina şaxên desthilatê ya ***El Fetîh*** û ***Hamas***ê, vê alozîyê dikaribû hê pir dewam bikira. Lê belê serhildana cîhana ereb rewş serûbinî hev kir. Di serî de hilweşîna rejîmên tûnisî û misirî, dûre jî helwêsta zexim a Tirkiyeyê li himberî Îsraîlê, Washington û Tel-Avîv lawaz kirin. Vê yekê Abbas jî ji hevalbendekî girîng ê weke **Husnî Mûbarek** bêpar hişt – di heman demê de ji ber serhildana li Sûriyê, Hamasê derbek xwar. Hêvibirîna ji serok **Barack Obama**yê nikare zextê li hevalbendê xwe **Benyamîn Netenyahû** (serokwezîrê îsarîlî) bike, zêde dibe. Salek berîya hilbijartina serokatîyê ku encama wê ji qasî dihat texmîn kirin şîlotir xuya dike, dilê Obama bi rastî jî dixwaze zextê lê bike?

Li ser dika îsraîlî û tevî xwepêşandanên dijberî pergala neolîberal, piranîya gel yê ji ber întîfadaya duyem çavtirsandî bûye û ketiye bin tesîra propagandaya rêveberên xwe, destek da hukûmeta dijberî lihevhatinê û Netenyahû, nisbet bi wezîrê xwe yê karûbarên derve **Avigdor Liberman**, weke fîgurekî pir nerm xuya dike. Xatûn **Shelly Yachimovich**, parlementer û namzeda xwedî giranî ya rêveberîya Partîya Karker berî demeke nêz dîyar dikir ku projeya kolonîzasyonê *"ne gunehek ne jî sûcek e"* lewra proje ji alîyê Partîya Karker bi xwe ve hatibû dest pê kirin (ku ev yek rast e) û li ser *"lihevkirineke tam"* pêk hatibû. Dîrektorê berê yê Kongreya Cihû ya Amerîkî **Henrî Siegman** ev tesbît wiha şirove dikirin: *"Divê em guh nedin vê palpişta ecêb a ku dixwaze bi lihevhatina di navbera dizan de dizîyê rewa bike. Eger îro li Îsraîlê Partîya Karker xwedî van helwestan be, mirov çawa bawer bike ku wê bergeheke aştîyê ya herî piçûk jî peyde bibe*"? (6)

Û îsraîlîyan wê çima xwe nedabûya ber statuquoyê? Pergal li Şerîaya Rojava, bi taybetî bi xêra hevkarîya filistînîyan bûye serdest. Ji alîyê civata navneteweyî ve tecrîdkirina Îsraîlê wê encamên girîng bi xwe re neyne, bi taybetî jî heta ku desteka Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê û ya Yekîtîya Ewropî ji bo Îsraîlê dewam bike û îmtîyazên girîng di warê aborî, bazirganî û siyasî ji vê dewletê re bên pêşkêş kirin – Israîl berî demeke nêz, weke endama çavdêr a Navenda Lêkolînê û Lêgerînên Nukleer (CERN)ê hat qebûl kirin û ev yek bi herhalî tê wateya destekdayîna bernama wê ya nukleer a eskerî. Heke mueyîdeyên navneteweyî û tecrîdeke berfirehtir, seferberîyeke xurt a xelkê a ji hundir ve nebûna û bawerî bi tenê bi niyeta baş a civata spî hatiba anîn, Afrîkaya Başûr wê ti caran nikaribûya xwe ji apartheidê rizgar bikira.

Nejîrîya RRFê ya bi tenê bi muzakereyan a bidestxistina tiştekî û serûbinbûna cîhana ereb bûn sedem ku **Abbas** serî li Neteweyên Yekbûyî bide. Lê belê pîvana wateya enternasyonalîzekirineke wisa hê jî pir zehmet e. Baş e, ev yek di stratejîyê de guherînekê pêk tîne an na? An jî li vir gelo tiştê tê peyivîn bi tenê di şertûmercên hinekî başkirî de jinûve destpêkirina hevdîtinan e?

Gelê filistînî li himberî inisîyatîfên rêveberîyeke pir neecibandî têra xwe gumanker e, ji ber ku ev dizane ku encama dengdanê çi dibe bila bibe, roja din ewê dîsa bikeve bin nîrê dagîrkerîyê, herçendî tehdîdên tolhildanê yên îsraîlî an jî amerîkî zêde ne cihê bawerîyê bin jî: Wan dê tenha muxeteba xwe yê filistînî lawaz bikira û hevkarîya ji bo ewlekarîyê ku bi her halî bi kêrî Tel-Avîvê tê, bixista nav xeterê.

Li miqabilê vê yekê, bikaranîna mafê vetoyê ji alîyê Washingtonê ve wê zirarê bide giranîya li herêmê ya Dewletên Yekbûyî –me bihîst ku sefîrê berê yê Siûdîyê li Washingtonê, mîr Turki Al-Fayçal dianî ziman ku vetoyeke wisa wê lezê bide bidawîbûna têkilîyên dîrokî yên navbera Riyad û Washingtonê ( herçendî ev daxuyanî hinek nepixandî xuya bike jî). (7)

Statuya çavdêr-dewlet, eynî mîna ya Swîsreya 2002yê, wê rê vekira ku Filistîn bibûya endama Dadgeha Navneteweyî ya Dadê (DND) û endama Dadgeha Navneteweyî ya Ceza (DNC). (8) Dibe ku biryarên DNDê encamên zêde bi tesîr jê dernekevin, (wê di 2004ê de lêkirina dîwarê ji alîyê Îsraîlê ve mehkûm kir, lê ti encam jê derneket), DNC derfetan dide ji bo ku der barê berpirsîyar, sûbay û avakarên kolonîyan de (ku hin ji wan xwedî pasaportên fransî û ewropî ne) ji ber "sûcên şer" lêpirsîn dest pê bikin –û di ser de jî pirsgirêka kolonîzasyonê bixe rojevê, ku li gor statuyên Dadgeha Navneteweyî ya Ceza, tiştekî wisa bi xwe jî sûcekî şer e. (9)

Hilperikîneke wisa ferz dike ku çarçoveya teng a lihevhatinên Osloyê bê şikandin û bi xwespartina şoreşên ereb û seferberîya filistînîyan, stratejîyeke ku destûrê bide sazkirina têkilîya hêzên cihêreng were şopandin. Gelo rêveberîya filistînî wê vê riyê bineqîne?

1 Rapora Arîstote, *Physique,* pirtûka VI

2 Êrişa Îsraîlê li dijî Misir, Surî, û Urdunê bi dagîrkirina Sîna, Şerîaya Rojava, Xezze, Qudisa Rojhilat û ya Golanê bi dawî hat

3 Razînebûyî ji Danezana Cenevreyê, Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê xwestibû ku di dema xwendina teksta ku wan bi xwe amade kiribû, ew wê yekê dest nîşan bike. Li himberî vê yekê, Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê dîyalogeke vekirî ya li gel RFê qebûl kir

4 Di mijdara 1967ê de piştî şer ket dengdanê, ew bidestxistina axan bi rêya hêzê şermezar dike û bi bikaranîna vegotina "penaberan " bi awayekî nerasterast îşaret bi filistînîyan dike

5 Sandy Tolan bixwînin, "Ramallah, si loin de la Palestine (Ramallah, ewçend dûr ji Filistînê)", *Le Monde diplomatique*, nîsan 2010

6 "September Madness (Dînîtîya Îlonê)", *Foreign Policy*, 15 îlon 2011

7 "Veto a State, Lose an Ally (Dewletekê veto bike, hevalbendekî ji dest bide)", *The New York Times,* 11 îlon 2011

8 Pirsa endamtîya Filistînê di navbera huqûqzanan de bû sedemê guftûgoyeke germ. Ji bo kurteyeke guftugoyê, mirov dikare çavekî li guftûgoya ji alîyê Instituya Dohayê ve organîzekirî bigerîne, "Palestinian Membership at the United Nations: All Outcomes are Possible (Endametîya Neteweyên Yekbûyî ya Filistînê: Encamp hemû mumkin in)", 11 ilon 2011, http://english.dohainstitute.org/Home/

9 Ev yek, li gor gelek rêveberên filistînî diviyabû aştîyane be, lê belê heqîqet nîşan dide ku artêşa îsraîlî bi darê zorê yê ewçend dijwar xwepêşandanên aştîyane dişkîne. Rapora B'tselem bixwînin, *Show of Force: Israeli Military Conduct in Weekly Demonstrations in a-Nabi Saleh (Nîşandana Hêzê: Birêveberîya Eskerên Îsraîlê di Xwepêşandanên Heftane yên en-Nebî Salih de),* 12 îlon 2011, http://www.btselem.org/

Wergera ji fransî: Baran Nebar

Bi sûdwergirtina ji statuya kehanetê, serfkirina gotinên hevnegirtî: ev e îmtiyaza "bazaran". teleskopa îfşaker, ev in yên di heman demê de ji hilweşîna aboriya yewnan a bi tedbîrên zêde bêhn lê hatiye çikandin û ji bêserûberî û sistiya aboriya îtalî gazinan dikin. Gelo mirov nikare li şûna vê rêzika dûrî aqil "rêzikeke zêrîn" a din xeyal bike?

## Krîza lîberalîzma ku coşê dide lîberalan

# Êlegê jiyanê bo Yewnanistanê, gopal bo Ewroyê

LAURENT CORDONNIER *

Em ferz bikin ku îro "rizgarkirina" Yewnanistanê pir acîl e. Heke em bala xwe bidin tevgera ramanên ku dîyar e hîn jî serdest in, mirov dê bi hêsanî bibîne ku tê xwestin rê li ber her cûre deynnedana dewleta *helenî* bê girtin û welat di herêma euroyê de bê hiştin. Ne tenê ji ber ku dê ji bo yewnanîyan felaket be ku îflas bikin û negihên armancên xwe, lê her wiha ji ber ku encam dê ji bo Ewropaya mayî jî bibe hezîmeteke pir mezin. Bi vî awayî, rizgarkirina Yewnanistanê dê ji bo yewnanîyan û ewropîyan tevde jî bi xêr be. Em li vê yekê kêlîyekê mikur werin û pirsa li jêr ji xwe bikin: Mercên îhtimaleke wiha dê çi bin?

Ji bo ku mesele hîn baştir bê fam kirin, em ferz bikin ku Atîna karibe ji niha heta sê çar salên din rewşa xwe ya darayî ya giştî, bi awayekî baştir bike ku deynê wê mistewaya ji % 200ê Hatinîya Nesafî ya Salane ya Navxweyî (HNSN) derbas neke. Hîn jî pirs çareser nebûye: Deyn halîhazir gîhaştiye dora ji % 160ê HNSNyê û lihevderneketina budceyê ya di maweya navbera çile û tebaxa 2011ê de 18 mîlyar euro (dike puanê HNSN) ye. Ev jî hîn dûrî jiholêrabûnê ye û her zêde dibe, bi îhtimaleke mezin ji ber kemberşidandina tirsnak a li ser xelkê hatiye ferz kirin, paşdemayîna aborî hîn zêdetir dibe; çalakîya aborî di 2011ê de ji % 5 kêm bû. Qebûlkirina kêmkirina ji % 21ê rêjeya deynên xwe yê ku divîya bistenda, "’bidilê xwe’ di bin darê zorê de", li gor lihevkirina 21ê tîrmehê ji alî bankeyên ewropî ve, bikêmanî dikare alîkarîya qebûlkirina sînorê ji % 200ê bike. Mesele wê gavê dîsa tê ser pirsa, bi mercên diravî yên ku bi tevayî gelê yewnanî nefetisînin (em li vir behsa lê vegerandina bextewerîya jîyana wî nakin...), kî dikare demeke dirêj barê deynekî wiha hilgire?

### Di vê rewşê de, ya herî xirab wê rû bida

Beşê yekê yê bersiva vê pirsê ew e ku bi nebûna her cûre tedbîrên sext, bi tenê hîn jî hêza giştî ya ewropî dê karibe barê vî deynê giran hilgire. Weke ku buroyeke diravî jî bi awayekî vekirî dîyar dike "*em xeyal nakin ku veberhêner bên tiştan bikirin*". (1) Ne bi tenê ku, hemî zêdebûna deynê yewnanî êdî ji xeynî deyndayên giştî pê ve nema dikare bê fînanse kirin, lê biqasî senedên stokkirî divê bên nû kirin, sektora taybet dê her kubarîyê bike ku derfeta îstiqrara diravî bide *Fona Ewropî* (FESF) û *Fona Diravî ya Navneteweyî* (FMI) berî her kesî wê bi kar bîne. Di vê navberê de, banke û sazîyên din ên diravî heta dê gelekî kêfxweş bibin ku *Bankeya Navendî ya Ewropayê* (BCE), tevî van hemî pêşîlêgirtinên doktrînal ên di derbareyê deynê dewletê de jî, wî bigire ser xwe, ji bo ku zûbizû barê wan sivik bike. Wê gavê di maweya çend salan de, sektora giştî dê bikaribe bitemamî deynê yewnanî bigre ser xwe.

### Gelo gelê yewnanî dê rêjeya faîza pir bilind qebûl bike?

Îcar dimîne ku mirov bizanibe rêjeya faîzê ya ji alî civata yewnanî ve, weke tevahîya civatê ya mayî, "bê qebûlkirin" dê çiqas be. Heta ku neke ku şoreşeke gel, yan desteserkirina desthilatê ji alîyê dîktatorîyeke xwînrêj ve, yan jî wendabûna şaristanîyeta yewnanî bide der, mirov dikare bêje ku neteweyeke pêşketî dê nikaribe barê jêgirtineke salane ya di ser ji % 6ê dewlemendîya xwe ya hilberandî re –ku ew jî jixwe, ji bo Yewnanistanê beramberî, nîvîyê mûçeyên karmendên dewletê yeheta bi hetayê hilgire. (2) Ji bo liberhevgirtinê, barê salane yê deynê dewleta fransî yê niha kêm zêde li dora ji % 2.3ê HNSN a Fransayê ye. Em ferz bikin ku sabîtkirineke deynê giştî yê yewnanî ji % 200ê HNSN ya neteweyî mimkun be, wê gavê divê rêjeya faîzê ya rasteqîn [rejeya faîzê ya tevî hesabkirina enflasyonê] ku ji bo deynê welatî tê xwestin jî bi % 3yê bê sînordar kirin ku mirov bikaribe li bin ji % 6ê HNSN bimîne.

Di encamê de, heke dewletên ewropî bikaribin bi rastî jî ji bazaran bi faîza ji % 3 (an hindiktir) pere deyn bikin, ew dê karibin deynê yewnanî jî fînanse bikin û ev dê li ser wan bi qurûşekî jî nebe mal. Ji ber ku, di nîvê meha îlonê de, FESFê karibû ji bo fînansekirina plana alîkarîyê ya Portekîzê 5 milyar euroyan (li ser deh salan), bi rêjeyeke faîzê ya nomînal [rejeya faîzê ya bêyî hesabkirina enflasyonê] ji % 2.75ê, zêde bike. Bi ferzkirina ku rêjeya enflasyonê ya ji alî deyndêran ve berê hatiye pêşbînî kirin, li dora ji % 2yê be, ku ev jî birastî dê rêjeyeke faîzê ya rasteqîn a ji % 0.75ê bi xwe re bîne. Wê gavê dê fînansekirina berdewam a tevayîya deynê yewnanî, di van mercên pir di binya asta fetisandinê re be ku me li jor bahs kiribû.

### Fona Ewropî dikare 440 mîlyaran deynê Yewnanistanê bigre ser xwe û ...

Ev senaryoya acîl dîsa jî dê sê mercên din li ser me ferz bike: Ku ev cûre plan jî bi awayekî vekirî fikra, ku birêveberên ewropî di vî warî de ji berê de li hev kirine û divê FESF xwedî kapasîteya deynkirineke hîn pir di ser 440 milyarên niha re be. Wezîrê diravî yê amerîkî **Timothy Geithner** jî, ev yek baş dîtibû û dema zîrweya *Wroclaw* hatibû, ji birêveberên ewropî re jî rave ke. Ne ji ber ku ji Parzemîna Kevnar pir hez dikir, lê belê, hîn bêtir ji ber ku ji bankeyan hez dikir. **Geithner** lê nedifikirî ku bankeyan li bende rehma demeke dirêj a nedana deynê Yûnanistanê bihêle. Ji ber ku bi 440 milyar euroyan, FESF bi tevayî dikare deynê vî welatî bigre ser xwe. Lê, divê berî plana Portekîz û Îrlandayê fînanse bike û bi vî awayî nîşan bide ku derfeta wê ya rihetkirina Îtalya û Spanyayê (bi tenê rihet kirin...) jî heye. Wê gavê heta bi kîjan mîqdarê mafê midaxeleya FESFê heye? Hezar mîlyar euro ji bo vê yekê reqemeke maqûl e.

Lê maqûl tenê ku dema di wexta xwe de bibe ... maqûl, bi plankirinekê ... bîr û bawerîya tevgerîyana bi biryardarî ... bê tawîz dikare tesîra xwe nîşan bide! Hemî dana "pêş û paş" a nû ya ji alî birêveberên ewropî ve, heta ku li ser rêyeke rast jî be, dê bi awayekî berevajî weke ji nû ve şerpezebûna li hemberî pêşketina bûyerên nayên kontrol kirin, bê dîtin. Hingê jî, felaketa herî xerab misoger e.

Îcar ev yek dê bixwebawernebûna bazaran kûrtir bike. Heke carekê BCE bernameya xwe ya ji nû ve kirîne rawestîne, rêjeya faîzê dê dest pê bike zorê bide deynê îtalî û spanî. Wê gavê, carekê bi henekan jî li pîpîzkê xistin, dê têr bike ku her kesê li trîbunan bawer bike ku penaltî (derecekirineke li bayê bezê ya notên di derbarê deynên dewletê de ji alî ajansên notdanê ve pêk tê) çêbû, ji bo ku kehaneta xwebixwe-pêkhêner ji nû ve bixin tevgerê. Welatên di bin vê êrişê de ne, êdî dê qet newêribin senedên deynên xwe yên dema wan hatiye, nû bikin, ji ber sedema ku dê mecbûr bibin bi rêjeyeke faîzê ya fahş pere deyn bikin. Di encamê de, dê deynê wan, ne bi tenê ji ber mîqdara wî, lê ji ber firîyana rêjeya faîzê neyê qebûl kirin. Divê em li vir bi bîr bixin ku deynekî rêjeya wî ya faîzê tunebe li ser mirov bi tiştekî nabe mal! Maneya xwe zêdebûna rêjeya faîzê ye, ku dibe sedema qebûlnekirina deynekî (bi maneya barê dana faîzê grev û ewinde jî budceya dewletê). Ev jî di encamê de fikra ku êdî deyn gîhaştiye mistewa ku nayê qebûl kirin, dide yên bideyn didin, ev jî wiha dike ku ew prîma rîskê zêde bikin û ji dewleta deynker bixwazin... ev yek rêjeya faîza ku zêde bibe, û bawerîya bi rîska tune ya paşerojê zêdetir dike.

### Bihabûna deynan dê tesîra xwe li ser Almanya, Fransa û Holandayê jî bike

Di rewşeke wiha ya şerpeze de, FESFyeke ku mirov wê mecbûr bike da ku têra xwe bibe xwedî navgîn, dê derfetê nede ku mirov ji bazaran di mercên biavantaj yên ku îro derdixin pêşîya me de deyn bike. Bihabûna deynkirinan ji bo FESFyê dê tesîra xwe li hemî deynên dewletê yên herêma euroyê jî bike, ji ber ku giranîya misogerîyên ji bo van deynan tên xwestin dê barê welatên weke Almanya, Holanda û Fransa jî girantir bike, lewra ev welat hîn neketine nav koma welatên alîkarîya wan hatiye kirin. Plana rizgarkirinê ya ewropî dê wê gavê bibe weke sipartina hev a du îskeleyên rizîyayî ku mirov hewl dide wan bi xêra westana wan li ser piya bigire. (3)

Îcar eurobond (seneda deynan a euro yan dolaran, n.w), ji ber heman sedemê, dê nebin çareserîyeke pir baş. Li ser kaxezê, formula ku derfeta parvekirina deynên dewletê dide, ji alî hosteyên xelat-cezayan ve li ser bingeha rêjeya faîzê pêk hatiye, narîn e û ji alî siyasî ve jî zîrekî ye. (4) Ewropaya aborî ji kaosa deynan di nav kozmogonîyeke zarokî de



YVES MARCHAND û ROMAIN MEFFRE: **Saeta helandî**, Detroi, 2008

ku federalîzma budceyî pêk anîye, derketiye holê, ev efsaneyeke diltezîn e: Ji bo her kesî kîsikên girêdayî yên şekirokan e! Lê ev jî dê weke heman îskeleyên rizîyayî be. Ji ber ku tevlîhevkirina hemî deynên dewletan di cîyekî de dê bi awayekî berevajî bîhna şerabeke qusîyayî bide, bêtir krêdîyên qedîyayî, efarekirî, çêkirî û menqul bîne bîra mirov... maliştineke bi mebesta tevlîhevkirina tovên baş û yên pûç e.

Êdî, wê gavê, dê weke çareyeke bitenê, qet acîliyeta zordana bankeyên ewropî ji bo ku hemî deynên dewletên ewropî yên ketine ber êrişê bigrin ser xwe, nemîne. Belkî di encamê de tiştê ku birêveberên ewropî lê digerin jî ev be. Weke partîzanên cure lîberalîzmeke troçkîst, belkî hate bîra wan da bifikirin ku heta dawîya krîzê neyê, mirov dê nikaribe çareserîyên baş peyda bike. Kî dikare wan neheq bike?

Gava acîliyet ji holê rabû û nema, çareserîyên baş ên din dikarin bi aqilekî selîm bên dîtin. Weke niha **Michel Aglietta** jî pêşnîyaz dike, berîya her tiştî (bi awayekî misoger) divê bacek bikeve ser peymanên dravî, her wiha bacek jî li ser petrolê, di çarçoveya tevahîya Ewropayê de bê danîn. (5) Dawîyê dev ji armanca enflasyona kujer a ji % 2yê bê berdan, da ku karibe derkeve heta ji % 4 an 5ê. Tiştê herî zor dê giştîkirina enflasyonê be. Bi rastî, weke **Robert Boyer** jî dinivîse: *"Hêvîya bitenê, di vî dîmenî de, dê ew be ku mirov li ser kêmbûna keda destî li Çînê raweste, lê her wiha jî li ser nelihevkirinên civatî, ku li Çînê derfeta enflasyonê dide. Ev yek dê vegera enflasyonê ya ji ber mûçeyan li Çînê pêk hatibû, tahrîk bike, ku ew jî dê giranîya deynan li cîhanê hemûyê kêm bike. Ew ê bibe senaryoyeke muhteşem".* (6) Ji bo alîkarîyê bike, belbî divê patronên ewropî (dîsa jî) piçekî alîkarîya hevdîtinên li ser mûçeyan bikin...

Û di dawîyê de, qaîdeyeke zêrîn a di asta Ewropayê de bidin qebûl kirin. Lê bi rastî jî sert, cidî û bi biryarnameyên cîbicîkirinê! Qedexe dikare ji bo hemî dewletan bê danîn ku ji % 3yê lihevnekirina budceyê derbas bikin, bi armanca deynekî giştî yê di binya ji % 30ê HNSNê re. Heke ev yan ew sînorê ku hêmaneke wiha rast û mêrane ye, bê derbas kirin: Avakirina sîstemeke jêgirtina xwe bixwe ya beşekî cihê yê baca li ser hatinîyê (ji % 90ê hatinîya net a di ser 35 000 euroyan re, serê yekîneyeke mesrefê û salane), bi awayê ku mirov nelihevkirina budceyê bîne nav xêzên rasteka zêrîn.

Em ji demokrasîyeke civatî ya ewropî naxwazin, ku ji nû ve bibe navenda ramanên baş, rêjeyeke hîn maqûltir a ji % 85ê sabît bike bes e.

* Aborînas, nivîskarê *L’Economie des Toambapiks / Aborîya Toambapiksan* Raisons d’agir, Paris, 2010.

1 Les échos, 13ê îlonê

2 Bi ji % 12yê HNSN ya ji dana mûçeyên karmendên dewletê re veqetyandiye, Yewnanistan bi piranîya welatên OCDEyê (ji 10 heta 12) re li ser heman xetê ye. Bide li ber "Tableaux de bord de l’emploi public (Tabloya plankirina karê giştî)", çileya pêşîn a 2010ê, Konseya Şiroveyên Stratejîk, Paris

3 "La rigueur qu’il nous faut / Sertîya ku ji me re pêwîst e", Le Monde Diplomatique, îlona 2010ê

4 Li lêkolîna Natixis binêrin, di Les Echos de belav bûye, 1ê îlonê yê 2010ê

5 Berhema li jor

6 "La crise est plus grave que celle de 1929 / Krîz ji ya 1929ê girantir e", Hevpeyvîn bi Ludovic Lamant re, Mediapart, 21ê tebaxê yê 2011yê

Wergera ji fransî: Yaqûb Karademir

## Neçarîya bersiveke neteweyî li hember globalbûnê

# Rizgarbûna ji krîzê: Em ê ji ku dest pê bikin?

Jean-Marie Harribey *

Di demeke weha de ku Yekîtîya Ewropayê ji ber krîza deynî li ber teqînê ye, Dewletên Yekbûyî ji bo rêlibergirtina daketina rewşa aborî a muhtemel bifilitin, di nav hewldanan de ne û Asya bi tehlûkeya pêre rû bi rû ye ku bîhna wê biçike, kesên ku pesnê globalbûnê didin her ku diçe hindik dibin. Lê belê, fikira "jiglobalbûnekê" cihê nerazîbûnên esas e, yên ku metna li jêr bi hûrgilî dide xuyan.

Lawazbûna civakan a ji ber êrîşên dinyaya fînansê, gihîşt sînorekî: Tevnên aborîyê dilerizin û perdeya îdeolojîk a ku temsîlên wê xist bin dûmanê çirîya. Pesndarên globalbûnê weha mecbûr man ku dengê pesnên xwe yên li ser serkeftina pîyaseyan kêm bikin û dijtez bûye cihê minaqeşeyan: Ji globalbûnê filitîn. Orîjînalîya vê minaqeşeyê jî ev e ku reqîbên wê ne parêzvanên ortodoksbûnê û "dijber" in, lê belê ew di nav refên aborînas û van siyasetmedaran de derbas dibe ku, bi taybetî di dema têkoşîna li hemberî projeya peymana destûrî ya ewropî de, li dij dîktatorîya pîyaseyên fînansî derketibûn. Ev çend meh in ku qûncikên rojnameyan, nivîsar û pirtûkan mijarên proteksîyonîzm, derketina ji euroyê û jiglobalbûnê, xistin meydanê. (1) Nîqaşên herî dûvdirêj li dor çawanîya krîza kapîtalîzmê, çarçoveyeke pêwîst a qaîdeyan û pirsa hikumdarîya demokratîk tên gerandin.

Ji destpêka salên 1980yê ve, tevnên kapîtalê weha hatin saz kirin ku berhemdarîyeke maksîmum a razandinên fînansî -"afirandina nirxê ya ji bo hîssedar"- çêkin, ligel organîzekirina sîstematîk a bênirxkirina kedkaran. Jixwe, ev yek rê dide berhemdarîya behskirî; lewre ku azadîya çûnûhatina kapîtalê rê li ber reqabeta sîstemên civakî û bacî vekir. Eufemîzma "globalbûnê" jî bi vê yekê îşaret dike: Ji nû ve belavkirina kapîtalîzmê li tevahîya dinyayê, da ku ji krîza rêjeya qezencê ya werçerxa dehsalên 1960-1970yê re çareyek were dîtin, serkeftina sinifên serdest ligel milkên ji meaşan girîngtir û ferzkirina tevgerîyana li gor bazaran li ser sazûmanên verastkirinê.

Du dehsalan têrî herifandina vê avahîsazîyê kir: Di nîvê dehsala 2000ê de, bilindbûna rêjeya qezencê li Dewletên Yekbûyî disekine û kredîya ji feqîran re veqetandî ji bo temamkirina kêmanîyên meaşî êdî têrî pişaftina pirberhemdarîya endustrîyel nake. Şok bi qasî çûnûhatina sermayeyan lezgîn belav bû.

Krîz liserhevkirina zehmetîyên neteweyî (yûnanî, îrlandî, portekîzî, spanyolî ûym.) yên ji ber pirsgirêkên taybet û navxweyî yên her welatî, bi awayekî tesadûf di heman demê de destpêkirî nîne. Ji destpêkê ve, ev krîza kapîtalîzmekê ye ku li tevahîya cîhanê "gihaştî", ligel mantiqekî afirandina nirxê yê ji bo hîssedar ê ku heta asta xwe ya herî bilind hat birin, lewre ku diviya hertişt bibûya mal, ji çêkirina milk û xizmetên bingehîn heta tenduristîyê, perwerde, çand, serkanîyên xwezayî û tevahîya gîyandarîyê.

Globalbûn bi pevguherandina azad a mal û milkan, yanî bi çûnûhatina wan bi sînor nabe. Fînansa derê axê aniha bi qanûna nirxê, yanî pêwîstîyeke dualî ya bêyî hev nabe re, rû bi rû dimîne: Li alîyekî, dîsa nirxdana xebatê ku heta hetayê tade nikare lê bê kirin; li alîyê din, pêkanîna vê nirxdana nû li ser bingeheke maddî ya kêm. (2) Li pişt krîza fînansî, zêde hilberandina kapîtalîst û neçarîya modeleke pêşketinê hene.

Argumaneke sereke a parêzvanên çepgir ên dijglobalîyê ew e ku xirakirina îstîhdamê û ji pîşesazîbûnê derxistina welatên zengîn dixe stûyê globalbûnê. **Jacques Sapir** weha texmîn dike ku *"heta nîvê salên 1990ê, qezencên berhemdarîyê yên welatên di pêşketinê de têrî guherandina dengeya hêzan a ligel welatên serdest nedikir. Lê belê, ji nîvê salên 1990ê û vir de, qezencên berhemdarîyê yên manedar li welatên weke Çînê an welatên Ewropaya rojhilat tên dîtin. Ev jî dibe sedem ku aktîvîteyên teva welatên endustryalbûyî biterikînin"*. (3) Lê belê, berevajîbûna dengeya hêzan li nav sinifa serdest û karkerên welatên endustryalbûyî berîya gavavêtina Çînê bi panzdeh salan tê.

Heke em bi tenê li mînaka fransî binihêrin, xirabbûna para meaşan a di nirxa lêzêdebûyî de (nêzîkî pênc puanên nirxa lêzêdebûyî ya brût a fîrmayên nefînansî li gor 1973ê û nêzî du qatê vê hejmarê li gor 1982ê) (4) û firîna bêkarîyê di dehsala 1980yê de çêdibin. Sewiyeyên wê demê gihaştî (pir nizm ji bo para meaşan û pir bilind ji bo bêkarîyê) dê piştre zêde neyên guherandin, ji derveyî kurte-serdema di navbera 1997 û 2001ê de. Em weha dikarin bi rastî bibêjin ku reqabeta hêzên xebatê ya di salên bihurî de zêdebûyî, pozîsyonên maldaran bi dest xistibûn, xurt kirin; lê belê em nikarin welatên di pêşketinê de weke berpirsîyarên sereke yên xirabbûna meaşan a di welatên kapîtalîst ên pêşketî de bibînin.

Dawîyê, şideta sinifan a nûliberalîzmê li welatên zengîn weha çêdibe: Parvebûna kapîtal/xebat bi xatirê kapîtalê tê kirin û belavbûna navxweyî ya tevahîya meaşan diguhere (meaşên bilind pir pêş dikevin, nemaze ji ber ku elemanên mibadeleya kapîtalê, weke stok opsîyon, tê de hene). Ev alîyê duyem hem têkildarê dewsa civakî ya kadroyên bilind a şirketan ji ber qabiliyetên xwe yên teknîkî digrin, hem têkildarê dampînga civakî ya li derve ye, ya ku karkerên dereceyên binî jê re dibin qurban.

Lewre jî, ihtiyateke teorîk pêwîst e da ku pevçûneke sinifan veneguhere pevçûneke neteweyan; dîsa jî, **Lordon** bi tirs e ku ev ihtiyat "dê bi kêr neyê" ji ber ku, li gor wî, "*strukturên globalbûna aborî* [mûçegirên çînî û mûçegirên fransî] *bi awayekî objektîv dixin nav têkilîyeke dijberîya dualî- û înkarên vê yekê dê bê encam bimînin*". (5) Ji xwe, çareya proteksîyonîst dê serdestîyeke dijberîya neteweyan li ser dijberîya sinifan saz bikira. Lê çawanîya sîstemîk a krîza kapîtalîst a dinyayî bi têkilîya civakî ya esas a kapîtalîzmê îşaret dike û li ser îmkana xelkên cihê ya jêderketina bi rêyeke neteweyî gumanan çêdike.

Ji bilî çend istîsnayan (wek mînak Ekvador li ser pirsa deynî), peywira dewletan ev e ku buhayê krîzê bi xelkê bidin dan, ev jixwe armanca bingehîn e ku sinifên serdest dike yek. Hikumetek nîne ku bixwaze an karibe rîska liserxwegirtina encamên nedana deynên neteweyî bigire, lewre ku bi berdana xeleka yekem ihtimala belavbûnê çêdibe. Hemû weha aborîyên xwe li rawestîyanê mehkûm dikin. Wekî din, globalbûn bi tenê bazirganî û fînansî nîne, ew herweha berhemdarî ye, heta wê radeyê ku şirketên mezin ên pirneteweyî zêde bi rêçûyînên aborî yên neteweyî mijûl nabin. (6) Ango pirsa zemînên ji bo verastkirin û têkoşîna dij krîzê minasib, esas e.

### Hikûmdarî û hevkarî

Lê belê, gelo divê em heyîna pirsgirêkeke desthilatdarîya cîhanî înkar bikin û *"xeyala"* (7) sazîyên navne-teweyî yên bihêz şermezar bikin? Belê, em dixwazin klîşeya "desthilatdarîya cîhanî" red bikin û dudilî û têkçûnên ***G8, G20*** û civînên din ên bilind ên hikûmetên serdest mehkûm bikin. Lê belê divê kêşeyek were çareser kirin: Kêşeya avakirina verastkirineke cîhanî. Jixwe, parêzvanên çepgir ên dijglobalîyê serdema pişt-şerî ya ku verastkirina bi awayê ***keynesî*** ya li *Bretton Woods* îlanbûyî mohra xwe lê xist, weke mînak nîşan didin.

Du heb nîşanên biryardêr acîliyeta verastkirinê nîşan didin, bêyî ku em li hêvîya jiholêrabûna an jî vegirtina kapîtalîzmê rawestin. Nîşana yekem ji cotyarîyê tê, ku roja îro bi jiqaîdekirina her cure pevguherînên cotyarî tarîf dibe û encamên wê jî, veqetandina erdên herî baş ên welatên başûr ji bo çandinîyên ixracatê li hember çandinîyên jîyanê, kêmbûna daxwaza jê tê deynê xwe bide û bêistiqrarîya ekstrem a fiyetên bingehîn ên cîhanê ne. Em çawa dikarin bifikirin ku her welatek dê xweserîyeke nisbî ji xwe re bibîne û serxweyîyeke zadî dê çêbibe, eger bazarên cotyarî li tevahîya cîhanê di çarçoveya rêgezên sert de nayên xistin, da ku hemû xwardemenî cotyarî û bêhtirî wan, hemû maddeyên bingehîn jî ji destê spekulasyon û tesadufên bazarê xilas bikin? (8)

Nîşana duyem jî têkildarê têkoşîna li dij germbûna hewayê ye ku jixwe divê li tevahîya cîhanê were meşandin. Digel vê, heta niha, muzakereyên *pişt-Kyotoyê* yên 2009ê li *Kopenhagê* û 2010ê li *Cancunê*, ji ber nelihevîya berjewendîyên dewletên herî bihêz ên esîrên girêdanên xwe yên bi daxwazên lobî û grûpên pirneteweyî ve têk çûn. Derketina holê ya haydarîyeke welatîyan a xwedîya nihêrîneke global a ji bo xilaskirina malên hevpar, dikare tesîrê li van muzakereyan bike, wek mînak bi rêya Banga Konferansa Cîhanî ya Gelan li ser guherîna avûhewayê ya li nîsana 2010ê bi înîsîyatîva hikumeta bolîvyayî çêbû.

Wekî din, cotyarî û avûhewa herdu jî pêwîstîya tavil a bi şoreşeke radîkal a modela pêşketinê ya globalbûna kapîtalîst bi xwe re dibe, keşf dikin. Parêzvanên dijglobalîyê carna vî alîyî piştguh dikin, lewre ku referansa wan a sereke modela fordîst a neteweyî ye ku, rast e, ji modela nûliberal bêtir kontrolkirî ye, lê berhemdarîyeke xirabker jî da dest pê kirin. Em wisa bi tarîfa zemînê pêkanîna hikumdarîya demokratîk re rû bi rû dimînin.

### Dawîyê: Hikûmdarîyeke demokratîk

Parêzvanên dijglobalîyê çawa li meseleyê dinihêrin? *"Em çi li ser bifikirin,* ***Frederic Lordon*** *dinivîse, çareya vegera li hikumdarîya neteweyî dîyar e lewre ku, berevajî yên din, qencîya wê ev e ku aniha li ber destên me ye -tevî pêkanîna guherînên tevnî yên di warê aborî de rê didinê: Proteksyonîzma hilbijartî, kontrola sermayeyan, kontrola siyasî ya banke-yan; îrade hebe, ev tişt hemû mimkin in"*. (9) Ev sê sewiyeyên guherînên tevnî pir minasib in. Pirsgirêk di "dîyarbûn" û "berdestbûnê" de ye, ji ber ku encameke girîng a pêvajoya globalbûnê, valakirina naveroka demokrasîyê û spartina klîtên mala hevpar li bazarên fînansî bû.

Ji ber vê yekê, astenga herî zor a li hember gelan disekine, ji nû ve înşakirina tevahîya hikumdarîya wan û ne tenê dîsa zindîkirina wê ye. Divê ev kar ne tenê li asta neteweyî lê ji bo ewropayîyan, li asta herêmî jî bê kirin, lewre ku pevçûna digel hêzên kapîtalê êdî ne tenê li asta neteweyî û heta bi piranî li derveyî wê çêdibe. Nakokîya ku divê were derbas kirin jî ev e ku, tevî ku demokrasî hê jî bi piranî li asta neteweyî saz dibe, verastkirin û guherînên pêwîst, nemaze di warê ekolojîyê de, di ser neteweyan re ne. Ji ber vê yekê afirandina gav bi gav a zemînekî demokratîk ê ewropayî ji girîng e. Ji ber ku krîz ne liserhevkirina krîzên neteweyî ye, xilasbûna ji krîza neteweyî nabe.

Pirsa mayî ev e ka em karê jihevdexistina kapîtalîzma nûliberal ji ku dest pê bikin. Bi awayekî demkurt û heta ecele jî, divê rewanebûna piranîya deynên dewletî û nedana wan bê îlan kirin, pêşî li welatên di rewşa herî acîl de ku wê bi biryareke ewropî bên dest nîşan kirin. Divê ev biryar li ser bingeha kontroleke giştî ya hesabên deynên dewletî bê dan. Divê tevahîya sektora bankayê ya ewropî bê civakî kirin û gavbigavbûneke xurt a bacan bê restore kirin. Tê de tu bêimkanîyên pratîk tunene, bi tenê îradeya siyasî ya "fetisandina faîzê" (Keynes) ligel betalkirina wê kêm e. (10)

Bi awayekî demnavîn û demdirêj, divê pêvajoya guherandina radîkal a modela pêşketinê bi maneyeke nekapîtalîst bê dest pê kirin. Xirakirina strukturên fînansê yên heyî gava pêşî ye, ku dikare bi qedexekirina transaksyonên hevalbend û yên berhemên têkildar, herweke bacgirtina li ser transaksîyonên mayî, dest pê bike. Jê bêhtir, sînorkirina sert a zemînê ticarî yê di lêgerîna qezencan de lazim e, da ku aktîvîteyên neticarî an jî bera wan li tevakirina pêwîstîyên xelkê digel parastina dengeyên ekolojîk e, pêş bikevin.

Em ê çi navî li van tiştan bikin? Parastinên pêwîst (ji qanûna xebatê, sîgortaya civakî, xwezayê...) dîsa jî nayên maneya sîstemeke proteksîyonîst. Pêkanîna fikira hilbijartina zemînên ku wê "dijglobalîyê bibin" an jî, berevajîya vê, wê gerdûnî bibin, helbet zehmettir e lê belê, qencîya wê ev e ku ew hedefên pêwîst nîşan dide, guherîneke sosyoekolojîk a civakan dide dest pê kirin û gav bi gav, hevkarîyeke navneteweyî ya rasteqîn înşa dike. Ev jî peyama alterglobalîzmê, ya ku qet dev ji rexnegirîya globalîzmbûnê bernade, lê dijbera wê ya xuyanî jî minasib nahesibîne.

* Profesorê alîkar li zanîngeha Bordeaux-IV, birêveberê pirtûka Attac a bi navê *Le Développement a-t-il un avenir? Pour une société solidaire et économe [Gelo siberoja pêşketinê heye? Ji bo civakeke piştgir û xercneker]*, Mille et une nuits, Parîs, 2004 û nivîskarê *La Démence sénile du capital, fragments d'économie critique [Dînîtîya êxtiyarî ya sermayeyê, fragmanên aborîya rexnegir]*, Le Passant, Bègles, 2002.

1 Ji bo kurtasîyeke minaqeşeyan: "Démondialisation ou altermondialisme?" ["Jiglobalîzmbûnê an alterglobalîzm?"], http://alternatives-economiques.fr/blogs/haribey/2011/06/07 û "La démondialisation heureuse? Éléments de débat et de réponse à Frédéric Lordon et à quelques autres collègues" ["Jiglobalîzmbûna xweşik? Elemanên nîqaş û bersivê ji Frederic Lordon û çend hevpîşeyên din re"], http://alternatives-economiques.fr/blogs/haribey/2011/06/16/ ; herweha bixwînin Frédéric Lordon, http://www.fredericlordon.fr/triptyque.html, Bernard Cassen û Jacques Sapir, http://www.medelu.org

2 J.M. Haribey, "Crise globale, développement soutenable et conceptions de la valeur, de la richesse et de la monnaie" ["Krîza global, pêşketina durust û niherînên li ser nirx, dewlemendî û diravê"], Forum de la Régulation, Parîs, 1 û 2 kanûn 2009, http://haribey.u-bordeaux4.fr/travaux/monnaie/crise-valeur-monnaie.pdf

3 J. Sapir, "La mondialisation est-elle coupable?" ["Gelo globalîzm sûcdar e?"], Nîqaşa li nav Daniel Cohen û Jacques Sapir, *Alternatives économiques*, hjm. 303, hezîran 2011

4 INSEE, Rapora J.P. Cotis, "Partage de la valeur ajoutée, partage des profits et écarts de rémunérations en France" ["Parvebûna nirxa lêzêdebûyî, parvebûna qezencan û cudatîyên pareyê standî li Fransayê"], 2009

5 F. Lordon, "Comment rompre avec le libre-échange. La démondialisation et ses ennemis" ["Çawa ji pevguherîna azad qût bûn. Dijglobalî û dijminên wê"], *Le Monde diplomatique*, tebax 2011

6 M. Husson, "Une crise sans fond" ["Krîzeke bêbinî"], 28 tîrmeh 2011, http://hussonet.free.fr/sansfond.pdf

7 F. Lordon, *op. cit.*

8 *Bnr.* Aurélie Trouvé û Jean-Christophe Kroll, "La politique agricole commune vidée de son contenu" ["Siyaseta cotyarî ya hevpar ji naveroka xwe valakirî"], *Le Monde diplomatique*, çile 2009

9 F. Lordon, "Qui a peur de la démondialisation?" ["Kî ji dijglobalîyê ditirse?"], 13 hezîran 2011, http://blog.mondediplo.net/2011-06-13-Qui-a-peur-de-la-demondialisation

10 Bixwînin: François Chesnais, *Les dettes illégitimes, Quand les banques font main basse sur les politiques publiques [Deynên nerewa. Dema ku banka siyasetên dewletî bi dest dixin]*, Parîs, Raisons d'agir, 2011

Wergera ji fransî: Simko Destan

## Di pirtûkan de

**Jacques Sapir**
***La démondialisation (Ji globalbûnê)***
Seuil, Parîs, 2011, 259 rûpel

Tevî ku pêşnîyarên sernavê pirtûkê xuya dikin, bi tenê li dawîya berhemê keşif dibe ku analîza globalbûneke fînansî û ticarî ya "*êdî nayê ragirtin*" bi xurtî tê saz kirin. Ew bi bîr dixe ku sinifên serdest ên welatên zengîn -çi li bakur û çi li başûr- globalbûn dane dest pê kirin (û herweha jê sûdê werdigirin) û bi derewên weha dînamîkeke li ser berpirsên siyasî ferzkirî pûç dike. Wek mînak, li Ewropayê, parastina diravî li ser dewletan "ferz" kir ku "*deflasyona meaşan organîze bikin*". Ev "*gulana 1968ê berevajî*" ji bo hîssedaran encamên neyînî bi xwe re anîn, nemaze ji ber ku vekirina ji bazirganîya navneteweyî re -dervekirin- rê da wan ku "*êdî bi bazara hundirîn û lewre jî meaşên lê dayî ve ne girêdayî bin*".

Vegera li projeyeke pêşketina neteweyî dê asê bimîne, ji ber ku serkevtineke ticarî ya efsanewî, weke ya otomobîla DSê ya *Citroënê*, di tevahîya heyînîya xwe de bi tenê mîlyonek û nîv erebe da firotin. Lê îro, "*produksîyoneke mîlyonek heban bi serê salê rêjeya qezenckirinê ya asgarî ye. Em weha fêm dikin ka çima firmayên pirneteweyî zext ji bo sistbûneke rêgezên bazirganîya navneteweyî kir.*" Almanya û Çîn ên ku, di vê leyistikê de, bi awayekî sosret mîna hev in, heta niha qezencên herî baş jê wergirtin.

S. H.

www.diplomatiquekurdi.org

DI SIYASETÊ DE VERSIYONEKE NÛ YA QEDERPERESTIYÊ

# Gelo dîrokê berê xwe daye rastgirîyê?

RÉMI LEFEBVRE *

Nicolas Sarkozy berîya demeke kurt da zanîn ku “nirxên fransîyan ber bi rastê ve beridîne: têra xwe otorîte nîne, têra xwe ewlekarî nîne, têra xwe qehîmbûn nîne”. Tevî vê jî heke em bi asta bi taybetî bilind a beşdarnebûna hilbijartinan – di hilbijartinên herêmî yên adara 2011ê û herweha di hilbijartinên berîya wê de – hingê guman li ser fikra nûneriya siyasî bi xwe çêdibin.

Çep, çi radîkal û çi reformîst be, ji krîza fînansî û gumanbirina ji lîberalîzma aborî sûd wernegirt. Di hilbijartinên ewropî yên 2009ê de, tevî ku kapîtalîzma fînansî di warê îdeolojîk de lawaz xuya dikir jî, sosyal-demokrasî bi awayekî dîrokî şikest. Li alîyê din ê Atlantîkê, bayekî rastgir li ser hilbijartinên nîv-wekaletê bihurî û partîya serok **Barack Obama** piranîya xwe li Meclîsa Temsîlkaran ji dest da. Li gor salên 1990ê, çep paş ve çûn û ev teza rastgirbûna civakên rojavayî piştrast dike, ya ku li hin derdorên siyasî û rewşenbîrî berbelav dibe û ji bo hilbijartina **Nicolas Sarkozy** a 2007ê jî, weke şiroveyeke hegemonîya çandî bi kar hatibû. Ma ne serokkomarê nû hilbijartî bi xwe behsa **Gramsci** kiribû û serkevtina xwe di şerê çandî de, ya ku ji bo her serkevtineke hilbijartinî pêwîst e, li xwe pîroz kiribû?

Bi vê nihêrînê, îdealên çepê êdî bi pêşketina civakên hevdem re, ne hevpar in, ku mohr û nîşana mezinbûna ferdperestîya serfkarîyê û paşvekişandina hedonîst (zewqgir, bi kêf) a di zemînê taybet de li ser in. Tê gotin ku "meşa dîrokê" van têgihan pûç dike û ew bi rengê arkaîzm û qedîmî tên şayesandin. Xulasa, dibêjin hewayê serdemê li milê rastê ye.

Pirtûka **Raffaele Simone**, *Cenawarê Nerm [Le Monstre doux]*, ku li Îtalya û Fransayê deng veda (1), ev tez bi awayekî sentetîk pêşkêşî xwendevanan kiriye. Ji bo vî zimannas û fîlozofê îtalî, pir zêde lawazbûna çepê, heta tekçûna wê ya ku weke ne mumkin e mirov xwe li ber bigire, tê hesibandin, bi çanda hevdemîyê ve girêdayî ye, ku nivîskar jê re dibêje *"cenawarê nerm"*. Ev pergala aborî-îdeolojîk a teva, ku piştgirîyê dide rasteke nû ya li dora medya, serfkarî û ferdparêzîyê tev geriyayî, projeya çepê ji binî ve xira dike. Ev ceribandina rewşenbîrekî ku xwe pêşverû îlan dike, reşbînîyeke tund dide der. Berhem ji bo *"yên ku hê jî pê bawer in"* tê raber kirin, lê weha xuya ye ku nivîskar bi xwe êdî pê ne bawer e. Teza wî pirsên rasteqîn radixe ber çavan: Serdestîya îdeolojîk a lîberalîzma aborî, kokên xwe di esaseke çandî de dibîne û xwe dispêre guherînên civakî yên kûr, ku milê çepê ew bi qasî pêwîst bû li ber çavan negirtin yan jî ew rewa kirine. Lê gelo evqasî hêsan e: Ma "rastgira nû" berî her tiştî hêza xwe ji qelsîyên çepê wernagire?

**Simone** îdia dike ku serdestîya lîberalîzmê, ne bi tenê li ser esasekî aborî, lê li ser dînamîkeke çandî ya kûr saz dibe. Kirîn, kêfkirin, ciwanmayîn: Ev fermanên herdemîn bi teknolojîya Înternetê zêdetir dibin û ewqasî jî hegemonîk dibin. Kapîtalîzm hêza xwe ji îmkana çêkirina jîyanên ferdî û afirandina bê navber a pêwîstî û girêdanên nû diafirîne. Ew xwe dispêre çanda narsîzmê: Bi ya **Simone** *"hesta herî teşwîqkirî, herî werimandî ya hevdem ezperestî ye, yanî her li xwe hizirîn"*. Civaka serfkar li kêmbûna giştî ya hestên siyasî zêde dike û sinifa karkeran terhîs dike, ya ku êdî nasnameya xwe naparêze, lê dixwaze bibe burjuwazî an jî, qet nebe, weke burjuwazî xuya bike.

**Li hember "*kêf*" a giştî û çandeke anihayîyê ya ku *"bêçandîbûna"* siyasî wê xurt dike, çep û têgihên wê yên *"fedakarîyê"* nikarin têbikoşin**

Meyla kiryarîyê *"hizirîneke ekstrem li ser dema niha"* bi xwe re tîne; feraseta siberojê vala dibe û maneya axaftinên li ser "pêşveçûnê" namîne. Li ber bandora medyayîbûna zêde ya civakan, xeta di navbera rastî û xeyalî de zirav dibe -her tişt dibe şow- û aqilmendîya îdeolojîk a çepê êdî nayê fêm kirin.

Tê gotin ku ev pêşketinên çandî bi vî rengî rastîya her projeya guherandina civakî xira dikin û mala çepê ji ber vê yekê kavil dibe. Nivîskar qelsîyên taybet ên şaxê reformîst ê malbatê jî radixe ber çavan: Tekçûna exlaqî ya rayedaran, mîrasnedarîya entelektuelî ya partîyan, nizimbûna fikira siyasî... Vê çepê dev ji doza karkeran berda û lewre bûye sedema tekçûnê: Ew çîna karkeran vedişêre û wê nedîtbar dike, ji ber ku ew wê weke "nayê raber kirin" û seba vê nayê parastin jî dihesibîne. Têgihên wê dibin *"giştî û ne zelal, mijarên muzakereyê, ji bo lihevhatinên cur bi cur hazir in û fikirên din jî qebûl dikin"*. **Simone** dozgerîya doza çepa îtalî dike û wê nermbûyî dibîne, her ku diçe dereceyên alkolê winda dike ta ku dibe şileyeke *"bê tahm û mîna avê"*.

Lê belê, esas ne ev e. Tekçûn jî ji ber *"sedemeke dîrokî ya berfirehtir û bihêztir, ku li hemberî wê têkoşîn zehmet e"* şirove dibe. *"Bi hatina hevdemîya globalbûyî û serfkarîyê, "îdealên çepê" -yên ku wê û rastê bi rastî ji hev vediqetînin- weha xuya ne ku êdî têra bilindahîya zemanî nakin"*. Li hember "kêf" a giştî û çandeke anihayîyê ya ku *"bêçandîbûna"* siyasî wê xurt dike, çep û têgihên wê yên *"fedakarîyê"* nikarin têbikoşin. Ji ber *zeitgeistê*, hewayê serdemê, zora siyaseta wê diçe. Axaftina wê nizane berê xwe bide ku û bê mane ye, ji ber ku ew nikare xwe bi meylên şexsî ve girê bide.

Her çi "rasta nû", ew bêhtir bi hevdemîyê ve girêdayî xuya dike. Serkeftinên wê yên hilbijartinê ji naveroka projeyên wê yên siyasî, bêhtir têkildarî kapasîteya wê ya ferzkirina pragmatîzmekê ne ku bi xetên serdest ên serdemê re hevpar e. Rasta ku berê xeteke hişk diparast (nirxên exlaqî û fedakarî), li alîyê kiryarî, carina bi rengekî diyar jî, cihê xwe girt. Bi alîkarîya medyayan, ew xwe weke *"hişmendîyeke belav û dest lê nakeve, îdeolojîyeke ku diseyre, tevahîyeke helwêst û şêweyên rabûn û rûniştinê ya ku di hewayê de hene û mînakên wê li kolanan, li televîzyonê an li medyayan tên dîtin"* dide der. Bi vî awayî, "rasta nû" ji hêzeke siyasî ya rasteqîn bêhtir têkildara çandê ye. Ew zêde kapîtalîst e, pesnê serkevtin û dewlemendîyê dide û li hember bizavên entelektuelî, pozbilind e. Bi xuyanî, ew nêzîktirî berjewendîyên



DARA ARAM: **Jin û çeng**, boyaxa akrîl li ser tûwalê, 32 x 36 cm

anihayî yên ferdê hevdem e, nazik û di meşa dîrokê de nivîsandî ye; ew çepê li arkaîzma xwe ya ma‘dtirş û dembihurî vedigerîne.

Xwendina *Cenawarê Nerm* mirov nerihet dike. Her tişt *di heman demê de* rast û nerast xuya dike. **Simone** bi hestiyarîyeke mezin hewayê serdemê û kapasîteya wê ya zirarlêkirin an jî fetisandina nirxên çepê fêm dike, lê her çi sedemên wê yên kûr in, ew bi tenê şiroveyeke qebe pêşkêş dike. Ka ew dixwaze çi bibêje?

**Simone li hember e ku çep dev ji çîna karkeran berde, lê vegera li marksîzmê û têkoşîna sinifan a ji bo dema niha bi tevahî red dike**

Rexnegirîya wê ya ne zelal a hevdemîyê hem ji mîrasa dijdemokratîk, heta reaksîyoner a **Tocqueville**, hem jî ji perspektîvên zêde rexneyî lê estetîkperest ên **Guy Debord** an **Jean Baudrillard** (rexneya "civaka şowê" û ji rastîyê ketinê) sûdê werdigire. **Simone** li hember e ku çep dev ji çîna karkeran berde, lê vegera li marksîzmê û têkoşîna sinifan a ji bo dema nuha bi tevahî red dike. Fîlozof bi rastî tu carî çepa nû ya ku dilê wî dibijiyê teswîr nake: Gelo divê ew bi hewayê serdemê re here, wê xira bike, xwe telef bike?

Tehlîla wê tenê me ber bi reşbînîyeke "têkçûnperest" a zêde ve dibe. Ew li ser şiklên nû yên berxwedan û tundrewîyê hewldanên nûkirina tarîfên entelektuelî yên çepê an jî nirxên "pişt-materyalîst" ên li dora jîngehparêzîyê sazbûyî, bê deng dimîne. *Cenawarê Nerm* bêhtir bi paşxana jiyana siyasî ya îtalî û "berluskonîbûna" wê ve girêdayî ye û nivîskar hinekî bi lez dirûvê tevahîya demokrasîyên rojavayî weke vê mînakê dike. Rast e ku felsefeya "***bling bling***" a **Nicolas Sarkozy** bi hewayê serdemê ya **Simone** dide xuyan re diçe, lê ma qatilê hefteyê 35 seetên xebatê, bilindkirina "fedakarîya" "nirxê xebatê" jî nekiribû dirûşmeke sereke ya kampanya xwe? Ma rastgir jî fedakarîya "hişkbûnê" naparêzin?

## Pedagojîya devjêberdanê

Li Fransayê, divê teza rastgirbûneke pergalên nirxên welatîyan bi awayekî xurt bê nuans kirin. Tercîhên aborî yên fransîyan, weke anketên herî hûrgilî yên 2007ê didin xuyan (2), li gor mijarê, lîberalîzmê û dijlîberalîzmê di xwe de vedihewînin. Hin pêşniyarên rastê dengekî di bilindbûnê de vedidin: Bisînorkirina mafê grevê di veguhastinên giştî de an jî bandora neyînî ya hatina asgarî ya lêzêdekirî (RMI) li ser lêgerîna kar. Nirxên ferdperest ên reqabetê li cem sinifên xizan jî mezin dibin. Bi vî rengî, % 61ê karker û % 68ê xebatkarên lêpirsî "tam" an jî "bêhtir" ji fikira *"divê şîrket xwedî azadîyeke berfirehtir bin"* razî ne.

Li gel vê yekê, kesên lêpirsî bi têwerdana dewletê ya di aborîyê de, parastina bazara xebatê, vebelavkirinê (% 57ê kesên lêpirsî li 2007ê fikira *"divê ji dewlemendan bistînin da ku bidin feqîran"* qebûl dikin) ve girêdayî dimînin. Nirxên wekhevî û piştgirîyê hê jî esas in û tesbîta pêvajoyeke têkbirina piştgirîyê ya di civakê de zêde nepixandî ye. Beşa sinifên feqîr ku berê xwe da rastê, ne ji bo projeya wê, lê ji ber ku wê karî bi awayekî jêhatî meyla wê ya parastin û emrê zêde di warê nirxan de bi alîyê xwe ve bikişîne. *"Neewlebûna aborî ya ku kapîtalîzma nû da dest pê kirin, kir ku beşeke ji proletaryayê û sinifên navincî li cihên din li ewlehîyê bigerin, di zemînekî "exlaqî" de ku wê zêde nelive û heta dê helwêstên herî kevnare û herî nas dîsa îlan bike"*.(3)

Reşbînîya **Simone** ji bo sedemeke din jî bi rihetî nayê pejirandin: Di rûpelên dawî yên berhemê de, ew têgiheke esasperest a mirov derdixe pêş, ku ji ber ezperestîyê "di xwezayê de rastgir" e. Ev antropolojîya feydeperest a neolîberalîzmê tîne bîra mirovî, tevî ku nivîskar wekî din li dijî encamên wê derdikeve...

Dîsa jî, nayê înkar kirin ku çepê pirsa çand nexist rojeva xwe ya întellektuel û bi gotinên nivîskarê, kapasîteya xwe ya *"şiklê xwe bide dinyayê"* winda kir. Hevdemîya lîberal bi kûrahî pêşfikirên wê yên çandî û exlaqî hejandin. Hemû tevnên civakî, çiqas ne ferzkar bin jî, xwedî "hişekî" ne ku ji bo meşandina emrê heyî pêwîst e û lihevhatina subjektîv û rewatîyê ku jê re lazim e, dide der. Bêyî ku mirov û subjektîvîteya wî bê guhertin, belavbûna muhtemel a kapîtalîzmê nabe. Lîberalîzm weha projeyeke antropolojîk û çandî ye, ku dixwaze awayên kiryarê yên hikûmdaran û yên di bin hikumdarîya wan de jî biguherîne.

Rastgirbûna ku **Simone** terîf dike, ji guherandinên sosyolojîk der tê, lê ew wan tehlîl nake û bi vî rengî destekê dide *qederkirina* wan: Tekçûna beşdarîyên subjektîv ên sinifê, terhîskirina siyasî ya sinifên feqîr a bi lawazbûna rêxistinî ya partîyên çepê ve girêdayî, teqîn û jihevbûna civakê, pêvajoyên pirhejmar ên ji payeketina civakî, kalbûna nifûsê, dorbajarvanîyê. Ev bûyer hemû encamên siyasî yên yekalî dernaxînin holê, lê îroj bêhtir li ber çepê asteng in, digel ku pêşketinên din, yên weke bilindbûna asta perwerdehîyê, dikarin bi kêrî çepê bên.

Herweha nirxên kiryarî û lîberal cihekî zêde digirin ji ber ku çep bi tenê bi valahîya xwe ya çandî û îdeolojîk derdikeve hemberî wan. Sivikbûyî û bi nasnameya xwe ne ewle, ew dibe hedefa rexneyên rasteke bêkompleks a ku dixwaze xebatkaran parçe bike û kategorîyan li hemberî hev sor bike. Bi rastî, axaftinên "rastgirbûnê" mînakeke feraseta rihet a ji bo rastîyên siyasî û civakî pêşkêş dike. Ew herweha berpirsiyarîya îdeolojîk a rêxistinên çepê di qelsbûna çandî ya pêşverûyîyê de li ber çavan nagirin û ji ber vê yekê, li vê hêlê bi awayekî baş tên qebûl kirin. Ew "ji nû ve diyarkirina armancên" xeta çepê, da ku bêhtir bi "raya giştî" ve girêdayî bibe jî rewa dikin. Teza nivîskar qederperest û di warê siyasî de alîgir e, lewre jî ew dikare şiklekî devjêberdanê bi pêş bixe û tekçûna entelektuelî ya çepê xurt bike.

Di dîrokê de, çep esasê xwe di dînamîkeke siyasîkirina civakê , bicihbûna çandeke siyasî, karekî bê navber ê derketina li dijî zelalîyên "xwezayî" (newekhevîyên civakî) de didît. Ku mirov xwe ji qada şerî vekişîne, hêsantir e ku tekçûnê bipejirîne.

* Profesorê zanistên siyasî li zanîngeha Lille-II

1 *Le Monstre doux [Cenawarê nerm]*, Le Débat-Gallimard, Paris, 2010. Herweha li hejmara taybet a kovara *Le Débat* binihêrin, 159, 2010

2 Etienne Schweisguth, "Le trompe-l’œil de la droitisation" ["Xepandina çavî ya rastgirbûnê"], *Revue française de science politique*, hezîran-tebax 2007

3 Serge Halimi, pêşgotina Thomas Frank, *Pourquoi les pauvres votent à droite [Xizan çima dengên xwe didin rastê]*, Agone, Marsilya, 2008

Wergera ji fransî: Simko Destan



Kanûn 1990

LI TIRKÎYEYÊ ŞIDETA ÇEKDARÎ DEWAM DIKE

# Kurd careke din hatin ji bîr kirin

CHRISTIANE MORE

## ARŞÎVA BÎRA KURDAN

Christiane More Fakulteya Hiquqê ya Grenoble temam kiriye, naskirina wê ya kurdan di 1974ê de gava Barzanî li dijî zagona otonomîyê rawestiyaye, çêbûye. Li INALCOyê li ser kurdan xwendiye û gelek caran çûye herêmên cûrbicûr yên Kurdistanê, bi rêvebirên rêxistin û partîyên wan re hevdîtin kirine. Pirtûkeke wê li ser kurdan bi navê "Kurd Îro, Tevgereke Netewî û Partîyên Politîk" di nav weşanên L'Harmattan de derketiye.

More di vê gotara xwe de dipirse: Ji bo bîst milyon kurdan paşerojeke çawa? Ev yek ji wan pirsan e ku çavkanîya wan krîza li Kendavê ye. Dema ku mirov dosyaya sînorên Rojhilata Navîn vedike, ev yek "birînên ji berê de yên disojin ên dabeşkirina kolonyal" vedijîne. Gelê kurd ê ku li Iraq û Îranê hat perçiqandin, li Tirkiyeyê di bin zexta xedar a desthilatdarîya navendî de ye; Tirkiyeyê li herêmên rojhilat rewşa awarte ragihandiye. Lê belê beşdarîya çalak a Enqerê ya nav refên koalîsyona dijberî Iraqê rojavahîyan ditevizîne, wan ji liv û tevgerê dixe, halê hazir ew naxwazin dest bavêjin vê pirsgirêka bi kelem.

LMd kurdî



DARA ARAM: **Roja sor 07**, boyaxa akrîl li ser tûwalê 36 x 36 cm

Çileya 1989ê, li Parîsê, civîna navneteweyî ya der barê silehên kîmyewî de, xwe nedabû ber ku Iraqê ji ber bikaranîna gazên kîmyewî li dijî kurdan, nexasim jî li bajarê *Helebce*yê, şermezar bike. Di çirîya pêşî ya heman salê de di dema konferanseke li ser nasnameya kurdî de, ya ku ji alîyê Enstîtuya Kurdî ya Parîsê û Fondation France-Libertés (Weqfa Fransa-Azadî) ve li paytexta Franseyê hate organîze kirin, tu berpirsyarê partîyên kurd nikarîbû pêwendîyên fermî deyne. Li hemberî vê, di çirîya pêşî ya sala 1990ê de, wezîra karê derve ya Franseyê **Edwige Avice** û cîgirê wezîrê, wezîrê ji mijara mafê mirovan berpirsyar **Bernard Kouchner** şandeyeke Bereya Kurdistanê ya Îraqî qebûl kirin. Krîzê 2ê tebaxa 1990ê ji alîyê Iraqê ve dagîrkirina Kuweytê dest pê kir, gelo ev krîz wê helwesta rojavahîyan li hemberî drama miletekî nifûsa wî bîst milyon û bê dewlet, biguhere? Helbet, endamekî bereyê Mahmûd Osman îşaret bi "şemitîna helwêsta Rojavayê kir", lê belê ew hişyar weha li gotinên xwe zêde dike: "ev têrê nake. Halê hazir kurdan tu tiştê berdest û berçav bi dest nexistiye". (1)

Tevî ku tekrara bûyerên salên 1970yê zêde muhtemel xuya nake jî; hingê pêşmergeyên Mela Mustefa Barzanî ji alîyê şahê Îranê, Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê û Îsraîlê ve hatin çekdarkirin û fînanskirin da ku li dijî "şoreşgerên baesîst" ên Bexdayê şer bikin (berîya ku li ser mîhraba lihevhatina iraqî-îranî werin qurban kirin). (2) Di nav bereya dijminê **Sedam Huseyin** de bicihkirina kurdan, wê xisleta taybet a pirsgirêka kurdî ya îro li ber çavan negire – nexasim jî alîyê wê yê li Tirkiyeyê– ku şax û rîşên xwe berdane nav dîrokeke tevlîhev a parçekirin û dildarîyan.

### Di xefka dîrokê de

Kurdistana ku demeke dirêj di navbera împeretorîyên *safewî û osmanîyan* de qada şer bû, tu caran nebûye xwedîya hêzeke yekbûyî. Sala 1639ê peymaneke di navbera Stenbol û Îsfehanê de sînor bi îstîqrar kirin; mîrên kurdan li dijî daxwaza navendîkirinê ya herdu împaratorîyan, gelek caran serî hildan, nexasim jî di sedsala 19ê de. Ji bo ku vê muxalefetê ji holê rake Dewleta Alî Osmanî tercîh kir ku gelek malmezinên kurd bi payeyên bilind wezîfedar bike.

Di dema Şerê Cîhanê yê Yekemîn de û li gor siyaseta wan a teşwîqkirina serhildana ereban li dijî siltanê osmanî, brîtanîyan di nav kurdan de jî kampanyayeke dij-tirk da dest pê kirin. Ajanên ku bi zimanê wan dipeyivîn û eşîr nas dikirin, şandin herêmê ji bo ku han bidin gel da ku li dijî desthilatdarîya navendî serî hilde, di berdêla sozên serxwebûnê yan jî qet nebe xweserîya navxweyî de.

Di dawîya şerî de London angajmanên xwe dixe dewrê: Sala 1920ê peymana ***Sevrê*** (Sèvres) di du xalên xwe de cih dida avakirina dewleteke kurdî. (3) Vê dewletê kurdên Îranê û yên Sûrîyeyê yên ku hejmara wan kêmtir e, nedigirt nav xwe; û serxwebûna wê jî sînordar bû, çawa ku hêzeke kolonyal komên din ên Rojhilata Navîn desteser kiribûn. Tevî vê jî, ev peyman ji bo neteweperestan îro jî referansek e: Ew di vê peymanê de bi huqûqa navneteweyî rewabûna daxwazên xwe dibînin.

Lê belê peymana Sevrê tu caran nehat pêk anîn. Serhildana Mustafa Kemal a li dijî neheqîya pûçkirina Împaratorîya Osmanî û serketinên wê di şerê ji bo serxwebûna Tirkîyeyê de, wê bi mohrkirina peymaneke nû ya li ***Lozanê*** (Lausanne) 24ê tîrmeha 1923yê hate nivîsîn, bi dawî bibûya: Vê peymanê tevahîya Anadolyayê dida welatê wî. "Dewleta kurdî" berîya ku ji dayik bibe, wê biketa xefka dîrokê, beşek ji erdên wê bi Tirkîyeyê ve hat girêdan, li alîyê din dîyarkirina paşeroja wilayeta Mûsilê hê "parastî" bû. Kanûna sala 1925ê Cemiyeta Miletan li gor daxwaza Londonê ev herêma Mûsilê bi Iraqê ve girê da. Xaleke taybet qebûlkirina cihêbûna kurdan di zimanê wan de, di mafê wan ê bi roleke dîyarker rabûna di birêveberîya herêma xwe de, pêş didît. Van ferzan ji bo vê hindikahîyê rewşeke nisbî biîmtiyaz diafirand ku pêşî li gelek serhildanan, nexasim jî piştî serxwebûna Iraqê ya sala 1932yê negirt; ev serhildan bi alîkarîya Hêzên Hewayî yên Meliktîyê hatin tepisandin.

Brîtanyaya Mezin kurd pir bi hêsanî ji destê xwe berdan, lewra wê hem bawerî bi milletên wê yên pir bi liv û tevger nedianî û hem jî ji ber ku îmkana liserxwemana Iraqê girêdayî petrolên wilayeta Mûsilê bû, li başûr hê tu rezerv nehatibûn dîtin. Ya rastî, Iraqeke mezin di kontrola brîtanî de rêya ber bi Hindistanê ve çêtir misoger dikir, nexasim jî li dijî tehlûkeya bolşewîk, daxwazên almanan û îredantîzma tirk. Di encama vê devjêberdanê de, kurdan hew nêrî ku di navbera sê dewletan de ango Tirkîye, Iraq û Îranê de hatine parçe kirin û civakên piçûktir li Sûrîyeyê û Yekîtîya Sovyetî jî djîyan.

### "Rojhilatê Anadolê û tirkên çîyayî"

Erê li Îranê rewşa nû ji alîyê desthilatdarîya navendî ve demeke dirêj hat kontrolkirin –zimanê kurdan zimanekî hindo-ewropî yê têra xwe nêzî farisî ye– lê belê encama rewşê li dewletên cîran teqînên li pey hev bû. Li Iraqê serhildanan heta bi sala 1945ê dewam kir. Li Tirkiyeyê li hemberî dewleta navendperest a ku **Atatürk** li dijî hewldanên parçekirinê yên Dewletên Hevgir ew damezirand, serhildan wê dijwartir bûna, nexasim piştî qebûlkirina qanûna dij-dîndaran a sala 1924ê, ku di encama wê de weşan û komeleyên kurdan hatin qedexe kirin. Gulana 1932yê desthilatdarîya tirk beşek ji kurdan bi darê zorê koçber kir û biryar da wan asîmîle bike, navê herêmê –ku heta sala 1946ê wê bi qanûna şer bihata birêvebirin– wê êdî bibûya "Rojhilatê Anadolê" û navê xelkê wê jî wê bibûya "tirkên çîyayî".

www.arsivakurdi.org



Piştî Şerê Cîhanê yê Duyemîn heta bi destpêka salên 60ê "nîzameke" nisbî li Kurdistana tirkan hakim bû. Lê belê demên demokratîkbûna nisbî yên pir caran bi darbeyên eskerî hatin birîn, wê destûr bidana tekrareke xweîfadekirina neteweperest, nexasim jî di bin bandora tevgera çekdarî de ku **Mustefa Barzanî** salên 60û 70yê li Iraqê bi rê ve dibir.

Dema îlona 1980yê eskeran li Enqerê hefsarê desthilatdarîyê girtin destê xwe, tevahîya azadîyan hatin betal kirin, redkirina bi israr a naskirina herî piçûk a cihêbûna kurdan (berevajîyê li Iraqê ku destûra bingehîn qebûl dike ku welat ji du neteweyan pêk tê, yek jê ya kurd e û ya din a ereb) û xizanîya herêmên başûrojhilatê Tirkiyeyê kirin ku radîkalbûneke bi lêz pêk were û *Partîya Karkerên Kurdistanê* (PKK) wê bibûya berdevkê wê.

Piştî damezirandina PKK (1978)ê, PKKê xwe ji rêxistinên xweserîparêz ên kurdî yên welatên cîran cihê kir, pêşî bi eslê birêveberên xwe –para bêtir ji derdorên xizan û mexdûr in, lê belê lîderên kurd ên Iraqê yan jî Îranê bi eslê xwe feodal in; bi sloganên xwe yên li dijî malmezin û axayan (xwedîyên erdan) yên ku "*ji bo parastina îmtiyazên xwe bi desthilatdarîya navendî re li dijî gelê xwe hevkarîyê dikin";* bi îdeolojîya xwe ya marksîst-lenînîst û a alîgirê dinyaya sêyem a bêtawîz; bi bikaranîna terorîzmê bêyî cihê bike – ji 15ê tebaxa 1984ê û pê ve– ya ku wê di destpêkê de sempatî jê dûr bixista.

Şerê di navbera Iraq û Îranê de herêm dabû ber xwe. Kurdên Îranê yên ku rewşa xwe piştî şoreşa îslamî xurt kiribûn, li ser sînor kom bûn. Kurdên Iraqê ji lawazbûna hukûmeta Bexdayê sûd wergirtin da ku gerîla xurt bikin û hin erdan rizgar bikin û PKKê wê xwe bispartiba wan, ev yek wê bibûya sedema destwerdanên artêşa tirk ên li ser erdên Iraqê yên ku hukûmeta baesî destûra wan dabû.

Sala 1988ê dawîya şerê kendavê wê rê li ber jinûve dîyarkirina rewşê vekira, her dewletê wê derfet bidîta xwe ji kelema kurdî rizgar bike. **Sedam Huseyin** eskerên xwe şandin bakur, di nav çend hefteyan de bi alîkarîya silehên kîmyewî, wî berxwedana kurdan ji holê rakir a ku ji ber hevkarîya xwe ya bi rejîma îslamî re zirar lê bûbû. Wî ew "pasîfkirin" bi gelek koçberîyên bi darê zorê temam kir.

Li Îranê, Partîya Demokrata Kurdistana Îranê (PDKÎ) ya **Dr. Qasimlo** jî di rewşa bergirîyê de ye û dikeve nav hevdîtinên bi desthilatdarîya navendî re; di dema hevdîtineke bi qasidên îranî re di tîrmeha sala 1989ê de li ***Vîyana****yê* ew hate kuştin, bi vî awayî PDKÎyê serokê xwe yê herî bi prestîj ji dest da. Bi tenê PKK bi silametî ji vê lîstikê difilite, bi xêra alîkarîya nexasim Şamê.

## Şerê avê, şerê Dîcle û Firatê

Hevrikîya di navbera Sûrîye û Tirkîyeyê de nû nîne, Sûrîye ji mêj ve biryar daye cihê xwe di kampa dij-rojava de bigire, li hemberî vê Tirkiye endameke çalak a NATOyê ye. Dîrokên cihê jî wan ji hev cuda dike, weke mînak der barê herêma Skenderûnê ya ku Franseyê sala 1939ê da Tirkiyeyê û Şam doza wê dike. Di dawîyê de piştî pêkanîna bernameyeke bi îhtîras a pêşketina aborî ya Başûrojavayê Anadolê û avakirina bendava Atatürk li ser çemê Firatê (4), di warê çavkanîyên xwe yên avê de Sûrîyeyê xwe di tehlûkeyê de his kir. Di navbera herdu welatan de 17ê tîrmeha sala 1987ê hat mohr kirin "*da ku dawîyê li bûyerên sînorî bîne"* –pê re jî angajmana dabeşkirina avê,- lê belê tesîra wê dê kêm bûya. Erê kampên PKKê li deşta libnanî ya Bekayê ne, lê belê buroyên wê li Şamê vekirî dimînin û derfetên xwe yên derbaskirina sînor jî diparêze. Di çileyê sala 1990ê de ava çemê Firatê meheke hate qut kirin da ku *Bendava Atatürkê* were dagirtin; ev yek hem ji alîyê Bexdayê (5) ve û hem jî ji alîyê Şamê ve weke zexteke bi tehlûke hat dîtin.

## Rewşa awarte li "Rojhilata Anadolê"

Alîkarîya Sûrîyeyê bi herhalî bi tenê yek ji sedemên harbûna çalakîyên PKKê yên sala 1990ê ye. PKK berîya her tiştî berê axaftinên xwe diguhere: Birêveberê wê **Abdullah Ocalan** ê heta îro partîzanê Kurdistaneke serbixwe, dide zanîn: *"Em nikarin herî kêm berîya çil salan ji Tirkiyê qut bibin, lewre pêdivîya me pê heye.* (6) *"* Paşê, bêyî ku dev ji şideta terorîst berde, ew hêza xwe dide ser propagandayê da ku gel bîne alîyê xwe. Ya dawîyê jî, ew sûdê ji alîkarîya "objektîf" a hukûmeta Enqerê werdigire: Piştî pêvajoyeke lîberalîzasyona nisbî ya nîvê salên 80yê, ku qebûla fermî ya etnîsîteya kurd –ji 55 milyon nifûsê 10 milyon kes – mohra xwe lê xist û nîqaşeke berfireh ya der barê pirsgirêkê de, dewletê destpêka sala 1990ê zor û zexta bêhedef derxiste pêş ku para bêtir ji alîyê hêzên taybet ve tê bi rê ve birin. PKKya ku doh ji ber rêbazên xwe yên terorîst dihat rexne kirin, her diçe bêtir ji alîyê tebeqeyên xizan ve weke rizgarker tê dîtin. Bi vî rengî ew bi hêz dibe û hêzên din ên kurd lawaz dibin, ev hêz weke yên îteeta îslamî pesnê têkoşîna siyasî didin.

Çileyê 1990ê çapemenîya tirk valakirina 112 gundan ragihand –paşê wê behsa 400an bihata kirin– da ku qadeke ewlekarîyê ya li ser sînorên bi Iraq û Sûrîyê re ava bikin. Piştî weşana du pirtûkên li ser kurdan, bi îdîaya *"propagandaya cudakarîyê kiriye û hestên neteweyî lawaz kirine"* 12ê adarê sosyolog Îsmail Beşikçî hat girtin; ew ê di tîrmehê de di encama zexta navneteweyî de bihata berdan. Lê belê dema dîyarker adara 1990ê ye: 13ê mehê, di şerekî dijwar ê bi PKKê re, artêşê sêzdeh partîzan kuştin. Rayedaran red kir ku cenazeyan bidin malbatan û ev yek bû sedem ku raperîneke bi rastî ya sivîl rû bide, ya ku bi lez û bez nûçeya wê belav bû.

Xwepêşandan, grev û pevçûnan, wê xisleta vê "Întîfadayê" -li gor binavkirina çapemenîya herêmî - dîyar bikira. Êdî rayedarên ku timî tesîra PKKê red dikirin, behsa komployekê kirin ku armanca wê xirakirina yekparebûna erdên Tirkiyê ye. 9ê nîsanê hukûmetê biryarnameya 413ê qebûl kir ku hêzên awarte dide walîyê super yê herêmên başûrojhilat –ev wezîfe tîrmeha 1987ê hatibû afirandin– ev hêzên awarte mehekê paşê bi biryarnameya 424ê hatin berfireh kirin, nexasim jî hêza cihguhertina dadger, dozger û eskerên tetmînkar nînin.

## Zordarîya Enqerê ne xema Rojavayê ye

Azadîya çapemenîyê xurttir hat asteng kirin. 28ê hezîranê çapxaneya du kovarên heftane ***2000'e Dogru*** û ***Halk Gerçegi*** bi tevahî hat girtin; di nava 3 salan de kovara ***2000'e Dogru*** bîst û du caran hat desteserkirin û pêncîh doz lê hatin vekirin. (7) Hemin, rewşê herî zêde li wilayetên başûrojhilat ên bi rewşa awarte tên bi rê ve birin, fikar bi mirovan re çêdikirin, lewre hêzên ewlekarîyê gelek binpêkirinên mafan pêk dianîn, êşkence bi kar dianîn, sivîlên ku weke alîgirên serhildêran dibînin, bi darê zorê ji cih û warên wan dikin.

Berîya 2yê tebaxê zextên dijwar ên Enqere pêk tîne li Rojava nebûn sedema nerazîbûnên cidî. Piştî ku Iraqê Kuweyt dagîr kir û serokkomar **Turgut Ozal** bi tevahî ket nav hevgirtina mezin a li dijî **Sedam Huseyin**, rexne hê jî kêmtir bûn. Bi navê realîzmê, êdî bîlançoya Tirkîyeyê ya li Kurdistanê jî nakeve ber gumanan, ne jî ya Sûrîyeyê li Libnanê yan jî ya Îsraîlê li erdên dagîrkirî. Huqûqa pirî caran bawerî pê tê anîn, li vir sînorên xwe yên bi rastî nîşan dide.

Tehlûke heye ku *"miletê xwedayan ji bîr kirî"* kurd li Rojhilata Navîn careke din bibin alîyê bi bin ketî. Heta parçebûneke Iraqê ya ku carinan behsa wê tê kirin, bi îhtîmaleke mezin wê bi îlhaqkirina herêma Mûsilê ji alîyê Enqereyê ve bi dawî bibe û ne bi damezirandina dewleteke kurd.

Her weha binêre: Li Lêgerîna bêhêvî ya li çareserîyeke dîplomatîk

1 Jeune Afrique , 17-23 çirîya pêşî ya 1990î

2 Bixwîne, Christiane More, "Les Kurdes à la recherche d'une nouvelle stratégie (kurd li stratejîyeke nû digerin)", le Monde diplomatique, çirîya pêşî ya 1988ê

3 "Les frontières, brûlantes cicatrices du partage colonial (sînor, birînên disojin ên dabeşkirina kolonyal)", le Monde diplomatique, çirîya paşî ya 1990ê

4 Armanca vê projeyê ew e ku herêma başûrojhilat a ku heta hingî paşve hatibû hiştin di warê aborî de bi pêş bixe û bi vî awayî "çîyayîyên serî natewînin" entegre bike

5 Ji bo %80 ta %90ê pêdivîyên xwe, Iraq girêdayîyê ava çemên Dîcle û Firatê ye. Li Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê hin deng bilind dibin û dibêjin bila ava welêt were birîn. Weke mînak bixwîne, Peter Schweizer, "By Water: Close the Taps (Bi avê: henîfeyan bigirin)", International Herald Tribune, 12ê çirîya paşî ya 1990î

6 Hürriyet, 1ê nîsana 1990î

7 Rapora misyona CIMADEyê ya li ser Tirkiyê ya ku di navbera 25ê tîrmehê û 5ê tebaxa 1990ê de hatiye nivîsandin bixwîne

Wergera ji fransî: Luqman Guldivê



DARA ARAM: **Giyana ewran**, boyaxa akrîl li ser tûwalê, 24 x 42 cm

# WÊNESAZÊ VÊ HEJMARÊ

## Dara Aram



Dara Aram, wênesazekî nûjen e ku li Torontoyê dijî. Wî Enstîtûya Hunerên Bedew a Silêmanî û herweha Koleja Hunerî ya Ontarioyê qedandine. Ji sala 1980ê û vir ve hunermend Dara Aram wêneyan saz dike.

Hunermendan peyamên xwe ji mêj ve ye, ne bi mantiq û vegotinên rasterast, lê belê bi dîmenan ragihandine. Hunera Dara Aram jî heman tiştî dike. Ew serpêhatîyek e bo warên xeyalî yên binhiş. Teşeyên razber û mijarên mîtolojîk ku li ser tûwalê peyda dibin, ji bo mirovê nûjen ê dema sanayîyê, ku divê bi ruhê xwe yê wenda têkilîyê deyne, îlhamek e. Ev ruh di bin giranîya cîhana modern, sar û fermî de bêhal maye û li vê cîhanê, berjewendî û hejmar li ser ruhê mirovan serdest in. Di vê serdema makînîze ya globalîyê de pêwîstîya mirovahîyê bi ewlekarîya manewî heye.

Ji par û vir ve, Dara di lêgerîna xwe ya bi azwerî ya li dû wateyê de, hêvî û îlhama xwe di motîfên dîrok û mîtolojîya Mezopotamyayê de peyda kirin. Peyva Mezopotamyayê ku di zimanê yûnanî de tê wateya 'navbera du çeman' welatê bi bereket e ku bi ava Dîcle û Firatê hatiye dorpêç kirin. Ev herêm ku herweha wekî 'dergûşa şaristanîyan' jî tê nas kirin, îro jî di warê qedera mirovahîyê de xwedî cihekî girîng e.

Berhemên wî yên nû berdewamîya lêgerîna wî ya îfadeyên dîmenî yên sebaret bi têkilîyên mirovan ên bi hev du re û sirûştê ye. Ev xebatên nûjen nihêrînên wî yên rojane yên ji balkona mala wî ne, ku li asoya Torontoyê dinihêre... Sîber û xetên razbar, ku digel teşeyên rengîn ên asîman û xwezayê re bûne yek, îlhamê didin van xebatan... Dîmenên avî, asoyên tarî yên şêlo û dirûvên guherbar, xeyalên ruh dewlemendtir dikin... Wênesaz mijara xwe ya berê berdewam dike, lê belê teşeyên razber ên jinan li berhemên xwe yên vê dawîyê zêde kirine. Berhemên wî sade ne û di xeta asoyê de peşên guherbar ên sê tebeqeyên sereke taswîr dike, muzîk û dîroka demê û herweha hawîrdora ku hertim diguhere.

Aram li seranserî cîhanê di gelek galerî û muzexaneyan de 73 pêşangehên takekesî û komî li dar xistine, ku Japonya, Almanya, Swêd, Danîmarka, Norwêc, Brîtanya, Rojhilata Navîn û Amerîkaya Bakur di nav wan cihan de ne. Wênesaz hêjayî gelek xelat û nîşanan hatiye dîtin û gelek dezgehên çapemenîyê digel wî hevpeyvîn kirine. Berhemên Dara Aram di gelek kolleksîyonên şexsî û dewletî de cih digirin ku Sefareta Kanadayê li Danîmarka û Swêdê hin ji wan in. Irvin Zukerê kollektorê navdar ê ku Hamilton a Ontarioyê û hunermendên navdar ên kanadayî Leonard Cohen û Doris McCarthy û Şaredarê Richmond Hillê Dave Barrow û Serokê Dezgeha Polêsan a Herêma Yorkê Armand P. La Barge ew kes in ku xwedî berhemên Aram in. Hunermend Aram gelek berhemên xwe bo dezgehên xêrxwazî, alîkarî û çandî kirine dîyarî. Aram di gelek kolej, zanîngeh, dibistanên seretayî û navendî de ders dane.

Barack Obama yê ku ji ber stratejiya xwe ya lihevkirina li gel komargeran û dîsa ji ber encamên xirab ên di warê aborî û îstîhdamê de hat rexnekirin, niha awayê vegotina xwe diguherîne pêşniyar dike ku bacên dewlemendan bên zêdekirin. Ev banga ku pir kêm şensê wê heye bigihîje encamên berbiçav, gelo armanca wê ew e ku ji bo hilbijartinên 2012ê tesîrê li dengdarên çepgir bike?

Xeyalşikestina çepê amerîkî

# Doza Barack Obama

Eric Alterman *

Di hezîrana 2008ê de, piştî ku ew ji alîyê demokratan ve wekî namzed hat nîşandan, Barack Obama di mîtîngekê de li pêşîya komeke alîgirên xwe yên bi heyecan peyivî û got: *"Em dê bikaribin li rabirdûyê binihêrin û ji zarokên xwe re bibêjin ku me di wê demê de dest pê kir ku li nesaxên xwe muqate bibin û karên baş pêşkêşî bêkaran bikin; di wê demê de avên okyanûsan dest pê kir ku kêm bibin û gerdûna me rehet bibe; di wê demê de me dawî li şerekî anî û ji bo neteweya xwe ewlekarî ava kir û îmaja xwe baştir kir û guherand ser baştirîn hêvîya gerdûnê."* (1) Lê belê heta niha heger serokekî gotina **Mario Cuomo**, ku digot *"kampanyayeke helbestî lê belê birêvebirineke pexşanî"* (2) rast derxistibe, ew jî **Barack Obama** ye.

Wekî ku akademîsyen û rêxistinger **Marshall Ganz**, ku di kampanyayê de bi roleke girîng rabûbû, nîqaş dike, Obama *"bi awayekî di nav sakoya etîkê de pêçandî hat ser kar"* lê belê bêyî ku têbikoşe dev ji vê yekê berda. Ganz vê yekê wekî *"serokatîya veguherînî"* bi nav dike û dirêjahî pê dide: *"Serokatîya veguherînî alîgirên xwe dikişîne nav karê bi rîsk û bi coş a guherandina cîhanê, lê belê di dawîyê de ne cîhan, lê alîgir tên guhertin. Çavkanîyên wê nirxên hevbeş in ku dibin kanîya wêrekî, afirînerî û hêvîyê. Di rêya serkeftinê de pêwîstî bi wan nirxan heye. Ji alîyê din de jî serokatîya veguherînî wekî bazirganîya hespan e ku bi rûtîna xwe didome û hewlê nade ku statukoyê biguherîne, lê belê wê diparêze ku berdewam be."* Obamayê ku di şûna mafparêzîyê de siyaseta lihevkirinê hembêz kir, şûna guhertinê statuko parast.

## Obama peymançêkerek bû, ne kesek ku cîhanê bihejîne

Gelek lîberal li bendê bûn ku serokek, ku ji bo carekê xelk bi rê xist, dikare girseyê ji bo fikir û ramanên xwe yên siyasî, ku bingeha kampanyaya wî pêk dianî, mobîlîze bike û serokatîyê veguherîne. Ev yek hertim xeyaleke pûç û sozên bi mubalexe yên hevbeş ên zilamekî realîst ku diket hilbijartinan û alîgirên wî bû; alîgirên wî îdealîst, lê di heman demê de naîv bûn. Wê fikra birêxistina girseyan hêvî dida ku demokrasîyeke hêzdar û hevpar dikare demokrasîya nûnerî ya du sed salî, ku ji ber hêza pere û berjewendîyên rehdayî biguherîne. Lê belê kêfa Obama yê fersendparêz û lihevker ji vê fikrê re nedihat, herçend wî di axaftinên xwe de bi awayekî din soz didan. Obama peymançêkerek bû, ne kesek ku cîhanê bihejîne. Da ku wê bernameyê yan prensîbê biparêze Obama çi soz dabin dengdarên xwe jî di dema gotûbejên li ser masê de tu îhtîmal li derve nedihat hiştin. Muxalîfên wî ji vê qelsîya wî agahdar bûn û wan helbet ev yek li gor berjewendîyên xwe bi kar anî. Ji gelek alîyan ve serokatîya Obama nisbet bi wê demê ku wî dest pê kiribû, welat kêmtir lîberal kir.

Ji bo Obama, ne hewce bû ku ji bo tiştekî têbikoşe: Di navbera kesên kamil de peyman danîn. Gotinên wî û stratejîya wî ya li ser çêkirina qanûnan her tim ji bo lihevkirin, daxîlkirin û pasîvbûnê bûn. Obama pir caran gazin dikirin ku komarparêz wî rehîn digirin û wekî rehîngîr tev digerin. Wî bi ser hev de çendîn caran fîdye daye û carna jî bexşîşeke comerd. Carekê jî berî ku xeber bistîne, wî bi dilê xwe pere daye.

Helwêsta Obama nikaribû hin guherînên bingehîn pêk bîne. Siyaseta amerîkî bi dema **Bush** re tengasî kişand. A herî balkêş ew bû ku, kêfa komarparêzan ji du-partîzanîyê re nedihat, ku **Obama** kiribû navenda banga xwe ya îdeolojîk. Senator **Jim DeMint** soz dabû ku ew bi reforma pergala tendurustîyê dê pişta serok *'bişkênin'*, ku vê soza wî gelek deng dabû. Serokê hindikahîyên senatoyê yê wê demê **Mitch McConnell** ji rojnameya **National Journal** re gotibû *"Tenha tiştê ku em dixwazin pêk bînin ew e ku Obama bi tenê ji bo sedemekê bibe serok."*

## Rawestina li rîngê û şernekirin

Dema ku ji Obama hatibû pirsîn gelo wî werza tatîlê ya 2010ê, ji bo sala 2011ê çi hêvî dikirin, wî weha bersiv dabû: *"Di Noelê de tenha tiştê ku min hêvî kir muxalefetek bû, ku ez bikaribim pê re muzakereyê bikim."* (3) Lê muxalefeteke weha tu cara çênebû.

## Sozên Obama, li Qesra Spî di navbera du derîyan de winda bûn

Siyaseta pêşîlêgirtinê qaîde bi ser awarteyan de pesend kir û piranîya bilind a li her du Kongreyan bêwate nîşan da, ji ber ku pêştirîyên lîberal, ku li dû hev hatin, yan têk çûn yan jî tu cara nehatin rojevê. Qanûna Vebijarka Azad a Karkeran, ku pêştirîya esasî ya tevgera karkeran, ji hikûmet û Kongreyê piştgirîyeke gelek qels wergirt. Da ku qanûnên xerabe (û di heman demê de xwînmij) yên koçberîyê yên amerîkî werin guhertin, tu tişt nehat kirin. (Dijberî vê yekê dertixûbkirin zêde bû.) Mafên jinan ên sebaret bi zarokanînê hatin tengtir kirin. Dema ku qanûna darayî ya kampanyayan (4) hatin qelstir kirin û jêbirînên bacê yên dema **Bush** hatin berfirehtir kirin û xwînmijî, neyeksanî li hember nerazîbûna raya giştî xerabtir bû, pere him di siyasetê de him jî civakê de hêzdartir bû. Li hember van rûdanên paşdeçûyînê serok **Obama** pir sakîn tevgerîya û da ku zirar bi dilsozîya wî ya du-partîzanî neyê tu tişt nekir. (5)

Di axaftina xwe ya pêşîn de Obama weha soz dabû: *"Rewşa aborîyê ji bo gaveke wêrek û lezgîn hawar dike. Û em dê weha tev bigerin da ku ne bi tenê karên nû peyda bikin, lê belê herweha bingeha mezinbûnê jî biavêjin. Em dê rê û piran ava bikin, tora elektrîkê û xetên dîjîtal saz bikin ku piştgirîya bazirganîya me bike û me bi hev ve girê bide. Em ê cihê ku zanist heq dike bidinê, mucîzeyên teknolojîyê bi kar bînin da ku kalîteya sistema tendurustîyê bilindtir bikin û buhayê wê erzantir bikin. Em dê ji tav, ba û axê sûde werbigirn da ku mekîneyên me pê bimeşin û palûkeyên me bixebitin. Û em dê dibistan û zanîngehên xwe li gor pêwîstîyên nûjen ji nû ve saz bikin. Em van hemûyan dikarin. Em dê van hemûyan bi cih bînin."*

Lê belê sozên ku **Obama** dan, heman rojê di nav *Qesra Spî* de li paş cote-derîyan wenda bûn da ku tu caran venegerin. Di dema muzakereyên mezinbûn û teşeya pakêta teşwîqê de, serok -rast e ku were gotin- hewce dît ku di warê lêçûnan de para şêran a bandorkirinê bide Kongreyê ku bikaribe pêşî li projeyên musrîf ên siyasetmedaran ên li herêmên xwe ên hilbijartinê bigre û berhewa dana bi sedan milyarên jêbirînên bacan ji bo razîkirina siyasetmedarên rastgir ên Komarparêz. Di encamê de pakêt hêja bû, lê belê têra wê yekê nedikir ku serî bi pirsgirêkê re derxe.

## Hikûmet govenda bankayên mezin digerîne

Vê rewşê xwe di dema serokatîya xwe de jî dubare kir. Bi gotina **Paul Krugman**, ji ber tirsa xwarina damgaya 'dij-karsaz' û herweha ji ber ku demokrat ji berê de wekî di berevanîyê de qels weha tên dîtin, hikûmetê biryar da ku 'buhayê wê çi dibe bile bibe, berjewendîyên dezgehên kredîyê biparêze.' Wekî mînak, di dema nîqaşên li ser qanûna reforma darayî de, hikûmetê hertim piştgirî da wan pêşnîyaran ku bankeyan berevanîya wan dikir. Da ku pirsgirêka bingehîn, ku di destpêkê de rê li krîzê vekiribû, were dest nîşan kirin, tu tişt nehat kirin: Sedma pêşîn a krîzê jî ew bû ku ji bankeyan re destûr hate dan ku 'ewqas mezin bibin ku têk neçin.' Bankeyên ku bûbûn sedema krîza 2008ê paşê hisseyên xwe yên hebûnên xwe yên gerdûnî bi awayekî berbiçav zêde kirin û bi vî awayî jî, krîz herçend xerabtir bû jî, ew ji paşeroja xwe ewle bûn.

Herçend di warê çêkirina qanûnan de bi ser ketin jî, ji ber ku wan nekarî kredîya ku wan hêvî dikir, werbigirin, Obama û şirket ji qesta têkilîyên xwe yên digel lîberalan xera kirin û gilî û gazindên nankorîyê ji wan kirin. Dema ku lîberalan gef lê xwar ku di warê têkoşîna reforma tenduristîyê de piştgirîya xwe vekişînin, serfermandarê kufurbaz **Rahm Emanuel**, liberal wekî *"ji serê xwe seqet"* bi nav kirin. (Wî paşê lêborîna xwe ji seqetan xwest, lê belê tu caran ji lîberalan nexwest.) Berdevkê çapemenîyê **Robert Gibbs** jî henekê xwe pê dikir û digot *"çepgirên profesyonel"* û diqêrîya *"ew dê kêfxweş bibin dema ku li cem me jî sîstema tendurustîya Kanadayê hebe û Pentagon were rakirin."* û Obama bi xwe jî tinazê xwe bi hêvîşikestina lîberalan kir û li *Greenwich* a *Connecticutê* mala kesekî bi navê **'Rich Richman'** got *"Xwedêyo, em hîna negihiştine aştîya cîhanê* [bi dengekî bilindtir] *Min got qey ew dê zûtir pêk bihataya".* Di adara heman salê de Obama li cem komeke xwendekaran henek bi reftara rojnameya lîberal *Huffington Post* a li hember **Abe Lincoln** kir. Li vê derê serokekî serdema şer heye, ku hewlê dide da ku bi dora xwe re li hev bike. Dibe ku ev yek mezintirîn mijarên moralê ya welêt bû ku wî ev fam kiribû *"niha karê min ew e ku em di şer de bi ser kevin û yekîtîya xwe berdewam bikin."* Obama ji xwendekaran re got *"Gelo hûn dikarin xeyal bikin ka Huffington Postê derbarê vê de nûçeyeke çawa çêbikiraya? Ew dê gelek tund bibûya. Hela bifikirin Lincoln xulaman difiroşe."*

## Di dîroka partîyê de performansa herî xerab a demokratan

Berîya hilbijartinan, lêdana alîgiran fikreke nebaş e û di talîyê de demokrat bi wan encaman re ku dihatin guman kirin, rû bi rû man. Wan di parlamentoyê de 60 kursî ji dest dan, piranîya wan a di senatoyê de kêm bû û wan deh walîtî wenda kirin. Di asta herêmî de, ku qirar bû ku di navbera dewlet û federalîyê de nexşeya nû ya herêman bihataya xêz kirin û bi vî awayî jî teşeyekê (dirûv/şikl) bidin hilbijartinên neteweyî yên deh salên dahatûyê, Komarxwazan di parlamentoyê de 680 kursî bi dest xistin û wan rekora 628 kursî ya demokratan a hilbijartinên piştî ***Watergatê*** ya 1974ê şikenand. Ev yek di dîroka partîyê de performansa herî xerab a Demokratan bû. Berfirehîya têkçûnê di wê merheleyê de ku ji ber faktorên xaricî dihat guman kirin, gelekî wêdetir bû. Lê heger, dengdar namzedên nekalîfîye yên Partîya Çayê nehilbijartibana, -ku piranîya dengdaran fikrên wan ên siyasî ecêb dibînin-, û piranîya senatoyê biketa destê komarparêzan encam dê xerabtir bibûya. Obama bi axaftina xwe ya sivik, ku dê paşê bibûya markayeke serokatîyê, qebûl kir ku wî di dema serokatîya xwe de qala "*pêwîstîya yekîtîya neteweyî*" û "*serdemeke piştî partîzanîyê*" kiriye, lê belê vê yekê "*ewqas bandor nekirîye*." (6)

Ji gelek alîyan ve, di vê demê de Obama di warê teşeyê de zilamê xelet bû. Di dema muzakereyan de meyla wî ew bû ku li hember gefên Komarparêzan her tiştî qebûl bike da ku peymanekê girê bide. Di dema munaqaşayên li ser firehtirkirina lîmîtên deynan -rutînek, di rabirdûyê de, ne bizaveke nakokîyê bû- Obama perê fîdyeyê pêşîn û pir caran da. Ew ewqas naçar bû ku berdewam kir xwe li ber dengdarên serbixwe wekî kesekî "maqul" nîşan bide, herçend helwêsta wî bi siyaseta wî re li hev nedikir jî.

Peymana saeta 11emîn a dawîyê pêşî li jêbirinên 2.4 trîlyon dolaran a ji bernameyên hikûmetê, ku bi awayeki biryardar xelet hatibû terîf kirin, dihewand. Ji helwêsta siyasî, peymanê li komarparêzan, ku piranîya wan ji Partîya Çayê pêk tê, 98 dersed pêşnîyar kir, ku wekî ku berdevkê parlamanetoyê **John Boehner** (7) pê serbilind bû û digot wî ev rêje li ser navê wan xwestibû. Rojnameya pêkenînê bi serenavekî henekî, lê belê herweha tûj Obama weha bi nav kir kir ku ew "ji demokratan û yên wekî demokratan tawîzên dijwar ên wekî hev" dixwaze. Jê cidîtir, senatorê **Illinois**, **Richard Durbin** ev peyman wekî "defnkirina dawî ya **Maynard Keynes**" bi nav kir. Wî got: "Ew [Maynard Keynes] di 1946ê de miribû, lê belê weha xuya dike ku em dê bi vê peymanê wî bigihînin rehmetê." (8)

Di vê peymanê de ne tenê lîberal têk çûn, lê belê aborîya amerîkayê jî têk çû, digel wê herweha mebestên siyasî yên demokratîk jî têk çûn.

## Obama tu caran gunehkarên rasteqîn yên sedema pirsgirêkê, bi nav dest nîşan nekirin

Tedbîrên teserûfê yên hikûmetê, buhayên wan çi dibe bile bibe, di demeke weha de pêk hatin ku bêkarî gelek zêde ye. Obama temîn dikir ku derdora deh dersedê karkerên amerîkî bêyî ku mafên wan ên xebatî hebin, di hilbijartinên 2012ê re derbas bibin. Ev yek wekî siyaset û prensîbên xerab xuya dike. Kêfa **Wall Street** jî ji vê peymanê re nehat. Roja ku Obama qanûn îmze kir, Endeksa Sanayî ya Dow Jones jî yan bi hemû xalan yan jî 2.2 dersed ket û du roj paşê jî du caran dîsa ket –512 xal, 4.31 dersed- . Li dû wê, cara pêşîn ***Standart û Poor*** nota kredîyê ya netewî kêm kir. Wekî herdem, Komarparêz bê awarte Obama berpirsyar girt û Obama jî kes berpirsyar negirt. Di şûna wê de, wî "lihevkirin" hembêz kir, ku ne populer bû. (9) Şêwirmendên wî rexne li lîberalan digirt ku ew qîma xwe bi tiştekî naynin, ji ber ku rewş dikaribû xerabtir bibûya. Psîkologê siyasî Drew Westin bal kişand ser helwêsta Obama ku wî tu caran berpirsyarî nexist stûyê muxalifên xwe -hetta wî tu caran qebûl nekir ku muxalifên wî hene: *"Herçend serok dixwaze bibe xetîbekî baş, di axaftinên wî de hertim tiştek kêm e: Zilamên nebaş ku bûn sedema pirsgirêkê, ku hertim li derve hatin hiştin, bi şêweyekî ne-şexsî tên bi nav kirin, yan jî bi dengekî pasîf. Tu dibêjî qey qebehet û kambaxîya wan ên din di pirsgirêkê de qet nîne. Lê ne dîyar e ka Obama weha dipeyive ji ber ku ew naxwaze bi donorên kampanyaya xwe re pev biçe, ku donor îro zora partîyan dibin û gef li demokrasîyê dixwin".* (10)

Him wekî **Jimmy Carter** û him jî wekî **Bill Clinton** -ku bi tenê demokrat in ku di pêncî salên çûyî yên siyaseta amerîkî de karibûn bigihîjin serokatîyê- Barack Obama jî hewce dît ku him di siyaseta navxweyî û him jî di siyaseta derve de, nisbet bi dema namzedîya xwe bibe serokekî muhafezekartir. Piştî ku Obama peymana deyn îmze kir, ew pê serbilind bû ku peyman dê pêşî li *"ji dema serokatîya **Dwight Eisenhower** û vir ve kêmtirîn teserufên salane yên nav welêt"* veke. (11)

Wateya vê yekê ji bo sala 2012ê çi ye? Pêşî, ev yek dê di warê pêştirîyên demokratan de nabe astengek. Rast e ku bi tenê endamê sosyalîst ê serbixwe yê Dewletên Yekgirtî **Bernie Sanders** got ku ew dê "fikreke baş" be heger serok bi muxalefeteke esasî re rû bi rû bimîne. Û heger Obama serokê tevgera sosyalîst a Amerîkayê bûya ew dê bi muxalefetekê re rû bi rû bimaya, lê jixwe wê demê ew dê nebûna serok. Xebera Sanders bû ku wî got *"ji ber serok hêvîya bi mîlyonan amerîkîyan şkandîye; di warê ewlekarîya civakî û gelek warên din de, tiştên ku niha Obama dike gelek cudatir in ji wan sozên ku wî wekî namzed dabûn. Sedem çi dibe bila bibe di muzakereyan de ew gelek qels ma, ku kes nikare bawer bike.*



William N. Copley: **Bênav**, 1980

www.arsivakurd.org

*Ev yek jî hêvîşikestineke mezin e."* Wî îddîa kir ku *"ji ber nebûna muxalefeteke esasî Serok dikarî ew qas ber bi rastgirîyê ve here."* (12) Dema mirov bifikire ku ka komarparêz çi qas ber bi rastgirîyê ve çûne û wan çawa karibû pêşî li hemû înîsîyatîfên serok bigirin, dijwar e ku îddîaya wî neyê pejirandin.

**Ne îspanyol, ne cihû ji Obama razî ne**

Rast e ku di nav çepgiran de kesê ji Obama razî tuneye. Alîgirên wî yên bi eslê xwe îspanî "nememnûn" in. Cihû jî gazinan dikin, lê belê bi tenê rêxistinên profesyonel û donorên cihû bi awayekî aşkere nerazîbûna xwe dîyar dikin. Hemcinsger dixwazin bi hevdu re bizewicin. Jin jî ji axaftina wî ya li ser sîstema tendurustîyê jê bi hêrs in. Jîngehparêz ji bo perîyoda pêşîn nota **F** didin wî, an ku di sinifê de dimîne. Min qala şerê li Afganistanê, azadîyên medenî û berfirehtir kirina hêzên serokwekî ku Bush kiribû- nekir.

Lê belê, vê hêrsê, xwe di hilbijartinan de dîyar nekir, ji ber ku xelk şûna şermezerkirina wî, tengezarîya wî fam dike.

Li cem kesên ku xwe lîberal bi nav dikin, rêjeya razîbûna ji **Obama** (her weha li cem hindikahîyan) hîna jî bilind e. Hin lîberal çiqas hêrs bibin jî- ku ez jî yek ji wan im- tirsa ji ber namzedên komarparêzan, nemaze jî pêşengê wan teokrat **Rick Pery**. Ji ber ku Obama gelek hindik sozên xwe yên dema kampanyaya xwe bi cih anîn û niha ditirse ku serkeftina wî ya sala 2008ê bikeve destê rastgiran, Heger ku kêfa wan bi namzedan neyê dengdarên çepgir, ku xwendekar û hindikahî jî tê de, roja hilbijartinan dê neçin ser sindoqan. Helwêsta ku digot *çepgir jixwe yên me ne*, xuya bû ku ne rast e. Obama ji zû de heyecana serokên wan -her çiqas qels bin jî- çilmisand ku helwêsta wî û şêwirmendên wî li hember wan kesan ku têkoşîneke domdar dixwest, da ku sozên hilbijartinê bi cih werin, piçûk xist. Reqîbê wî yê komarparêz kî dibe bile bibe ev yek dê roja hilbijartinan derkeve pêşîya wî. Rewşa ecêb ew e ku herçend Obama ji alîyê çapemenîyê ve wekî "sosyalîst" û "radîkal" tê bi nav kirin jî, di siyaseta wî de nêzîkbûna wî ya ber bi muhafezekarên rastgir heye. Dema ku tirsa wî ya di warê teşwîqan de, bi hembêzkirina wî ya israrên rastgiran a demeke weha de ku pêwîstî bi perexistinên dewletî heye, werin cem hev Obama di warê fikara herî mezin a Amerîkayê an ku di warê kar de nikare rekorekê bişkîne. Bêkarîya li welêt di asteke gelek bilind de, 9.1 dersed, berdewam dike. Tu serok, bi van hejmarên ku li pêş me ne, ji bo careke din nehatiye hilbijartin. Heger weha be jî, serok bawer dike ku ew dikare xwe wekî "zilamê naverastê" nîşan bide. Lê mixabin, em di kêlîkeke dîrokî de dijîn, ku tu kes nikare naverastê bi dest bixe.

* Rojnamevan, nivîskarê pirtûka *Kabuki Democracy. The System vs. Barack Obama,* Nation Books, NewYork, 2011. Tebax 25, 2011

1 Jeff Zeleny, "Obama clinches nomination; First black candidate to lead a major party ticket", *The New York Times,* 4 juin 2008

2 Kevin Sack, "Cuomo the orator now soliloquizes in book form; Disclaiming greatness, he labors on: An embryonic idea here, an honorarium there ", *The New York Times,* 27 septembre 1993

3 Marcus Baram, "Alter's "the promise" epilogue: Obama team's dysfunction prompted lack of focus on jobs, Bill Clinton annoyed at White House", www.huffingtonpost.com, 30 kanûn 2010

4 Binêrin li nivîsa Robert McChesney û John Nichols, "Li dewletên Yekbûyî, medya, deshilat û dirav fuzyona xwe bi dawî dikin", *Le Monde diplomatique,* tebax 2011

5 Binêrin li nivîsa Serge Halîmî, "Gelo mirov dikare Dewletên Yekbûyî biguherîne?", *Le Monde diplomatique, çile* 2010

6 Ji nava nivîsa RichardWolffe, *Revival: The Struggle for Survival Inside the Obama White House,* Crown Publishers, NewYork, 2010

7 CBS Evening News, 1'ê tebaxê 2011

8 "Sê têkçûnên BarackObama", Bexçika dîplomatîk, 3 tebax 2011,www.monde-diplomatique.fr

9 *Cf.* Ben Smith, "Tense moments at common purposemeet", *Politico,*Washington, DC, 3 tebax 2011

10 Drew Westen, "What happened to Obama?", *The NewYork Times,* 7 août 2011

11 Ji nivîsa Jared Bernstein, "A few more comments on the pending deal", On the economy, http://jaredbernsteinblog.com, 1er août 2011

12 "Why Obama's base won't revolt", www.thedailybeast. com, 27 juillet 2011

Wergera ji îngilîzî: Celîl Kaya

## DI DESTPÊKÊ DE SIYASETA AMERÎKÎ, DI DERBARÊ ÎSRAÎL/FILISTÎNÊ DE, 1948

# Gava Washingtonê di venasînê de dudilî dikir

IRENE GENDZIER *

Li gor daxuyanîyên fermî yên ji Washington û Tel Avîvê yên havîna 2011ê tu tişt jê girîngtir nîne ku pêşî li Rêveberîya Filistînî were girtin da ku nikaribe derkeve pêşîya Civata Giştî ya Neteweyên Yekgirtî û bi vî awayî jî nikaribe ji bo ragihandina xwe ya yekalî ya serxwebûna Filistînê piştgirîyê bistîne.

Divê, ev helwêsta Amerîka (DYA) û Îsraîlê û berhevdana nepenî ya digel Îsraîlê were binxêz kirin, ku tê îdîa kirin ku Îsraîl endameke 'civata navneteweyî' ye û bi huquqê ve girêdayî ye û ji vê civatê daxwazên siyasî yên nerewa dike.

Lê heger li siyaseta Filistînê ya Amerîkayê ya sala 1948ê were nihêrtin ev îmaja heyî nerast derdikeve. Di wê demê de, Washingtonê pêkanîyeke ragihandina serxwebûnê ya ji alîyê Îsraîlê ve wekî gefeke li dij berjewendîyên xwe yên li herêmê didît.

Di 1948ê de wezareta karûbarên navxweyî, wezareta berevanîyê û ***CIA*** ji encamên serxwebûna Îsraîlê bi awayekî aşkere endîşe dikirin. Şêwirmendê taybet ê serok **Truman**, **Clark Clifford** û çend kesên digel wî li hember vê endîşeyê derdiketin; ew di wê bawerîyê de bûn ku naskirina Îsraîlê ya ji alîyê Amerîkayê li gor berjewendîyên Amerîkayê ye. Bi ser de jî **Clifford** daxwaza serxwebûneke bi destê ***Qesra Spî*** dikir û bi israr digot jixwe dewleteke cihûyan heye û tiştê maye bi tenê ew e ku Amerîka vê dewletê berîya Yekîtîya Sovyetê nas bike.

Di vê pevgirêdanê de çendîn xal hene ku hêjayî destnîşankirinê ne. A yekemîn bibîranîna şert û mercên zivistana 1948ê yên li Filistînê ne ku bûbûn sedem ku serokê Amerîkayê bike ku piştgirîya xwe ji *Biryara Pêşnîyarê* ya ji bo parçebûnê vekişîne.

A duyem jî ew bû ka Amerîka di arefeya vekişîna Brîtanyayê ya ji Filistînê, rejîmên ereb çawa dinirxandin û fikarên domdar ên karbidestên amerîkî ku digotin dewleteke cihû ji bo berjewendîyên amerîkî pêwîstîyek e. Xala sêyem jî ew e dema derket holê ku fikarên bi vî rengî ne rast in, sanayîya neft û berevanîyê yên amerîkî gihîştin wê encamê ku zerengîya leşkerî û meylên siyasî yên dewleta nû dikare van berjewendîyan biparêzin. Siyaseta amerîkî jî li gor vê yekê hat guhertin.

Di zivistana 1948ê de karbidestên amerîkî û serokê amerîkî li hember pevçûna bêdawî û pêkanîna wê hêzê ku vê yekê pêk bîne, nêzîk bûbûn ku dev ji biryara pêşnîyarê ya Neteweyên Yekgirtî ya ji bo parçebûnê (Hejmar 181) berdin. Di şûna piştgirîya pêşnîyarê, Washingtonê piştgirî da agirbestekê, daxwaza li hevdu bawerbûneke demkî, lê belê parçebûn jî bi giştî neda alîyekî; talox kir.

Hevdem, nedibû ku pêşveçûnên li Filistînê werin paşguh kirin. Di 3ê gulanê an ku yanzdeh roj berîya vekişîna Brîtanyayê ya ji Filistînê, sefîrê Qudusê yê Amerîkayê hilweşîna hikûmeta Filistînê ragihand û hişyarî da *"heta ku hêzeke bi rêkûpêk a qanûnî ya ereban werin, em li bendê ne ku piştî vekişîna Brîtanyayê hêzên cihûyan piranîya bajêr bi rê ve bibin."* (1) Heman rayedar di meha nîsanê de ragihand ku hêzên cihûyan li ***Jaffa***yê operasyonên şerût û bêberpirsîyar bi rê ve birine û li ***Deir Yassinê*** komkujî pêk anîne, wî herweha bûyerên ku di heman demê de li ***Hayfa***yê pêk hatibûn jî ragihandin.

### Têkiliyên fermî yên tengijîner

Sefîrê amerîkî dîyar kir ku di destpêka gulana 1948ê de brîtanî û yên din li hev kirine ku *"Heger artêşên bi rêkûpêk ên ereban neyên, cihû dê bikaribin her derê paqij bikin. Wekî mînaka Hayfayê bi operasyona leşkerî dagîrkirina **Haganah**ê, operasyonên wan dikarin asayîşê pêk bînin."* (2) Asayîşeke çawa? Brîtanî, îraqî û amerîkîyan Hayfa bi piranî ji ber rafînerîya wê ya neftê nas dikir ku bi rêya xeta lûleya IPC, petrola Îraqê lê dihat palandin. Ji bo îraqîyan bi destxistina rafînerîyê ya ji alîyê cihûyan ve nikarîbû bihata qebûlkirin û vê yekê tora têkilîya navbera karkerên filistînî û cihûyan xera kiribû.

Piştî demeke kurt, **Robert McClintock**, paşê digel şandeya amerîkî li cem NY, şirove kir ku Civata Ewlekarîyê dê di demeke nêzîk bi vê pirsyarê re rû bi rû bimîne; gelo *" êrişên artêşa cihû yên li Filistînê meşrû ne, yan jî ev êriş ji bo aştî û ewlekarîya navneteweyî gefek in û dê Civata Ewlekarîyê naçar bimîne ku hin tedbîran bistîne."* (3) **McClintock** herweha dîyar kiribû ku heger artêşên ereban bikevin Filistînê ev yek dê bibe sedem ku hêzên cihû bibêjin *"dewleta wan di bin êrişeke leşkerî de ye û ew dê hewlê bidin wê rastîyê veşêrin; ya ku li Filistîne êrişan pêk tîne artêşa wan e û ev êriş dibin sedema dij-êrişên ereban."* Amerîka jî naçar dimîne ku mudaxele bike. (4)

Talîyê, deh rojan piştî vekişîna Brîtanyayê, **George C Marshallê** wezîrê karûbarên navxweyî yê amerîkî bi pêş-şertekê ku rejîmên ereb ew dê bixwe binirxîne hin ofîsên dîplomatîk hilbijartin. Derbarê wan tiştan de ku dê bihatana serê dinyayê hin fikrên wî hebûn.

Vê tevlihevîya siyasî û aborî hikûmeta Îraqê xist xeterê û Îraqê nikaribû ji wan yekîneyên leşkerî yên ku berê şandibûn bêhtir leşkeran bişîne. Serê Misirê jî bi darbe û tevlihevîyan di belayê de bû. Ji ber ku ew li dijî brîtanîyan derketibûn, destê wan de gelek hindik çek hebûn û ên heyî jî ji bo asayîşa nav welêt hewce bûn. Ne artêş, ne jî çekên Sûrîyeyê hebûn ku mirov qala wan bike. Ji ber ku fransiz sê sal berê vekişîyabûn, Sûrîyeyê hîna nikaribû ji xwe re artêşekê ava bike. Artêşeke rast a Lubnanê jî nebû û artêşa Suûdîyê jî gelek piçûk bû, ku bi zorê têra kontrola eşîrên li welêt dikir. Hesûdîya navbera Erebistana Suûdî û Sûrîyeyê û ya navbera hikûmeta Haşimî ya Urdunê û Îraqê jî dibûn sedem ku ereb bi hêzên xwe yên heyî tiştê herî baş ku karibûn bikin, nekin. (5)

Şiroveyên **Marshall** ên li ser Misirê ji alîyê sefîrê amerîkî ve hat piştrast kirin ku wî digot çekên ku di destê artêşa Misirê de têrê nakin û ev jî encama wê yekê ku Misirê nexwestibû ku Brîtanî çek bidin wan. Wekî ku **Marshall** dest nîşan kiribû, artêşa Urdunê muhtacî efserên brîtanî bû. Li hember şert û mercên bi vî awayî, **Marshall** hişyarî dabû ku *"lê belê, ev yek nayê wê wateyê ku di demeke dirêj de dewleteke cihûyan wê li hember neyartîya welatên ereb bi tena serê xwe li ser pîyan bimîne."* Û ev empatî weha şirove kiribû *"heger cihû guh bidin şîretên tundrewên xwe, ku piştgirîya siyaseteke piçûkxistinê ya li dij ereban dikin, dewleteke cihû, ku were damezirandin, dikare bi tenê alîkarîya ji derveyî welat ser pîyan bisekine."* (6)

### Berî her tiştî petrol

Jixwe, him di dema ragihandina serxwebûna Îsraîlê de û him jî piştî wê, rayedarên amerîkî reftarê li hember penaberên filistînî şermezar kiribû û bang kiribû ku penaber vegerin. Ev fikra serokê amerîkî bû, ku wî dema ku brîtanî hîna li Filistînê bûn, bang li wan kiribû ku destûrê bidin da ku 100.000 penaberên cihû werin Filistînê.

Heger çiqas em naveroka hevpeyvînên taybet ên serok **Truman** ên digel karbidestên cihû, ku serokê yekem ê Îsraîlê **Chaim Weizmann** jî tê de bû, nizanin jî, heger em bandora tevgerên sîonîst ên li amerîkayê li ber çavan ragirin elîtên siyaseta derve yên amerîkî derbarê rîskên li hember berjewendîyên amerîkî yên li Rojhilata Navîn hişyarî dabû, ku wan digot pêşdeçûna berjewendîyên warê neft û berevanîyê ya sala 1948 aşkere ye.

Lê belê derket holê ku rewş ne wekî dîtina wan bû. Sedemên li paş xeletîya wan bawerîya wan "têkilîyên taybet" bûn ku di navbera Washington û Tel Avîvê de bi pêş diketin.

Salekê piştî damezirandina Îsraîlê re wezareta navxweyî û ya berevanîyê, ku berê xwedî endîşeyekê bûn ku Îsraîl dikare zirarê bide berjwendîyên amerîkî yên li herêmê, îcar helwêsta xwe ya rexnegir guhert û pesnê piştgirîyeke pêkan a Îsraîlê ji bo wan berjewendîyan da.

Karbidestên amerîkî bi awayekî aşkere dîyar kir ku herçend fikra raya giştî ya ereban û daxuyanîyên serokên wan li hember helwêsta piştgir a amerîkî ji bo Îsraîlê rexnegir in jî, vê yekê bandoreke neyînî li ser berjewendîyên aborî yên amerîkî nekiriye. Di adara 1948ê de karbidestên amerîkî yên li NY hatin agahdar kirin ku suûdî di wê nêrînê de ne ku *"pevçûna li Filistînê pevçûneke navxweyî ye û ji bo dewletên ereb gelek girîng e ku tiştekî nekin da ku sedemekê bidin Civata Ewlekarîyê ku li Filistînê hêzê bi kar bîne."* (6) Rayedarên amerîkî ku wezîrê navxweyî jî tê de ji vê helwêsta suûdîyan gelek razî bûn.

Encama dawîyê ew bû ku berjewendîyên amerîkî yên ji neft û berevanîyê, her du jî wê demê li Erebistana Suûdî bûn, zirar nedîtin. Serokên şirketên amerîkî bi endîşe digot dibe ku suûdî peymanên wan ên neftê betal bikin, lê belê ev yek pêk nehat. Herweha, li hember berfirehtirbûna kontrola şirketa qirase ya amerîkî ya neftê ***US Aramco*** ya li ser nefta li deryayan, tu hewldan pêk nehatin.

Di zivistana 1948ê de hin pêşveçûnên din pêk hatin. Dezgeha Cihû qebûl kir ku mebestên sereke yên siyaseta Rojhilata Navîn ya amerîkî ew pêk tînin û lewma wan hewl da ku berjewendîyên amerîkî yên ji neftê biparêzin. Di zivistana 1948ê de **Max Ball** gerînendeyê beşa neft û gazê ya wezareta navxweyî, ku wekî yek ji kesên herî agahdar a li ser nefta amerîkî û ya navneteweyî navdar e, digel nûnerê sereke yê ***Dezgeha Cihû*** yê li Dewletên Yekgirtî kom bû. (7) **Eliahu Epstein** (paşê Elath) endamê *Komîteya Şêwirmendîya Siyasî ya Dezgeha Cihû,* endamê *Konseya Serokatîya Giştî ya Sîonîst* û gerînendeyê *Nivîsgeha Dezgeha Cihû ya li Amerîkayê* bû. Kombûna wî ya digel **Ball** di demeke weha de pêk hat ku *Meclîsa Nûneran a Dewletên Yekgirtî* li ser mijara 'Têkilîya Neftê ya digel Berevanîyê' hin civîn li dar dixistin. Di van civînan de ew yek dihat binxêz kirin ku siyaseta neftê ya amerîkî di navenda siyaseta derve ya amerîkî de ye, ku ***Bernameya Marshall***ê jî tê de ye. Ev yek li dij wê keleporê û ji ber baldarîya Ball ji bo dîtina neftê li Negevê, Ball da bin cengê *Epstein* da ku alîkarê serokê *Aramco,* gerînendaeyê *Socony Vacuum* û alîkarê serokê *Standart Oil* a ji *New Jersey* jî tê de digel rêveberên şirketên neftê yên amerîkî hevdîtinan pêk bîne. Baldarîya îsraîlîyan ji bo siyaseta neftê ya amerîkî berîya 1948ê dest pê kir.(8) Lê belê dema ku **Max Ball** di zivistana 1948ê de digel *Epstein* kom bû û pêşnîyar kir ku bendewarîyên berjewendîyên neftê ya amerîkî ya li Rojhilata Navîn bi cih bînin, ev yek ji bo dîyarkirina siyaseta amerîkî ji bo herêmên neftê yên welatên ereban serdemeke teşegir bû.

Pêşketinên li jorê derbarê helwêsta baldar a Dezgeha Cihû li hember siyaseta neftê ya amerîkî ji bo rayedarên amerîkî yên berpirsyarên vê sektorê sînyaleke erênî bû. Herweha, ev siyaset li hember nêrînên hêzdar ên karbidestên hikûmetê û şirketên mezin ên sektora neftê bû ku piştgirî dida dewleteke cihû û lewra jî berjewendîyên xwe yên bi vî rengî xistin xeterê. Têkilîyên di navbera Îsraîl û berjwendîyên neftê yên amerîkî yên di vê serdemê de, hêjayî lêkolînê ne.

Hêjayî bibîranînê ye ku dubare nirxandina dewleta nû ku çi bigre piştî bûyerên gulana 1948ê pêk hat, di esasê de ji ber faktorên sereke yên pirhejmar bû. Di nav wan de hin faktor hebûn ku bûn sedem ku artêşa amerîkî bigihîje wê encamê ku di warê 'kontrol kirina' Rojhilata Deryaya Spî û Rojhilata Navîn û herweha di warê parastina berjewendîyên neftê yên amerîkî de, Îsraîl dikare xwedî roleke girîng be. Lê belê ev yek li pêşîya naskirina girêdayîbûna piştgirîya derve, yan jî pêwîstîya çareserkirina pirsgirêka penaberên filistînî nedibû asteng. Şert û mercên bi vî rengî li alîyekî, artêşa amerîkî amade bû ku li xwe mukir were û bibêje ku Îsraîlê tewazina hêza leşkerî ya li herêmê guhert û vê yekê jî guherîna siyaseta wan biheq derdixist.

Di 7ê adara 1949ê de serfermandarê hêzên asmanî yên amerîkî ji bo serfermandarên hevbeş daxuyanîyek sebaret bi 'Berjewendîyên Stratejîk ên Amerîkî li ser Îsraîlê' şand ku tê de pêwîstîya dubare nirxandina siyaseta wan bi awayekî aşkere dihat ragihandin.

Tewazina hêzan a li Rojhilata Navîn û Nêzîk ji binî hat guhertin. Di wê demê de ku dewleta Îsraîlê hîna nû dihat damezirandin, gelek nîşaneyan dîyar dikir ku li hember muxalefeta Yekîtîya Ereban temendirêj nabe. Lê belê niha Îsraîl ji alîyê Amerîka (DYA:Dewletên Yekgirtî yên Amerîka) û Brîtanyayê ve hatiye nas kirin û mumkin e ku di demeke nêzîk de bibe endama Neteweyên Yekgirtî. Îsraîlê herweha bi hêza çekan nîşan daye ku mafê wê heye ku li Rojhilata Navîn û Nêzîk digel Tirkîyeyê wekî hêzeke leşkerî were hesab kirin. (9)

### "Bi zora çekan"

Di ronahîya pêşveçûnên bi vî rengî de, heman çavkanî digihîje wê encamê ku '*wekî encama piştgirîya wê ya ji bo Îsraîlê dibe ku Amerîka ji vê rewşa nû ya siyasî avantajên stratejîk bi dest bixe.'* (10) Di esasê heman hesaban de, serfermandarê hêzên asmanî yên amerîkî bang kir ku li ser 'Hedefên Stratejîk ên amerîkî, ku digihîjin Îsraîlê' kûr bibin û pêşnîyar kir ku li alîkarî û perwedehîya leşkerî were fikirîn û jê girîntir divê pêşî li bandora Sovyetan a li ser dewleta nû were girtin.
Her ev hesab bûn sedem ku siyaseta amerîkî ya sebaret bi Filistînê dubare were nirxandin, ku bere bere pirsgirêk bi tenê wekî pirsgirêkeke penaberan didît û ji çarenûsa dewleteke Filistînê cuda dikir.

*Li Zanîngeha Bostonê Profesora Beşa Zanistên Siyasî, Tebax 29, 2011

1 Gulan 3, 1948, Ji Sefîrê Giştî yê Qudusê (Wasson) bo Wezareta Derve, FRUS 1948, V, beşa 2, rûpel 889

2 Gulan 3, 1948, Ji Sefîrê Giştî yê Qudusê (Wasson) bo Wezareta Derve, FRUS 1948, V, beşa 2, rûpel 889

3 Gulan 4, 1948, Reşnivîsa Daxuyanîyê , FRUS 1948,V, beşa 2, rûpel.894-895

4 Heman çavkanî. Rûpel 895

5 Gulan 13, 1948,Wezareta Dewletê ji bo hin Nivîsgehên Dîplomatîk, FRUS, 1948,V, beşa 2, rûpel 983-984

6 Adar 13, 1948,Wezîr li Erebistana Suûdîyê (Childs) ji Wezareta Derve re, FRUS 1948,V, beşa 2, rûpel 719

7 Sibat 18, 1948, Daxuyanîya ji bo for M. Shertok, No. 210, Belgeyên Siyasî û Polîtîk, çirîya paşîn 1947-gulan 1948. Arşîvên Dewleta Îsraîlê, Arşîvên Navendî yên Rêxistina Sîyonîst a Cîhanê , Qudus 1979, rûpel 354

8 Zohar Segev, "Têkoşîna ji bo Hevkarî û Hevrebûnê: Sîonîstên amerîkî û nefta ereban, 1940ê," Lêkolînên Rojhilata Navîn, îlon. 2006, cîld.42; rûpel 821, n.5; rûpel 829, n.7 û 8

9 Adar 7, 1949 Daxuyanîya serfermandar., rûpel 181

10 Heman çavkanî

Wergera ji îngilîzî: Celîl Kaya

Serdema ku artêş di navenda pergala endustrîyê de bû, bi dawî hat. Artêşa ku heyameke dirêj e bi tena serê xwe maye, divê qîma xwe bi techîzateke teknolojîk a kevin bîne, di demekê de ku produktorên nû yên techîzatên leşkerî ketine nav reqabeta ji bo îxracatên Rûsyayê. Serokdewlet Dmitri Medvedev planeke berfireh a veberhênanê radigihîne.

## TEÇHÎZATEKE BINAVÛDENG LÊ KEVIN

# Rewşa kambax ya endustrîya leşkerî ya Rûsyayê

VICKEN CHETERIAN *

Serkeftina di şerê brûskî [rêbazeke êrişê ku tê de hemû hêzên leşkerî têne seferber kirin da ku serkeftineke kamil bi dest bikeve] yê beramber *Gurcistanê* de, tebaxa 2008ê, Moskova bi rengekî qet'î piştrast nekir û her cotmeha piştî şerî, Moskovayê dest avête verêkxistineke tevahî ya hêzên xwe yên leşkerî. **Alexandre Golts** dîyar dike ku *"Rêveberên rûsî karekî pir şarezane kir. Kêm caran diqewime ku dewletek piştî bidestxistina serkevtinekê rabe dest bavêje reforman. Lê belê, di vê rewşa nimûneyî de, tevî deh salên bixêrûbêr, ku fermandarîyên leşkerî yên cihê çavkanî û piştgirîyên girîng wergirtin, krîza 2008ê nîşan da ku artêşa Rûsyayê pîr e û nikare çekên modern baş bi kar bîne. Piştî gihiştina bi vê qenaetê bû ku Anatoly* ***Serdyukovê*** *wezîrê bergirîyê yê Rûsyayê plana reforma herî radîkal a van sed û pêncеh salên dawîyê* [piştî şerê Krimê yê di navbera 1853 û 1856ê de] *ragihand."*

Hêj di hengava salên 1990ê de, herdu şerên Çeçenistanê rewşa hesas a artêşê raxistibû ber çavan. Heçî dubendîya bi Gurcistanê re ye, tevî serkevtina berbiçav a Rûsyayê di nav çil û heşt saetên piştî destpêkirina lêkdanan de û tevî agirbesta ku bi mercên Rûsyayê di dawîya pênc rojên lêkdanan de hate girêdan jî, piştî vî şerî, çi di nav efser û fermandaran de, çi di nav sîyasetmedarên pilebilind de, hesasîyeta li ser rewşa artêşê zêdetir bû. Kurte xeleka şerî nîşan da ka heta çi radeyê fermandarî û kontrola artêşê, her wekî techîzata wê ya keşif û ragihandinê, kevin û bêkêr bûbû. Gurcistanê firokeyên şerî nebûn, lê tevî vê yekê, Rûsyayê ragihand ku çar ji firokeyên xwe winda kirine ku dîyar e ketibûne ber topên Gurcistanê. (1)

Tiblîs, bi rexê xwe ve, hê jî îdia dike ku 21 firoke xistine xwarê. Guman tê de nîne ku îmkan û techîzatên artêşa Rûsyayê gelek zêdetir û çêtir in, lê belê, artêşa gurcî, ku xwedana tankên T-72 yên li Komara Çekê nûjenkirî ye, herwiha di bin destê wê de dronên malê Îsraîlê û sîstemên ragihandinê yên modern hene, serdestîya xwe ya teknolojîk raxiste ber çavan.

Beramber meseleya şerê Gurcistanê, rêkxistina çaksaziyeke nû û ji bo nûjenkirina techîzatan hewlên dabînkirina budceyê, nîşaneyên şoka Moskovayê ne. (2) Kanûna 2010ê, serokdewlet **Dmitri Medvedev** ragihand ku di çarçoveya plana nûjenkirina hêzên leşkerî de, ku di heman salê de hate pesend kirin, 22 trîlyon rûble (540 mîlyar euro), anku heta sala 2020ê, ji sedî 2.8ê hasilaya hilberîna giştî ya navxweyî ya salane, hatine terxan kirin. Radeyeke ewqas bilind a veberhênana giştî di sektorekê de ku ji salên 1990ê ve ye her bi îxracatê li ser pêyan maye, dîyardeyeke nedîtî ye ji dema dawîya şerê sar. (3)

### Temenê navînî yê teknîsyenan 58 e

Bo panzdeh salan artêşa rûsî bi techîzata nûnekirî re: Bo nimûne, artêşa hêzên hewayî heta sala 2003yê ti firokeyeke nû wernegirt û ji hingê ve, bes çend firokeyên din lê hatine zêde kirin. **Medvedev** bi xwe dîyar dike ku bi tenê ji sedî 15ê cebilxaneya leşkerî ya berdest şayanî navê *"şahasera teknolojîyê"* ye.(4) Armanc bi van tedbîrên dawîyê ew e ku bihêlin artêş kêmasîyên xwe temam bike û derengmayîna xwe telafî bike, bi şiklê ku heta 2015ê ji sedî 30ê techîzata xwe bi materyelên modern nûjen bike.

Lê belê, ne teqez e ku dewlet dikare bigihe van armancên xwe. Heyama Sovyetê, berevanî di merkeza aborîyê de bû. Herçend gelek zehmet be mirov nirxandineke deqîq jê derîne jî, em



DARA ARAM: **Rîtmên Mezopotamyayê VIII.**, boyaxa akrîl li ser tûwalê, 36 x 36 cm

dikarin bibêjin ku hingê hewlên leşkerî, li gor heyamên cuda, ji sedî 20 heta ji sedî 40ê hasilaya hilberîna giştî ya navxweyî ya salane bi xwe ve digirt. (5) Piştî belavbûna Yekîtîya Sovyetan, êdî muşterîyên bîyanî bûn yên ku biryar bi berbelavbûn an jî jinavçûna karên sektorê didan, lewre sektor bi tenê li ser îxracatê mabû. Rûsyaya piştî Sovyetan ne karî çekên nû dabihêne, ne jî karî çekên heyî pêş bixe.

### Ji ketina Yekîtîya Sovyetan ve, bi hezaran zanyaran welatê xwe bi cî hiştiye; gihiştin û wergirtina bisporên nû hema bêje rawestiyaye

Techîzatên heyî hemû, ji bilî du îstisnayan, di dema rejîma komunîst de hatibûne dahênan û çêkirin. Firokeya şerî ya neslê pêncê ***Sukhoi T-50***, ku reqîba *F-22 Raptora Lockheed Martin* e ku niha di artêşa DYAyê de tê bi kar anîn û heta îro li esmanan tu reqîban nas nake. Nimûneya wê ya pêşîne, ku serê 2010ê hate ceribandin, ji niha ve artêşên hindî, vîetnamî û rûsî cezb kirine, tevî ku bispor bawer dikin ku *Sukhoi T-50*, ji ber taybetîyên xwe yên firînê û motora xwe, ji firokeyeke neslê pêncê bêtir firokeyeke pêşketî ya neslê çarê ye. Hêvîya din a teknolojîya hûrbîn a rûsî fuzeya nav-parzemînî ya *Boulava* ye ku wê jî, bi rexê xwe ve, kêmasîyên teknîk hene. *"Her ceribandineke wê bi xetayeke parçeyên wê tûşî şkestê bû"* dibêje Gots. Bi ya wî, ev kêşe ji ber *"qutbûna xeleka hilberîna endustrîyel diqewime ku ev qutbûn nahêle endustrîya berevanîya rûsî bi serî* [wek rêzeke berheman] *hilberîne."* Ji ketina Yekîtîya Sovyetan ve, bi hezaran zanyaran welatê xwe bi cî hiştiye; gihiştin û wergirtina bisporên nû hema bêje rawesta. Hêj ji vê jî girîngtir, kompleksa endustrîya leşkerî, ku ti hewleke nûjenkirinê jê re nehatibû encam dan, bere bere ji hev ket… Di nav endustrîya berevanîyê de ev yek bû sebeb ku nûjenkirina neslên techîzatan bi zehmet bikeve: temenê navînî yê teknîsyenên sektorê 58 sal e.

Di çarçoveyeke wiha de, ihtimaleke kêm e ku Rûsya bikare bigihe radeya produksîyona xwe ya caran. Adara 2006ê, piştî seredaneke **Vladimir Putin** bo Cezayîrê, herdu welatan girêbesteke 8 mîlyar dolaran îmze kiribû ku li gor girêbestê Moskovê dê çekên cihê ji artêşa Cezayîrê re dabîn bikirana, ji wan sî û pênc firokeyên şerî ***MIG-29***. Sala 2008ê, Cezayîrê panzdeh ji firokeyan, ku di nav du salên pêştir de wergirtibûn, bi qenaeta ku *"kalîteya wan baş nebû"* paşde vegerandin. MIGên rûsî du kêmasî hebûn: pergala wan a elektronîk ne heman pergal bû ya di girêbestê de hatibû terîf kirin, û herwiha, hindek parçe ji depoyên kevin, ihtimaleke mezin ji dema Sovyetan, dihatin. Moskovê dijayetî li vegerandina firokeyan nekir, demildest dane hêzên xwe yên leşkerî.

Çîroka dawîlênayê ya keştîya veguhastina firokeyan a bi navê **Amiral-Gorshkov** rûreşîyeke din e. Ji ber nebûna îmkanan, înşaata wê keştîyê ku di dema Sovyetan de bi navê "Bakû" ketibû xizmetê û paşê jinûve navê amîral **Sergey Gorshkov** (1910-1988), qehremanê Yekîtîya Sovyetan, lê hatibû kirin, berî ku sala 1996ê bikeve bazarê ji bo firotinê ji kar û fealîyetê hatibû hilanîn. Sala 2004ê, Hindistan lê bû talib û bi 950 mîlyon dolaran (qederê 700 mîlyon euro) jê kirî û wê jî bi rexê xwe ve navê qralekî efsanewî "***Vikramaditya***" lê kir,. Çendîn guhartin di peymanê de hatibûne pêşdîtin. Bi vî rengî qirar bû fuzeyên kruvazîyerê jê bêne derxistin da ku ji fîloya hewayî re ciheke zêdetir bimîne. Piştî çendîn kêşeyên nişkî û hejmareke guhartinên di peymanê de, proje sê caran ji bihayê hatî dest nîşan kirin, zêdetir lêhat û lewma veguhastina keştîyê ji sala 2008ê bo sala 2012ê hate paşve dan. Li Hindistanê, ku yekemîn bikira çekên rûsî ye, meseleya Gorshkov bû sedema dengên bilind. Rayedaran divîya rexneyên tûj safî bikirana, lewma ihtimal hebû di van mercan de berê xwe bidine dabînkerên din ên techîzatên modern. (6)

Halê heyî îxracat her zêdetir dibe: Ji 2.5 mîlyar euroyan di 2001ê de bo 5.4 mîlyar euroyan di 2009ê de û 6.8 mîlyar euroyan di 2010ê de. Lê belê tê heye Rûsya pozîsyona xwe ya baladest a di bazara cîhanî ya çekan de ji dest bide. Her ji niha ve Çîna ku ji salên 1990ê ve yekemîn muşterîya Rûsyayê ye, êdî bi xwe firokeyên xwe yên şerî yên ji neslê çarê (J-10) çêdike, û herwiha tankên êrişê yên *Type-99* çêdike. Çîn hêşta her yek ji muşterîyên serekî yên çekên rûsî ye, lê belê li dû Hindistan û Cezayîrê. (7) Serê 2011ê, bi tenê çend rojekan berî seredana **Robert Gatesê** sekreterê berevanîyê yê DYAyê, Pekînê perdeya li ser firokeya xwe ya şerî ya neslê pêncê vekêşa. Herçend tevahîya hilberîna kargehên Çînê yên çekan diçin bo hêzên leşkerî yên Çînê, bispor texmîn dikin ku mumkin e Çîn xwe weke reqîbeke tirsnak li îxracatkarên rûsî ferz bike.

### Putin hewl dide Rûsyayê di nav rêzên hêzên serekî de bi cî bike, ne ku Împaratorîyê careke din damezirîne

Îmzekirina girêbesteke din a di navbera Fransa û hêzên deryayî yên rûsî de, sala 2011ê, ji bo kirîna du keştîyên şerî yên *Mistral* –bi şiklê xwe yê şeşgoşe– meyleke dîtir radixe ber çavan. Meseleyê li Rûsyayê gelek dengên dijber rakirin, ku dijberan daxwaz dikir ku girêbesta 1.9 mîlyar dolaran (1.4 mîlyar euro) bê terxan kirin ji bo yek ji çendîn şantîyeyên keştîyên jikarketî yên welatî bi xwe. *Mistral* dikare heta 700 eskeran, şêst wesayîtên veguhastina leşkerî û şanzdeh helîkopteran hilgire. Herwiha, wek di şerê Gurcistanê de, çekekî êrişa ser bi erdî ve ye. Ya rast, ev ne cara yekê ye ku Rûsya dikeve bazareke wiha. Hêj sala 2009ê, artêşa rûsî digel şirketa îsraîlî *Israel Aerospace Industries* (IAI) ji bo îthalkirina danzdeh dronan (firokeyên ku ji dûr ve tên kontrol kirin) peymanek îmze kiribû. Sala 2010ê, peymaneke nû hatibû bestin ku li gor peymanê dê li ser axa Rûsyayê dronên bi teknolojîya îsraîlî dê bihatana çêkirin. (8)

Bi ya **Ruslan Pukhovê** rêveberê *Navenda Analîzên Stratejîk* û Teknolojîk a Moskovayê, asayî ye ku Rûsyayê dest bi îtxalkirina materyalê leşkerî kiriye: *"Yekîtîya Sovyetan îstisnayek bû,"* dibêje, û têra-xwe-bûna teşkîlata leşkerî-endustrîyel bi bîr dixe ku xwedana şîyana bicihanîna hemû pêdivîyên Artêşa Sor bû. **Pukhov** wiha pê de diçe: *"Hetta DYA, ku budceya wê ya berevanîyê bi qasî nîvê mesrefên berevanîyê yên li dinyayê ye, ji derve çekan dikire. Bi kirîna techîzatê ji derve, dewleta rûsî fişarê dide ser endustrîya xwe ya berevanîya neteweyî da ku, hem li ser çawanîya berheman û hem li ser*



DARA ARAM: **Rîtmên Mezopotamyayê II.**, boyaxa akrîl li ser tûwalê, 36 x 36 cm



DARA ARAM: **Rîtmên Mezopotamyayê VII.**, boyaxa akrîl li ser tûwalê, 36 x 36 cm

*biha û maweyê veguhastina wan, ji bo reqabeteke xurttir, wê han bide."*

Dahatûyê, bi taybetî heke muzakereyên li ser biçekkirineke tevahî û berfireh bigihine qonaxa xwe ya dawî, wezareta berevanîyê dê her zêdetir berê xwe bide alîyê dabînkerên bîyanî, tevî ku Serdyukov hisaba kirîna teknolojîya neteweyî dike. Li rexê xwe ve artêşa amerîkayî, herçend bi profîleke hinekî cuda be jî, her zêdetir çekên rûsî yên wek kalaşnîkovên helîkopterên veguhastinê dikire. Dîyar e *Pentagon* bêtir bala xwe dide çekên bi teknolojîyeke sade, erzan û hêsan ji bo ragirtinê da ku bide xizmeta hevpeymanên xwe yên nû, ku berê i çekên sovyetî bi kar dianîn. Bo nimûne, dixwaze pênceh û neh helîkopterên Mi-17 ên veguhastina leşkeran bi bihayekî giştî yê 800 mîlyar dolaran bikire (qederê 600 mîlyon euro) da ku bide Efxanistan, Iraq û Pakistanê. (9)

## Hesta nerihetîyê li nav refên artêşê

Li rexê endustrîya sîvîl jî heman nîşaneyên bêtaqetîyê serdest in. Ev çend sal in Moskova hewl dide pergala navîgasyona bi peykê ya *Glonassê* bixe fealîyetê, ku di dema Sovyetan de li kar bû. Projeya ku sereta wek reqîba GPSa amerîkayî û Galileoya ewropayî dihate sêwirîn, salên 1990ê di dema serokatîya **Borîs Yeltsîn** de hate berdan. Sala 2002yê, rayedar biryara jinûve karkirina li ser projeyê digirin û radgihînin ku dê bîst û çar peykên nû li ser ruwangeyê bêne bi cî kirin da ku sîstemê di sala 2011ê de temam bikin. Sala 2010ê, di hengava şandinekê de, sê peyk di encama qezayekê de telifîn û ev yek bû sebebê zerereke li dor 348 mîlyon euroyan. Îro, xizmeta sîstema *Glonass*ê, çi li rûyê teqezîya agahîyan, çi li rûyê berfirehîya erdê ku bi xwe ve digire, bi qasî ya reqîbên xwe ne baş e, ku ev yek tevahîya bernameyê dixe jêr pirsiyaran. (10) Heçî sektora veguhastina hewayî ya sîvîl e, tercîha sektorê bêtir kargoyên malê Airbusê an jî Boeingê ne, di demekê de ku dahatûya ticarî ya *Suêrjet 100ê*, balafira veguhastina rêvingan ku *Sukhoiyê* durist kiriye, hê jî gelek hesas e.

Ev bîst sal in reformên leşkerî di rojeva siyasî ya Rûsyayê de xaleke daîmî ye.(11) Salên 1990ê, têgeha "reform"ê, ku ya rastî rengekî sivik ê derbirîna tabûyekê bû, dihate bi kar anîn da ku rasterast behsa herifîna bêqisûr a hêzên leşkerî neyê kirin. Hatina **Poutin** li destpêka şerekî nû yê li Çeçenistanê rast hat. Wê çaxê ji artêşê re budceyeke îzafî hatibû terxan kirin û tevî şideta berbelav û kuştina hejmareke pir mezin a mirovan –sîvîl û esker–, karîbû heta radeyekê prestîja xwe careke din bi dest bixe. Serok Putin hingê zanîbû ka dê çawa sûdê ji wê atmosfera sembolîk wergire da ku îmaja Rûsyayeke jinûve bihêzbûyî bide derve. Hingê Putin careke din meşên eskerî yên li ser *Meydana Sor* ji bo bibîranîna serkeftina 9ê gulana 1945ê kiribûn adet û bi helkefta bernameya 2007ê, wî numayîşa firokeyên bombardimanê yên **Tupolev** jî lê zêde kiribûn.

Tevî van kiryaran, wek **Fyodor Lukyanovê** sernivîskarê kovara xwedanprestîj a *Russia in Global Affairs* piştrast dike, *"Rûsyayê êdî ti hewesên emperyal nîne. Putin hewl dide bi veşartina beşdarîya welatên din, duyemîn şerê cîhanî wek şerê Rûsyayê nîşan bide. Serkeftina "şerê mezin ê welatperwerîyê" –wiha ye navê vî şerî li vir– bû faktora yekgirtina hemû hemwelatîyên sovyetî. Putin hewl dide Rûsyayê di nav rêzên hêzên serekî de bi cî bike, ne ku Împeretorîyê careke din damezirîne."*

## Rûsya bes bi xêra cebilxaneya xwe ya nukleer ya kevin, cihê xwe yê di nav hêzên gewre de diparêze.

Zincîreya reforman, ku plana wê ya destpêkî sala 2008ê bi rê ket û veberhênana qerase ya di warê teknolojîyên şerî de biryar e piştî 2020ê berên xwe bide. Gelo hingê rûyê berevanîya Rûsyayê dê çawa be? Bi ya rojnamevan Andrei Soldatov, *"ti elaqeya vê siyasetê bi şerê Rûsya-Gurcistanê re nîne. Gelek berî şerî bi rê ketibû."* Lê belê, alîyê artêşê vê siyasetê wek mueyîdeyekê dibînin. Nerihetîyek li dar e. Di van du salên dawîyê de çendîn yekîneyên şerê taybet (Spetsnaz), ku di dubendîyê de bûbûn teref û beşdarî bi bidestketina serkeftinê bûbûn, hatine hilweşandin; eskerîya îcbarî hate rakirin û sed hezar efser ji wezîfeyê hatine derxistin. Ev hemû kiryar bûn sebeb ku di nav refên van yekîneyên sernerm û apolîtîk de bizavên muxalif derkevin. Armanca resmî ew e ku hejmara eskeran ji mîlyonek û dused hezaran dakeve mîlyonekê. Lê di rastîyê de hejmar hêj kêmtir e, lewre di artêşê de qederê 750 000 esker hene.

## Reqîba F-22yê Raptora Lockheed Martin e ku niha di artêşa DYAyê de tê bi kar anîn û heta îro li esmanan tu reqîban nas nake

Gava digel Fransayê peymana *Mistral*ê hate îmze kirin, bi tenê Gurcistan û her sê welatên baltîk (Lîtvanya, Letonya û Estonya) dijayetîya xwe derbirîn. Di demekê de ku aşkere ye ev keştîyên şerî dê li ser ava Baltîk û Behra Reş dewrê lêdin, ne Polonyayê û ne jî Tirkiyeyê hema rexneyeke biçûk jî lê negirtin. Dîyar e sebebê piştrastîya van du dewletên navbirî ew e ku, bi rewşa heyî, Rûsya ne xwedana wê şîyana leşkerî ye ku gefan li van herdu hêzên weset bixwe; bes bi xêra cebilxaneya xwe ya nukleer ya kevin, cihê xwe yê di nav hêzên gewre de diparêze. Li pişt gotarên jixwebawer û retorîka berçav, xuya ye ku Kremlin mecbûr e her ku diçe zêdetir tawîzan bide pêdagîrîyên Waşîngtonê. Bi vî rengî, tevî dijayetîya Rûsyayê li hember bicihkirina binkeyên leşkerî yên amerîkayî li Asyaya Navîn, piştgirîya lojîstîk bo leşkerên amerîkayî yên li Efxanistanê di ser tora rêasinên rûsî re tê veguhastin. Herwiha, îlona 2010ê, li pêş fişara DYA û Îsraîlê, Moskova mecbûr ma girêbesta firotina fuzeyên dij-hewayî S-300 bo Îranê betal bike.

Gelo çawa rewşa Rûsyayê wiha lêhat? **Alexandre Perendijievê** ku berî bibe profesorê zanîngehê, efserê Artêşa Sor û paşê yê artêşa rûsî bû, sebebê rewşa heyî di gendelîyeke binecihbûyî de dibîne û wiha pê de diçe: *"Rêveberên me wisa bawer dikin ku pere ji heq çareserkirina kêşeyan tê. Lê belê, jixwe **Serdyukovê** ku berê serekê serperiştîya karûbarên darayî bû wek wezîrê berevanîyê hate tayîn kirin da ku serûberekê bide meydanê û rêveçûna xerab rawestîne. Lê belê, bi tenê heke kontroleke giştî ya rasteqîne li ser nebe, sîstem nikare were guhartin."* Tevî beyanên qet'î û jixwebawer ên serokdewlet **Medvedev**, cihê şikê ye ka çaksazîyeke ewqas bineretî bikare were sepandin. Ji cerga Perestroikayê (12) ve û bi dirêjîya qonaxên cuda yên guherînê li dû wê, sebaret bi rola ku dê di nav sîstema aborîya nû de hilgirta ser xwe, sîstema endustrîya leşkerî her tûşî kêmasîya bername û wîzyoneke siyasî bû.

## Sî û du binkeyên zanistî tûşî kêmasîya budceyê ne

Di demekê de ku derdorên desthilatdar û xwedanhêz bo careke din li ser "modernîzasyon"a welatî munaqeşeyê dikin, herkes hewl dide ku bi ti awayî peyva "reform"ê bi kar neyne, lewre bi hêsanî trawmaya dema hilweşîna bloka Rojhilat, û berî wê, hewlên **Mikhael Gorbatchev** ên ji bo guhorîna sîstema Sovyetan tîne bîra mirovan. Lewma di rojevê de guftûgoya li ser reforman nîne, lê belê, ev yek nabe sebeb ku **Medvedev** û hevkarên wî qebûl nekin ku welatê wan bi zêdeyî girêdayî îxracata petrol û gazê ye û binesazîya wê ya aborî nema bi kêr tê… Îro ji sedî 70yê îxracatê me'den e, lê bi tenê ji sedî 5ê îxracatê berhemên endustrîyel e. (13) Heke bernameya Medvedev ya modernîzasyonê qîma xwe bi tenê bi têkoşîna li dijî gendelîya di bûrokrasîyê de bîne û bi pifdana dozajeke geşedana teknîk û teknolojîk bo nav sîstema aborîyê, bêguman gelek ji çavdêran dê bernameyê têrkêmasî û hetta pir serveyî binirxînin.

Gelo mirov dikare têkilîyekê di navbera nîqaşa heyî ya li ser modernîzasyonê û meblaxên astronomîk ên ku biryar e ji beşê berevanîyê re werine terxan kirin, bibîne? Ev yek zêde teqez nîne: **Medvedev** dixwaze 2 mîlyar dolaran (qederê 1,5 mîlyar euro) (14) ji bo duristkirina *Silicon Valleyeke* rûsî li *Skolkovo*yê, li herêma Moskovayê razîne. Û ev yek di demekê de diqewime ku **Oxana Gaman-Golutvinaya**, profesora zanistên siyasî li zanîngeha Moskovayê, sî û du binkeyên lêkolînên zanistî destnîşan dike ku bi rengekî cidî mexdûrên kêmbûna fînansmanê ne.

## Berjewendîya Rûsyayê di wê hindê de nîne ku bibe gefek bo fermandarîya NATOyê û hê kêmtir bo hevpeymanîya NATOyê bixwe

Wisa xuya ye ku polîtîkayên layengir qet hisaba rastîyên wan binesazîyên zanistî nakin ku ji zemanê Sovyetan mane û herwiha heçko dixwazin piştguh bikin ku hê jî rêzik û rêveçûna sîstema berê li ser endustrîya berevanîyê zal e. Lewma mirov diheyire gava pê dihese ku ti plan û pêşnîyazeke duristkirina bihurkekê di navbera bernameyên pêşxistina teknolojîyên girîng û endustrîya leşkerî de nîne. Tiştek heye ku ji **Gorbatchev** heta **Yeltsîn** û ji **Pûtîn** heta **Medvedev** her wek xwe maye: Her yek ji wan, bi reng û terzê xwe, potansîyela endustrîya berevanîyê bêqîmet dîtiye. Lukyanov wiha kurteyeke babetê dide: *"Guherînên di dema Perestroikayê de bûne sebeb ku di wan kargehan de, ku ji bo duristkirina firokeyên supersonîk* [ji dengî bi leztir] *hatibûn ava kirin, tawe û firaq bêne çêkirin. Heynê reformên **Gaidar*** [ji navê Iegor Gaidar tê, serokwezîrê hezîrana 1992ê], *salên 1990ê, hikûmetê nedizanî çi bi kompleksa endustrîya leşkerî bike, lewma ji parçeyên din ên sîstema aborîyê hate qut kirin û bi vî rengî sektor ma li ser îxracatê. Êdî nema parçeyekî sîstema aborîya neteweyî bû."*

Vekolîneke baldar li ser kompleksa endustrîya berevanîya rûsî eşkere dike ku çendîn ji wan efsaneyên ku derbarê Rûsyayê de behsa wan tê kirin, bêbingeh in, bi taybetî efsaneya vegera bo şerê sar ku ji sala 2008ê ve û piştî şerê rûsî-gurcî gelek caran tê rojevê. Meger çî bikare, ti berjewendîya Rûsyayê di wê hindê de nîne ku bibe gefek bo fermandarîya NATOyê û hê kêmtir bo hevpeymanîya NATOyê bixwe. Fikra din a belave û bêbingeh: Fikra ku **Putîn** dijayetîya olîgarşîya ji serokatîya Yeltsîn mayî dike da ku rejîmekê ava bike ku KGBya kevin û serfermandarîya giştî li piştê be. Ev fikir hê bihêztir tê ber çavan gava lê difikirin ku **Mîxaîl Khodorkovskiyê** endamê zumreya kevin a desthilatê û serokê şirketa petrolê Ioukosê, ji 2004ê ve girtî ye û di hepsê de ye. Lê belê fikra **Oxana Gaman-Golutvinayê** ne wisa ye, ku bi ya wê, bêguman *"derdora Putîn bêtir ji FSByê* [xelefê KGByê] *û ji artêşê ne, lê belê, herçend hebûna tesîra wan rast be jî, tesîra wan bêtir li ser îxracata enerjîyê ye"*.

## Rêveberên Sovyetê û rûsî ti caran nebûne xwedî bernameya sepandina teknolojîyên girîng û projeya xwe ya modernîzasyonê

Rêveberên Sovyetê û rûsî ti caran nebûne xwedanên bernameya sepandina teknolojîyên girîng li ser endustrîya berevanîyê û hewl nedan teknolojîyê bikin hêmaneke navendî ya reformên xwe û ya projeya xwe ya modernîzasyonê. Heynê rejîma Sovyetê, ev sektora ku şiklê rêveçûna wê ne şefaf bû û lewma qet xwe nedida guherîn û veguherînan (15), pareke qerase ji budceya neteweyî dadiqurtand. Berpirsên reformên dewra **Gorbatchev** qet lê nedifikirîn ku rojekê dibû ku guherînên erênî ji kompleksa endustrîya leşkerî derkevin; lewma, dêvla ku pê re bin, li dijî wê xebitîn. Piştre, reform li dû reformê hat, kesî bi duristî nezanî ka çawa dê sûdê ji sektorên herî pêşketî yên endustrîya neteweyî ya berevanîyê wergire. Bi qedir û nirxê wan nezanîn, lewma, bi gotineke sivik û sade, hiştin ku hemû bi xwe bi xwe bimirin. Heçî **Medvedev** e, ew li dû ye ku dest bavêje bernameyeke modernîzasyonê, lê belê, ji encamên civakî û siyasî yên van reforman ditirse, lewma, bo niha qîma xwe bi pesindana modêla Silicon Valleya amerîkayî tîne. Gelo welatekî bi gaz, bi petrol û çendîn çavkanîyên din ên me'denan nexşandî, ku derxistina wan çavkanîyan dihêle ku zumreyên rêveber û serkirdeyan qazancên qerase bidin ser hev, dikare, tevî van hemû faktoran, pêşxistina teknolojîyên ultra-modern piştguh bike?

* Rojnamevan. Nivîskarê *From Perestroika to Rainbow Revolutions. Reform and Revolution After Socialism (Ji Prestroîkayê heta bi Şoreşên Keskesorê. Piştî Sosyalîzmê Reform û Şoreş)*, Hurst, London, 2011.

1 Lêkolînekê, ku çendîn bisporên rûsî amade kiriye, dest nîşan kir ku şeş firoke hatibûne êxistin, bi kêmî nîvê wan ji alîyê leşkerê rûsî yê erdî ve. Bnr. Rouslan Poukhov, "Les chars d'août (tankên tebaxê)", CAST, Moskov, 2010, r. 100-108, www.cast.ru

2 *Nezavisimaya Gazeta*, Moskov, 9ê tebaxa 2010ê

3 RIA Novosti, 25ê çirîya paşî ya 2010ê

4 Bloomberg, 18ê adara 2011ê

5 William E. Odom, *The Collapse of the Soviet Military (Hilweşîna Artêşa Sovyet)*, Yale University Press, 1998, r. 104

6 "Second-hand" Gorshkov costlier than new warship (Gorshkov a "destê-duyem" ji kêştîya şer a nû buhatir e), *The Times of India*, 24ê hezîrana 2009ê

7 Russia'arms exports to reach records 10 trillions dollars in 2010 (Îxracata sîlehan a Rûsyayê wê bigihêje rekora 10 trîlyon dolaran), Novosti, 28ê çirîya pêşî ya 2010ê

8 "Israel signs $ 400 million deal with Russia (Îsraîl bi Rûsyayê re peymaneke buhayê wê 400 mîlyon dolar mohr dike)", UPI, 15ê çirîya pêşî ya 2010ê

9 "On Pentagon Wish List: Russian Copters (Li ser lîsteya daxwazan a Pentagonê: Helîkopterên Rûsî)", *The Wall Street Journal*, New York, 8ê hezîrana 2010ê

10 "Russia to launch new batch of Glonass satellites by June (Rûsya hezîranê wê komeke din a satelîtên Glonassê bi rê bike)", *Ria Novosti*, Moskov, 25ê çileya 2011ê

11 Bnr. "L'armée russe en quête de réformes (Artêşa rûs li pey reforman e)", *Le Monde diplomatique*, îlon 2000

12 Navê ku Mîxaîl Gorbatchev dabû bernameya reformên ku sala 1985ê bi rê ketin

13 "Medvedev calls for economy reform (Medvedev banga reformên aborî dike)", BBC News, London, 12ê çirîya paşî ya 2009ê

14 "Russia's Skolkovo may cost $ 2 billion in next 3 years (Dibe ku di nav sê salên bê de 2 mîlyar dolar li Skolkovoya Rûsyayê biçin)", *Ria Novosti*, 1ê hezîrana 2010ê

15 Archie Brown, *The Gorbachev Factor (Faktora Gorbatchev)*, Oxford University Press, 1996



DARA ARAM: **Rîtmên Mezopotamyayê IV.**, boyaxa akrîl li ser tûwalê, 36 x 36 cm

Wergera ji fransî: Ergîn Opengîn

HILBERÎNA TUND, BIKARANÎNA ZENAETKARÎYÊ, NEBÛNA ŞOPANDINÊ

# Geşedana pîşesazîya çandinîya bîyolojîk

PHILIPPE BAQUE *

Mirîşkên di pîlan de tên xwedîkirin, bacanên sor ên her demsalê, bostanên ku dibin warên xwarina keda karkerên koçber… Erê, lê belê "biyo"! An jî, tevgereke mîlîtanên parastina cotkarên piçûk ji xwe re dikin xem, bi redkirina mentiqa hilberînkarîyê çawa dikeve nava rîska şeperzebûna li ser gondolên supermarketan.

*Jîngehparêzan û nifşê 68ê cihê xwe ji profesyonelan re hişt"* Di hezîrana 2009ê de, teknîsyenekî kooperatîva Terres du Sud [Erdên Başûr], li herêma Lot-et-Garonne rojeke "danasînê" li ser ajeldarîya întensîv ya mirîşkên bîyolojîk li dar xistibû, weha dipeyivî. Encamên baş ên van bingehan, ku kooperatîv bi awayekî "hazirkirî" pêşkêş dikin, digel hin kredî û alîkarîyên dewletî, diviyabû bi dilê cotyarên mêhvan bûna. Jixwe, kooperatîvên çandinî yên bi hêz û bi fîrmayên mezin ên pîşesazîya çandinî-xwarinî ve girêdayî, aniha ji bo bazara belavkirina fireh û restorasyona giştî (1), di warê xwedîkirina van mirîşkên xalîxeres de bi hev û din re ketine reqabeteke tund. Ew ji qanûnên nû yên ewropî sûdê werdigrin, yên ku serê her salekê rê didin xwedîkirina heftê û pênc hezar mirîşkên goştê bîyo û mezinîya ajeldarîya mirîşkên hêkker jî bi sînor nakin.

Ev kooperatîv tê gihîştin ku bi xêra çandinîya bi vî rengî -tevî ku wan ev bi salan rexne kiribû jî-, dikarin pareyekî baş qezenc bikin. Lê wan rêbazên xwe yên xebatê têde bi kar anîn. *"Hilberîner bi peymanên teng ve girêdayî ne û xweserîya xwe bi temamî ji dest didin".* Daniel Florentinê endamê Confédération paysanne [Konfederasyona Cotyaran] û kevnexwedîkerê mirîşkên bîyo, ku bi kooperatîva landî [herêmeke Fransayê] Maisadourê re xebitî, vedibêje. *Ew bi kêmanî ji bo bîst salan bi giranî deyndar in û divê ew tevahîya berhemdarîya xwe bifiroşin kooperatîvê, kooperatîv jî mecbûr e ku wê bikire, lê bêyî ku* buha *ji berê ve bên dest nîşan kirin. Ev pergaleke entegrasyonê ye ku di ajeldarîya mirîşkan a adetî de pir belav e."*

Ji 1999ê ve, pirsgirêkên tenduristî û jîngehê dikin ku xwarina berhemên bîyolojîk, li Fransayê salê %10 zêde bibe. Sala 2009ê, tevî krîzê, hatinên ji berhemên bîyo % 19 zêde bûn. (2) Ev bazar, ku ji bo demeke dirêj marjînal mabû, niha bû bazareke "rahêj" ji bo belavkirina fireh, ku % 45ê firotinan pêk tîne. Lê belê, sala 2009ê, tevî pêşketina ecibandina bîyoyê, bi tenê % 2,46 a erdên çandinîyê bîyo bûn. Ji bo ku bersivê bidin daxwaza bikiran, aktorên sereke yên bazarê du çareyên cuda hilbijartin: îtxalatên berfireh û bicihkirina çandinîyeke bîyo ya endustriyel û întensîv.

### Bazareke ku têde simsar dibin qral

Têgeha çandinîya bîyolojîk li Ewropayê, weke berteka li dijî çandinîya kîmyayî û berhemperest a salên piştî şerê cîhanê yê duyemîn peyda bû û pêş ket. Di destpêka salên 1960ê de, toreke piçûk a cotyarên bîyolojîk û bikiran, komeleya Xweza û Pêşketin (bi fransî Nature et Découverte, N&P) ava dikin. Komele pareke mezin ya xelkê bajaran ber bi xwe ve dikişîne, ya ku bi vegerîna erdê û -weke tevgera dijnukleerî û Sendîkaya Cotyarênkarker di salên 1970ê de, û bi piştre ji salên 1990ê ve, Konfederasyona Cotyaran û Tevgera Dij-GMOyan-digel tevgerên jîngehparêz û siyasî yên cihê têkilîyan deynin, bawer in. Di vê navberê de, Xweza û Pêşketinê hin rêç û rêbaz di destûra xwe de bi cih kirin: Redkirina berhemên sentezê, miameleyên xwezayî, cudakirin û zivirandina çandan, xweserîya zemînan, enerjîyên nûjen, parastina cotyarîya piçûk, cihêrengîya bîyo, tovên cotyarî, serbixweyîya xwarinî... Ji bo ku danûstandin ji nû ve watedar bibe û girêdanên civakî dîsa çêbibin, firotina berhemên bîyolojîk dikeve ser milê bazarên herêmî, fuar û kombûnên kirînê, ew ê jî şebekeya Biocoopan (3) ava bikin. Destûra Xweza û Pêşketinê ji destûra Federasyona Navneteweyî ya Tevgerên Çandiniya Bîyolojîk (Ifoam) re bûye îlham, ev yek jî sala 1972yê pesind bû û wê armancên ekolojîk, civakî û mirovparêz bi pîvanên agronomîk ve girêdan.

Lê tevgera cotyarî û civakî ya têkildara çandên bi vî rengî zehmetîyan dikêşe da ku bibe yek. Di salên 1980ê de, şertnameya Xweza û Pêşketinê, ku bi awayekî fermî hatibû nasîn, li cem panzdeh şertnameyên tevgerên din jî heye. Di 1991ê de, Brukselê ev tevlihevî ji xwe re kir hincet û şertnameya xwe li ser tevahîya Yekîtiya Ewropayê ferz kir û dewleta fransî ev şertname bi pêşkêşkirina etîketa YEyê jî bi cih kir.

Organîzmayên berpirsên kontrolkirina vê etîketê jî, çi ferdî û çi ticarî, li dijî çavdêrîya beşdar derdikevin, ku heta hingê komîsyonên berhemdêr, bikir û guherîneran ev bi hev re pêk dianî.

Xweza û Pêşketin dikeve nav krîzeke giran. Hin endam etîketê boykot dikin. Hinên din yên ku mezinîya bazara bîyoyê wan ber bi xwe ve dikşîne, ji komeleyê vediqetin. Jordy van den Akker kevneserokê Xweza û Pêşketinê şirove dike: *"Etîketkirin bû sedem ku fîrma şebekeyên piştgirîyê tercîh bikin"... "Ekolojî û civakparêzî, ku ji bo me nirxên bîyo yên girîng in, êdî ji ekonomîyê hatin qut kirin". "Etîket û zagonên ewropî rê dan pêşketina bazareke navneteweyî û çûnûhatina azad a berheman, bazirganî û reqabeêt. Ev temsîla komeleya me nake."*

Zagoneke ewropî ya nû, ku ji 1ê kanûna paşî û pê ve derbas dibe, dihêle ku di nav berhemên bîyo de % 0,9 GMOyan hebin û destûrên taybet didin miameleyên kîmyayî. (4) *"Bîyo û GMO qet li hev nakin"*, Guy Kastlerê xwedîyê Heraultê û çalakvanê N&Pê dibêje. *Em hê jî têgeha % 0 GMOyan diparêzin! Zagona nû hin qeydan nîşan dide û pratîkên çandinîyê ji xwe re nake xem. Em ji pêwistîya rêbazan -em ê bi çi rengî biçinin?- derbasî pêwîstîya encaman bûn- di berhema dawîyê de çiqas bermayî hene? Ev rê dide giştîbûna çandiniyeke bîyo ya endustrîyel."*

Di vî warî de, kooperatîvên çandinê li pêş in. Nemaze bi xêra alifa mirîşkan, ku ew bi xwe çêdikin û difiroşin cotyaran, qezenca wan pir zêde ye. Zagona fransî ya berê li ser xwedîkirên bîyo ferz dikir ku % 40 alifa heywanên xwe li ser erdên xwe hilberînin. Di zagona ewropî ya nû de, ev girêdana bi erdê ve nema. Xwedîkir tevahîya alifan, bi taybetî yek ji malzemeyên sereke, soyayê ji kooperatîvan dikire. Li 2008ê, li Fransayê, berhemdarîya mirîşkên bîyo % 17 zêde bû, lê di heman demê de ya soyaya bîyo % 28 kêm bû. Soyaya ku ji derve tê kirîn erzantir e û wê bazar bi dest xist.

Li çirîya paşî ya 2008ê, piştî ku rêjeyeke melamînê -berhemeke pir bijehr- a bilind tê de diyar bû, 300 ton bermayîyên tovên soyaya bîyo ya ji Çînê hatî, bi rêya şaxeke kooperatîva Terrana, ji bazarê hatin derxistin. Ji wê de, vê şîrketê dev ji ticareta digel Çînê berdaye, lê ew hê jî li ser bazara navneteweyî alifa ji bo mirîşkên bîyo yên rojavayê Fransayê distîne, ku komîsyoner xwedanên vê bazarê ne û operasyonên xwe bi awayekî zelal nameşînin. Soyaya bîyo ku ji Îtalyayê tê kirîn -lê dibe ku li Romanyayê an Polonyayê çêbûbe jî- digel soyaya Brazîlê reqabetê dike. Berhemdarên piçûk ên Eyaleta Paranayê ku wê diçînin, têkildarên fîrmayên ixracatê yên mezin in: Bi taybetî Mato Grosso û xwedanên wê ku *fazendayên* bîyo tê de dikarin bi qasî 5000 hektaran fireh bibin û ziyaretên çapemeniyê red dikin. (5) Tevî ku herî zêde destê vê eyaleta navbihurî di xirakirina daristanên Amazonê de heye. Li gor WWF-Fransa, hemû bi awayekî dîrekt an îndîrekt ji ber soyayê 2.4 mîlyon hektarên daristanê her sal li Amerîkaya Başûr tên tune kirin. (6) Tevî vê yekê jî, tu etîket tunene ku beşdarnebûna soyaya bîyo ya brazîlî a di vê bobelatê de misoger bike.

Digel ku çandina bîyolojîk pareke hûrik a çalakîyên kooperatîvên mezin be jî, ew hê jî dixwazin serdestîya xwe li ser vê bazarê pêk bînin. Terrenayê şirketa Bodîn a lîdera mirîşka fransî kirî; kooperatîva Le Gouessand niha xwedîya Yekîtîya Fransî ya Çandina Bîyolojîk e; Euralîs xwedana parên mezin ên Agribio Unionê ye... Hejmareke mezin a komeleyên navpîşeyî yên herêmî yên çanda bîyolojîk û piranîya odeyên çandinê -her ku diçe pêwendîyên wan bi çandina bîyolojîk re zêde dibin- di bin tesîra kooperatîvan de mane. Enstîtûya Neteweyî ya Navlêkirînên Resen (INAO) ya ku berpirsa bicihkirina zagonên ewropî li Fransayê ye, ji hêla Michel Prugue, serokê Maisadoura ku çend cureyên tovên GMOyan jî difiroşe, tê bi rê ve birin.

Van kooperatîvên çandinî tu carî bikaranîna berhemên kîmyayî ya ji bo çandiniya "adetî" red nekir û ev yek jî girêdanên wan bi şirketên navneteweyî yên lêkolîn û firotina GMOyan ve xurt dikin. Ji sedî çil para Maisadour-Semences [Maisadour-Tov] -şaxeke Maisadourê-, di bin destê şirketa swîsreyî Syngentayê de ye, ku bixwe jî mîratgira bizavên agrokîmyayî yên Novartîsê ye. Maisadour-Semences li piranîya welatên cîhanê xwedîya kargehên hilberînê ye. (7) Helbet, ev bandora mezinbûnê ya kooperatîvan, ku di beşa GMOyan de xwedîyên berjewendîyên fînansî ne, dikare biryara Komîsyona Ewropî şîrove bike, ya ku rêjeya GMOyan a qebûlkirî di berhemên bîyo de, tevî dijberîya Parlemena Ewropî, kir % 0,9.

Fransa bêhtirî % 60ê mêwe û sebzeyên xwe yên bîyolojîk ji derve dikire. Pro Natura lîdera fransî ya firotina wan di dukanên taybet û supermarketan de ye jî. Ji kêmtirî deh salan û vir de, vê şirketa başûr-rojhilatê Fransayê qezenca xwe deh qat zêde kir û çar şirketên din jî kirîn. Çaryeka berhemên wê ji Fransayê tên, lê yên mayî li Spanyayê (% 18), li Fasê (% 13), li Îtalyayê (% 10) û li çil welatên din jî tên kirîn. Pro Natura fîrmaya yekem bû ku fêkî û sebzeyên bîyo bêyî demsalê bifiroşe.

### Heman rêbaz, lê belê "bi awayekî fermî mohrkirî"

Tevî vê yekê, damezrînerê wê, Henri de Pazzis, hê jî rêzgirtina ji bo erd, jîngeh, cotyar û bikiran derdixîne pêş. Lê belê rêbazên fîrmayên belavkirina fireh ji van qeydan pir dûr dikevin. *"Ew ji bo bîyoyê weke ji bo çandina adetî, heman mekanîzmayên kirînê yên xiraker bi kar tînin*, de Pazzis rave dike. *Ew reqabetê bi awayekî hişk teşwîq dikin. Hin berhemên me ji referansê dadikevin ji ber ku buhayên hin şirketên din ji yên me pir kêmtir in".* Pro Natura û şirketên din ên îtxalat-ixracatê tercîh kir ku beşdarî vî şerê buhayan bibin, lê ev ji civakparêzî û hawirdorparêzîyê re cihekî pir teng dihêle. Ji duwanzdeh salan ve ye ku Pro Natura çîlekên bîyo yên spanyayî, berhemên şirketa Bionest, îtxal dike. Patronên vê şirketê, Juan û Antonio Soltero, di herêma Huelvayê de xwedîyên pênc sed hektarên erdî ne, ku bi nihêrîna destpêkê ji hezaran serayên adetî yên deştê qet ne cuda ne. Ev deşt jixwe ji ber çandina yekcureyî ya çîlekan gemar dibe û karkerên wê erzan tên xebitandin. Wekî fîrmayên din, Bionest di nav parka xwezayî ya Donanayê de cih digre, ku li lîsteya mîrasa dinyayî ya Unescoyê qeydkirî ye. (8) Li gor WWF-Spanya, sera bi awayekî nehiqûqî li ser erdên parkê zêde dibin, rezervên avê dixin tehlûkê û bandoreke xirab li jîngehê dikin. (9) Bionest ji cihêrengîya bîyo re rêzê nagire (hindikîya darçîlekên bikaranî heman darçîlekên serayên adetî ne), çandina yekcureyî dike, bi pergaleke avdana dilop bi dilop zibil bi sebzeyan de direşîne... Rêbazên wê yên çandinê ji yên serayên adetî yên Huelvayê tam cuda nînin. Tovên etîketkirî bi tenê, etîketa bîyo misoger dikin. Ji bo komkirinê, Bionest bi sedan jinên romanî, polonî û fîlîpînî di bin şert û mercên pir ne ewle de dixebitîne. Patronên Bionestê naxwazin bi rojnamevanan re biaxivin û vê mijara hestyar niqaş bikin.

Her sal, ev jinên hanê li welatên xwe ji hêla rêxistinên patronî yên spanyayî ve, digel peyman û vîzeyên demkurt tên xebitandin û bi "peymanên orîjîn"ê re tên Spanayayê. Ji ber ku ew mafên xwe nizanin, tam di bin destê xebitînerên xwe de dimînin, ku wan bi zanîn dikin kole. (10) Francis Prieto, endamê herêmî yê Sendîkaya karkerên çolteran (SOC) ziyareteke neplankirî ya lojmanên xebatkarên jin ên Bionestê li dar dixe. Ew di nav serayan de bi temamî îzole ne û mecbûr in ku li gor şertênpir zehmet tev bigerin: Ziyaret li wan qedexe ne, derketina derve tê kontrol kirin û carina dest li ser pasaporta wan jî tê danîn... *"Patron wan pir ditirsînin*, Francis Prieto şîrove dike *û bi qasî karkerên demsalî yên din li Huelvayê dibin kole û di şertên xebatê yên pir zor de dixebitin."*

Li Andalusê şirketên din ên weke Bionestê hene. AgriEco li derdora Almeria di bin 160 hektarên serayan ji meha îlonê heta dawiya hezîranê jî de bêhtir ji 11 000 ton bacanên sor, îsot û xîyarên " bîyo" hildiberîne, paket dike û difiroşe. Di van serayan de ku teknolojîyên herî pêşketî bi kar tînin, tov weke "bîyo" etîketkirî ne û karkerên demsalî jî, jinên romanî û fasî ne. Miguel Cazorla, serokê devliken ê şîrketê, bi serbilindî behsa belavbûneke nû dike. Fîloyên kamyonan sebzeyên AgriEcoyê li hemû supermarket û dukanên "bîyo" yên Ewropayê belav dikin. Û ji destpêka zivistanê ve, ew digel berhemên serayên "bîyo" yên Îtalya, Fas û Îsraîlê reqabetê dikin... Li peravên Deryaya Spî, şerê ticarî tund û tûj dibe û qezenca navbeynkaran jî zêde dibe.

Dûrî van nebaşîyên bîyoya endustrîyel, kooperatîva cotyarî ya piçûk La Verde, di Sieraya Andalusî ya Cadixê de, di salên 1980î de ji hêla karkerên rojane yên endamên SOCê ve hat ava kirin. Zevîyên ku di serdema dawî ya frankîzmê de bi dijwarî ji bo bidestxistina wan têkoşîn. Li wir, şeş malbat li ser çardeh hektaran sebze û darmêweyan diçînin û çend manga û mihan jî xwedî dikin. Ew tevahîya berhemên xwe li Andalusyayê bi rêya kooperatîveke din, Pueblos Blancosê difiroşin, ku 22 cotyarên piçûk an kooperatîvên bîyo vedihewîne. *"Pêşîyê me bi çandina bîyolojîk dest pê kir"*, Manolo Zapata rave dike. *"Ew li gor çandina bav û kalên me bû û bi riya têkoşîna me de jî diçû. Eger çandina bîyolojîk nayê wateya bicihanîna wekhevî, edalet, xweserî, debaraxwekirin û serbixweyîya xwarinî, ew jixwe bê wate ye. Lê etîketkir alîkarîya me nakin. Barê bacê yê li ser cotyarên ku çandina pircureyî dikin, dê ji yê cotyarên ku çandina întensîv ya yekcureyî dikin, girantir be."*

Ji ber ku La Verdeyê li ber raya giştî piştgirîya organîzma etîketkirinê ya sereke ya spanyayî, Komîteya Andalusî ya Çandina Ekolojîk (CAAE), a ji bo şîrketên mezin ên "bîyo-businessê" aşkere kir, bû hedefa kontrolên bêsedem. Tevî ku wan banka tovên cotyarî ya herî mezin li Spanyayê saz kir: ku çandên wan misoger dike û tovên xwe difiroşe tevahîya berhemdêrên bîyo yên piçûk ên herêmê, endamên wê jî biserdegirtinan ditirsin. *"Qanûn û qeyd hene ku mafê bavûkalî yê dubarekirina tovan bi sînor dikin û rê li pêşîya etîketkirina van cureyên kevin ku me parastine, digirin".* Qanûnên ewropî yên çandina bîyolojîk jixwe bikaranîna tovên "bîyo" etîketkirî, li ser cotyaran ferz dike. Ku ew tov tunebin, ew mecbûr in ku tovên adetî yên bazarê bi kar bînin. *"Heta niha, her tişt li ber sînorê hiqûqîbûnê derbas dibe, lê heke*

*ew sibe firotina berhemên me qedexe bikin, ew ê bikaranîna tovên "bîyo" yên Monsantoyê li ser me jî ferz bikin.* (11) Bi mînaka hin cotyarên Xweza û Pêşketinê, endamên La Verde lê difikirin ku xwe ji karê etîketkirina bîyoyê vekêşin.

Berxwedana li hemberî biyo-karsazîyê

Mînakên weke La Verde, çi li Kolombya, Bolîvya, Brazîl, çi li Hindistan, Îtalya, Fransayê be, zêde dibin ... Berxwedana li dijî bîyo-business li seranserê dinyayê gur dibe. Hejmara cotyar, civatên gundî û kooperatîvên piçûk ên berhemdêran a ku çandineke cotyarî û rêbazên çandina agroekolojîk û zemînên piçûk ku ji pirrengîya bîyolojîk û serbixweyîya xwarinî re rêzê digirin diparêzin, her ku diçe zêde dibe. Pir ji wan etîketkirinê red dikin û di pergalên beşdarîyê yên garantîyê de cihê xwe digrin, ku li ser esasê pevguherîn û pêbawerîya di nav berhemdêr û bikiran de dixebitin. Torên parastina tovên cotyarî bi pêş dikevin da ku mafê cotyaran a hilberîn û firotina tovên xwe bixwe, bê qebûl kirin.

Li Fransayê, Komeleyên ji bo Parastina Çandina Cotyarî (Amap) dixwazin bêyî ku li bazarê bialiqin bi awayekî dîrek têkilîyên navbera berhemdêr û bikiran deynin. Ew pêrgî elaqeyeke ewqasî mezin tên ku nikarin bersivê bidin daxwaza kirînê. Komeleya Terre de Liens (Erdê girêdanan) ji bo cîbicîkirina cotyarên bîyo yên ciwan bi awayekî serkeftî fonên piştgirîyê kom dike. Da ku ji qanûnên ewropî xilas bibe, Federasyona Neteweyî ya Çandina Bîyolojîk (FNAB) markeke nû çêkir: Bio-Coherence. Ew ê digel şertnameyeke pir dijwartir û pejirandina rêbazên ku îlhama wan ji qeydên Ifoamê yên 1972ê tê, etîketkirina fermî temam bike. Li derveyî qeydan, Xweza û Pêşketin şertnameya xwe ya ku çandina bîyolojîk a cotyarî misoger dike, diparêze.

Tevlîkirin an tevlînekirina nirxên civakî û ekolojîk li nav fikirên berhemdêr, guherîner û bikirên bîyoyê wê siberoja wê nîşan bide. Gelo ew ê bibe aliyekî bazarê ye ji rêzê, ku teslîmî berjewendîyên lîberalîzma aborî bûye? An ew ê dîsa jî li hember vê lîberalîzmê alternatîvekê pêşkêş bike?

* Rojnamevan û birêveberê projeya pirtûka De la bio alternative aux dérives du "bio"-business, quel sens donner à la bio? [Ji bîyoya alternatîv heta bi xeterên "bîyo"-business, em çi wateyê bidin bîyoyê?], ya ku dê di dawiya 2011ê de bê weşandin. Malpera alterravia.com.

1 Ji bo gihiştina ku yek ji armancên "Grenelle" (Konferans) a Jîngehê, dewlet dixwaze berî 2012ê % 20 xwarinên ji çandina bîyolojîk di menuyên xwaringehên îdare û sazûmanên dewletî de bi cih bike

2 Piranîya hejmarên venivîsandî ji ber dosyeya çapemenîyê ya Ajansa Bîyo "Les chiffres de la bio sont au vert" ["Hatinîyên Bîyoyê Geş Dibin"], beşa çapemenîyê ya Agence Bio, 2010, û ji berhema *"Agriculture biologique, chiffres clés" [ Çandina Bîyolojîk, Çend Hejmarên Girîng"]*, Agence Bio, Montreuil-sous-Bois, çapa 2009ê, hatin girtin

3 Pascal Pavie û Moutsie, *Manger Bio. Pourquoi? Comment? Le guide du consommateur éco-responsable [Xwarina Bîyo. Çima? Çawa? Rêbera bikirê/a xwedî Ekoberpirsiyarî]*, Edisud, Aix-en-Provence, 2008

4 "Bio/GMO: le vote des députés européens à la loupe" ["Bîyo/GMO: Dengdana nûnêrên gel ên ewropî di bin çavan de"], 21ê gulana 2009ê, www.terra-economica.info

5 Binihêrin gotarên Cecile Leclere û Ben Hoppenstedt, "Mission en Amérique Latine" ["Mîsyona li Amerîkaya Latîn"], *Biocontact*, Gaillac, ji hezîranê heta îlona 2008ê

6 Boris Patentreger û Aurélie Billon, WWF-France, "Impact de l'agriculture et de l'alimentation industrielles sur la forêt dans le monde - rôle de la France" ["Bandora Çandin û Xwarina Endustrîyel li ser Daristanên Dinyayê -rola Fransayê"], Parîs, nîsana 2008ê

7 Di eyaleta brazîlî ya Paranayê de, cotmeha 2007ê, mîlîseke çekdar a ku Syngentayê xebitandibû, çalakvanekî Tevgera Bêerdan (MST) kuşt, dema ku wî digel nêzî sed cotyarên din zemînên lêkolîna GMOyan a şîrketa swîsreyî dagîr dikir

8 Binihêrin "Importer des femmes pour exporter du bio?" ["îthalkirina jinan j ibo îxrackirina bîyoyê?"], *Silence*, hjm. 384, çirîya paşîn a 2010ê

9 Daxuyanîya çapemeniyê ya WWFê, "Fraises espagnoles: exigeons la traçabilité" ["Çîlekên Spanyayî: Em dixwazin bizanibin ji ku tên"], 23ê adara 2007ê

10 Emmanuelle Hellio, "Importer des femmes pour exporter des fraises (Huelva)" [" Ithalkirina Jinan ji bo Îxraca Çîlekan (Huelva) "], *Etudes rurales*, Parîs, tîrmeh-kanûna pêşîn a 2008ê

11 "A qui profite la récolte ? La politique de certification des semences biologiques" ["Feydeyê komkirinê ji kê re ye? Siyaseta Etîketkirina Tovên Bîyolojîk", raporeke GRAINê, Barselona, kanûna paşîn a 2008ê; www.grain.org

Wergera ji fransî: Simko Destan

## LI PARKA CÎHANÎ YA NAGOYÊ

# Rûyê sexte yê bîyorengarengîyê

AGNÈS SINAÏ *

Li zîrveya Nagoyê (Japonya), şirketên mezin ên cîhanî yên geşedana xweragir xwe bi retorîkeke jîngehparêz girtine da ku pawan û destdana xwe ya ser çavkanî û samanên xwezayî veşêrin.

19'ê çirîya paşîna 2010'an, li Parîsê, di nav stûnên gewre amfî-şanoya Mûzexaneya neteweyî ya Dîroka Sirûştî re, di bin wan bergehan de ku navên zanayên navdar bi herfên zêrîn lê hatine qewartin, nûnerên *Lafarge*, *Electricité de France* (EDF), *Areva*, *Total*, *Véolia* û gelek endamên din ên Tevgera şirketên Fransayê (MeDef) û herweha endamên Konseya cîhanî bo geşedana xweragir (*World Business for Sustainable Development*), bi boneya konferansa "Business and Biodiversity" [Karsazî û biyo-cihêrengî] bi lez û telaş tên û diçin.

Nûnerên ku hatine ku bi civînekê "sala biyo-cihêrengiyê" pîroz bikin û di holên civînê de logoyên şirketên mezin mîna îkonan muqeddes in, hêviyên xwe derdibirin ji bo serkeftina Konferansa aliyên Konvansiyona li ser cihêrengiya biyolojîk (COP 10), ku di heman demê de, ji 18 heta 29ê çirîya paşîn, li Nagoyê (Japonya) bi amadebûna qederê hejdeh hezar beşdarên ji nod û sê welatên beşdar bi rê ve diçe.

Bi herhal, qey Areva xema parastina biyo-cihêrengiyê naxwe gava ku hewl dide cinsekî xwecihî, lîkena *teloschistes capensis* [giyayeke ji kuvark û algan pêk tê û li ser zinar û kurmê daran şîn tê], biparêze bi xêra guhartina berê kanalîzasyona ku kargeha wê ya xwêderxistina ji ava behra Swakopmundê bi madena wê ya ûranyûmê ya Trekkopjeyê li Namibiyê ve girêdide? Herçî serkêşê cîhanî yê kîmyayê BASF e, piştî bazarkirina Fîpronîla dermanê mêşan ku ihtimal e bûbe sebebê jinavçûna komên mezin ên mêşan, heqê wê ye ku pesnê xwe bide ku li Fransayê du hezar û pênc sed hektarên erda polenberhevkirinê terxan kirine û erdê navhatî bi têkelawên kulîlkan pêçayî ye.

"Zîrveya jîngehê", ku hezîrana 2007'an dest pê kir û hezîrana 2010'an bi versiyona xwe ya teqez hate pejirandin, retorîk û amrazên "mezinbûna aborî ya kesk" [croissance verte: geşedana aboriyê bi awayekî hesas beramber jîngehê] dane destê şirketan, ku ew retorîk nêrebendek bû li nerihetiyên civaka bazarê hate çespandin û mîna *dermanê hemû derdan* hate pêşkêşkirin. *"Telafiya jîngehî"* û teşebbusa biqîmetkirina darayî ya ekosîsteman ji bo tesbîtkirina bihayê xerabûna wan û çakkirina/tamîrkirina wan a nîhayî, ku li Nagoyê gengeşî li ser hatine kirin, du ji mekanîzmayên wan in. Weke mînak:

Rêyeke otomobîlan digel şertê rêzgirtina li ekosîsteman sazgar û hevaheng e, heger li ser viyadukekê hatibe avakirin, lê ne heger bi axê hatibe tijîkirin: bi xêra zêde-bilindkirina rêyê – bo nimûne, bi destê grûba Vinciyê –, ne tenê req dê bikarin di nav aramiyê de waqewaqê bikin, belkî şifêrê trimbêlê jî dê bikare bi dilê xwe pê li pedala xazê bike û di heman demê de hişyar û li ser xwe bimîne. Bi heman rengî, Sofiproteola rûnê kolzaya endustriya "hestyar" wisa pêş dibîne ku bi qasî agro-karbûranan [sotemeniyên ziraî] dimezêxe ewqas jî dê xema "xizmetên" jîngeh û peyzajî bixwe. *Caisse des dépôts*'ya [grûbeke cemawerî bo berjewendiyên giştî ye li Fransayê] xemxurê "berjewendiyên giştî", di sala 2008'an de, di warê qerebûkirina biyo-cihêrengiyê de, bi navê CDC Biodiversité, yekemîn operatora darayî ya fransî ava kir. Bi saya "maddeyên çalak" (actif naturel) ku ji wan hostayên berheman re têne pêşniyazkirin ku mecbûr in berdêla tesîra berhemên xwe bidin, *CDC Biodiversité*'yê dest avête projeya selihandina deşta Crau (li herêma Bouches-du-Rhône'ê) û bi vê armancê sê sed û pênceh û heft hektarên erdê ku berê dehl [baxçê fêkiyan] bû xiste bin çavdêriya xwe da ku cins û nijadên lokal vegerin.

Bank jî pê hisiyane ku dikarin qezenceke girîng bi dest bixin ji fonên "etîk" "ISR" (Investissement socialement responsable [Veberhênana li rûyê civakî ve xwedanberpirsiyarî]). Grûba *Paribas* ya ku ji bo nîşandana niyetpakiya xwe tu fersendekê ji dest nade, çend rayedarên xwe yên zîrek, ku bi rîhên sexte û perûkên sor ketibûne şiklê aktîvîstan, şandin da ku tev li xwepêşandaneke bi bisîkletan a ji bo parastina klîmayê bibin, ku Weqfa Good Planet a Yann Arthus-Bertrand – Paribas yek ji fînansorên wê yên serekî ye– di 10'ê çirîya paşîna 2010'an de bi rê xistibû. Paribas ya ku di hemû qad û qedemeyên berhemên "ISR" de hazir û nazir e, mezintirîn grûba bankî ya fransî û sêyemîn nirxê piyaseyê [market capitalization] yê CAC 40ê ye –bi nirxê nêzîkî 60 milyar euroyan di sala 2009an de–. Grûba navborî, bi awayekî ku nakok be digel "jîngehparêziya" xwe, beşdar û pişkdar e di hindek projeyan de ku tesîra wan a insanî û jîngehî pir giran e (projeya petrol û xazê ya Sakaline II li Rûsyayê, projeya binkeya nukleer a Belene li Bulgaristanê, berfirehkirina bendava Theun-Hinbounê li Laosê); herweha, xwe dide ber kar û mecbûriyetên şirketên munaqeşebar/gumanbar (hilberînerên bombeyên pirtik-tesîr [cluster munition], aktorên endustriya nukleer an jî peravên bipetrol ên Kanadayê). (1)

### Destwerdana antropolojîk li axê

Versiyona dawî ya raporta li ser aboriya ekosîsteman û biyo-cihêrengiyê (*The Economics of Ecosystems and Biodiversity, TEEB*), ku bi serperiştiya banker Pavan Sukhdev hatiye amadekirin û di civîna Nagoyê de hatiye pêşkêşkirin, hewl dide ku xwezayê di nav têgeha "nirxê aborî yê tevahî" de vepêçe, ku nirxê bikaranîna yekser û ne-yekser – wekî serfkirina gîhayan ji bo duristkirina xurekan, îmalata endustriyel di qada dermansaziyê de an jî safandina xwezayî ya avê–, digel nirxê bikarneanînê –bo nimûne parastina daristanekê bo nifşên dahatûyê an jî ji ber nirxê wê yê manewî an jî totemîk–, digihîne hev.

Siyasetnasa amerîkî Elinor Ostrom a xelatgira Nobela aboriyê ya sala 2009an, bi rêya metodên antropolojîk ên meydanî nîşan da ku ne dewlet û ne jî bazar xwedanê wê şiyanê ne ku kêşeyên girêdayî serfkirina saman û çavkaniyên xwezayî, ku navê wan ên din "samanên hevpişk" e, çareser bikin. Di berhema xwe ya bi navê *Governing the Commons* (2) de, xwe dispêre çavdêrîkirina cihêrengiya çareseriyên ampîrîk û nîşan dide ku tenzîmkirina serfkirina samanên hevpişk, ne mecbûrî "trajediyeke" tehsîskirinê ye, weke ku ekologê amerîkî Garrett Hardindans di sala 1968an de, di gotareke navdar a li ser "trajediya samanên hevpişk" (3) de, îddia dikir. Ji lêkolînên li ser sîstemên avdanê li Fîlîpînan heta masîvaniya li Srî Lankayê û heta akiferên Kalîforniyayê, ji hejmareke mezin a lêkolînên Elinor Ostrom diyar bûye ku stratejiyên lokal ên xwe-rêxistinê, û stratejiyên hevkarî û danûstandina zanyariyan, dihêlin ku saman û çavkaniyên muşterek bêyî ku bêne qedandin werin serfkirin. Gava ku ev tenzîm û sazkarî tûşî tehsîskerên derekî dibin, kêşe û zehmetî hingê rû didin. Bo nimûne, pompevanên ava binerdê ku rewşa çavkaniyê baş pê nizanin, an jî masîvaniya endustriyel ku dibe binasê jinavçûna sinhetê masîgiriya adetî. Destnîşankirina fêl û lîstikên aktoran, di rastiyê de, bercestebûna wan aliyên meseleyê ne ku diravîkirina ekosîsteman wan ji rastîbûnê derdixe û etîk wan vedişêre.

*Rojnameger, endama lijneya weşanê ya kovara Entropia

1 www.secretsbancaires.fr

2 *Governing the Commons. The Evolution of Institutions for Collective Action*, Cambridge University Press, 1990. Çapa fransî, Editions de Boeck, Bruksel, 2010

3 Garrett Hardin, "The Tragedy of the Commons", *Science*, Vol. 162. no. 3859, 13'ê çileya pêşîna 1968'an, r. 1243-1248

Wergera ji fransî: Ergîn Opengîn
Redaksiyon: Îbrahîm Seydo Aydogan

# Toreke navneteweyî

Di sala 2007an de, li tevahîya dunyayê, ji 30 mîlyonan zêdetir hektarên çandina bîyolojîk hebûn. Çandina bîyolojîk a dijwar berfireh dibe û gav bi gav dide ser şopên çandina berhemdarîparêz, ya ku damezrînerên wê jixwe bi tundî rexne dikir. Şîrketên navneteweyî yên pîşesazîya çandin-xurekîyê û xwedanên erdên mezin, yekcure çandina ji bo ixracatê bi encamên baş bi pêş dixin. Cotyarên feqîr ên Asya, Amerîkaya Latîn an Afrîkayê jî beşdar dibin. Di bin destê fîrmayên bazirgan ên bihêz de, ew xurekên bîyolojîk ji bo xelkê zengîn ê welatên endustrîyel hildiberînin. Li Amerîkaya Latîn û welatên rojhilatê Ewropayê, li ser zemînên hezar hektarên erdên herî berhemdar, zad an soyaya bîyolojîk tê çandin. Li Filistînê, beşeke ji erdên newala El -Xorê, ku niştecihên wê dagîrkerên îsraîlî ne, ji bo çandina fêkî û sebzeyên bîyolojîk tê terxan kirin. (1) Li Brazîlyayê, merivek bi tenê xwedîyê 20 000 hektar erdê qamîşê şekirî ye. Li Tirkîyeyê, bi hezaran cotyarên piçûk hemû berhemdarîya xwe ya mewîj, hejîr û mişmişan ixrac dikin... Fasûlyeyên bîyolojîk ji Kenyayê û kartol jî ji Misirê tên... Li ser hemû van berhemên ixrackirî, mohrên organîzmên ferdî yên tesdîqkirinê hene: yên ku riya bazaran li ber wan vedikin, lê li ser rêzgirtina ji bîyocihêrengî, jîngeh, mafê erdî û serbixweyîya xurekê zêde ranawestin...

Rûnê qespê ku şirketa kolombî Daabon çêdike, li Ewropayê di piranîya berhemên bîyolojîk ên guherandî de cih digre û bûye nîşana armancên nû yên bazarê. Daabon xudana bi hezaran hektar erdê palmîye, kakao, darên mûzê û darên qehweyê yên bîyolojîk e û ew berhemên wan difiroşe Ewropa û DYAyê. Bi riya şebekeyeke kompleks a şubeyan, her weke bi hezaran hektar erdê palmîye û keştîgeheke neticarî ya luksê, mezintirîn kargeha bîyodîzel a welêt, di bin destê wê de ye,... Li gor texmîna rojnamevanê kolombî Alfredo Molano Bravo hatinîya salane ya Daabonê li derdora 120 mîlyon dolaran e. (2) Malbata Davîla xudana şirketê bi kevneserokkomar Alvaro Urîbe ve girêdayî ye, yê ku artêşa wî bi hezaran kes kuştin û bi alîkarîya paramîlîteran, xelkê cotyar bi awayekî berfireh koçber kir da ku xwedanên erdî yên bihêz bikaribin palmîyeyên rûnî û tiştên din biçînin. Mario Mejia Gutiererez ê nivîskar û mamosteyê çandinnasîyê li Zanîngeha Neteweyî ya Kolombîyayê, aşkera weha dibêje: *"Li Kolombîyayê, guherandina berfireh a bi sedan hezar hektar erdî jî bo çandina palmîyeyên rûnî, çiqasî bîyolojîk û mayînde bibin jî, projeyeke weha ye ku tam bi paramîlîteran ve girêdayî ye. "*

Lê belê, li Fransayê, organîzma tesdîqkirinê Ecocert û birêveberîya Biocoopê hê jî piştgirîyê didin şirketa kolombî. Di tîrmeha 2010ê de, rêveberîya toreya dîrokî ya belavkirina berhemên bîyolojîk ji endamên xwe re weha vedigot : *"Paşxaneya siyasî ya kolombî, adetên welêt... dê dijwarîya rewşê û armancên ragihandineke medyayî ya rojavayî û lihevkirî baş şirove bikin "*. (3)

**Ph. B.**

1 Ev berhemên bîyolojîk weke "Li Îsraîlê Çêkirî " tên firotin. Dibe ku di demeke nêzîk de jî ew li Fransayê, li termînaleke keştîgeha Seteyê, ya ku jixwe hedefa nerazîbûnan e, ji hêla şirketa îsraîlî Agrexco ve bên îtxalat kirin

2 Alfredo Molano Bravo, "Mas claro no canta un gallo", 3 cotmeha 2009ê, www.elespectador.com

3 "Rewşa Daabonê û Rûnê Qespê", belgeya 6ê tîrmeha 2010ê ku ji bo endamên wê, ji hêla birêveberîya Biocoopê ve hat weşandin

Wergera ji fransî: Simko Destan



DARA ARAM: **Qadên narîn**, boyaxa akrîl li ser tûwalê, 36 x 36 cm

Carina darek daristanê îfşa dike. Tîrmeha sala 2011ê, dema ku bi xisleta pratîkên rojnamevanîyê yên heftane ya bi navê "News of the World" hisîyan, di nav brîtanîyan de skandalekê rû da. Lê belê vê rewşê hin tiştên din zelal kirin: Di kêm destan de kombûna mal û milkê çapemenîyê, metakirina agahîyan, hevkarîya gunehkarîya siyasetê. Têgeheke çapemenîyê ku di giregirê pîşesazîya Rupert Murdoch de bi gewde dibe.

## DAWIYA MIROV NE LI BENDÊ YA HEFTANEYA HERÎ MEZIN A BRÎTANÎ

# Çima împaratorîya Murdoch barê gewhereke ku êdî pir giran bûye ji ser xwe avêt?

JEAN-CLAUDE SERGEANT *

Ev lêkolîneke zêde bû. 5ê Tîrmeha 2011ê, sêyemîn împeretorîya çapemenîyê ya cîhanî *News Corp.* ku milkê **Rupert Murdoch** e (wî pêncî û sê hezar mûçegir ji bo wî li çar parzemînan dixebitin) diheje (1): Derkete holê ku rojnamevanê *News of the World*, heftaneya herî zêde difiroşe ya yekşemê ya brîtanî (du milyon û heftsed hezar nusxe), karîbû bigihîje mesajdanka bi deng a telefonê ya **Milly Dowler**, keça piçûk a 13 salî ku sala 2002yê hatibû kuştin û ev yek bû sedem ku di nav raya giştî de hêrs û înfîal peyda bibe. Brîtanî herweha pê hisîyan ku ev bi dizî gihîştina mesajdankan digihêje yên telefonên malbatên eskerên li Afganistanê hatî kuştin jî. Erê, bêdestûr ketina nav jîyana şexsî ya mirovên pir navdar ji mêj ve dihat zanîn, lê belê tevlîbûna nav mehremîya ferdên adetî yên ku derbên xemê yên felekê xwarine, êdî ji sînorên ku mirov dikare qebûl bike, dibihurin; sînorên ku ji mêj ve ji alîyê çapemenîya populer a welêt ve hatine fireh kirin.

Armanca heqaret û piçûkxistinan, *News of the World*. Rojnameya yekşeman a ku ji alîyê Murdoch sala 1968ê hatî kirîn, qonaxa girîng a pêşî ya karîyera wî ya çapemenîyê li Birîtanyayê; ev rojname bi lez û bez di mijara skandal, bertîlxwarin û bazirganîya narkotîkê û ya neqanûnî de bû bispor; ev yek bi xêra komek rojnamevanên berê yên ku di hunerê cilûbergguherandinê û ketina nav refên ê hemberê xwe de hoste, pêk dihat.

Vê xeta edîtorîyê dikir ku redaksîyon mijarên xwe bi navgînên neqanûnî têrûtijî bikin; doh wêneyên bi nêzîkkirinê hatî girtin ên li cihên weke taybet navdar, îro bi korsanî ketina nav mesajdankên bi deng ên telefonên destan. Sala 2006ê du hevkarên rojnamê ketibûn mesajdanka prens **Hary** û ya prens **William** û ji ber vê jî çend mehan cezayê girtgehê li wan hatibû birîn: **Clive Goodman** û **Glenn Mulcaire**.

Birêveberê redaksîyonê **Andy Coulson** berpirsiyarîya xwe ya pîşeyî qebûl kir û biryar da ku îstîfa bike. Helbet îdîa kir ku pratîkên bi vî rengî bi tenê yên rojnamevanekî jirêderketî ne û ku ew bixwe tu carî ji korsanîya mesajdankan re weke rêbaza lêkolîn û lêgerîna rojnamevanî nebûye kefîl. Lê belê ew peyama xwe ya ku exlaqê rojnamevanîyê pir bawerîyê nadê, bixwe xelat dike: Di Adara 2003yê de **Rebekah Brooks** *-hingê birêvebera rojnameya The Sunê bû, ku di çapemenîya brîtanî de rojnameya herî zêde tê firotin ew e û ji sala 1969ê ve xwedîyê wê Murdoch e-,* li xwe mikur hatibû ku berê di berdêla agahîyan de wan pere dane endamên rêxistina polîsan. Li alîyê xwe Coulson îdîa kiribû ku di bin birêveberîya wî de, wî ferman dabû rojnamevanan da ku rêzê ji qanûnan re bigirin, ew ji bo berjewendîya raya giştî amade bûn vê fermanê binpê bikin.

### Rojname çawa jîyana şexsî kontrol dikin û bi kar tînin

Bi xêra serhişkîya *The Guardian*ê hişyarbûna wê ya li ser mijara kor-sanîya mesajdankên telefonan hat parastin. Tevî *The Independent*a ku parêzvana herî mezin a pozîsyonên sosyaldemokrat e û carcaran *The Daily Mirror* û rojnameya bi ser wê ve ya yekşeman *The Observer*, misêwa li dijî bandora zêde ya **Murdoch** a li ser çapemenîyê û jîyana siyasî a brîtanî ne. Di îlona 2010ê de **Nicolas Davies** şahidîya kevne-rojnamevanekî *News of the World*ê derxiste pêş ku pênc endamên din ên redaksîyonê yên ku *The Guardian*ê bi wan re hevpeyvîn çêkiribû, piştrast dikir: Derdiket holê ku kirinên li dijî qanûnan ên vê rojnameya yekşemê, jê re bûne adet.

Hin parlemanteran bi rengekî dan zanîn ku mesajdankên wan bêyî ku haya wan jê hebe hatine guhdarî kirin. Weke mînak **John Prescott**: Kevne zilamê duyemîn ê hukûmeta **Anthony Blair** dibêje ku baş jê piştrast e, ku di dema pêwendîya wî ya bi hevkarekê re ku sala 2006ê hatibû eşkere kirin, bûye mexdûrê baldarîya qaçax a *News of the World*ê. Dema ku ji malîyeya welêt berpirsyar bû (1997-2007) **Gordon Brown** jî bûbû armanca bisporên korsanîya telefonan ên ji alîyê *News of the World*ê ve hatibûn wezîfedar kirin. Di vê mijarê de yên dikevine tehlûkê ev in: Zirarkirina li azadîya xweîfadekirinê ya ku Deklarasyona Mafan (Bill of Rights) sala 1689ê dayî parlemanteran û zirarkirina li destpênebûna tevahîya axaftinên wan ên li gor doktrîna **Harold Wilson**ê (2) ji Partîya Karker ji bo parastina têkilîyên di navbera parlemanter û dengdarên wan de biparêze, saz kiribû.

Endamên parlemanê derbarê vê mijarê de pir hişktir bûn, lewre berîya du salan, *The Daily Teleghraph*ê bi kêfxweşî rehetîya wan a rûmetşikên a derbarê mijara mesrefên çûnûhatin û xwarinê de roj bi roj eşkere kiribû û nûçêyên xwe disipartin wan çavkanîyan ku hinan ji wan ji bo agahîyan pere distandin. Gelo parlemanteran ev derfet bi kar anî da ku êrişê bibin ser organeke çapemenîyê, çiqasî mirov neke baştir jî be, ji bo ku di çavê raya giştî de duristîya xwe ji nû ve ava bikin? Bi ser de jî, di nav refên Partîya Karker de tu kesî heqareta ku birêveberîya *The Sun*ê kirî ji bîr nekiriye: Rojnameyê roja axaftina dawîyê ya **Brown** a di kongreya Partîya Karker a îlona 2009ê de bijart, da ku desteka xwe ya ji bo muhafezekaran eşkere bike, piştî ku kêmûzêde bi awayekî dilsoz destek da "New Labour" ji sala 1997ê û vir ve.

Muxalefetê zû fêm kir ku skandal derfetê dide da ku înîsîyatîfê ji nû ve bigire dest. **Edward Miliband,** serokê nû yê Partîya Karker dizane ku bawerîya bi wî kêm e. Ew dereng namîne û bi lez û bez biryara serokwezîr **David Cameron** dixe ber lêpirsînê, yê ku roja piştî hilbijartinên Gulana 2010ê **Coulson** kiribû birêveberê xwe yê ragihandinê. Startejîstên muhafezekar pê bawer bûn ku ev bisporê çapemenîya populer wê were da ku bandora bi awayekî potansîyel nebaş a li cem dengdarên kokesîlzadeyan yên ji koma muhafezekar a li ser hukim, tewazûn bike (3). Lê belê gelo baş fikirîbû ku vî karî bide mirovekî, ku hîç nebe bi awayê nepenî, ne mumkin bû ku birêz **Cameron** bi tevlîbûna wî ya nav karûbarên sûcbarî nizanibe û ev sûc di bin birêveberîya wî ya li *News of the World* de hatibûn kirin?

Wekî din karê korsanîya mesajdankên bideng, rastî kêlîyeke weha hat ku **Murdoch** hewl dide % 61ê sermayeya *British Sky Broadcasting* (BSkyB) bikire, ku hê ne di destên wî de ye. Ev kanal birêvebera sereke ya televizyonên bi pere ye û îro yanzdeh milyon aboneyên wê hene. Hasilata wê ya salane jî, ji bacên ji bo *British Broadcasting Corporationê* (BBC) tên kom kirin bêtir e, nêzî 3.5 mîlyar sterlînan, ango 4 milyar euroyan. BSkyB di encama fuzyona SkyTV ya ji alîyê Murdoch ve tê kontrol kirin û konsorsîyûma *British Satelite Broadcasting* de hat afirandin, ku bi xwe ji alîyê birêveberên sereke yên taybet ên televizyonê yên brîtanî ve hat sêwirandin. BSkyB baqekî ji qederê sedûpêncî kanalan pêşnîyarî aboneyên xwe dike ku para bêtir kanalên spor û sînemayê ne û yek ji wan jî *Sky News* e, ew jî di agahîyên dewamî û misêwa de bispor e. Ev şirket pirsgirêk e. Gelo dikare were qebûl kirin ku şirketa News Corp. a ku ji xwe % 35ê bazara çapemenîya neteweyî kontrol dike, bi navbênkarîya şaxê xwe *News International* destûra wê hebe kanaleke nûçeyan kontrol bike (lawazîya temaşevanan çi dibe bila be)?


DARA ARAM: **Şîna nav mêrgê 1.02**, boyaxa akrîl li ser tûwalê 32 x 36 cm

Di kanûna 2010ê de, xuya ye pirsgirêk hatiye çareser kirin. Wezîrê ji çapemenîyê berpirsîyar **Jeremy Hunt** biryarê dide pêşnîyara **Murdoch** ji nirxandina Komîsyona Yekdestdarîyan re nehêle. Ev komîsyon bi awayekî adetî ji nirxandina tehlûkeya afirandina pozîsyonên yekdestdar berpirsîyar e. Di berdêla vê de Murdoch qebûl dike *Sky Newsê* ji baqê kanalên BSkyByê derêxe û birêveberîya wê bide pêkhatineke serbixwe. Dema mirov eşkerekirinên tîrmeha 2011ê yên elaqedarî pratîkên *News of the World*ê li ber çavan digire, hin mirov vê pirsê ji xwe dikin: Gelo Murdoch xwedîyê tevahîya kalîteyan e, ku kontrolvanê çapemenîya bihîstbar û dîtbar –Office of Communications (Ofcom)– ferz dike, da ku bikaranîna lîsansa BSkyByê bispêrinê? Parle-manter behsa lîsansa berê ya sala 1981ê dikin ya ku destûr dabû Murdoch rojnameyên şirketa Times Newspapers bi dest bixe. Margaret Thatcher erê kiribû, bêyî ku wezîrê bazirganîyê yê wê demê ji Komîsyona Fuzyon û Yekdestdarîyan re behsa wê bike; lê belê wezîfeya wî bû ku vê yekê bike. Ji wê demê ve, tevî % 35ê weşanên çapemenîyê, Murdoch karîbû giranîya xwe bide ser jîyana siyasî ya welêt.

### Scotland Yard li xwe mukir tê

Seferberîya parlemanterên Partîya Karkeran û lîberal-demokratan, a bi desteka hin rojnameyên *Fleet Streetê* (4) û bi hevpeyvînên *New York Times*ê xurtkirî, kir ku encamên bitesîr derkevin holê. Di çileya 2011ê de **Coulson** biryara xwe datîne ber serokwezîrî. Çend meh paşê Murdoch dev ji projeya xwe ya ji nû ve kirîna BSkyB berdide.7ê tîrmehê **James Murdoch** –kurê wî û di heman demê de berpirsyarê karûbarên News Corp. li Ewropayê– girtina *News of the World*ê da zanîn, vê yekê di heman demê de kir ku dawî li karê dused rojnamevan û mûçegirên wê jî were anîn. Ev dawîya yek ji rojnameyên herî kevin ên neteweyî yên brîtanî bû. Ev rojname sala 1843yê hatibû damezrandin –lê belê çawa ku wê Murdoch bigota, bi tenê % 1ê hatina malî ya şirketê pêk dianî. Li alîyê xwe, berpirsyarên herî bilind ên Metropolitan Police (Scotland Yard) li kêmasîyên xwe mikur hatin, yên di birêvebirina lêpirsîna doza derbarê pratîkên neqanûnî yên *News of the World*ê de: Ev lêpirsîn bi yek rojnamevanî ango **Goodman** û çavkanîya wî ya agahîyan sînordar mabû. Di lêgerînên li malên van herdu kesan de yanzdeh hezar rûpel têbînî, yên ku nasnameya qederê çar hezar mexdûrên potansîyel di wan de hebû, hatin desteser kirin, lê hemû nehatin bi kar anîn. Di hevpeyvîneke bi *The Daily Telegraph*ê re (5), duyemîn mirovê herî girîng ê ***Scotland Yard***ê **John Yates** neçar mabû li xwe mikur were ku polîs li ser tehlûkeya terorîst konsantre bûye û bêguman navgînên pêwîst ji bo lêpirsîna sala 2006ê destpêkirî, seferber nekirine, tevî ku rêxistin girêdayî prensîpa girtina mesajên telefonê yên ku ji alîyê kesê ji wan re hatî şandin, hatine guhdarî kirin, nakevin ber qanûnê. **Yates** di dawîyê de neçar hat hiştin ku hema piştî yê di hîyerarşîyê de di ser xwe re **Paul Stephenson**, îstîfa bike (18ê tîrmehê). Li Stephenson hê nû eşkere bûbû ku weke şêwirmendê alîkarê kevnebirêveberekî *News of the World*ê xebitîye. Di çarçoveya lêpirsîna nû ya çileya 2011ê de îfadeya wî bi xwe jî hate girtin.

Bi hêvîya sînordarkirina propagandaya krîzeke siyasî-medyatîk, ku wê bikira ku serokwezîr gerûgeşta xwe ya li Afrîkayê kurt bibire, *News Internationalê* di çapemenîya neteweyî de *mea culpa* (gunehê min) yek di bin sernûçeya "*Putting right what's gone wrong*" (sererastkirina şaşîyan) weşand. Tê de (di ***mea culpa*** de) behsa angajmana wî ya tazmînkirina mexdûrên desttêwerdanên bêdestûr ên rojnameyê, daxwaza şirketê ya hevkarîya bi dozgerên Scotland Yardê re û komîsyona Meclîsa Gel a ronîkirina van jirêderketinan dikir.

Ji 15ê tîrmehê û pêve, News Corp. dengê xwe zêde bilind nekir. Vê rojê Brooks ji News Internationalê îstîfa dike. Ew sala 2009ê bûbû birêvebera wê ya giştî. Les Hintonê ku heta sala 2005ê berpirsîyarê şirketê bû, da ser şopa wê. Dîsa jî ew êdî şirketa Dow Jonesê (sala 2007ê ji nû ve hat kirîn) bi rê ve dibe, ev şirket *Wall Street Journal*ê diweşîne. Çar rojan paşê, di refaqeta kurê xwe James û warisa wî ya fikrî Brooksê de, li pêşîya komîsyona Meclîsa Gel a bi taybetî ji bo tesbîtkirina berpirsiyarîyên di bûyera korsanîya mesajdankan a *News of the World*ê de civiyayî, giregirê pîşesaziyê destûrê dide îfadedanê û liberhevgirtinê. Ji îfadeya sê seatan, dîmenê li ber çavê me dimîne yê Murdochekî lawazbûyî û bîrsar e, yê ku xwe bi peyvên yekkîte îfade dike û weke gurê ku postê miyan li xwe kiribe got, wî xwe hîç hewqasî "nehêja" his nekiriye, da ku nebêje hatiye piçûk xistin. Li bingehê meselê bixwe tu tiştî nû nîne: Poşmanî, sozên binîzamkirina karûbarên şirketê û cezakirina gunehkaran weke ku heq dikin, helbet piştî ku eşkere bûn.

### Hikûmet û çapemenî: Hevkarîya suc û gunehan

Me yê hez bikira em ji pêşdîtina qunciknivîskara *The Guardian*ê **Polly Toynbee** bawer bikin, a ku sala 2006ê weha nivîsîbû: "*siyasetmedara/ê ku wê bibe xwedî zirav û ciger ji bo derkeve pêşberî Murdoch, ji ber ku wê lê serwext bibe ku Murdoch bi tenê pilingekî ji kaxetî ye, dibe ku matmayî bimîne* (6)." Lê belê zilamê ku 19ê tîrmehê li pêşîya komeke piçûk a parlemanterên hêrs rabûyî îfade da û qet veneşart ku dixwaze giranîya xwe li ser çarenivîsa şirketê dewam bike, şirketa ku ji bo demeke kurt li bazarê nirxê wê kêm bû. Erê di navbera 4 û 18ê tîrmehê de buhayê hisseyên News Corp. % 18 kêm bû, le bêlê piştî îfadedana Murdochan, hem bav û hem kurî, ji nû ve % 6 buhayê wan zêde bû, li Londonê jî buhayê hisseyên BSkyByê % 3 zêde bû. Gelo lêpirsînên li Birîtanyayê û Amerîkayê dewam dikin, wê bikin ku împaratorîya Murdoch ji nû ve were saz



DARA ARAM: **Şewqên şîn II**, boyaxa akrîl li ser tûwalê, 20 x 24 cm

kirin û damezrînerê wê were marjînal kirin, çawa ku hejmarek hissedarên hêzdar jî dixwazin? Tu tiştekî din ji vê nemisogertir nîne.

Ev krîza siyasî-medyatîk ji gelek alîyan ve bi xêr bûya. Serê pêşî, ji ber ku wê kir ku nêzîkbûna desthilatdarîya siyasî û çapemenîyê derxiste pêş û nexasim jî ya di navbera Partîya Muhafezekar û birêveberên *News Internationalê* de. Çapemenîyê têkilyên dostane yên eşkere bûyî yên di navbera *Cameron* û *Brooks* de yên di dema civînên wan ên li xanîyên wan ên dawîya hefteyê de ji alîyê çapemenîyê ve kite bi kite weşandin. Di dema îfadeya xwe de, bi îlhamekê hate bîra **Murdoch** ku demeke kurt piştî hilbijartinên Gulana 2010ê, di derîyê veşartî yê hewşê re li *Downing Streetê*, ew çûbû serdana serokwezîr.

Ev hevkarîya sucî, helbet ne bi tenê karê muhafezekaran e. Heta ku em heta bi destpêka sedsala 20ê bi dîrokê danekevin, ku tê de **Llyod George** ê hingê serokwezîr, subvansîyon dan kirîna *The Daily News*ê, da ku siyaseta xwe biparêze, ev bûyer bi serê xwe têrê dike mirov serdana Blair a Awustiralyayê ya hezîrana 1995ê bîne bîra xwe da ku bi Murdoch û hevkarên wî re rûne. Hingê pê re şêwirmendê **Blair** yê çapemenîyê kevne rojnamevanê siyasî yê rojnameya *The Daily Miror*ê **Alastair Campbell** jî hebû. Campell piştî ku bi karûbarê ragihandinê yên Blair hat wezîfedar kirin, ji birêvebirina têkilîyên xwe yên bi çapemenîyê re amûreke tirsnak a desthilatdarîyê çêkir. Dibêjin pêşdîtina "manşeta" *The Sun*ê ya sibetira rojê û xwestina beşdarbûna nivîsandina wê, ji bo wî fikra sabit e. Kevne-wezîrê karûbarên ewropî yê Brown, Christopher Bryant 6ê tîrmeha 2011ê li Meclîsa Gel li koledarîya birêveberên siyasî ya li hemberî çapemenîyê mikur hat: "*Em girêdayî wan in, em li başîya wan digerin, em jîyan û mirina xwe ya siyasî bi wan kesan ve girêdidin ku dinivîsin û bi wan kesan ve ku nîşan didin. Û carinan maneya vê ew e ku em têra xwe wêrek nînin ku jirêderketinan eşkere bikin.*"

Vê bûyerê wê derfet bida komeke çapemenîya nû, ya ku bi xwe bawer e ku dikare serketina di hilbijartinan de ji bo partîya ku ew ê biryarê bide destekê bidiyê, misoger bike. Belgeya jêhatîbûnê ya ku *The Sun*ê bi xwe piştî binketina Partîya Karker a di hilbijartinên sala 1992yê de dabû xwe û di rûpela yekem de hatibû weşandin, tê bîra mirovan: "*It's the Sun wot won it!*" ("*The Sun* bi ser ket!"). Bi her halî desteka wê dê têra muhafezekaran nekira ku piranîya mutleq a di hilbi-jartinên sala 2010ê dihat hêvî kirin, bi dest bixin.

## Hikûmet dibêje, jîyana şexsî ewqas tevlîhev e ku baştir e mirov hewl nede wê tarîf bike

Tesîra duyem a bi xêr, der barê başkirina pêwendîyên di navbera rêxistina polîs û çapemenîyê de ye. Vê tesîrê bi rasthatina lêpirsînên ji dema derketina holê ya bûyera *News of the World* ve tên meşandin, xwe da der; dozgerên Scotland Yardê der barê dozê de karê xwe yê destpêkê zêde bi pêş de nebirin da ku koma şirketa Murdoch fihêtkar nekin. Kevne-berpirsîyarekî Metro-politan Police ê maseya çapemenîyê ji *Mail on Sunday*ê re weha peyivî: "[Li Scotland Yardê] *heyranîyeke bi rastî ji bo rê û awayê rojnameyê* [*The News of the World*] *heye, ya ku baş operasyonên neqanûnî bi rê ve birin; yên ku destûr dan sûcdarên navdar derkevin pêşberî dadgehê. Di encama vê de di navbera Yardê û tevahîya rojnameyên News Internationalê de nêzîkatîyek peyda dibe* (7)." Polîsê ji wezîfeya xwe geriya û kete nav redaksîyonên Fleet Streetê bêguman derfetê diafirîne ku rojnamevan bigihin çavkanîyên polîs, lê belê herweha dike ku mirov ji xwe bipirse, ka gelo ev tesîrê li kapasîteya azadîya çalakîyê ya rêxistina polîs dike, di wan karan de ku organên çapemenîyê jî di nav wan de ne. Ev pirsgirêkeke exlaqê pîşeyî bû ku li gor komîsyoneke parlemanteran diviyabû were ron kirin.

Di dawîyê de pirsa navendî ya verast-kirina çapemenîyê dimîne, ya ku kete ber lêpirsînê piştî ku du caran *Press Complaints Commissionê* (PCC) – sazîya otoverastkirinê ya sala 1991ê hatî damezrandin –gilîyên derbarê mudaxeleyên bê destûr ên *News of the World*ê de weke bêelaqe sinifandin û lêpirsîn neda dest pê kirin. Bi awayekî esasîtir ya li navenda nîqaşê pirsgirêka parastina jîyana şexsî ya di xala 3yê a qanûna exlaqê pîşeyî ya PCCyê de ye, ya ku bi awayekî zelal guhdarîkirina axaftinên telefonan û bi destxistina nameyan qedexe dike (xal 10).

Ji ber ku ev sazî ji alîyê edîtorên rojnameyan ve tê fînanse kirin û ji ber ku beşeke esasî ya endamên wê ji redaksîyonan e, bi serê xwe bivênevê pirsgirêkek e û ev yek hê ji alîyê komisyona *Calcutt* ve hatibû tesbît kirin, ev komîsyon di navbera salên 1990 û 1993yê de hatibû wezîfedar kirin da ku li rêyên xurtkirina serxwebûna vê sazîyê bifikire. Di rapora xwe ya dawîyê de (8), **David Calcutt** pêşnîyar kir ku PCC were fesih kirin –lewra li gor wî, serxwebûna xwe piştrast nekiriye– û dadgeheke bispor şûna wê bigire, ev dadgeh divê bişê weşandina sererastkirin û lêborînan ferz bike û herweha di warê malî de edîtorên serhişk ceza bike. David bi israr got "*tevahîya sîstema verastkirinê divê di nav xwe de formeke cezakirinê bihewîne*", wî wekî din pêşnîyar kir ku parlemanter qanûnekê erê bikin a ku wê jîyana şexsî nexasim li dijî desttêwerdan û mudaxeleyên bê destûr ên rojnamevanan biparêze.

Sala 1995ê hukûmeta **John Major** pêşnîyarên komîsyonê red kirin, li gor wê avakirina sîstemeke kontrola birêkûpêkkirî wê ji alîyê edîtorên rojnameyan ve weke awayekî sansûrê bihata şirove kirin, hemin diviyabû hukûmet wan jî razî bike. Ji ber ku der barê qanûneke rêzgirtina jîyana şexsî de, ji bo piştgirîya biryara xwe ya redkirina ya hukûmetê di vê pêşnîyarê de li ber çavan girtî ew bû ku zirar di rastîyê de pir kêm bûn, belê mirov ji ber çend bûyerên zêde hatî medyatîze kirin vê texmînê nake û wekî din li gor hukûmetê parastineke bi vî rengî wê ji bersivdana kapasîteya lêpirsîna çapemenîyê bibihuriya. Di dawîyê de hukûmetê berpirsiyarîya wê fikrê girt ser xwe ku dibêje jîyana şexsî ewqasî tevlîhev e ku baştir e mirov hewl nede wê terîf bike.

"Êdî bes e ji derdê van hirhopan..."

Bahoza ku bûyera *News of the World*ê dayî dest pê kirin, kir ku şefê rêza Partîya Karker û birêveberê lîberal-demokratan û navê duyem ê hukûmetê **Nicholas Clegg** doza guhertina awayê verastkirina çapemenîyê bikin, **Cameron** jî bû hevgirê vê daxwazê: 15ê tîrmehê wî komîsyonek wezîfedar kir û dadgerê payebilind ê ku hemû alî rêza wî digirin, **Brian Levenson** wê bi rê ve dibe. Ev komîsyon ji şeş kesan pêk tê û didu ji wan rojnamevan in. Ev komîsyon xwedîya tevahîya azadîyan e da ku îfadeya mirovên wê biryara guhdarîkirina wan dayî bi sûndxwarinê bigire; wê pir karê wê hebe. Komisyon di asta herî jor de hatiye wezîfedar kirin da ku awayekî nû yê verastkirina çapemenîya nivîskî pêşnîyar bike; wekî din erka wê ye ku bi exlaqê pîşeyî yê çapemenîya bihîstbar û dîtbar jî dakeve, nexasim ê BBCya bi awayekî dijwar ji alîyê muhafezekaran ve tê rexne kirin, ji ber ku bûyera *News of the World*ê nixumand û herweha bi xebitîna tevnên civakî dakeve.

Çapemenî ji bo bersivê bide dereng nema, lewma wê didît ku li pişt vê reforma hatî ragihandin, kontroleke navlênekirî xuya dike; heftaneya *The Economist*ê 23ê tîrmehê li defa hewarê xist: "*Sinifa siyasî ya brîtanî ya ku difikire ji bin nîrê Murdoch xwe xilas kiriye, dibe ku kontrolan xurt bike. Ango wê zehmettir be ku mirov di sektora çapemenîyê de pereyan bi dest bixe.*"

Du rojan berîya wê *The Daily Telegraph*ê weha nivîsî: "*Serokwezîr ragihand ku ew naxwaze çapemenîyê kontrol bike. Lê belê ew herweha naxwaze ku sîstema otoverastkirinê ya bi navbênkarîya PCCyê jî dewam bike. Ew dixwaze sazîyeke serbixwe hebe, lê belê hîmê vê sazîyê bivênevê wê bide kontrol kirin û derî li kontrolên qanûnî veke ku wê dijberên azadîya xweîfadekirinê bin;* ***Cameron*** *bi xwe got ew hez dike azadîya xweîfadekirinê biparêze.*"

Encamên Komîsyona Levenson bi îhtîmaleke mezin wê berîya dawîya sala 2012ê neyên eşkere kirin. Heta hingê rapora komîsyoneke din wê bi hukûmetê dîyar be. Ev komîsyon di adara 2011ê de hat damezrandin û erka wê amadekirina pêşnûmeqanûneke muhtemel e, ya ku mafên welatîyên brîtanî –***British Bill of Rights***– terîf dike. Ev qanûn wê qanûna der barê mafê mirovan de a sala 1998ê hatî qebûl kirin sererast bike; xala 8ê a vê qanûnê weke Peymana Ewropî ya Mafê Mirovan jîyana şexsî ya ferdan diparêze. Bi girêdanên bi vê xalê re dadgerên brîtanî her çû bêtir meyildar bûn ku îmtiyazê bidin rêzgirtina jîyana şexsî li hemberî xirabkirina rewşa azadîya agahdarkirinê ya ku xala 10ê wê misoger dike. Li gor Cameron pêşveçûneke bi vî rengî di nav xwe de çewtîyekê dihewîne û ji bo wî girîng e vê yekê rast bike: "*Dadger Peymana Ewropî ya Mafê Mirovan bi kar tînin da ku bi rengekî qanûna jîyana şexsî diparêze, xurt bikin, bêyî ku parleman gotina xwe bike. Ya rast ew e ku bihizirin û ji me bipirsin gelo divê bi vî rengî tevbigerin*. (10)"

Heke ev Bill of Rightsa nû pêk were, divê ew bivênevê bi awayekî zelal û kite bi kite esasê jîyana şexsî û herweha qada azadîya agahdarkirinê terîf bike. Dema vê dike jî biryara der barê dozên bi pirsgirêk de jî neçar ji dadgeran re dihêle: Ev doz bi tenê dikarin bi îşaretkirineke bi terîfeke hişk a berjewendîya gelemperîyê werin çareser kirin, û bi tenê ew dikare destûrê bide destdirêjîyeke nav qada jîyana şexsî (11). Li gor rewşa ku qanûna der barê mafê mirovan de ya sala 1998ê bi xala xwe ya 12.4ê ji dadgeran dixwest, di rewşên dudilîyê de imtiyazê bidin azadîya agahdarkirinê, em bipêşketina ku ev qanûna nû wê bike nabînin. Heke komîsyon bi dadgerê pir ketî nav dozên çapemenîyê **Hary Woolf** re nebe yek; Woolf sala 2002yê weha difikirî: "*nabe ku dadgeh ji bîr bikin ku heke rojname agahîyên bala millet dikişînin neweşînin, hindiktir rojname wê werin weşandin, û ev ê jî li dijî berjewendîya gelemperîyê be* (12). Ev ew çavkanî ye ku mentiqê metakirina agahîyê têra xwe jê vedixwe, ev yek li gor bêqusûr dîtina tiştan ya **Murdoch** bû; giregirê pîşesaz rewş weha îzah kir: "*êdî bes e ji derdê van hirhopan ku ji me re rave dikin ku rojnameyên min xirab in. Ev hirhopên ku rojnameyên tu kes naxwaze bixwîne, dixwînin*" û "*bawer dikin ku mafdar in tehm û zewqa xwe li ser beşên mayî yên civakê ferz bikin*". (13)

Krîza piştî eşkerekirina pratîkên *News of the World*ê û jixwe ev rojname bi tena serê xwe ne yekdestdara van pratîkan bû, destûr da ku mirov bi zirarên hin awayên xebitîna çapemenîya brîtanî, nexasim ya populer bihise. Û kir ku mirov ji bo reformkirina sîstema verastkirina wê hewl bidin. Bi awayekî kûrtir, wê dê hizirîneke li ser hema hema bihevrebûna desthilatdarîya siyasî û çapemenîyê derxista der, ku dê destûr bidaya jinûvecîbicîkirina lipêşbûna siyasetê li hemberî îmtiyazên redaksîyonên herî populer; bêguman ji bo demekê. Heke were piştrast kirin ku tevgerên sûc yên şaxekî wê -di vê mijarê de yên News Internationalê- tesîr li rêveçûna şirketê kirine, hingê ev eşkerebûna mirovan metelmayî dihêle, dikare li ser birêveberîya împaratorîya Murdoch bibe xwedîya bandorekê. Dîsa jî misoger nîne ku vê krîza digihêje çerxên demokrasîyê, bi kurahî raya giştî hestiyar kiribe, lewra bala vê raya giştî bêtir li ser kêmbûna hêza wê ya kirînê û şideta li bajêr e û ne li ser eşkerekirina qusûrên wan kesan e ku xwe weke tercûmanên berjewendîyên raya giştî nîşan didin.

* Profesorê bijarte yê li zanîngeha Parîsa Sêyem (Sorbonne nouvelle). Nivîskarê berhema bi navê *Les Médias britanniques (Çapemenîya Brîtanî),* Ophrys-Ploton, Parîs, 2004.

1 Bixwîne "M. Rupert Murdoch, empereur des médias" ("Rupert Murdoch, Împeratorê Çapemenîyê"), Le Monde diplomatique, çile 1999

2 Ji sala 1964ê heta 1970yê û ji sala 1974ê heta 1976ê serokwezîr bû

3 Di kabîneya wezîran a pêşî a Cameron de ji bîstûneh endaman hijdeh milyoner bûn

4 Binavkirina metonîmîk ya tevahîya çapemenîya brîtanî ye (navê xwe ji rêya ku rojnameyên sereke lê bicihbûyî bûn digire -berîya ku ji wir bar bikin)

5 "JohnYates: Phone hacking investigation was a 'cock up' (John Yates: Lêpirsîna korsanîya telefonan 'tevlîhevîyek' bû)", The Daily Telegraph, London, 9ê tîrmeha 2011ê

6 "This is a good time to strike at the monstrous power of the media (Demeke baş e ji bo ku derb li hêza cinawirane ya çapemenîyê were xistin)", The Guardian, London, 1ê kanûna 2006ê

7 Chester Stern, "Getting cosy with the Yard (bi Yardê re xweşûbêş bûn)", The Guardian, 7ê îlona 2010ê

8 Department of NationalHeritage, Review of Press Self-Regulation, Stationery Office Books, London, çile 1993

9 "Privacy and Media Intrusion: The Government's Response to the House of Commons National Heritage Select Committee (Jîyana şexsî û destwerdana wê bi destê çapemenîyê: bersiva hukûmetê dayî Komîteya Hilbijartina Mîrateya Neteweyî ya Meclîsa Gel )", Stationnery Office Books, tîrmeh 1995

10 "Celebrities would lose super-injunctions in Bill of Rights plan (Di plana Qanûna Mafan de kesên navdar fermanên dadgehê yên super ji dest didin)", The Daily Telegraph, 27 avril 2011

11 "Editors tangle with the zip code (rojnamevan bi şîfreya gihiştinê tevlîhev dibin)", The Guardian, 2ê gulana 2011ê

12 Joshua Rozenberg nivîsand, Privacy and the Press (jîyana şexsî û çapemenî), Oxford University Press, 2004, rûpel 56

13 Jibergirtina di belgefilma "Murdoch 1er (Murdochê Yekem) de", Canal+ roja 9ê tîrmeha 1997ê ev belgefilm weşand

Wergera ji fransî: Luqman Guldivê

www.arsivakurd.org

Zêdebûna li malê, şîrmijandinê jî bi qîmet dike...Van çend salên dawîn, pêşketina ekolojîyê rengê zarokçêkirinê jî guhert. Li hember dermanên fizûlî û lobîyên endustrî rexne zêde dibin û li alîyekî din jî, mirov dibîne ku fikrên li dijhev di derheqê "xwezaya jinan" de peyda dibin. Munaqeşeyeke ku ev serê bîst salan e li Amerîkayê tê kirin.

## JI NÛ VE PEYDABÛNA FIKREKE HAZIR

# Femînîzm û ekolojî, têkilîyeke "xwezayî" ye?

JANET BIEHL *

Gelo jin ji mêran *"kesktir in"?* Ma têkilîyeke wan a taybetî bi xwezayê re heye yan perspektîveke wan a bêhempa li ser pirsgrêkên ekolojîyê heye? Van çend deh salên dawîn jinên ku ji xwe re dibêjin femînîst, bi rengekî erênî bersîva vê pirsê dan.

Bi rastî, vê pozîsyonê ji dema peydabûna tevgera ekolojîst ya modern dest pê kirîye. Di sala 1968ê de, di pirtûka xwe *La Bombe P* (1) de, **Paul Ehrlich** digot ku; zêdebûna mirovan li kaînatê dê dawîya dinyayê bi xwe re bîne. Tiştê herî baş ku mirov karibe pêk bîne bo dinyayê, ew e ku mirov (nifûsa) xwe zêde neke. Çend sal piştî re, femînîsteka radîkal ya fransî, **Françoise d'Eaubonne**, dida zanîn ku nîvîyê gel, ne xwedîyê ve hilbijartinê ye: jin di zarokçêkirinê de, ne xwedîyê biryarê ne. *"sîstema mêran"* yanê pederşahî, dixwest ku jin her pêxwas, hemîle û xwedî gelek zarok bin.

Lê belê **d'Eaubonne** digot, jin divê ku bersîvê bidin û bixwazin ku azadîya zarokçêkirinê di destên wan de be, xwedîyê biryara zarokjibergirtinê be û tedbîrên dij-hemîletîyê ew bi xwe hilbijêrin*; Ev tişt in ku dê jinan pêşde bibin û kaînatê ji zêdebûna bê mane xilas bikin. Encama yekem di navbera ekolojî û azadîya jinan de ev e ku, jin divê xwe bikin xwedîyê biryara pêşketina demografîk, bi vê şêweyê bibin xwedîyê laşê xwe, bedena xwe.* (2) Di pirtûka xwe ya bi navê; ***Le Féminisme ou La Mort*** (ya femînîsm yan mirin) de ku di sala 1974ê de derketiye, wê navê vê ramanê kiribû *"ekofemînîsm".*

Parastvanên jîngehê yên amerîkanî vê ramanê diparêzin, lê belê maneyeke din a cuda didinê. Ev jî baş tê bîra wan ku nivîskara pirtûka "*Silent Spring*" (***Behara Bêdeng***) jin bû û bibû dengê femînîzma sala 1963: **Rachel Carson**. (3) Ew pê dihesîyan ku jin di meşên li hember merkezên nukleer an jî li hember gend û gemara jahrîn wek ***Lois Gibbs*** li "***Kanala Love***" li eyaleta *New Yorkê* cîh digirin. Jinek din, **Donella Meadows**, ku yek ji nivîskara rapora *"Halte à la crossance*" (4) (***Zêdebûnê Bisekinînin***), raport di sala 1972an de derçûbû. **Petra Kelly**, yek ji wan kesên herî pêşde ya *Keskên Alman* bû. Li *Britanya Mezin*, grûbek jin, bi navê "*Women for Life on Earth" **(jinên ji bo jîyanê li dunyayê)*** li ser balafirgeha ,***Greenham Common*** ji bo protestokirina bicîhkirina çek û mîsîlên parzemînî (qitayî) yên ***NATO***yê, kampek aşîtîyê damezirandin. Gelek ji wan bêşdaran xwe wek ekofemînîst îlan dikin; lê belê ev kes beşdarî tekoşîna ji bo azadîya çênekirina zarokan nabin. Mirov dest pê dike têkilîyeke taybetî di navbera jin û xwezayê de bibîne.

### Heqaretek ku veguherî îltifatê

Mirov vê yekê di nav ziman de jî ferq dike: bêjeyên ***xweza*** (la nature) û ***erd*** (la terre) bi artikelên mêr an makê dest pê dikin, daristan ***bakîre*** ne, xweza, wek ***dîya*** me tê zanîn, ku ya herî henûn e. Tam tersê vêya, qawetên ku xwezayê xerab dikin yên ku axê îxfal dikin, gelek caran qawetên ilmî, yên teknolojî û yên aqil in. Ev jî hemû berhem û projeyên mêran in. Çend hezar sal berê, **Arîsto** mantiq wek mêr şanî da; Arîsto wusa difikirî ku: jin têra xwe baqil nînin ku bikaribin biryarê bidin, bi vî awayî jî tam insan nînin, dikare kûvîyên efsûnî bin.

Bi dirêjahîya du hezar salan vê ramanê tesîra xwe li kultura ewropî jî kir ku jinan wek kêm-aqil qebûl bikin ku sebeb û bingeha zêdebûna însanan li ruyê erdê ew in.

Paşîyê tevgera ***Lumière*** (*Ronî: tevgera zanîn û agahîyan*); projeyeke din ku welê dîyar e ew jî mêrane ye, ji xwe re şêweyên nû peyda kiribûn û bi vî awayî bi alîkarîya ilm, teknolojî û fabrikayan xweza xera dikirin, wêran dikirin. Ew kesên ku xerabî çêdikirin her mêr bûn û bi çavên ticaret û bazirganiyê li çavkanîyên xwezayê mêze dikirin û ji bo kara xwe bi kar dianîn. Projeya ***Lumiyer*** dixwest serdestî li xwezayê bike û her wisa pesnê aqil-mantik dida û dinya wêran û xera dikir. Li gor felsefeya *New Age* ***"Serdema Nû"*** û ekofeminism. Xwedîyê vê felsefeyê wek nivîskarên; **Frijtof Capra** û **Charlene Spretnak** bûn. (5)

Lê belê fêmînîstên salên 1970yî digotin ku jin destên wan paqij in. Û dunya pêwistîya wî kêmtir bi mantiq û rasyonalîzma wêrankar ya xwezayê heye; ger jin ji mêran hîn zêdetir xwedî hisiyet û *hest* bûna. Dê gelek xweş biba: jin *antidot* in. Ji ber ku hisiyatên jinan û yê xwezayên bi hev re dimeşin, ji ber wê jî têkilîyên navbera mirovan û xwezayê ji ber xwe ve û baş dizanin. Nîşana xerabkirina jîngehê jî, bi van têkiliyên taybetî ve girêdayî ne. Bi vî awayî ger mirov jinan bi xwezayê re bike yek, ev dibe projeyek êrênî, bi vî awayî jî jin dibin melekên parastina mesaja ekolojîst. Ev tişt ji alî psîkolog **Carol Gilligan** ve jî hatîye teyîd kirin û herweha **Gilligan** (6) pêşnîyar dikir ku *pêşketina moral û exlaqî ya taybetî ya jinan, dikare bibe etîka lixwemêzekirin û tedawîkirina kesên din.* (7) Hinek ji wan, herwekî; **Mary Daly**, dê di gotina xwe de hewqas pêşde here û bêje ku xweza ***dees (***xwedawend/îlahe) e. Û di rihê hemû mexlûqan de heye û jin jî havêna vê bûyerê ye. (8)

Femînîstên ku ji bona pêşketina mafên xwe têdikoşin ji vê ramanê çav tirsandî bûn.

*Ekofeminîzm*, dîsa bi qîrîn li gel sloganên xwe yên stereotîp û pederşahî: dest pê kirin çêrên xwe yên kevn nû bikin û wek komplîmant şanî bidin. Van sloganên wan yên stereotîp ku di sedsala 19an de bi kar hatibûn ji bo ku ideolojîya wan ya ***"Sphère Séparées***" bidin qebûlkirin ku jin mahkûmî xebatên hundurîn yên malê ne û wan di nav qefesan de mehkum dikir, vê jî li ser navê exlaq û qîmetên bilind şanî didan. *Ekofemînîzm* dubarekirina stereotîpên bindestîyan bûn. Hemû ji nû ve ji dest derbas kiribûn lê ev kes, cîhê wan di tekoşîna femînîzmê de tunebû, vana tenê derî ji femînîzma mîstîk re vedikirin. Rastîya wî ew bû ku piranîya kesên ku xebata jîngehê yên salên 1970ê dikirin mêr bûn. Her wekî: **David Brower, Lester Brown, Barry Commoner, E. F. Schumacher, Denis Hayes, Murray Bookchin, Ralph Nader, Amory Lovins, David Suzuki** û her weha **Paul Watson**.

Di vê gavê de, ekofemînîstên rojava, bi rêya projeyên bo pêşketinê ya Banka Dunyayê ve alaqa ji bo dunya sêyemîn şanî didan. Muhendis, ji bo enerjîya avê, baraj li ser çeman ava dikirin, di vê gavê de dor û der cîhen avahîyan xera dikirin. Ev ***polîtîka "Agrobuisiness"*** axa çandinê ya hezar sale ku gelek babet ziraet lê pêkdihat, bû yek babet ziraet û tenê ji bo bazara dunyê û li derva bêt firotan. Di vê gavê de daristan jî dihatin qelibandin û jêkirin ku ji zû ve gundîyan debara xwe pê dikir, ji xwarinê, fêkîyan bigire û heta xwe germkirinê ji wir temîn dibûn, materyalên avahîyan dîsa her ji wir dihatin temîn kirin. Daristanê, her weha heywan, ax û avên bin erdê diparastin. Ev pêşketina xerab ku muxalefetê jê re digot *Kapitalîzma Kedxwar ya Navneteweyî*, ev kapitalîzm ne tenê daristan, av, çem, ax, heywan, her weha civakên însanan jî ji jîyana wan ya ekolojîk û kevnare dûr dixist.

Civakên eslî yên bi cîh li hember vê polîtîkayê serî radikirin û li ber xwe didan. Li bakurê ***Hindistan***ê bi taybetî,dema ku şîrketekê dixwest daran bibire, jinên gundî xwe bi daran ve girê didan da ku kes nikaribe wan jêke. Çend salên paşîn navek ji vê tevgerê re peyda bû; ***Chipko*** ku li hemû parzemîna (qita) jêrin ya ***Hindistan***ê belav bû.

Tevgera ***Chîpko*** tesîr li ser bawerîyên ekofeminîstên rojavayî kir, rastîya bûyerên civakî grûbên jinên ku bi axê ve girêdayî ne û mîstîk peyda kirin **Vandana Shiva** û hinek kesên din beyan dikirin ku: bi taybetî li heremên dervayî bajaran, li Afrîkayê, li Asyayê û li Amerika Latînî îro jin baxçevan in û zanînek wan ya taybetî heye û di vî warî de pispor in. Pêşvexistina xirab ya mêran, tenê qîmetê dide çavkanîyên ji bo bazara bazirganîyê; lê jinên xwecihî-eslî, dizanin çawa hurmetê şanî çavkanîyan bidin, ji ber ku baş dizanin neslên paşê her pêwistiya wan dê pê hebe. Ji ber vê yekê jinên ku li ser axa xwe dijîn, hurmeteke taybetî û hîsî ji bo jîngeh û tabîatê xwedî dikin û diparêzin.

Meraqa ekofemînîzmê ji bo tevgera ***Chipko*** ew bû ku; zîreat tenê ji bo jîyana mirovan pê berdewam be, dimeşandin. Baş e mirov ji bo jinên ku bixwazin bixwînin û jîyaneke profesyonel, an wek hemwelatîyeke temam xebateke polîtîk ya profesyonel bimeşînin çi bêje?

Ekofemînîstan dixwest ku jin her bi karên xwe yên berên eleqedar bin, pêxwas û baxçevan bin. Ji bîr dikirin ku di navbera tevgera ***Chîpko*** de mêr jî faal bûn…

Her weha, diyar bû ku bi vî awayî, dema jîngeh û xweza wêran dibe tesîra wê li ser jîyana jinan bi rengekî negatîf diyar dibe. Dema erdên xurt ku tenê yek babet hubûbat li ser tê çandin, kesên din mecbûr xwe didin ber bi kêlekan, dîyaran û cîhên kêm xurt, ev jî dibe sebebê darbirînên daristanan, erezyonên erdan. Bê guman ev jî feqîrîyê bi xwe re tine. (9)

Germbûna klîmatîk jî, di destê yekem de li ser rewşa jinan tesîr dike, kêm statûya wan ya civakî, ji ber felaketan, ba û baran, bahoz, lehî, tofan, şewatên daristanan, germên zêde û zuhayîyan, hîn kêmtir dibe, bi ser de jî nexweşî, kêmasîya xwarinê, rewşê hîn xerabtir dike.

Ev rastî, ji alî raporên rêxistina jinan: ***Women's Environmental Network*** (WEN), rêxistinek e ku li Britanya Mezin bi cîh e, tespît bûye. Li gor vê rêxistinê salê 10 000 jin, ji ber van felaketên bi guhertinên klîmatik ve girêdayî ne, dimirin.

Li gel vê, tenê 4 500 mêr mirine. Ji sedî 80% penaberên klîmatik jin in, ji 26 mîlyon kesên ku malên wan û şertên hebûna wan ji ber tofanan ji dest çûye, 20 milyonên wan jin in. (10)

Mesela di sala 1991an de, li *Bengladeş*ê, di lehî û tofana avê de jin pênc qat ji mêran zêdetir mirin an jî fetisîn. Kincên wan bû sebeba fetisandina wan, ji ber ku nedikarîn li ba mêran wan derxin. An ji demek dirêj di malên xwe de man da ku mêrek ji malbatê were wan xelas bike, li nêzî wan mêr hebûn, lê ne ji malbatên wan bûn û nedikarîn mudaxele bikin, mêran bêtir bi rehetî alîkarîya hevûdu dikir û hevûdu ji talûkê haydar dikir, mêran tew haya jinan jî pê nedixistin. Li warên ku statuya jin û mêran nêzî hev e; di demên ku fîyetên xwarinên esasî bilind dibin û nexweşîyên ku ji ber germayê jîngehê tar û mar dike.

Li Amerîkayê, piştî krîza fînansê ya **Wall Street**, têkilîyên jin û mêran hatin guhertin û şikleke din girt: *"jin jî êdi li têkilîyên dûr û dirêj digerin û girîngîyê bêtir didin neslên nû."* Bi vî awayî dinivîse **Shannon Hayes** di pirtûka xwe ya bi navê *"Radical Homemakers*" (***Kevanîyên radîkal)*** (11) ev jinên nû yên bi navê *"ax û dayik";* dest ji avantajên aborî yên ku dikaribûn jîyanek bi konfor û bilind, xwendinên bilind û karîyerek bi qîmet ji wan re ava bike, berdidin û tercîh dikin li malê bisekinin bi zarokên xwe re mêşxûl bin, di karê baxçên xwe de bixebitin da ku karibin xwarinên xweş bidin malbat û zarokên xwe. Bi cîranan û dor û dera xwe re têkilîyan geş datînin, jîyanek basît û rehet dimeşînin. Xwetêrkirina bi îmkanên xwe, bingeha fikirê ye û garantîya krîzên aborîyê ye. Bi vî awayî ziyana wan li ser tebeqa ozonê jî kêmtir dibe. Ew jî jîyana xwe ya şexsî memnûn in û ji alî ûjdan ve xwe rehet dibînin, bi kêmasî di nêrîna yekem de bi vî awayî diyar in.

### Vegera ser cîhanên cuda?

Parastina jîngehê ji mêj ve dest pê kirîye û lêkolinerên ilmên sosyal û civakî dikarin têkilîyên jin û mêran ya bi ekolojîyê ve girêdayî ye analîz bikin û ferqîyetên wan eşkere bikin.

Ji salên 1980yî vir de, piranîya wan hatin ser wê fikrê ku li welatên endustrîyel, jin ji mêran bêtir li hember texrîbata jîngehê serê xwe diêşînin.

Li gor hin lêkolînan, jin ji mêran kêmtir karbonê belav dikin. Lêkolînek swêdî şanî dide ku mêr bi şêweyeke bê miqayese ji jinan zêdetir beşdarî germbûna klîmatik ya dunyayê dibin, ji ber ku mêr otomobîla ji jinan zûtir û dûr û dirêjtir dajon. Li Swêdê, çûn û hatina bi otomobilan, ji çaran sisê ji alî mêran ve bikar tê. (12)

Gelo li ser çalakîyên sîyasî yên bi pirsên jîngehê ve girêdayî ne, mirov dikare çi bêje? Di çarçeveya neteweyî de, li gor ***IWPR*** beşdarîya jinan di berpirsîyarî û rêveberîyê de gelek kêm e. Di rêvebirina rêxistinên ekolojîk yê neteweyî de piranî mêr in. Lê belê di warên lokal de, ji bo çareserkirina pirsgirêkên ewlekarîyê an tendurustîyê, wê demê beşdarbûna jinan ji ya mêran gelek zêdetir e. Kêm ku li hember qeza û tofanên ekolojîk derdikevin ji nîvî zêdetir jin in.

Gelo mirov dikare bi rehetî bêje ku ev ferqîyet cudayetîyên esasî ne û bingeha stereotîpên pederşahî ne? Gelo divê ku mirov qebûl bike ku di warê neteweyî de, mêr serekîya birêvebirina rêxistinên ekolijîk dikin û jin tenê xebatên xizmetê dikin? Gelo hûn di derheqê vê fikrê de çi difikirin: ku jin vê zehmetîyê ji bo navê femînîzmê dikşînin?

Di vê gavê de rîsk heye ku mirov were ser fikra *"sphère séparées"*. Her weha ji bo ***"kevanîyên radikal***" jî, fikra li mal mayînê xweşbûna xwe winda dike, ev jî fikra femînîsta meşhûr **Peggy Orenstein** e, ger mêr beşdarê çalakîyan nebin û bi wan re xebatê parve nekin, jin îtîraz dikin, jin vêya li hember xwe wek kêm hurmetî qebûl dikin, ev ji li ser jîyana wan ya civakî xerab tesîr dike. (13) Dema ku tenê mêr ji bo idarekirina malê pere qezenc dike û jin tenê karê malê dike, di malbatê de gotina mêran bêtir derbas dibe û tevlihevîyek dikeve têkilîyên malbatê, di vê rewşê de, hîn bêtir jin û zarok zerarê dibînin. Di vê warî de guhertinên rastîn yên civakî û ekolojîk dikarin pêk bên, gelo ji ber xwe ve çareser dibe, ger mudaxele neyê kirin?

* Mîlîtaneka ekolojîk ya civakî, Burlington (Vermont, Yekîtîya Amerîka). Nîvîskara Rethinking Ecofeminism Politics, South End Press,Cambridge (Yekîtîya Amerîka), 1991.

1 Paul Ehrlich, *La Bombe P. Sept milliards d'hommes en l'an 2000*, (Bomb P. Heft milyar mirov di sala 2000î de) Fayard, Paris, 1972

2 Rachel Carson, Silent Spring (Bihara Bêdeng), HoughtonMifflin, Boston, 1962

3 Rachel Carson, *Silent Spring*, (Bihara Bêdeng) Houghton Mifflin, Boston, 1962

4 Donella H. Meadows, Dennis L. Meadows, Jørgen Randers et William W. Behrens III, *The Limits to Growth*, (Hidûdên Mezinbûnê) Universe Books, New York, 1972

5 Fritjof Capra, *The Turning Point*, (Nuxteya Vegerê) Simon & Schuster, New York, 1982; *Green Politics: The Global Promise (*Sîyaseta Kesk: Soza Gerdûnî*)* (avec Charlene Spretnak), Dutton, New York, 1984

6 Carol Gilligan, *In a Different Voice*, (Di Nav Dengekî Cihê de) Harvard University Press, 1982

7 Lire Evelyne Pieiller, "Liberté, égalité… "care"", (Azadî, Wekhevî...) *Le Monde diplomatique*, septembre 2010

8 Mary Daly, *Gyn/Ecology :The Metaethics of Radical Feminism*, (Gyn/Ecology: Meta-etîka Femînîzma Radîkal) Beacon Press, Boston, 1978

9 Jodi Jacobson, "*Women's Work", Third World* n° 94/95, (Karê Jinan, Dunya Sêyemîn) McGraw-Hill, New York, janvier 1994

10 WEN, "*Gender and the Climate Change Agenda*", (Zayend û Rojeva Guherîna Îklimê) www.wen.org.uk, 2010

11 Shannon Hayes, *Radical Homemakers. Reclaiming Domesticity from a Consumer Culture*, (Kevanîyên radîkal: Ji civateke serfkar vegera ser jiyana malbatî) Left to Write Press, Richmondville (Etats-Unis), 2010

12 "*Are men to blame for global warming?*" (Gelo sûcdarên germahîya gerdûnî mêr in?), *New Scientist*, Londres, 10 novembre 2007

13 Peggy Orenstein, "The Femivore's Dilemma", *The New York Times*, 11 mars 2010

Wergera ji fransî: Vehbi Aydin

# ÇAND Û HUNER

## DI NAVBERA HEBÛN Û NEBÛNÊ DE SÎNEMAYA KURDÎ

# Sînemaya kurdî li gor kîjan prensîban dikare bê bi nav kirin?

YILMAZ ÖZDIL *

Yekemîn projeksîyona sînemayî 22yê kanûna 1895ê li Parîsê, li **Grand Café**yê, ji alîyê du birayên bi navê **Auguste** û **Louis Lumière** (*Frères Lumière*) ve hate çêkirin. Pîştî wê projeksîyonê îcada ***Birayên Lumière*** ya bi navê "cinématographe", ango yekemîn cihaza qeydkirin û nîşandana wêneyên bi hereket, wekî mizgînîya moderniteya sedsala 20ê li her derê dinyayê belav dibe. Di heman demê de, bandora îdeolojîya nasyonalîzmê jî li ser hemû kevnesîstemên desthilatdarîyê zêdetir dibû û dewletên împaratorî yek bi yek hildiweşîyan.

Şerên di navbera dewletên mezin de û herwiha krîzên çandî û aborî dibine sedemê bikaranîna sînemayê ji bo qeydkirin û parastina arşîvên dîrokî û propagandaya leşkerî. Di vê qonaxa aloz de, ku heta dawîya Yekemîn Şerê Cîhanî berdewam dibe, rêya sînema û îdeolojîya nasyonalîzmê jî dibe yek û sînema bê hemdî xwe dikeve bin etîketa "dewletên neteweyî". Bi gotineke din, hemdemîya peydabûna hunera sînemayê li gel pêvajoya belavbûna nasyonalîzmê li cîhanê, wate û armanca sînemayê jî diguherîne û sînemayê, hem wekî hunereke nûjen hem jî wekî dezgeheke ragihandinê/propagandayê di nav sazîyên dewletî de bi cih û bi nav dike. Her wisa, li cem hinek gel û dewletên rojavayî yên wekî Îran (1) û Împaratorîya Osmanîyan (2), hem bi wateya sembolîk (îcadeke nûjen û ewropayî/rojavayî) hem jî bi wateya xwe ya hunerî (derfeta jinûve avakirina dinyaya rasteqîn), hunera sînemayê dibe amrazê îdealîzekirina moderniteya (3) rojavayî. Îro, herçend pêşveçûnên siyasî û teknîkî wate û sînorên sînemayên neteweyî hinek guhertibin jî, hunera sînemayê hê jî bi tevahî ji bin nîrê dewletên neteweyî, yan jî netewegerîya dewletan derneketîye. Lê, divê mirov bi bîr bîne ku îcrakirina hunera sînemayê nisbet bi hunerên ciwan ên din giranbihatir, aloztir û zehmettir e. Ji bilî daxwaza dewletan ya bikaranîna hêz û bandora hunera sînemayê ji bo propagandayê, ev rastî jî dibe sedemeke din a girêdana sînemayê bi sazîyên dewletî ve.

### Sînemaya neteweyî û dewleta neteweyî girêdayî hev in

Gelo sînemayeke kurdî wê çawa bikaribe xwe di nav vê tevna ideolojîk de binexşîne ku sed salan berî niha hatiye raçandin? Pirsgirêkên li hember nasîn û binavkirina sînemayeke kurdî, bi piranî, ji têkilîyên di navbera kurdan û nasname û sînemayên neteweyî yên dewletên serdest de "dipekin". Ji ber ku hebûna sînemayeke neteweyî, girêdayî hebûna dewlet û nasnameyeke neteweyî ye; nebûna sînemaya neteweyî ya kurdî jî girêdayî nebûna nasnameya neteweyî, ango nebûna dewleteke neteweyî ya kurdî ye. Bêyî ku em karîkatûrîze bikin, li gor vê formulasyonê, sedemên pirsgirêka kurdî û sedemên bênavbûna sînemayeke kurdî yek in. Her wisa, pirsgirêka kurdî, ya ku di dîskurên polîtîk yên kurdan de bi rêya peyvên "red" û "înkar" tê ziman, di wateya temsîlîyeta kurdînîyê ya di sînemayên neteweyî de, wekî veşartina (dissimulation) hemû *formên maqûl* yên nasnameyên kurdî xwe pêk tîne. Yanî, înkarkirina polîtîk ya nasnameya kurdî dibe sedemê veşartina hemû formên xweser yên kurdînîyê di sînemayên neteweyî yên dewletên li dijî kurdan de. Di vê wateyê de, perdeya spî ya sînemayê ku hemû gelên xwedî dewlet xwe li ser dibînin û didin diyarkirin, li pêşîya hebûna kurdan di destên dewletên neteweyî yên dijberî kurdan de dibe perdeyeke tarî.

Qesta min ji gotina "formên maqul yên nasnameya kurdî", ne nîşandaneke realîst/objektîf ya kurdînîyê ya bi destê "bîyanîyan" e. Di çarçoveya meselaya kurdî de, ku zêdeyî sedsalan e devam dike, temsîlkirina kurdan di sînemayê de hindî ku bi destê bîyanîyan be, di navbera zimanekî sînemayî yê objektîf/realîst an jî yekî subjektîf/fîktîf de ferqên girîng nînin. Tê qebûl kirin ku *zimanekî sinematografîk* (langage cinématographique) yê subjektîf/fîktîf bi giştî xwe dispêre *metafor*an, lê zimanekî sînematografîk yê objektîf/realîst xwe dispêre *mêtonîmîy*an. (4)

Di çarçoveya behsa temsîlkirina kurdan di sînemayên bîyanî de, sînorên di navbera metafor û metonîmîyê bi hêsanî radibin. Gelek caran, rastîyên civakî an jî polîtîk yên kurdan, bi rêya nîşandana "parçeyekî" xirap tên ser û bin kirin. Bo mînak, mijarên li ser "jinkuştin û feodalîya kurdan" di sînemaya neteweyî ya Tirkîye de pir caran wekî mêtonîmî/parçeyekî ne baş ya rastîya kurdan tê bi kar anîn û "kurdînî" wekî feodalîteyeke kevneperest tê nîşan dan. Di gelek fîlmên tirkan de (5), "jinkuştin" (ew dibêjin *namus cinayeti*), "axaftina bi aksan ya bi tirkî", "bêfamî/cahilî", "destkurtî û feqîrî", "tund û tûjîya olî" û "cil û bergên kurdî" wekî kodên feodalbûn, ango paşdamayîna kurdan tên bi kar anîn û bi vî awayî dibin amrazê biçûkkirin/biçûkdîtîna kurdan. Rast e, feodalî û jinkujî, qasî hemû civakên rojavayî (tirk bi xwe jî tê de) rastîyeke civakî ya kurdan e. Lê, her çi qas ev perçeyekî ji rastîya civaka kurdan be jî, yekem sedemê avakirina "îmaja hovîtîya kurdan" di filmên tirkan de nîşandana feodalîyê nîne. Ev îmaj, berî her tiştî, di nav dîskurên fîlman de li gor konseptên îdeolojîk yên veşartî tên ava kirin. Di fîlmên tirkan de, lehengên fîlmîk yên sereke di avakirina "îmaja hovîtîya kurdan" de xwedî misyoneke mezin in. Ew leheng ku her car bi kêmî, yek ji wan tirkekî "modern" (6), "rewşenbîr" û walatparêz (neteweperest) e, mîna prototîpên idéal yên nasnameya fermî û modernîzma kemalîst tên karekterîze kirin. Mesela, di wan filman de ji alîyekî ve kurdînî wekî kêmasî û kevneperestîyekê tê kod kirin, ji alîyê din jî tirkbûn, li dijî kurdînîyê wekî nasnameyeke îdeal ya neteweyî tê xemilandin. Sedemê "afirandina" vê dualîzma ideolojîk, bêyî ku peyvên "kurd" an jî "Kurdistan" bên bi kar anîn, piştgirtin û qewîkirina nasnameya neteweyî ya tirk e. Ji ber vê yekê, di wan fîlman de kurd çiqas "rojhilatîyên paşdemayî" bin, tirk ew qas "rojavayîyên pêşda çûyî" ne, kurd çiqas "bêfam", "jar" û "perîşan" bin, tirk ew qas "bi aqil", "jîr" û "bextewar" in. Yanî dawîya dawîyê mesele tê li ser gotina **Atatürk**: ***"Ne mutlu Türküm Diyene".*** Eşkera ye ku vegotina (naration) mijara feodalîyê di filmê derhênerekî kurd de, heke bi zimanê kurdî û ji bo kurdan hatibe kêşan, tu cara nabe sedemê neqedirgirtina nasnemaya kurdan. Ji ber ku, di filmekî ku bi destên kurdan û bi kurdî hatibe kêşan de, "kurdînî" wê di nav hîyerarşîyeke nawxweyî de û bi çavekî kurdewarî bê nirxandin. Bi gotineke din, ev nabe amrazê mezinkirin û îdelîzekirina nasnameyeke din ku xwe li dijî nasnameya kurdî avakirî ye.

### Sînemaya kurdî çi ye?

Ne bi tenê ji ber sedemên îdelojîk, her wisa ji ber sedemên teknîkî û hunerî jî "nîşandana" dinyaya reel bi rêya sînemayê, tim û tim, li gor dîtin û niyetên ew kesên ku biryara dîskûr û esasên kêşana filman didin, tê guhertin. Ji ber vê yêkê, ji bo min, maqûlîyeta temsîlkirina kurdînîyê di sînemayê de, tê wateya "heqê xwe-vegotin" û "xwe-nîşandan"a kurdan wekî kurd û bi zimanî kurdî. Ez bixwe ji gotina maqûlîyet û meşrûîyeta temsîlkirina kurdan, çêkirina filmên *bi zimanê kurdî*, bi dest û derfetên kurdan û li ser jîyana kurdan tê digihim. Li ser vî esasî û li gor filmên derhênerên kurd yên ku heta niha di salonan de hatine nîşan dan, yan jî li ser bingehekî dijîtal (DVD, VCD û hwd) an jî analog (şerît, band û hwd) hatine qeyd kirin û min bixwe dîtine, pêşnîyara min ji bo tarifa sînemaya kurdî ev e:

Sînemaya kurdî ji fîlmên ku ji alîyê derhênerên kurd ve hatibin kêşan, ku zimanê wan bi tevahî (intégralement) an jî bi giştî (principalement) bi kurdî be û ku mijara wan li ser kurd û Kurdistanê be, pêk tê. Li gor vê tarîfê du paradoksên mezin ku ji pirsgirêka kurdî ya polîtik dizên, derdikevin pêşîya sînemaya kurdî. Paradoksa yekê ev e: Sînemaya kurdî, wekî sînemaya gelekî bindest, ji sînemayên neteweyî yên gelên serdest zêdetir pêwîstî bi piştgirîya fînansman û sazîyên dewletî heye. Berevajî sînemayên neteweyî, sînemaya kurdî ne xwedî temaşevan e, ne xwedî bazar e, ne jî xwedî nasnameyeke fermî ye. Her wisa ji ber nebûna bazar û temaşevanên kurd, ew nikare, wekî dezgehên din yê ragehandin û xwe-îfadekirinê jî, hebûna xwe *bi temamî* bi hebûna bizavên siyasî yên kurd ve girêbide. Ev kêmasîyên aborî bandoreke mezin li ser naveroka filmên kurdî dikin û gelek caran derhênerên kurd mecbûrî lêgerîna "çîrokên sivik" dikin ku çêker û temaşewanên "ne-kurd" nikarin û naxwazin filmên kurdî çêbikin û temaşe bikin. Paradoksa duyem jî ev e: Sînemaya kurdî, heya vê gavê armanca hebûna xwe, wekî aşkerekirin û nîşandana "kurdînî"yê destnîşan kirîye. Yanî mîsyona sereke ya sînemaya kurdî şikandina *kodên polîtîk yên veşartina kurdînîyê* (7) ye. Lê, mixabin di halê hazir de, filmên derhênerên kurd ku mirov bikare di bin navê sînemaya kurdî de analîz bike, bixwe ji alîyê wan kodan ve hatine dorpêç kirin û veşartin. Ev rastî careke din hebûna sînemaya kurdî bi pirsgirêka kurdî ve girêdide.

Çend taybetmendîyên sînemaya kurdî yên ku li gor tarîfa min derdikevin peş çav ev in:

1 Zimanê kurdî di binavkirina sînemaya kurdî de faktora sereke ye. Lê, ji ber sedemên aborî, polîtîk û hunerî, zimanê kurdî nikare bibe zimanê yekane yê sînemaya kurdî. Ji bo ku em bikaribin filmekî derhênerekî kurd di bin navê sînemaya kurdî de kom bikin, divê ev fîlm, ne bi tevahî jî be, bi giştî (% 50yê zêdetir) bi zimanê kurdî hatibe kişandin.

2 Rola derhênerên kurd di nasîna sînemayeke kurdî de ji ya çêkeran girîngtir e. Lê derhênerên kurd di heman demê de, hem xwedî nasnameyeke kurdî ne, hem jî girêdayî nasnameyeke fermî ne. Ango, li hinek cihan û car caran wekî kurd, li hinek cihan jî li gor nasnameyên xwe yên fermî tên nas kirin. Ji ber vê yekê mijar û zimanê filmên derhênerên kurd, mixabin, têra kurdbûna filmên wan nake. Ew dibe ku bibin berpirsên dannasîna filmên xwe di bin navê sînemaya kurdî de. Ango, ji bilî naveroka filmên xwe, derhênerên kurd dibe bi dîskûrên xwe jî bibin wesîleya dannasîna filmên xwe di bin navê sînemaya kurdî de. Kampanyaya dannasîna filma dawî ya **Hiner Saleem** ***"Heke tu bimirî ez ê te bikujim"*** pir baş nîşan dide ka bi çi awayî derhênerek dikare bi dîskûrên xwe yên medyatîk filma xwe bike "kurd".

3 Fîlmên kurdî bi tevahî behsa mijarên polîtîk dikin û bi gelek lewnan dişibin dîskûrên hereketên polîtîk yên kurdistanî. Bi gotineke din, sînemaya kurdî xwe li ser bîr û bawerîyên dîroka kurdan ya polîtîk ava kiriye û mîsyona xwe wekî nîşandana kurdan dîyar kiriye. Ev rastî qedrê hunera sînemayê (ku hunera dîtîn û nîşandanê ye) ji bo gelê kurd (ku di dîrokê de her dem hatiye veşartin) zêdetir dike. Lê di heman demê de ziman û estetîka sînemaya kurdî di nav mijarên polîtîk de asê dike.

4 Di filmên kurdî de mijara filmê li gor/bi çavên lehengên fîlmîk yên kurd tê raçandin û kamera bi rêya wan derdora wan nîşan dide û *cîh û dîmenên fîlmîk ava dike*. (8) Lê, her çiqas di fîlmên kurdî de mirov dikare li ser hebûna kurdan behsa nêrînekê xweser bike jî, divê em ji bîr nekin ku, heya ku li her çar parçeyên Kurdistanê bazara sînemaya kurdî peyda nebe, pir zihmet e ku derhênerên kurd bikaribin di fîlmên xwe de, xwe bi yekcarî ji nêrînên orîentalîst, ango xwe ji bi çavên bîyanîyan li xwe nêrînê biparêzin.

Li gor vê tarîfê, piranîya filmên derhênerên kurd yên ku li dîyasporayê dijîn (9), bi taybetî yên **Hiner Saleem,** filmên **Bahman Ghobadî,** piranîya filmên derhênerên Kurdistana başûr, fîlmên derhênerên ji rojhilata Kurdistanê yên wekî **Cemîl Rustemî, Şehram Alîdî, Şîrîn Cîhanî** û ji Kurdistana Bakur filmên **Kazim Öz** dikarin di bin navê sînemaya kurdî de bên bi nav kirin. Her wisa, filmên **Hiner Saleem** û **Bahman Ghobadî** ku li her derê dinyayê tên dîtin, di naskirin û çêbuna sînemaya kurdî de xwedî roleke pêşeng in. Ji alîyê din, bêyî ku em behsa kalîteya hunerî/estetîk, qazanca aborî, bandor û xweserîya naveroka filmên wan bikin, eleqe û enerjîya derhênerên kurdên Başûr divê wekî îşareta mezinbûna sînemaya kurdî li başûrê Kurdistanê bê dîtin.

* Xwendekarê doktoraya sînemayê li Zaningeha Sorbonneê-Parîs.

1 Dabaşi Hamid, *Iran Sineması: Geçmişi, Bugünü ve Gelecegi,* (wergera bo tirkî, Bariş Aladag, Begüm Kovulmaz), Istanbul: Agora Kitaplıgı, 2001, r: 1-24

2 Evren, Burçak, *Sigmund Weinberg: Türkiye'ye sinemayı getiren adam,* Istanbul : Weşanên Milliyetê, 1995, r: 35

3 Ji bo têkilîyên di navbera sînemayê û modernîzmê de binêrin, Aumont, Jaques, *Moderne? Comment le cinéma est devenu le plus singulier* des arts, Paris: Cahiers du Cinéma, 2007

4 Bn: "*Filmer le passé dans le cinéma documentaire: les traces et la mémoire*", Caillat, Association des cinéastes documentaristes, Paris: L'Harmattan, 2003

5 Fîlmê Korhan Yurtsever, Firat'in Cînleri, 1977, *(Cinnên Firatê)* û filmê Ali Özgentürk yê bi navê Hazal, 1977, (*Xezal*) du mînakên pir balkêş in ji bo vê nêrîna îdeolojîk

6 Ji bo dîskûra sînemaya neteweyî ya Tirkîyeyê binêrin: Umut Arslan YEGEN, *Gecikmiş Modernlik, Ulusal Kimlik Ve Türk Sineması*, T.C. Ankara Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Radyo Televizyon Sinema Anabilim Dalı, Ankara, 2007

7 Bn: YEGEN, *Mesut, Müstakbel Türk'ten sözde Vatandaşa: Cumhuriyet ve Kürtler,* Istanbul: Iletişim Yayınları, 2006

8 "*Lehengên fîlmîk (personnage) bi kamerayê re hereket dikin û sekans û cîhên fîlmîk bi hev re girêdidin*" MARIE, Michel; COLLET, Jean; PERCHERON, Daniel; SIMON, Jean-Paul; VARNET, Marc, Lectures du film, Paris: Editions Albatros, 1975, r. 177-178

9 Hinek ji wan derhêneran ew in: Hiner Saleem, Hîşam Zaman, Miraz Bezar, Yüksel Yavuz, Nizamettin Ariç, Ehmed Zîrek, Jano Rojbeyanî, Jalal Janroy, Mansur Tural, Zulî Aladag û hwd.



# Roman gencîneya ziman e

JAN BADA

Destpêk û derketina *romanê* wek formeke serbixwe ya wêjeyê ku em îro dibînin û dixwînin, digihîje sedsala hijdehan. Berîya wê hin epos û çîrok hene ku wek destpêk tên pejirandin, lê bi form û avahîyên xwe, ne ew tişt in ku îro em jê re dibêjin roman. Têgeha romanê bi xwe di sedsala 12ê de derketîye û bi bingeha xwe tê maneya her tiştî ku di wê sedsalê de bi zimanê romanî (lingua romana) dihat nivîsandin. Ji çîrok û helbestên vebêjîyê re jî roman dihat gotin, ji ber ku bi heman zimanî dihatin nivîsandin. Di sedsala 13ê de hin beşên din li romanê zêde bûn û bi tenê ji bo nivîsên pexşanê roman dihat gotin. Di dema nû de, yanî piştî sedsala 17ê roman gihîşt form û avahîya xwe û bi sedsala 18ê şûn ve jî wek "wêjeya bilind" rêz dît û bi wêjeya klasîk ve roman gihîşt avahîya xwe ya taybetî û bû parçeyek ji jîyana mirovan.

Niha roman bi gelek form û avahîyên xwe bûye cîhaneke bi serê xwe û gelek sazî û dezgehên fermî û taybetî hewl didin para wan di vî beşê wêjeyê de hebe. Gelek beşên romanan hene, çend mînak: Romanên dîrokî, nameroman, romanên fêrkirinê, macera, şer, mêranî, evîndarî, malbatî, rêwîtî, felsefî, civakî, krimînal, fantazî, romanên zarokan, jinan, keçan, xortan ûwd. Wekî din awayên nivîsandinê hene; mirov dikare bi forma "Ez" yan "Ew" yan bê bernavên kesan vebibêje. Di romanê de ziman, mijar û fîgur bi awayekî rêkûpêk lihevhatî tê hûnandin; cî, dem, xweza, muzîk, bajar, gund, derya, zevî, heywan ûwd. dikarin xwedî rol bin. Fantazîya nivîskar bê serûber e, heta dikare li pêş civaka tê de dijî, berheman bifikire û biafirîne. Hin nivîskar ji bo nifşên xwe nanivîsin, ji bo nifşên piştî dema xwe dinivîsin. Di vî warî de serfirazî bi hûnandina mijar û ziman ve girêdayî ye. Carna civak ne dixwîne, ne jî diecibîne û rêz û rûmetê nade berhemên afirandî, lê ev yek divê dîsa jî li pêşîya afirandina bêsînor nebe asteng …

Em dakevin meydana romanên kurdî. Dîroka romanên kurdî pir caran bi **Erebê Şemo** tê dest pê kirin, dibe ku ji alîyê pexşanê ve ev yek rast be, lê roman ne bi tenê bi awayê pexşanê qebûl dibîne, herwiha destan û efsaneyên mezin jî dikarin wek roman bên hesibandin. Wê demê tu astengî li pêş wê yekê tuneye ku mirov berhema **Ehmedê Xanî** *Mem û Zîn* wek romana destanî*, fêrkirinê bihesibîne û gelekên din jî; belê ew ne romanên sedsala bîstan in, ne di wê formê de ne ku îro em jê re dibêjin roman, lê kî dikare bibêje ew ne roman e! Berhemên **Dante** û **Vergil** jî pir caran wek roman tên hesibandin, heta destan û fantazîyên dema antîk yên yewnan jî wek romanên antîk tên pejirandin. Gava mirov behsa romanê dike, divê rewş û demeke berfireh bigire ber xwe. Roman bi sedsalan, bi heyaman ve jî tê parvekirin. Heyama em tê de ne helbet awayê xwe diafirîne û dijî û gelek form di nav hev de ne: Ji nûjenîyê heta post û piştî post-nûjenîyê afirandin di nav hev de ne.

Em dîsa vegerin ser dema nû ya romanên kurdî. Em nikarin bibêjin ku ji alîyê nivîskarîya nûjen ya pexşanê, kurd di zimanê xwe de gelek berhemdar in. Asta romanên zimanê kurdî hêdî hêdî bi ziman û mijar, xwe çêdike, diafirîne. Gelek nivîskarên romanan dinivîsin, gazinan dikin ku xwendevanên romanên kurdî kêm in; ev rastî êşê dide nivîskaran, ji ber vê yekê jî, ev awa nivîs nû ye û ne zêde ye. Piranîya nivîskaran ji destpêkeke valahîyê wek wezîfeyeke netewî derketine holê, nexwastine meydana romanê vala bimîne. Gelek nivîskarên romanên bi kurmancî piştî salên 1980ê li dervayê welat dest bi nivîsandina romanê kirine; piranîya ji wan ji siyasetê tên, yanî ji bo wan ev pêwîstîyeke deyndarîya zimanê kurdî bû, li gor wan ev yek diviyabû bihata kirin. Ev destpêk piştî salên 90ê geştir bû. Ji salên 2000ê bi şûn ve nifşekî nû derket û niha berê nivîskarîya romana kurdî ber bi pêş e, pir tişt ji nû ve dest pê dikin. Ew kesên destpêkê gelek tahde dîtin; nehatin pejirandin, dêvla rexneya berhemên xwe, dijberîyeke şexsî ya tund li hember xwe dîtin. Rexnegirîya romanê di nivîsevanîya kurdî de hîn jî li kesayetîya xwe digere. Rexnegirîyeke ku bala xwe bide berhemê û ne nivîskar û bi kêfxweşîya hebûna berheman di zimanê kurdî de nêzîkî pirsgirêkê bibe û heta jê tê objektîv be, gerek e.

Kesên ji wezîfedarîya netewî dest bi nivîsandina zimanê kurdî kirine bi tu awayî nikarin biçûk û nebaş bên dîtin, ji ber ku wan bi gelek peyvên zimanê gelêrî, kurdîya nûjen xurt kiriye û bûne sedem ku romanên kurdî bibin gencîneya peyvên zimanê kurdî. Ew pêşengên vî karî ne û li ser wan nirxandineke objektîv hebe gelek baş dibe. Berhemên wan bi çavekî rexnegirîya hemdem li ber çav bên girtin, neheqî ji holê radibe û *mafê Sezar ji Sezar re dimîne*; dem hatiye ku di warê rexnegirî û hevnasîna kesayetan de rûpelekî nû bê vekirin. Divê nivîskarî û nîvîsevanîya zimanê kurdî bi asta berhem û ne kesayetan ve bê pîvandin û nirxandin. Romanên kurdî hene û her diçe dê zêde bibin. Em ji bîr nekin ku rexnegirên zimanê rûsî nebûna (Belinski, Çernîşevskî, Dobroljubow ûwd.), romanên klasîk ên rûsî bi vî awayî xurt bi pêş ve nediçûn; dema derketina rexnegirên pîşeyî yên romana kurdî hatiye.

**Çavkanî**

- Lukács, Georg, Die Theorie des Romans(*Teorîya Romanê*), 1986, München
- Migner, Karl: Theorie des modernen Romans*(Teorîya Romanên Nûjen),* Stuttgart 1970
-http://www.magic-point.net/fingerzeig/literaturgattungen/roman/roman_ergebn1/roman_ergebn1.html


* Heta Alman ji hemû nivîskarên xwe yên mezin re dibêjin Dichter (Helbestvan). (Dichter: Ev peyv tê du maneyan 1. Helbestvan, 2. Kesê gotina ji ber xwe derdixe. (Yanî hem neyînî û hem jî erênî tê bi kar anîn)

## Jîyan bi kurdî xweş e!




# NAVEROK

## ÇIRÎYA PÊŞÎN 2011



Li Kurdistanê rêya sêyem
PROF. DR. ILHAN KIZILHAN
▶ R. 1

Siyaseta Tirkîyeyê ya Rojhilatê Navîn û faktora kurd
PROF. DR. FERHAD IBRAHIM
▶ R. 1

Tûnis, serxweşîya gengazan
SERGE HALIMI
▶ R. 1

Dîplomasîya lihevkirinê û sazûmana navneteweyî
ALAIN GRESH
▶ R. 2

JI ÇAPEMENÎYÊ
▶ R. 2

Armanc û perspektîvên demokrasîya herêmî
GIOVANNI ALLEGRETTI
▶ R. 6

Dewleta Filistînê dîsa ma bo siberojê
ALAIN GRESH
▶ R. 8

Êlegê jiyanê bo Yewnanistanê, gopal bo Ewroyê
LAURENT CORDONNIER
▶ R. 9

Rizgarbûna ji krîzê: Em ê ji ku dest pê bikin?
JEAN-MARIE HARRIBEY
▶ R. 10

Gelo dîrokê berê xwe daye rastgirîyê?
RÉMI LEFEBVRE
▶ R. 11

Kurd careke din hatin ji bîr kirin
CHRISTIANE MORE
▶ R. 12

Doza Barack Obama
ERIC ALTERMAN
▶ R. 14

Gava Washingtonê di venasînê de dudilî dikir
IRENE GENDZIER
▶ R. 15

Rewşa kambax ya endustrîya leşkerî ya Rûsyayê
VICKEN CHETERIAN
▶ R. 16

Geşedana pîşesazîya çandinîya bîyolojîk
PHILIPPE BAQUE
▶ R. 18

Rûyê sexte yê bîyorengarengîyê
AGNÈS SINAÏ
▶ R. 19

Çima împaratorîya Murdoch barê gewhereke ku êdî pir giran bûye ji ser xwe avêt?
JEAN-CLAUDE SERGEANT
▶ R. 20

Femînîzm û ekolojî, têkilîyeke "xwezayî" ye?
JANET BIEHL
▶ R. 22

ÇAND Û HUNER
▶ R. 23

## Forma Abonetiyê

Nav:
Name

Navnîşan:
Address

Koda Postayê: Bajar:
Postcode City

Telefon:

E-Mail:

Abonetiya salane (12 hejmar!)

☐ Almanya (50 €) ☐ Derveyî Almanyayê (60 €)

☐ Abonetiya dîjîtal (20 €)

**Independent Kurdish Media Group GmbH (IKMG)**
**Carnotstr. 4 - D-10587 Berlin**

Berliner Volksbank - Hesab/Account/Konto: 2284 1230 10 - BLZ: 100 900 00
IBAN: DE78 1009 0000 2284 1230 10 - BIC/SWIFT: BEVODEBB

www.arsivakurdi.org